# Bûbê Eser

# SAPO

Roman

Sapo

Bûbê Eser

Wêneyê Bergê pêşî

Yahia Silo

Pergela Berg û Rûpelan

Çapa yekem:

ISBN

*Ez vê romana xwe diyarî brayê xwe Bawer Eser dikim. Ji ber ku gelek alîkariya min çi di warê madî û çi jî di warê manewî de kirî ye. Her weha ew jî yek ji qehremanê wê demê û yek ji lehengê vê romanê ye.*

# Sergotin

Min romana birayê hêja Bubê Eser, ku bi sernavê Gardiyan e, wergerand zimanê Erebî û niha ew dixwaze wê romanê bi Erebî jî bide çapê, weku berê bi hinde zimanên dî jî çapkirî ye.

Ez gelek hukar bûm bi xwendina wa berhema hêja, lew re gava ev romana nû (SAPO) ji min re șand, da ez jê re çavdêriya zimanî bikim, min yekser erê kir, ji ber ku êdî ji min re zelal û bi cih bû ye, ku kak Bûbê bo gelê xwe yê Kurd dinivîse, dinale û xema vî gelî hildaye ser mil û dilê xwe.

Ev roman ne dirêj e, lê gelek watedar e û bi Kurdiyeke asan û baș e. Bê guman tê de hinek çewtiyên piçûk hene, lê hemî berhemên mirovî jî wilo ne, hema armanc û axaza "daxwaza" kekê Bûbê ji lêkirina va romana, ku mirov dikare wê ji romanên siyasî bijimêre, bi zanîn û kanîn hatiye lêkirin, tiștên ne giring di nav de nayên dîtin. Ew du aliyan bi hev re dide nasîn, aliyê civakî û aliyê ramiyarî di civata kurdî de, li bakurê Kurdistanê û gelek veșartokên wê civatê derdixîne ber ronahiyê, ku piraniya wan ji Kurdan re baș ne hatibûn nasdan.

Sernavê vê romanê (Sapo) ye, navekî ne rastîn e ji bo mirovekî xudan ramanin cuda ji ramanên hembervanên wî. Em li Çiyayê Kurdan, li rojavayê Kurdistanê, li ciyê Sapo, peyva "Xapo" bi kar tînin, gava yek xapînok be. Sap jî ew genim e an cehe ye, yê ku bi melêban ji bêderan davêjin ber cercerê. Ew kesê pir gotinên vala jî dike li ser wî dibêjin: Ew disapirîne! Lehengê romanê (Şêro) ye, ku hembervanê Sapo ye, lê ew bi xwe jî, tevî ku mirovekî zana ye bi Sapo yê ku ajanê dewletê ye, demekê tê xapandin.Di vê romanê de hinek kesên rêwenda û ji xêza tevgera neteweyî ya kurdî berșê bûne, ji ber ku ew bi rêberê xwe Sapo hatîne xapandin, ew ê ku

jiyana wî ya ramiyarî ji serî heta dawiyê sapirandine û bizava xwe dike, ku gelê xwe bike berdest û koleyê deselata xwînrêj û neyarê Kurd û Kurdistanê.

Ez naxwazim firehtir li ser va romana bi peraveke niștperwer hatiye lêkirin binivîsim, da hûn bi xwe wê bixwînin û nêrîna xwe li ser bidin. Silavek ji dil.

Cankurd – Bonn: Dawiya sala 2022

## ÇEND GOTIN

Ev kitêba di destê we de, romaneke sîyasî ye. Bûyer, li devera Mêrdînê derbas dibin. Wekî tevayîya kurdistanê, li vê deverê jî hişmendîtîya kurdayetîyê pêşve diçe, kurd di pêşengîya ciwanên xwe de, xwe organîze dikin. Ev yek, di qada bilind a rêveberîya dewletê de tê minaqeşekirin. Dewlet, plan û programan li dar dixe da ku rê li vê pêşveçûyînê bigre.

Kitêb, deşîfrekirina leystikên dewletê ji bo xwe kirîye armanca sereke. Ev leystik û aktorên ku di vê leystikê de rol girtine, bi zimanekî xweş hatîye nivisîn. Loma jî xwendina vê kitêbê gelek hêsan e.

Jiber ku bûyer û leystikên devera Mêrdînê li gelek heremên me yên dine jî qewimîne, xwendevan, bi rehetî, sebeb û encamên bûyeran fahm dike û van bûyeran ji nû ve dijî.

Dewlet, ji espertên xwe komîsyonek ava dike. Rêveberên vê komîsyonê Z. Kuçik û Bîrîncîk in. Ev herdû kes, di ware sîyasetê de, şarezan in, herweha, tevgera kurd jî nas dikin. Li gor planên wan, divê bi navê kurdan partîyek were avakirin û serokê wê jî yekê kurd be. Bi vê armancê li merivan digerin, li Enqereyê, rastê Sapo tên.

Sapo, kurê Bênav û Filîzê ye. Ev malbat, di warê civakî de bêkok e. Malbat him di nava xwe di bi problem e û him jî bi gundîyên xwe jî ne li hev e. Sapo, berhemê sosyolojîyeke bi vî rengî ye û di heman demê de, di asta patolîjîk de, narsîst e.

Li gor biryara dewleta kûr, prose bi avakirina PTKê destpê dike û Sapo dibe serokê wê. Ev prose bi kuştina çend welatparêzên navdar didome. Gava sêyem, êrişa li ser eşîr û axayan e. Ev bûyer,

tevgera Sapo xwurt dike û nav jê berdide. Bi vê xwurtbûnê, biryarê êrişa rêxistinên ciwanan yên dinê tê girtin. Ev biryar, ewilî, li ser rêxistina herî lewaz tê tetbîqkirin û bi rêxistina PGKê didiome. Di şere navbera PTK ya Sapo û PGK ya Kurdistanî de bi dehan ciwan telef dibin. Ev yek, li Kurdistanê xebatên ronakbîrîyê kokbir dike û herweha, di warê aborî û civakî de dibe sebebê tahrîbatên mezin.

Piştî 12ê îlona 1980an, proseyeke dinê dest pê dike. Li Bakûr, bi kontirol, di navbera partîya Sapo û hêzên dewletê de, şer tê lidarxistin. Serokatîya Sapo ji alî gel ve tê pejirandin, bi hezaran pêgirtîyên Sapo çêdibin. Yek ji armancên dewleta tirk jî ev e ku di sedsalîya Lozanê de, Sapo wek temsîlkarê kurdan li pêş be, biryara qedera kurdan bikeve nava destên Sapo.

Niviskar Bûbê Eser, di şexsê Sapo da, têkilîyên di navbera fonksîyona civakî û ya sîyasî xweş dinirxîne; mirovên ku di warê civakî de bê kok û bê mesûlîyet in, dikarin di warê sîyasî de her kirasî li xwe kin.

Mixabin, piştî avakirina komara Tirkiyê, li Bakûrê welatê me, beşeke mezin ji rêveberîya me ya civakî, bi ronakbîrên me re, tûşê zilm û sirgûnan bûn, ên mayîn ji hatin xesandin û bûn xîzmetkarên sîstema serwerîya tirk. Ev yek, rê ji bo yên wekî Sapo xweş kir.

Kekê Bûbê, beşek ji tarîxa me ya nêzîk bi zarekî xweş pêşkêşî me kirîye. Wî, rewşa sîyasî ya wê demê, bi problemên wê re li ber çavan raxistîye. Ew, di nirxandinên xwe de xwedî helwest e, lê çareserîya probleman ji xwendevanan re hiştîye. Min ev kitêb bi zewk xwend.

Salim Çelîker

03-12-2022

## ÇEND GOTINÊN XWENDEVANIYÊ

Vê romana ku hina hûn dixwînin, romaneke sîyasî û çandî ye. Birêz nivîskar Bûbê Eser, pêwendîyên civakî, gundewarî, eşîrî yên beşek ji civata Bakurê Kurdistanê bi pêşveçûna tevgera sîyasî û neteweyî ya Bakurê Kurdistanê ve bi gunceyî li hev hunandîye. Di dever û navçeya mijara romanê de tevgera sîyasî bi awayekî berfireh mezin dibe. Cuwanên Kurd di nava tekoşînê de bi girseyî cî digrin. Dewlet ji pêşveçûna tevgera neteweyî ditirse û pisporên dewletê dest davêjin vê pirsgirêkê.

Roman her çiqasî bi tahlîl û helwesta sîyasî hatibe nivîsîn jî, divê ew bi destûra wêjeyê bê şîrovekirin. Nivîskar her dikare mijarên sîyasî bi mijarên çandî ve girêbide û encaman ji wê girêdanê derbixe. Di civata romanê ku ew beşekî Kurdistanê ye, piştî bêdengîyekê di demek kurt de, şîyarbûnek bêhempa rû dide. Dewlet dixwaze zû pêşîya vê lehîyê bigre û asteng bike. Dewleta navborî, bêgûman dewleta Tirkî ye.

Dewleta Tirk di tevaya jîyana xwe de, xwestîye pêşîya şîyarbûna neteweyî ya Kurd bigire. Tevaya serhildan û berxwedanên Kurdan bi hovane têk birine. Kurd koçber kirine, Serek û rêberên Kurdan bê dadwerî îdam kirine, wan koçberî bajarên din kirine û mafê vegerê nedane wan. Pêwendîyên wan û neteweya Kurd jar û kêm kirine. Dewletê daîma li ser tedbîrên stratejîk yên ku Kurdan ji xwebûn û hebûna xwe bidûr bixin rawestîya ye. Stratejîyên nehênî yên tinekirin û asîmîlekirina Kurdan li dû hev wek berdewamîya hevdû afirandine û bicî kirine.

Di romanê de mijara sereke tedbîrên dewletê ye. Pêşîlêgirtina tevgera neteweya Kurd bixwe ye. Dewlet dibîne ku bi koçberî û kuştinê Kurd natewin û radest nabin. Pisporên dewletê bi hişmendî û derfetên dewletê li çareserîyeke mayende digerin û vê çareserîyê li gorî xwe peyda dikin. Pisporên dewletê wek komîteya têkbirênê

tê avakirin. Kesên pisporên navborî Kurdan û tevgera Kurdistanî nas dikin. Ew herweha di lîstok û stratejîyên dewletê yên tinekirine de jî xwedî kerametin. Nivîskar Bûbê Eser van kiryar û bûyerana bi zimanekî sivik û herikbar bi hev re girê dide û bi encam dike.

Encama mijara romanê; ji nava Kurda, bi navê Kurda avakirina tevgereke bi dewletê ve girêdayî ye. Pisporên dewletê di vê daxwaza xwe de biser dikevin û Sapo wek serokê vê tevgerê destnîşan dikin. Sapo lawê malbatek tevlihev û bi gundîyên xwe re jî nelihevin. Nivîskar di vê mijarê de girêdanek xweş bi kesayetîya Sapo, pisîkolojîya civakî û sîyasî ve girê dide. Loma jî pisporên dewletê li yekî weha û xwendevan ku ji bo navê xwe amadeye vî karî bike digere û Sapo tercîh dikin. Sapo ji bona xwe bi qebûlkirin bide dikare hemî hebûna xwe jî têxe xeterê. Mirovekî tevliheve û dikare têkeve her rengî. Narsîste û jixwe ditirse.

Pisporên dewletê bi derfetên dewletê partîya Sapo ava dikin û wî dikin serokê partîyê. Ev partî ya dewletê ye û bi alîkarîya pisporên dewletê xebata xwe birêve dibe. Berîya her tiştî tevgera neteweyî terorîze dike, di nava wan de nakokîyan derdixe, wan dijî hev bikar tîne û dawî jî şerê wan dike. Di nava van kiryaran de dewlet li pişt û kêleka Sapo û partiya wî ye û bi dîrektîfên dewletê, bi stratejîya dewletê dixe jîyanê. Sapo li Kurdistanê derfetê ji darbeya leşkerî ya 12ê îlona 1980 yî amade dike. Darbeya leşkerî tevgera neteweyî ya Kurd ji hev dixe û bi partîya ku Sapo serokê wê ye li hev dike ku bi koordînasyona dewletê şerekî çekdarî dest pê bike. Dewlet di vê stratejîya xwe de biser dikeve û ev kar bi encam dibe. Bi vî awayî dewlet dixwaze Sapo wek serokê Kurdan yê bê alternatif û piştî sedsalîya Lozanê jî wî wek temsîlkarê yekta rê bide û dawîya tevgera neteweyî bîne.

Mijar bi mijar, bûyer bi bûyer li dû hev, bi awayekî wêjeyî roman hatîye nivîsîn. Nivîskar Bûbê Eser di romana xwe de pêwendîyên sîyasî û civakî bi sosyolojîya civakî, bi malbatên Kurdî û stratejîya dewletê ve girêdaneke wêjeyî pêk anîye û bi encam kirîye. Hêvîdarim xwendevan ji romanê hez bikin û wek min xwend ew jî tahma wan şîroveyên wêjeyî bikin. ji nuha ve Pîroz dikim

Nezir Akat 7-12-2022

## WÊREKIYA REWŞENBÎRÎ

Nivîskarê vê pirtûka ku nuha di destên we de ye û hûn xwe amade dikin ku bixwînin, bi vê berhema xwe li ser navê miletekî bindest, belgeyek ji dîrokê re hiştiye.

Piştî sedan salan, keç an xortekî endamê wî miletê bindest, wexta bixwazî fêr bibe ku di dawîya sedsala 20an û despêka sedsalan 21emîn de çi hatiye serê miletê wî û rastî vê berhema Bûbê Eser were ji dil bawer dikim ku wê gelek tişt ji bo wan zelal bibe.

Berhem bi şêwazê romanên dîrokî hatiye nivîsandin û nivîskar ji bilî hunera xwe ya nivîsê hunera çîrokbêjiya xwe jî derxistiye pêş. Ji despêka romanê heta dawîya wê bawer nakim ku xwendevan ji xwendina wê acizbin û wexta mirov romanê dixwîne mîna ku mirov li gundekî Kurdistanê li şevbuhêrkê li çîrokbêjekî guhdar dike.

Elbet ewê gelek têbinî û gotin li ser aliyê edebî yê vê berhemê were gotin. Ez bixwe vê yekê ji xwendevan re dihêlim. Lê dixwazim çend gotinan di derheqê naverok û aliyê rewşenbîrî ya nivîskarê delal bêjim.

Piştî ku min xwendina romanê qedand, tişta despêkê hatî bîra min ev bû "xwezî Bûbê Eser ev pirtûk berî bîst salan nivîsandiba." Bi vê berhema xwe nivîskar wêrekbûna rewşenbîriya rasteqîn ku wekî Kurd em hemû bi hesreta wê ne nîşan daye. Ji bo serdema xwe berhemên feylezof û zanayên mezin ji bo miletên wan û mirovahîye hatibe çi wateyê ev berhem jî bêguman him îro û him jî di siberojê de ji bo miletê bindest ku ez û nivîskar endamên wê ne ewê xwedîyê heman wateyê be.

Ji dil bawer dikim ku nivîskarê ez baş zanim gelek caran ji mirinê rizgarbûye, bi vê berhema xwe, carekedin mirina xwe daye ber

çavên xwe û bi hemû hestên xweyî azadîxwazî qîriyayî û gotiye; "ew keya yê ku bi destên dagirkeran li ser serê miletê me hatiye danîn û li pêşiya azadî ya miletê me bûye astenga herî mezin, tazî ye..."

Serhad Mêrdînî 14.12.2023

# -1-

Beriya Mêrdînê beriyeke dûz weke keva destan dihat xuyakirinê. Xelkên wê beriyê îdara malên xwe ango aboriya xwe, bi çandiniyê û xwedîkirina heywanan dikirin. Çandinî ji salê carekê bû ku heger ew jî baran bihata, wê salê gundiyan hebekî xwe rehet û aram didîtin. Pêwîstiyên xwe bi firotina zad pêk dianîn. Lê heger wê salê baran nehata, hemî perîşan dibûn û ji bona birçî nemînin bi bajar û kolanên metropolên tirkiyê diketin. Çi kar heba dikirin û bi pereyekî hindik dîsa li gundên xwe vedigeriyan. Wan debara xwe her sal bi vî awayî dikirin. Wê demê hema bêjin havînan li piraniya gundên beriya Mêrdînê bê av diman. Ji bona peydekirina avê gelek ji gundiyan berê xwe didan gundên ku bîra wan ya avê hebû da ku ji bona xwe, zarok û malbatên xwe qurtek ava vexwarinê bianîna malên xwe.

Havînan derd û êşa gundiyên hêrêma Mêrdînê bê av bûn bû. Ew derd û êşeke bi taybet bû. Derdê bê avbûyinê di ser her derdî re bû. Ev nebes bû, carna leşkerên romê bi gundan diketin, sedema ku “Qaçaxçî” di gundê wan re derbasbûne an ji gundiyan hinan ji ber nakokiyên nava xwe gilîyê hin ji gundiyên xwe li Qereqolên tirk dikirin. Leşkerên Qereqolan jî li ser giliyê hinan, lêdan û êşkenceyên xeter dianî serî wan kesên ku giliyê wan hatibû kirin. Wê lêdan û êşkenceyên leşkeran li gundiyan dikirin, dibû cihê kêf û şahiyê wan. Leşker bi nava gund diketin hemî zilam li meydana gund topî ser hev dikirin, bi dar û qalasan diketin nava wan. Hal di wan de nedihiştin. Piştî lêdaneke bi dilê xwe dikirin, êdî ji herdu aliyên ji hev nexweş, pereyeke baş distendin û weke ew li hev dianîn, dikirin. Lê ya rastî lihevanîna gundiyan ne dihat hesabê leşkeran. Wan her dixwest ku şer û pevçûn di nava gundiyan de hebe û ne li hev bin. Ev, siyaseta dewletê jî bû. Wan jî fêm kiribûn û dizanîbûn ku Kurd çiqasî ne lihev bin, di nava wan de şer û pevçûn hebe, karê wan jî ewqasî rehet û hêsan dibû. Loma li hevhatineke berdewamî tu

caran nedixwestin. Hema bêjin di nava hemî gundiyên Kurdistanê de nakokî hebû. Hin ji ber nezanî û ne xwendina wan û hin jî bi zanetî ji teref dewletê ve dihat kirin. Kurd çiqasî ne li hev bana. Di nava wan de çiqasî nakokî hebûya, ji bona dewletê jî ewqasî rehetî çê dibû.

Dema dewletê erd li gundiyan belav dikir, Îbrahîmê bavê Ehmo jî bi qasî pêwîstiya xwe heta hinekî zêde erd ji dewletê girtibû û li gundê Xezebê bi cih war bû bû. Piştî  mirina bavê Ehmo êdî ew erd hemî bûn ê wî. Di wan demên berê de keç nedibûn xwediyê xwe û mîrasa bav an bapîrên xwe. Tiştê ku weke mîras diman hemî yên kuran ango lawan bûn. Ji ber Ehmo kurê malê ê bi tenê bû, hemî erdê bavê, mal û hebûnên din tev bi wî mabûn. Keriyek pez, çend dewar, du hesp û sê ker. Ji ber Ehmo hinekî delalî mezin bû bû, zêde kar bi wî nedidan kirinê. Bavê Ehmo Îbrahîm xwedî keriyek pez bû jî. Lê pezê xwe tim bi rastmalî dida kesên bê erd, bê mal û feqîr bûn. Ji ber hebûna malê dinyayê wî ne dixwest kurê wî Ehmo bibe şivan. Ji ber vê bû ku bavê Ehmo tim pezê xwe ya bi rastmalî dide, ya jî bi peran ji bona xwe Şivan digirt.

Di dema xortaniya Ehmo de û baharan gelek caran ew jî bi gundiyan re diçû bêriyê, carna alîkariya bêrîvanan dikir. Wî jî weke gelekên din bi serê mîh an bizinên ku divê bihata dotinê, digirt û bêrîvanan jî ew didotin. Ehmo ji çûna bêriyê gelekî hez kiribû, hema bêje bi kêmanî heftê du sê caran ew jî bi bêrîvanan re diçû û dihat. Her çiqasî bavê wî jê re digot:

-Kurê min kesên feqîr û yên pez bi rastmalî digirin ew bi xwe diharin bêriyê. Lê tu kurê min e, em maldar in. Tu lazimiya me jî tune ye. Malê dinyê dê li dinyê bimîne. Me çi xwar ew e, yên din dimîne li vir. Kesek nikare malê xwe bi xwe re bibe dinya din.

-Erê bavo rast e, lê weleh ez ji çûyina bêriyê gelek hez dikim. Dema ez bi serê wê heywana ku divê bê dotin digirim û li hember xwe dinerim, gelekî kêfa min tê. Heta hin caran di bin çavan de li bêrivanên din jî dinêrim. Gelek keçik û ciwanên weke min jî têne wir. Piştî dotina pez, em ji xwe re dilîzin û ev ji bona min gelekî xweş e. Heger tu destûr bidî ez jî car carna herim bêriyê.

-De baş e kurê min tu dizanî.

Ehmo yê ciwan û azib, xwe fêrî çuyin û hatina bêriyê kiribû. Li gel kesên di temenê wî de bûn û ji xwe re bi hevre dilîstin. Ne tenê kur, piraniya keçan jî ji bona him xwe fêrî dotina pez bikin û him jî bi alîkariya dayikan ve rabin, ew jî diçûn beriyê. Ya rastî ew bû ku çûyin û hatina qîz û xortan ya bêriyê gelek caran dibû hevdu nasîna wan ku bi hevre dizewicîn. Ji xwe di wan demana de keç û xortan ya li ber bêriyê ya jî li dawetên gundan çê dibûn hev didîtin. Gelek caran dilê wan diket hev û bi vê yekê ango bi rêya qasidan û xwestina keçên wan dihate kirin. Bi gotineke din du ciwanan jiyana xwe dikirin yek.

Di destpêka çûn û hatina bi bêrîvanan re ya Ehmo, zêde bala wî nekişandibû ku keçên der û dora gundên wan jî têne wir. Piraniya pez, di dema şîrdotinê de hema bêjin li gel hev bûn. Piştî dotinê jî pez mexel dikirin û şivanan jî ji xwe re bi hevre sohbet dikirin. Qal û behsa pezê xwe, zayîna pez û berxikên xwe dikirin. Cixare pêşkêşî hev dikirin. Gelek caran dema pezê xwe mexel dikirin, şivanan jî ji xwe re bi hevre dilîstin. Lê Ehmoyê kurê bavê xwe ê bi tenê jî her fêrî bêriyê bû bû û êdî sebra wî nedihat ku nere. Ji vê rewşa wî her çiqasî bavê wî ne kêfxweş jî bû, lê li ser daxwaza kurê xwe bêdeng dima.

Piştî demekê bi çûyin û hatina Ehmo ya bi bêrîvanan re rojekê çavên wî bi keçeke ne ji gundê wan bû dikeve. Ehmo carekê bê hemdî xwe li hêla wê keçika delal pak û xweşik ku wê jî bi serê mîh an bizanan digirt, dikeve. Di navberê herduyan de bi qasî werîsekê navber hebû. Haya kesî ji kesan tunebûn. Herkes bi karê xwe ve mijûl bûn. Çawa çavê wî li bedewbûna wê delalê, xweşikbûn û pakbûna wê ket, hema yek ser weke ku di nava Ehmo de singekî biçikîne, bû. Tibabekî lê nerî di wê nerînê de divê peza hatibû dotin berde, bi serê yeka ku wê bihata dotinê bigirta. Lê wî nema dikarî bû li hember wê rindê û delaliya wê keçikê, tevgereke din bikira. Heta ku jinika dotina mîha di nav destê Ehmo de qedand, dît ku Ehmo wê berneda loma bi dengê ne zêde bilind got:

-Ehmo lawo vê berde bi serê yeka din bigire.

Ji nû de Ehmo dihate ser heşê xwe û weke jinikê dikir. Her ku karê xwe dikir, êdî di bin çavan re jî li wê keçika pak, delal û weke horiyekê bû dinerî. Lê hay û bala keçikê ji Ehmo tunebû. Ew tenê bi

karê xwe û bi alîkariya bêrîvana xwe ve mijûl bû. Ehmo fikirî ku piştî dotina pez, wê weke her car keç û xort ji xwe re hinekî bilîzîn. Loma xwe bi xwe got: ”Di wê naberê de ez ê ji xwe re têr li vê keçika delal binêrim”. Lê weke wî nebû. Çawa bêrîvan li gund vegeriyan keçik jî bi wan re çû. Qîz û xortên mabûn, jj xwe re lîstin, keçik di nava hevde rûniştin, ken û laqirdiyên xwe bi xortan dikirin ku bala wan bikşînin ser xwe. Xortan bi kevirê Qawetê, bi çirê û sêkûçê dilîstin û her weha hin lîstikên din jî, heta ku dema wan biqediya. Lê Ehmo wê rojê ji lîstikan tu tam negirti bû. Her çiqasî dilîst jî lê heşê wî mabû li ser wê keça ku singek li ser dilê wî de kuta bû. Wê, singê evîna xwe di dilê Ehmo de bi yek carê çikandibû. Ehmo jî li hember wî singê ku wê biba şirîkê hemî jiyana wî, nikarî bû berxwe bida. Dilîst lê heş û bala wî mabû li ser wê delalê, wê xweşikê û wî singê di ser dilê wî de hatibû kutandin. Di lîstikê de gelek caran Ehmo tuşî erdê dibû û ji hevalên wî jî diyar dibû ku ew weke heroj nalîzê. Loma hevalê wî Berxo yê ku di temenê wî de, jê pirsî û got:

-Lawo Ehmo çi bi te hat, ma tu nerehet e, tu çima xweş nalîze? Binere vaya zore me çû. Xweş bilîze da ku em jî carekê zora yên li dijberî xwe bibin.

Tew te digot belkî Berxo vê ji hênin din re dibêje. Deng nediçû Ehmo heta ku Berxo tepek lê da û gotina xwe dubare kir. Lê Ehmo bi şermokî got:

-Bawer bike ez jî nizanim çi bûye? Heta hatim bêriyê jî kêfa min li cih û tu nexweşiya min jî tune bû. Lê lawo Berxo ez ketim bextê te, ji kesekî re nebêje. Dema çavên min li wê keçika kêleka min ya bi serê pez girtibû, ket. Te got qey te singek di nava min de kuta. Û her bala min ma li ser wê. Nizanim çi bi min hat?

-Ehmo emirqut bo, ev destpêkê evînê ye. Dema mirov bi nerîna ewil de di nava xwe de singek kuta, aha ew destpêke. Her ku here ew sing wê di nava dilê te de here, êşê bide te, te aciz bike, heşê te ji serê te bibe. Ez dibêjim ê te jî weha bû.

-Na lo hema weha bi yek carê dibe?

-Erê dibê û xweş jî dibe, ji xwe hemî evîn, bi nerîna cara ewil destpê dike. Di destpêkê de singekî di nava me re de dikute û her ku dihare kutana wî sîngî bêtir di dilê me re de dihare û êşê dide mirov.

-Na lo! ne ewqasî! Malxerab hema bi yek care te ez kirim Mem û ew jî kir Zîn.

-Erê evîna wan jî weha destpê kir û dawiya wan di ku de derket, di hemî stranên dengbêjên têne gund de, heye. Ma qey te ew guhdarî nekirine?

-Berxo bi rastî te ev gelekî mezin kir, kûr û dûr kir. De ka rabe em jî berê xwe bidin gund û herin malên xwe. Ez nema dikarim zêde bilîzim.

Xortê pak, rind û li hevhatî, kurê malê ê bi tenê, dema hate mal, rû û rûçikên wî ne weke her roj bû. Loma vê bala Dayika wî Hemşê jî kişandibû. Ji ber vê rewşa kurê xwe, hema ew yek ser hate ba Ehmokê xwe û jê pirsî:

-Kurê dayika xwe! îro madê te nexweş e. Çi bûye? Qey tiştek qewimî ye? Ka ji dayika xwe re bêje!!!

-Na yadê wele tu tişt neqewimî ye. Ez jî nizanim çi bi min hat. Hevalê min Berxo jî weke te got. Ew jî tirsiya ku ez bi nexweşiyekê ketibim. Lê bawer bike dayê tu tiştekî min tune ye. Ma wê çi bi kurê Hemşê bê?

Wê êvarê Ehmoyê me nerehet bû, xew li herêmî bû, hiş û bala wî mabû li ser wê keçika di dema beriyê de ku wê jî weke wî bi serê pez girtî bû. Çavên xwe digirt ew keçik dihat ber çavan. Herku serê xwe berbi aliyê rastê de dizîvirand çavên wî li wê rindê diket. Her çiqasî ew di nava nîvînan de bû jî, lê xwe li bêriyê û bi serê pezekê girtinê, didît. Didît ku ew keçika rind jî li kêleka wî ye. Wê jî weke wî bi serê heywanekê girtiye. Her çiqasî xwe di wê de û virde di nava nivînan de bir û anî jî xew lê herimî bû. Dikir û nedikir nikarîbû razê. Li xwe û li vê rewşa xwe heyirî mabû. Bi nerînekê çi bi serê wî de hatibû. Wî jî nema dizanî bû. Heta destê sibê ranezabû. Bi ronahiya destê serê sibê heta bilindbûna rojê ya bi qasî du bejna, razabû. Dema şiyar dibe xwe ne rehet hîs dike. Çû serşokê dev û rûyê xwe şuşt. Dayika wî weke her car taştêya wî ya ku ji qîmaxê mastê mîhan, rûnê nivhişk û çaya qaçax bû li ber wî danî. Danî lê Ehmo weke her car hema bi yek care êrîşê wê taştiya delal nekir. Bi giranî rahişt nanê tenûrê yê ku do dayika wî lê xistibû. Pariyek jê kir, hêdîka di nav temsîka qaymax de bir û anî, bê ku li nanê xwe binêre

xiste devê xwe. Lê tu qaymax bi ser nanê wî de neketibû. Ew nanê tisî xiste nava diranên xwe û destbi çûtinê kir. Vê rewşa wî dîsa bala dayika wî kişandibû. Wê fêm kir ku lawik ne weke berê ango do ye. Wê yekser fêm kir ku tiştek bi serê kurê wê de hatiye. Lê çi? Gelo hevalên wî heqaret lê kiribûn? Gelo şer û pevçûn di nava wî û hevalên wî de derketibû? Wê jî nema dizanî bû. Ew, ji cihê xwe radibe, berbi kurê xwe ve dihare. Destê xwe da eniya wî, xwest fêr bibe bê ka agirê wî heya an na. Piştî dest danîna ser eniyê fêm kir ew weke her car e. Loma vê carê bi meraq jê pirsî:

-Kurê dayika xwe, min netirsîne! Ez dayika te me û ji hale te jî baş fêm dikim. Ez dizanim tiştek hatiye serê te. Lê tu nabêje. Ka bêje da ku dayika te jî jê re çareyekê bibîne, ez bi qurban.

-Dayê heyran, dev ji min berde, wele û bile, tu tişt û nerehetiya min tune ye û tu tiştek neqewimî ye. Ez jî nema dizanim ku çi bû? Ez jî dizanim ne weke do me. Lê ka hela îro heta sibê wext bide kurê xwe. Carna tiştên weha diqewimin. Ne xem e, soz tiştek hebe ez ê ji dayika xwe re bêjim.

Lê weke gêrik di qûna Ehmo de be, hema diçû wî alî û vî alî, çû û hat, li benda dema bêriyê bû. Bi çûyin û hatine xwe ya nav malê, carna serê xwe dihejand, carna di nava lêva xwe de tiştnî digot. Lê dayika wî fêm nedikir ku çi dibêje. Loma wê jî xwest demekê kurê xwe bi tenê bihêle, bê ka wê çi bibe.

Dema çûyina bêriyê nêzîk bû bû, Ehmo dest bi haziriyê kir ku dereng nemîne. Her ku dem nêzîk dibû, ew bêtir kelecanî dibû. Weke aciz be, dibû. Lê ji aliyekê ve û carna jî weke kêfxweş be, dimizmizî. Berî çûyina xwe deng li dayika xwe kir û got:

-Dayê wa dayikê!

-Kerem bike ez bi qurban. Çi dixwazî?

-Dayê wele ez îro dixwazim bi cilên xweşik herim bêriyê. Tu dikare ji min re wî bedlê bavê min ji min re kirî bû bîne? Ez dixwazim îro wî li xwe bikim.

-Erê qurban dikarim bînim. Lê mirov bi cilên xweşik dihare dawet û şahiyan, ne ku bi wan dihare bêriyê.

-Erê dayê, ez dizanim. Lê îro hema weha ji dilê min hat. Ka tu jî dilê kurê xwe nehêle. Wî bedlî bîne ez ê li xwe bikim û bikevim nava bêrîvanan.

Teqîn û zinginiyek ji serê dayika wî hat. Ew jin bû û ji rewşên weha agahdar bû. Nu fêm kir û texmin kir ku sanciya ewil ya evîndariyê bi dilê kurê wê girtiye. Loma êdî wê dengê xwe dernexist, çû bedlê bavê wî jê re kirî bû derxist, anî danî ber kurê xwe û got:

-De kerem bike ez bi qurban, wan li xwe bike û berê xwe bide bêrîvanan bi hevre bikevin rê û herin. Dibe ku li wan deran tu ji dayika xwe re bûkek bi esil û fesil bibîne. Êdî dayika te jî westiya, pîr dibe, berî mirinekê dixwaze çend nebiyên xwe jî bibîne. Vê gotina dayika Ehmo weke tu perçeyek dilê wî jê bike. Sar ma û li cihê xwe rawestiya. Fêm kir ku dayika wî rewş fêmkirî ye ku ew dike dilbigire, ya jî girtî ye. Lewra Ehmo yeka xwe ne kir dido û dayika xwe hembêz kir, rûyê wê destên wê maç kir û got:

-Dayê tu ji ku tiştên weha dizanî? Dayika wî bersîv nedayê û bêdeng ma. Ehmo cilên xwe li xwe kir. Çû ber mirêkê porê xwe şeh kir, hin toza li ser cilên xwe dawişand, çend caran li xwe mêze kir û xwe bi xwe got: ”Kuro Ehmo ev çi halê te ye? Çi bi te hat! Bêrîvan wê ji te re nebêjin; ”Ehmo mirov bi van cilan naçe Bêriyê”. Erê weha got, lê dîsa jî li mêrikê li xwe nerî, porê xwe dîsa şeh kir. Dema wê derketa, dayika xwe ya li ber derî rawestiya bû, maçî kir derket û berê xwe da nava bêrîvanan.

# -2-

Kurdistan welatekî bi ser erd û binerda xwe dewlemend e. Her weha xelkê li ser vî erdî dijîn yanî kurd jî bi mêrxasî û wêrekiya xwe di cihanê de navdar in. Ne tenê ev, her weha kurd, miletekî xwedî asalet û xwedî soza xwe ye jî.

Bi mêvanperwerî û bi qedirgirtina mêvanên xwe jî navdar in. Kesên xwe diavêjin an bavêtina bextê wan, heger dijminê wan jî ba. Heta di mala wan de bana, ew diparastin. Ji ber ku li ba kurdan bext her tişt e. Dost û dijminên Kurdan jî ev yeka baş dizanîbûn û dizanin.

Bi vê başî û qenciyên xwe kurd navdar bû bûn. Loma jî dijminê wan tim dixwest û dixwazin ji vê yeka kurdan fêdê bibînin da ku bi rehetî bikaribin afat û bobelatekê bîne serê wan. Bi fen û fûtên xwe, bi derew û boxtanên xwe, welatê wan talan û wî jî tune bike.

Ji ber Kurdistan welatekî dewlemend e. Xwedî hebûnên bê pîvan yên sererd û binerd e. Loma tim çavên neyarên wî jî lê bûn ku wê hebûnê bikin yên xwe. Kurdan li vê cîhanê gelek dewlet jî avakiribûn. Di hemî şer û pevçûnên xwe de, ne bê wijdan bûn. Tim li gor şert û mercên ku li hember dijminê xwe divê çawa tevbigerin, digeriyan. Di demên şer de heger hin hêsîr bigirtina, nedikuştin. Eksê wê weke ew mêvanên wan be, li wan dinêrî. Nan û ava wan li gor pêwîstiyên wan didan wan. Roj dihat ew azad dikirin an bi kesên xwe yên di destê dijminê wî de bûn, diguherîn.

Kurdan ji berxwede, ango li gor kêfa xwe û bê ser û ber zilm û tade li tu kesan nedikirin û nekirine. Lê tim di nava xwe de jî weke serokeşîr, axa, beg û her yên li herêma xwe desthilatbûn jî, ne li hev bûn. Dijminê wan ev yeka jî baş zanîbûn û dizanin.

Dema Tirk ji Asiya Navîn hatin li ser erda kurdan bûne mêvan, kurdan jî weke adet û toreyên xwe, bi alîkariya wan ve rabûn cih û

war ji bona wan amadekirin. Şert û mercên mêvantiyê çawa bû ew ji bona wan tirkên ku wê sibê qira wan bianîna jî, pêk anîn.

Tirk bûn, loma jî gelek tade û zilm dîtibûn, birçî, bê cih û war bûn, ji bona pariyek nan, erdekî ku bikaribin li ser bisitirin digeriyan. Digeriyan û dizanîbûn ku tenha kurd dikarin vê yekê ji bona wan amade bike. Loma wan berê xwe dane mezra botan (Mezepotomya) li kurdan bûne mêvan. Kurdan jî qedr û qîmeta mêvanê xwe girt. Hin erdê ku ew bikaribin li ser bisitirin dane wan. Di destpêkê de çi pêwîstiyên wan hebûn, pêk anîn û êdî eleqederên xwe ji wan neanîn.

Tirk bi pîlan û projebûn, wan dixwestên cihê nigê xwe bigirin, dûre dest bi fen û fûtan bikin da ku ew erdê li ser bi cih bûne dagir bikin. Ne tenê ev, her armanca wan di vê yekê de ew bû ku piştî bi hêz bûn û bûne xwedî qawet û zimanê kurdî bi hin aqilmendên xwe yên fenok dane fêrkirinê. Bi saya wan ku xistin nava kurdan fêr bûn ku kurd ne li hevin. Eşîrek ya din guhdarî nake, agir bi mala cîranê wî jî bikeve yên din bi alîkariya wî ve ranebe.

Wan aqilmendên tirkên ku kurdî fêr bibûn rewşa kurdan orf û adetên wan baş fêrbûn. Li gor vê jî hêdî hêdî nakokî xistin nava kurdan. Gelek eşîr berra berhev dan. Şer û pevçûn di nava kurdan de derxistin. Piştî ku xwe li ser erda kurdan bi cih kirin, êdî ew jî rabûn da ku fen û fûtên xwe pêk bînin. Lewra bi hêz û qaweta xwe piştgirî dane hin serokeşîran da ku bikaribin yên din têk bibin. Têkbirina her eşîrete kurd di eslê xwe de têkbirina kurdan bi xwe bû. Lê serokêşîrên kurdan hay û bala wan ji vê planê tune bûn. Loma di nava wan de şerên mezin derdiket û di gelek şerande bi fesadî û bi kiryarên xwe yên dizî tirkan karê xwe baş dimeşandin.

Bi vê yekê weha li kurdan kirin ku ew desthilatî û mêrxasiya kurdan hêdî hêdî ji dest diçû. Her têkçûna eşîreteke kurd dibû sedema xurtkirina wan tirkên ji ber birçîbûnê xwe avêtibûn bextê wan. Kurd miletekî mêrxas, lê nezan bûn. Hingê mêvanperwerbûn, kê xwe biavêtina bextê wan, bi pêşewaziyeke mezin ew li ser erda xwe li ba xwe dihewandin. Lê qet neket bîra yek serokêşîr, axa û begên kurdan ku wanên li ba xwe û li ser erda xwe bi cih kirine, wê rojekê ji bona tunebûna wan têbikoşin. Ne ev ê difikirîn ne jî texmîn dikirin ku wê roj bê, mêvanên wan ji bona tunekirina wan kar û xebatê

bikin. Ne ket bîra wan ku wê rojekê kesên ku li ser erda xwe bi cih kirinê wê malwêranî, talanî û bê wijdaniyê bîne serê wan.

Serokêşîrên kurdan axa û begên wan, bi mêrxasiyên xwe û ne qebûlkirina hukmê birayê xwe, fêm nekirin ku wê rojekê têk herin û bibin koleyên kesên li ser erda xwe bi cih û war kiribûn. Neket bîra wan ku bikaribin, weke bra li hev bikin. Weke kurd li ba hev bin, da ku çi dema êrîşeke hat ser erda wan, li gel hev û bi hevre li hember wê rawestin. Ev nekirin û her ev kirin adet ku kurd tim ji hev perçe bin. Ev adet û tore hê jî berdewam e. Berdewamiya wê kurd kirin kole, xulamokên ber destê xwe kirin serok û berpirsên xwe.

Lê dijmin ev yeka baş dizanibûn. Lewra li gor wê jî zilam û pêgirtin xwe di nava kurdan de bi cih kirin da ku tim kurd û serokêşîrên kurdan ne li hev bin. Ne li hevbûna wan, hêz û qaweta tirkên ji Asya Navîn hatibûn xurt kir. Ji ber ne li hevbûna kurdan wan xwe dane ser hev, cêş û hêzin xwe yên şer amade kirin. Bi vê amadekirinê, bi fen û fûtên xwe, bi derew û boxtanên xwe, destpêkirin û nakokiyên mezin di nava êşîr û axayên kurdan de bi cih kirin. Ji eşîreke kurdan kesek dikuştin û kuştina wî dixwistin hustiyê eşîreka din da ku du eşîr bi hev kevin, her weha jî dibû. Dema ditîn ku eşîrek qels ketiye xwe digîhiştin wan û digot:

-Em bi her awayî di her warî de dikarin piştgiriya te bikin da ku tu û eşîra xwe bi temamî wenda neke.

Ew serokêşîra têkçûyî jî rewş baş fêm kiribû ku heger qawetek, hêzek bi alîkariya wî ve ranebe, wê têk here. Wê erd, mal û canê xwe ji dest bide. Loma mecbûr dima ku pêşniyarên tirkên ku çavên xwe berra erda wan dabûn, qebûl dikir. Lê ev qebûlkirin ne weha karekî hêsan û rehet bû. Loma dema ev qebûl dikirin, ev dihat wê wateyê ku divê wan jî hin şertên ku êdî ewên hemî kar û biryarên tirkan qebûl bikirana.

Bi vê yekê, bi vê plan û projeyê, tirkan xwe bi hêz, êşîrên kurdan jî bê hêz, qels û lawaz dikirin. Bi saya wan eşîrên peymana ku dabûn tirkan, şerê hin êşîrên din dikirin da ku li hember wan hêz û qawetên mezin nemîne. Ev her weha berdewam kir heta ku piraniya êşîrên kurdan desthilatiya xwe ji dest dan. Loma pêşîyên me gotine ”Kurmê darê ne ji darê be, nikare bi darê”.

# -3-

Ehmoyê êdî bû bû evîndarê Helîmê, nema karîbû ku nere bêriyê. Roj bi roj agirê evîna Helîmê li ser serê wî pê diket. Hêdî hêdî vî agirî ew dişewitand. Ji bona tefandin û vemirandina vî agirê nava xwe, derd, êş û kula xwe ji dayika xwe re got. Dilê xwe ê birîndar ji wê re vegot. Sedema tîbûna demeke dûr dirêj ji dayika xwe re vekir. Ji ber ku dayik her tişt in, ji ber ku dayik afîner in. Lewra dayik êş û kula zarokên xwe zû fêm dikin. Ji bona çareseriyê jî ji wan re dibe alîkar. Loma dayik şêrîn û delala zarokên xwe ne, ji ber vê jî zarok hemî tiştên xwe berê ji dayika xwe re dibêjin.

Ehmo jî weha kir û wê êşa dilê wî qul kiribû, ji dayika xwe re vekir da ku dayika wî bikaribê wê qula di dilê kurê xwe de biseyîne. Ew guhdarî dikir û ji bona pêkanîna wê jî soza ku bi alîkariya wî ve rabe û bavê wî jî serwext bike ku ev here serî, didayê.

Li gel çend zehmetiyan, berê bersîva bavê Helîmê na bû. Lê dûre bi saya çend sal mezinên gund û bi timakirina (bertîldayîn) derfetên zêde, bavê Helîmê qebûl kiri bû. Piştî erêkirina bavê Helîmê, Bavê Ehmo ji kurê xwe yê bi tenê, daweteke li gor demê sê roj û sê şevan li darxistibû.

Dayik û bavê Ehmo, bi zewaca kurê xwe kêfxweş bûn. Êdî Ehmo jî li gor gotina gundiyan piştî leşkeriya tirkan û zewacê mirov dibe zilam. Yanî li gor gundiyan êdî Ehmo jî bû bû zilam û dema diçû oda gund ku her êvar li wir sohbet digeriya, stranbêj guhdarî dikirin. Êdî Ehmo ne weke berê zarok dihat hesibandin. Di nava çekalan de û li ber derî rûnedinişt. Êdî ew jî weke zilamên gund di nava koma zilaman de li kêleka muxtêr bû.

Ji ber hê Ehmo zavayekî nû bû, muxtar û gundiyan zêde qîmet didanê. Wî jî ji nû de fêm kir ku ew êdî zilam e û divê li gor vê zilamtiya xwe tevbigere. Qaîde û qanûnên gundiyan, yên ji xwe ber

ku li gor rewşê, lê ne nivîskî bûn, hebûn. Wana ji bona herkesan derbas dibûn. Êdî Ehmo him li mal û milkê xwe dinerî, him jî her êvar li oda gund civat digerand. Gelek caran bi gerandina wê civatê ew jî dibû xwedî gotin û peyv. Ji ber ku ew him kurê malbeteke xuyanî û hinekî rewşa wan ya aborî ji ya gundiyan baştir bû. Him jî Ehmo bi tevger, dan û stendinên xwe hezkirina gundiyan jî girtibû, bi serde jî zavayekî nû bû. Loma bêtir dihate hezkirin.

***

Dem û zeman weke çemê Dicle û Firatê diherikî. Herkes ji halê xwe razî, bi karê xwe ve mijûl bûn. Ehmo jî êdî bû bû bavê 5 keçikan. Dayik û bavê wî çûbûn ser dilovaniya xwe. Ji ber ku ew kurê malê ê bi tenê bû mal û milkê bavê hemî ji wî re mabû. Êdî ew bû bû xwedî sermiyanê xwe û mala xwe. Lê rebeno hê ne bû bû xwedî kurekî ango lawekî. Vê jî ji bona wî hin zehmetî derdixist. Piştî ku Ehmo bû bû bavê pênc keçan û kurê wî tune bû, gundiyan carna di nav hevde digot in:

-Wax wax, Ehmo yê me kurdûndaye. Heger weha here wê kurdûnda ji vê dinyê bar bike.

Gelek caran ev gotina gundiyan dikete guhên Ehmo jî. Lê wî ji jina xwe hez dikir û ne dixwest careke din bizewice. Her ev gotin û zehmetî ji bona jina Ehmo û keçên wî jî ne xweş bûn.

Li gor adet û toreyên berê yên kurdan ku kesên kurê wan çênebûna, ji wan re dihate gotin ku Kurdûnda ye. Yanî weke zarokên wî tune bin. Heta kurek ji wan re çê neba, bi navê kurdûnda dihatin bi nav kirin. Malbatên nas û dostan jî zor didan kesên weha ku ji xwe re jineke din bîne da ku bibe xwedî kurek an çend kuran ku ji kurdûndabûnê xilas bibe. Vê yekê Ehmo jî diêşand û qet nedixwest bizewice. Lê gotina Kurdûnda jî bi xweşa wî ne diçû. Mal û milkên wî, pez û dewarên wî jî gelek bûn. Her ev pirs di serê wî de olan dida û ketibû tengasiyekê ku wê çawa vê çareser bike? Her ev gotina ne xweş gelek caran dikete guhê Helîmê jî ku gundiyan digot in:

-Ehmo kurdûnda ye, divê ew careke din bizewice ku bibe xwedî kurekî an çend lawan.

Vê gotinê û gotinên weha dilê Helîmê diqelaşt, lê tiştekî ku bikira tunebû. Wê jî dizanîbû adetên gundan weha ne. Kesên nebin xwedî kur ango law divê ji xwe re jineke din bianiyana. Loma Helîmê jî haziriya xwe ku wê hewî bê ser dikir. Êdî wê jî fêm kiribû û dizanîbû bi vî awayî nabe. Heta gelek caran wê bi xwe jî doza ku Ehmo ji xwe re jineke din bîne, lê dikir. Lê Ehmo ev qebûl ne dikir û digot:

-Ka em hinekî din jî rawestin û li benda rewşê bimînin. Hê em ciwan in û dibe ku kurekî me jî çê bibe. Ka hinekî sebir bike. Ez gelekî ji te hez dikim û naxwazim tu hewiyan bînim ser te.

-Erê lê Ehmo! ma gotinên gundiyan û xelkê nakeve guhên te jî? Herkes bi halê te diêşin, tim jî xemginiyên xwe tînin zimên.

-Erê xem nake Helîma min, kî çi dibêje, bila bêjin, ne xema min e. Ez ji te û keçên xwe hez dikim. Hê qawet û hêza me heye ku em çend zarokên din jî çê bikin. Ka em hinekî din sebir bikin. Kes nizane wê sibê çi bibe. Divê tu jî xwe aciz neke, Em ê hinekî li rewşê binerin. Niha ji sebrê pêve tu tiştek ji destê me nayê.

Ma gelo tenê Ehmo û Helîmê di nava vî agirê Kurdûndayê de dişewitîn. Na, her weha wan gotinên weke xenceran dilê keçên delal û xweşik jî birîn dikir. Her ku di nava hevalên xwe de dilîstin an bi hevre diçûn, ger û seyranê hevalên wan jî tim li rûyê wan digotin:

-Wax wax ne heyfa we ku brayekî we tune ye. Heger brayekî we jî heba, wê rewşa we jî ne weke ya niha ba. Wê herkesan bi rehetî nikarîbana çavên xwe yên beloq bera ser bejna we ya xweşik bidana. Lê mixabin.

Ev ji bona malbata Ehmo ne tiştekî xweş û baş bû. Ev êşek bû ketibû mala wan. Lê wê çawa bihata çareserkirin hê jî ne diyar bû. Loma Ehmo tim ji jin û keçên xwe re digot:

-Em ê sebir bikin, ka bê siberoja me dê çawa bibe? Xwe aciz nekin. Ez ji we û dayika we hez dikim. Dibe ku kurekî me û brayekî we jî çê bibe. Sebir û sikûnet lazim e. Zêde xwe bi gotinên gundiyan re aciz nekin.

Her çiqasî gotinên Ehmo, dil jin û zarokên wî xweş jî dikirin, lê wan jî dizanîbûn ku li gor adet û toreyên hene, nebûna lawan dihat

wateya kurdûndayî yê û ew jî dihat maneya ku ew malbat bê zarok e. Ji ber gotinên gundiyan hema bêjin Helîmê ji mal dernediket û keçan jî weke berê ger, lîstik û seyranên xwe ne dikirin.

Erê Ehmo ji wan hez dikir lê wî jî dizanîbû ku dê weha nere. Lê wî nedixwest jin û zarokên xwe biêşîne. Loma tim halan di wan de hildida ku ew ê nezewice. Lê hêdî hêdî ji ber wan gotin û peyvên gundiyan, zewaca dudan jî dinuqitî dilê wî. Carna ew jî xwe bi xwe diket nava fikaran ku bizewice divê qîza kê ji xwe re bîne. Lê her car jî digot: Na na ez ê hinekî din sebir, bikim.

***

Rojek ji rojên baharê bû, çandiniyên gundiyan hêdî hêdî serê xwe ji bin axa ew veşartibû hildida. Mîh û bizinan, barê xwe danî bûn. Kêfa gundiya li cih bû û li gor dîtina rewşê, vê bahara xweş, bereketa wan dê îsal zêde ba. Bi hatina baharê erd û dilê wan germ dibû. Zad hêşîn dibû, ew beriya Mêrdînê bi şînkayiya xwe weke deryayekê dixuya.

Herkes bi kêf bûn, tenê dilê Ehmo û keçên wî bi xof bû. Lê ne Helîmê. Ji ber ku wê di dawiya meha pêncan de bi himlebûna xwe, bi barê xwe ê giran û bi livandina zarokê di zêkê xwe de, fêm dikir ku wê lawik be. Ji ber wê pênc zarok ango keç anîbû û tevgeran hemiya ya di zêkê xwe de weke hev hîskiribû. Lê niha ku ji danîna barê wê re demeke hindik mabû, dizanîbû ku ev bar ne weke barê berê ye. Tevgera wî barî, livandina zarokê di zikê wê de, qet nedişibiya weke yên din. Loma ev ji bona Helîmê dibû qawet û bi vê qawetê jî mizginiya ku vê carê wê kurekî wê çê bibe dida zilam û keçên xwe. Ji bona kes êdî ji wan re nebêjin, “wax wax van keçên bê bira”. Erê Helîmê çiqasî bi vê kêfa mêr û zarokên xwe dianî jî, Lê hêvîya wan ne zêde xurt bû. Tenê bi duayan ku xwedê vê carê kurekî bide dayika wan, wextê xwe derbas dikirin û li benda zarokanîna dayika xwe bûn.

Ewrên reş girtibû ser gund, baranek weha dibariya te digot ava bahra Okyanûsê bi ser gunde tê. Qîje qîja birûskan, xume xume branê, tirs û xofa gundiyan. Tirsa careke din birûsk li ku bikeve dê wir bişewitîne û malikê li çend gavan û şivanan xerab bike, de bûn. Êdî êşa zarokanînê bi Helîmê girtibû, ha ha wê zarok bihata,

qîreqîra wê di cihê xwe de û ji ber wê êşa zarokanînî tebatî nedihatê. Dît ku her ku dihare, ev sancî zorê dide wê û fêm dikir ku îro wê barê xwe dîne. Li gor baweriya wê ev danîna bar wê kêfa mêr û zarokên wê bianiya.

Piştî zêdebûna êşên zarokanînê, Helîmê awirek bi ken da mêrê xwe weke bêje, Ehmo ev lawik e ha. Û got:

-Ehmo divê tu derkeve hera mala cîrana ya jî oda gund, zarok tê û bila dilê te rehet be.

Helîmê li keça xwe ya mezin li Fatê nerî û got:

-Keça min bi bazdan here ba meta xwe bike, bêje Metê lez bike vê carê wê brayekî min çi bibe û dayika min li benda te ye.

Ehmo bi fikir û ramanên kûr û dûr ji mal derket. Derket lê di serê wî de hezar û yek fikir hebû. Loma xwe bi xwe digot; ”Heger ev jî ne law be ez ê çi bikim. Piştî vê jî êdî divê ez bizewicim” Bi vê sergêjiyê xwe gihiştî oda gund ku berî wî jî çend kes rûniştî bûn. Ji wan yekî li Ehmo nerî û got:

-Ehmo xêr e? tu van demana nayê odê û madê te jî hinekî nexweş xuya dike. Çi bûye bra?

-Na tişt tune ye. Xanimê got derkeve, wê barê xwe deyne.

-Hêvîdarim ku wê vê care kurekî bide te ku te ji kurdûndayê xilas bike.

-Ya bi xêr.

Hinan bi hevre dame û hinan jî kişik û nehberkê dilîstin. Lê Ehmoyê reben, tu tiştek ne di bala wî de bû. Tenê difikirî ku heger vê carê jî ne law be, wê çi bike?

Qederek derbas bû bû Fatêya bangî meta xwe kiri bû û ew bi çend alavên wê ve anîbû mal. Heta wan xwe gihiştibûn malê, çend jinên çiran jî li mal bûn. Dema Fatê û meta xwe jî ketin hundir qarqara dayika wê ji ber êşên zarokanînê bû. Meta Fatê û wan jinên din bi îşaretan diyarkirin ku divê Fatê û xuşkên xwe derkev e. Loma wê jî bi destên xuşkên xwe yên ku xwe dabûn ber agirê kuçikê êxur girt

û bi hevre derketin. Derketin û xwe li hêwanê dane ser hev. Lê guhên wan li benda danîna barê dayika wan bûn.

Ji ber ku Fatê ya mezin bû, berê destên xwe di ser serê xuşka xwe ya herî bi çûk gerand û li yên din jî nerî û got:

-Netirsin li gor gotina dayika min vê carê dê brayekî me çê bibe. Êdî kesek dê ji me re nikarin bêjin keçikên bê bra.

Xuşkên wê jî ew hembêz kirin, bi hevre xwe li ber wî agirê hêwanê ku dada (pêxistibûn) bûn, germ dikirin. Lê guhê wan li dengê zarok, çavên wan li deriyê ku metika wan jê derkev û bêje; ”keçikno mizginiya min li we brayekî we çê bû ye”, bûn.

Hemî xuşk bê deng bûn. Tenê gûre gûra ewran, qije qije brûskan, xime xima baranê bû. Wan heta wê gavê jî hê şeqa şeqeq weha, terezên bi şîdet, baraneke weke ji kûzan bê xwarê nedîtibûn. Gelo ev çi ecêbe? Ev çi bobelate bi ser me de hatiye. Qey hinan nifir kirine ku gundê me di bin avê de bimîne, çi ye?

Tam di wê bêdengiya keçikan de gurînî bi ewran ket, dengê brûskekê û dengê zaroka Helîmê bi hevre olan da. Ji ber dengê brûskan, xuşkan fêm nekirin ku ew dengê ji zikê dayika wan hate xwarê ê çi bû, keç an law bû? Lê hemîyan bi hevre çavên xwe kutandibûn deriyê ku mizginiyek ji wan re were û guhê wan jî bi gure gura ewr û terezan hatibû xetimandin. Fatê dît ku meta wan bi kêf li ber derî sekinî û qêriya:

-Keçikno werin brayekî we çê bû!!! Fatê keça min bireve mizginiyê bide bavê xwe, bêje bavo mizginiya min û meta min li te kurekî te ê weke şêrekî bi hatina xwe şahî xiste nava male, hat.

-Ka ez werim berê brayê xwe bibinîm dûre ez ê bi bazdan herim mizginiyê bidim bavê xwe.

-Na keça min, hema bireve vê mizginiyê bide bavê xwe û bi hevre werin. De yala keça meta xwe.

Fatê berbi oda gund û keçikên din ji berbi dayika xwe ya ku ji wan re birak anî, bazdan.

Fatê hingê bazda û xwe gihişt ber deriyê oda gund hilm lê çikiya bû. Bi dîtina bavê xwe xwest bêje bavo kurekî te çê bû! Lê hilm lê çikiya,

kir û nekir ew bêjeya kurekî te yanî brayekî me çê bûye derneket. Bavê wê ji tirsa ji cihê xwe rabû, bi milê Fatê girt û hinekî hejand û got:

-Çi bû keça min? Nexwe dayika te…..

-Na na bavo, dayika min baş e, miziginiya min û ya meta min li te, kurekî te û brayekî me weke şêrekî, bi xêr û xweşî hat.

Bi qedandina gotina talî ya Fatê, Ehmo ji kêfa hew xwe girt, bi lez û bez sola xwe kire pê bê. Xatirê xwe ji kesên li odê xwest. Bi destê Fatêya ku ev mizginiya xweş dabûyê girt, bi bazdan xwe gihiştin mal.

Mal şên bû bû, germ bû bû, mala ku bi salan ewrê reş ê ku Ehmo kurdûndayê girtibû ser wan, rabû bû. Dema Ehmo kete hundir berbi Helîma xwe de çû û xwest kurê xwe bibîne û halê Helîma xwe bipirse. Lê xuşka wî meta zarokên wî, pîrika zarokên li gund, destê xwe da sînga brayê xwe got.

-Bisekine Ehmo, ne weha rehete hema tu yek ser kurê xwe bibîne, dîtina wî bê ku tu soza diyariyekê bide, nabe. Ka tê çi bide xuşka xwe ku ew bû pîrika vî şêrî.

Ehmo nema dizanîbû wê çi bêje, hema ji devê wî:

-Ez ê mîheke bi şîr ku berxika li ber, diyarê xuşka xwe bikim. Da ka îcar ez kurê xwe Şêro bibînim.

-Şêro!!! kuro lawe ev çi bû bra? Ma qey te ji berê de ev nav nazir kiribû. Û lawik dirêjî bavê wî kir.

Ehmo rahişt kurê xwe yê di nava qumatkê de hatibû pêçandin. Lawik li ser destên wî û berbi Helîma xwe ve meşiya. Helîmê jî gelekî kêfxweş bû ku kurek dabû mêrê xwe yê gelekî jê hez dikir. Ehmo destê xwe di serê wê de gerand eniya wê ramûsa û got:

-Mala te ava be ku te îro ev kur da min.

Êdî kêf û şahî ketiba mala Ehmo. Ehmo li xwe hay bû ku xuşka wî ya bû bû pîrik li ber wî sekinî bû hema rûyê wê jî maç kir got:

-Mala te jî ava be xuşka min.

-Ya te jî kekê min. lê te çima hema got Şêro gelo? Ma tê vî navî lê bike.

-Wele ez jî nizanim, dema Fatika min got: ”Bavê kurekî wekî Şêrekî ji te re çê bû. Ew di serê min da ma û ji devê min Şêro derket. Tu û Helîmê jî bêjin erê hema bila navê wî Şêro be.

-Gelek xweş e, bi dengekî hêdî û weke bi tirs ji nav lêvên Helîmî derketin. Piştî wê jî hemiya ev nav pejirandin.

Bi hatine Şêro, bavê wî ji kurdûndayê, dayika wî ji hewî anîna serxwe azad bû bûn, xuşkên wî jî gotina wax wax heyfa van keçikana ku brayekî wan tune, filitîn.

# -4-

Piştî salên 1970ê li bakurê Kurdistanê êdî şiyarbûna neteweyî ket pêşiya tevgera çînî. Di hemî munaqeşe û tevgerên nû yên ciwanên kurdan de mesela kurd û kurdistanê derket pêş. Tevger û partiyên kurd êdî destûr û bernameyên xwe li gor vî asasî datanîn. Hêdî hêdî dev ji zimanê tirkî berdidan ji ber ku hebûna xwe, bi karanîna zimanê xwe dianîn holê. Dizanîbûn ku gelê wan nexwenda ye. Zimanê Tirkî baş nizanin, ji bona ciwan fikir û ramanên kurd û kurdistanî bi wan bide qebûlkirinê divê wan bi kurdî qise bikirana. Her xwestin vê bikin lê bi ser neketin. Ji ber ku zêde di bin bandora zimanê tirkî de mabûn. Pirtûkên dixwendin jî hemî bi wî zimanî bûn. Lê çiqasî bi zimanê tirkî jî destpêkirin dîsa kar û xebatên wan ji bona azadî û serxwebûna Kurdistanê bû. Weha li rewşê hat ku hemî tevgerên kurdan dest avêtin kar û xebatên ji bona azadiya gelê xwe. Ew kar ji teref xwendevanan hatibû destpêkirin. Ew xebatên siyasî ku dihatin kirin li gor bav û bapîran, metik û xaltîkan, xal û apan ew weke xebatên teleban ango xwendevanan dihate dîtin.

Li seransera bakurê kurdistanê xebat û lebata tevgerên ciwanên kurd, zêdetir û geştir dibû. Xendevan ango telebe, êdî ketin nava gundan, bajaran, kuçe û kolanên welatên xwe. Ji xelkê xwe re, ji mirov nas û dostên xwe re, bindestiya gelê xwe, feqîrî û hêsîriya wan ji wan re digotin. Ji bona kar û xebatên berfireh bikin, li gor zagonên wê demê, bi vekirina hin komeleyên demokratîk karên xwe berfirehtir dikirin. Wan zanebûnên xwe didan gelê xwe. Ji bona şiyarkirin û serîhildana li hember wê zilma dagirkerên xwe, çi lazim bû ew dikirin. Her hefte li komeleyên wan li ser rewşa welatê wan û cîhanê semîner dihatin dayîn. Heta hin partî û rêxistinên welatparêz haziriya şerê çekdarî jî dikirin. Di piraniya kar û xebatên wan de dagirker jî agahdar bûn. Gelek sîxur û peyayên xwe yên kurd jî di nava tevgerên kurdan de bi cih kiribûn. Bi saya wan, dîtin ango fêr

bûn ku desthilatiya wan li bakurê kurdistanê kêm dibe. Tiştên dixwazin êdî nema dikarîbûn weke berê pêk bînin. Helbet ciwanên kurd jî nedisekînin. Ew bi xwe jî ketin wê rewş û halî ku rojekê berî rojekê welatê xwe bighêjînin azadiya wî. Bi hevre ketibûn lecê ku kî/ê dikarin zûtir demê Kurdistana xwe ji nava lepên ango destên tarî yên dagirkeran derxin. Leca wan li ser vî asasî bû û tevgerên xwe li gor vê dihûnandin.

Rewş li bakurê kurdistanê gihiştibû astekê ku êdî li gundan li bajaran şer û pevçûnên ku di nav gundiyan derketa, ji bona li hevanînê êdî nema diçûn qerekolên dewletê. Wan êdî berê xwe didan komeleyên bi destê ciwanên wan hatibûn vekirin. Li vir bi saya ciwanên xwe êdî gundiyan him aşitiya nava xwe û him jî pêwîstiyên xwe pêk dianîn. Li gel tevgerên ciwanên kurd jî li bakurê kurdistanê her ku diçû mezin û bi hêztir dibûn. Êdî gundî gihiştibûn wê baweriyê ku xelasiya wan, azadî û rehetiya wan û jiyaneke rehet û aram dikare bi destê van ciwanan û komeleyên wan bibe. Loma wan komeleyên bi destê xwendevanan ango teleban hatibûn vekirin, ji bona gundiyan, karkeran û heta hin malbatan jî bû bûn rêya azadî û xelasiya wan.

Her ku diçû xwendevanan jî rewş berbi azadî û serbestiyê ve dibirin. Piştî vekirina komeleyan, xebatên di nava gundî û karkerande, wan dest avêtin karê nivîsîn û xwendinê. Dem hat, her rêxistinekê li gor xwe, di weşandina kovar û rojnameyên xwe de dest bi nivîsên bi zimanê tirkî û kurdî kirin. Heta hin rojname tenê bi kurdî hatin weşandin. Li ciwanên kurdan sekin tune bû. Hingî karên wan baş bi rêve diçû, wan xebatên xwe zêde û berfireh dikirin. Ketin hilbijartinên şaredariyan û bi van xebatên hevbeş li bakurê kurdistanê li Amadê û li Agiriyê du şaredarî bi dest xistin. Li gel van xebatana êdî li gor gelekan rojên azadiyê nêzîk dibû

Hingî rewş geş û fireh bû bû, êdî di malekê de jin û mêr jî pevbiçûna, şer û lêdan bi ba, ji bona çareserkirinê jin an mêr serî li komeleya nêzîkê xwe didan. Yanî rewş hatibû wê qonaxê ku hema hema desthilatiya dagirkeran li kurdistanê nema bû. Kurdan weke berê fesadî û sîxuriya hev nedikirin. Gilî û gazinên hev li Qereqolên leşkerên dewletê an li ba polîsên wan nedikirin. Ev dibû sedem ku ciwanên kurd êdî zimanê xwe fêr dibûn, êdî wan jî fêm kiribûn ku ziman hebûn e. Di nav malan de ziman her kurdî bû, qedexeyek ji

xweber pêk hatibû ku tu kesan li malên xwe bi zimanê tirkî qise nedikirin. Ev jî dibû sedem ku bi rêya wî zimanî geşbûn û belavkirina hizra neteweyî pêk dihat. Şîn û şahî, dawet û mewlûd hemî bi kurdî bûn. Seyrangehên ciwanan kar û xebatên nava gundiyan hemî bi kurdî bû. Heta şer û pevçûn jî bi kurdî bû. Xelkê xewnên xwe bi zimanê xwe didîtin. Xeber, dua û şerên xwe bi kurdî dikirin. Li bakurê kurdistanê xebatên fireh ku di demeke nêzîkde wê ciwanên me, ango telebên me, kurdisanê azad bikin dihate axaftin. Di nava wan kar û xebatan de nehat bîra wan ku carekê dîroka xwe bixwînin û fêr bibin ku bê çawa Împaratoriya Alî Osmanî û komara tirkiyê tevgerên bav û bapîrên wan çawa têk birine. Nehat heşê wan ciwanên ku bi agirê azadiyê dişewitîn ku bê di dîroka wan de dagirkeran çi anî bû serê bapîrên wan. Fêr nebûn ku bê çawa dagirkeran hin eşîr kiribûn pêgirtin xwe û ew li hember brayê wan bi kar dianîn. Nikarîbûn an nehat bîra wan ku di dema her tevger û serîhildaneke kurdan de çi nakokî ji ber çi sedemê derdiket. Loma jî wan ciwanên hêja û dilovan bi agirê azadiya gelê xwe dişewitin, dîroka xwe fêr nebûn. Nebûn xwedî tecrubeyên bapîrên xwe. Karbidestên dewletê jî ev yeka baş dizanîbûn, dizanîbûn ku tevgera ji dîroka xwe bê par be, dê tu caran bi sernekeve. Vê rehetî û aramî dida wan da ku vî agirê azadiya gelê kurd ku pê ketiye, wê çawa bitemirînin. Karbidestên dewletê serê xwe bi vê diêşandin, kar û xebatên wan hemî bû bû ev. Tevger û civînên wan hemî li ser asasê dê çawa pêşî li tevgerên ciwanên Kurd bigirin, bûn. Dest bi xwendina dîrokê ango ya Împaratoriya Alî Osmanê kirin. Hemî arşîvên Împaratoriya Alî Osman û ya komara xwe ku li ser çi asasî hatibû damezrandinê ser û binê hev kirin. Taliya talî gihiştin wê baweriyê ku çawa Împaratoriya Alî Osam bi navê ”Yenîçerî Ocaklari” ku cêşek ji ciwanên neteweyên din û kêm neteweyên pêk anîbûn û bi destê wan çawa gelê wan dabû qirkirin û talan kiribûn, dîtin. Piştî dîtina vê êdî karbestên dewletê rehet bû bûn. Loma li gel hev li ser wê yekê hevdu bi ber xistin ku divê ew jî vê pêk bînin da ku bikaribin tevgera gelê kurd ya li bakurê Kurdistanê têk bibin. Her li ser vê biryarê li hev kirin. Biryara wan ya dudan jî ew bû ku divê êdî karê wan bibe zilamekî an çend zilamên pê bawer ku di ruhiyeta wan de dijminatiya kurdan hebe, bibînin. Li ser vê ketin nava lêkolînên dûr û dirêj.

# -5-

Belê hay û bala ciwanên kurd ji kar û xebatên dagirkerên wan tunebû. Ji ber ku bê tecrube bûn û dîroka xwe jî fêrnebû bûn. Di rojên pêşde dê çiyê bihata serê wan nizanîbûn. Ango bîr nebirin ku dijminê wan jî dê bi zilamên xwe ango bi nokerên xwe yên kurd bikeve nava wan. Bikevin nava wan da ku çi tevger û xebatên wan çi partiyên wan hebin yek bi yek têk bibe. Ev ji bê tecrubeya wan pêk dihat. Ji ber di têkçûna hemî tevgerên li bakurê kurdistanê de serokên hatin îdamkirin, yên hatin kuştin û yên hatin surgunkirinê û yên di nava welêt de jî man hemî ji tirsa kuştinê bê deng kiribûn. Telebe ango ciwanên ku ji tecrubeyên mezinên xwe bê par bûn, hovitiya dewletê, barbarî û wêraniya wan baş fêm nekiribûn. Bi vê bê tecrubeyê û bi fikra çînîtiyê hatibûn perwerdekirin. Rê nedîtin an nizanibûn ku miletekî li ser koka xwe mezin nebe, dîroka xwe baş nizanibe, wê bi rehetî nikaribe azadiya gelê xwe jî bîne. Ev bê tecrubeyî û serxweşbûniyê ha ha wê kurdistanê îro sibê azad bikin. Vê serxweşiya azadiya Kurdistanê ku ji dîroka xwe bê par bû, li wan weha kir ku zû jî têk çûn.

Dagirker tim û tim li ser karê têkbirina tevgerên netew û kêmneteweyên ku bi xwe dagirkiribûn, dixebitîn da ku ji bona her serîhildan an tevgereke wan bi sernekeve plan û projeyên wan yên di çend warande tim hazir bûn. Bi wan proje û planên xwe ji bilî kurdan hemî kêmneteweyên din bêdeng kiribûn. Heta gelekan êdî xwe û hebûnên xwe înkar dikirin û xwe weke tirkê esil didan an dizanîbûn. Ji ber karbidestên dewletê hingê tade, êşkence û wêranî bi serê wan de anîbûn, êdî taqeta wan ya berxwedanê nemabû. Bê hêz ketibin. Westiyabûn. Loma jî li pêşiya wan û li ber wan tenê înkarkirina xwe û qebûlkirina tirkbûnê mabû. Piraniya wan ev kirin û êdî wan jî xwe weke tirk nas dikirin. Êdî wan dev ji ziman û adetên xwe berdabûn. Ji bona ew jî weke tirk bêne qebûlkirin. xwe ji wan

bêtir tirk dizanîbûn û diparastin. Ji bona parastina komarê, ji wan bêtir xwe feda dikirin. Êdî ji tirkan bêtir komara wan ya xwe, dizanîbûn û nasdikirin. Ev bi xweşa deweletê jî diçû. Loma kîjan kêmnetewe tirkbûn qebûl dikirin û dixwestin bikevin xizmeta wê. dewletê jî ew li hember netew û kêm neteweyên din bi kar dianîn da ku ew xwe bi xwe, bi hevkevin. Qira hev bînin da ku karê wan jî hêsan bibe. Her weha jî bû.

Dewletê hemî netew û kêm neteweyên li ser erda xwe ya ku bi destê wan hatibû dagirkirin, kirin dijminê hev. Her yek ji wan di warekî de dixapand ango xapandibû. Ji ber vê bû ku hemî zimanên heyî, adet û toreyên wan qedexe kiribû. Dewletê êdî bi dare zorê tirkbûn li ser wan ferz kiribû, zimanê xwe adet û toreyên bi wan dida qebûlkirinê. Bi vî aweyî ji bilî kurdan tu netew nehiştibûn. Ji ber kurd miletekî asîlzade, kevn û tim li ser erda xwe bû, ji bona dewletê zehmet bû, bi hêsanî Kurdan jî tune bikin.

Hemî kar û xebatên deshilatê dewletê û berpirsê wan serê xwe bi vê yekê re diêşandin ku dê çawa kurdan jî weke kêmneteweyên din biqedînin da ku tu asteng li hemberî wan nemîne. Ji ber vê bû bi zalimtiyeke mezin û bi bê wijdanî dest bi qira gelê kurd kirin. Êdî ûsil û kaîdeyên şer nasnekirin. Ser û ber dest bi kuştina mezin û zarokên gelê kurd kirin. Heta zarokên hê di zikê diya xwe debûn jî kuştin û bi vê xwestin ku tovên kurdan nemîne. Bi awayekî xeter, li seranserê kurdistanê bi alîkariya û piştgiriya hin dewletên mezin kurd bê deng kirin. Yên kuştin, yên koçber kirin, yên avêtin zîndanan. babîsokek weha rakirin ku êdî kurdan nema diwêrîbûn bêjin em kurd in. Bê deng bûn, êdî nema deng ji wan dihat. Tevger û serîhildanên wan hemî têk çû bûn ango têk biribûn.

Vê bendestiyê, vê malwêraniyê heta ku şoreşa îlona 1961an ya bi serokatiya Barzanî destpêkir, domand. Destkpêka şoreşa îlonê weha kir ku kurd li her çar perçan ji nûde li hebûna xwe hay bûn. Wê tirs û xofa li ser wan, cihê xwe ji berxwedanên nû re hişt. Piştî şoreşa îlonê êdî kurdan hêdî hêdî xwe livandin ango xwestin rabin û doza welatê xwe bikin, tola bav û bapîrên xwe hilînin. Ji ber wê guleya şoreşa îlonê ku hatibû teqandin, zara bêdengiya guhê kurdan qetand. Li gel vê jî êdî li cihanê şerê du desthilatiyan destpê kiribû. Li gor gotinên wê demê du kamp peyde bû bûn. Kampa sosyalîst û ya kapîtalîst. Ev bû bû sedem ku li tirkiyê di nava

xwendevanên wan de jî ji bona firehkirin û qebûlkirina fikra sosyalîst ango ya çepitiyê xortên wan jî ketin nava tevgerên da ku rejîm ango desilatiya heyî biroxînin û li şûna wê, komara sostalîst damezrînin.

Aqilmendên dewletê ev dîtin. Loma ji bona pêşî li vê bigirin, êdî wan bi xwe li ser navê sosyalîst an komunîstiyê partî û rêxistin damezrandin û serokatiya wan tevan kirin Kemalîst ku Kemalîzm jî li ser qirkirin û tunebûna kurdan û kêmneteweyan hatibû damezirandin. Loma êdî tirsa karbidestên dewletê ji çep an sosyalîstên wan nema bû. Derdê wan, êşa wan dîsa mabû kurdên piştî şoreşa îlonê şiyar bû bûn. Plan û projeyê wan yên nû ew bû ku dê çawa tevgerên ciwanên kurd bitemirîne, dê çawa rê li wan bigire. Ev ji bona karbidestên dewletê serêşeke nû bû û divê berî ku şoreşek destpê bike vê tevgera kurdan ya bi şiyarbûna şoreşa îlonê destpêkribû, vemrînin. Plan û projeyên karbidestên dewletê ya nû ev bû. Vê jî piştî gelek salan ji nû de xew li wan herimandibû. Lewra ketin nava arşîvên dema Împaratoriya Alî Osman, ketin nava dîroka cîhanê û xwendin. Ji bona rê li pêşketina kurdan û serîhildanên wan ya nû bigirin, gelekî serê xwe êşandin û taliya talî gihiştin encamekê….

# -6-

Bi hatina Şêro kêf û şahiya mala Ehmo ne tenê li gundê wan. Hema bêjin li hemî gundên der û dora wan ev nûçe ev şahî û kêfxweş belav bû bû. Lê Ehmo, ji bona kurê xwe bide xwendinê bi planên xwendina wî re mijûl bû. Dem zû derbas dibû, li ber çavên Ehmo bû bûn weke şev û rojekê. Şêroyê wî ketibû heftsaliya xwe û dibê Ehmo ew bişanda dibistanê. Dibistana gundê wan jî salek berê hatibû vekirin. Lê hê tu avahî ji bona wê nehatibû, çêkirin. Loma Ehmo xaniyê ku ji bavê wî mabû û ew ji xaniyên din mezintir bû, kiribû dibistan. Heta ku dewletê ji bona dibistana wan avahiyek çêbikira. Lê dewletê kursî û mase şandibû, mamoste jî hebû, zarok jî li gor hejmara yên hatibûn nivîsîn, têr dikirin.

Her çiqasî Ehmo xaniyekî xwe kiribû dibistan jî, lê dewletê dest bi çêkirina lojmanê ango xaniyê ciyê razana mamosteyan û dibistanê kiribû. Kêfa Şêro jî hatibû ku bavê wî dê ew bişanda dibistanê. Berî ku dibistan dest pê bike, Ehmo çûbû bajêr û ji kurê xwe, ji delalê ber dilê xwe, ji Şêrê xwe re çil û bergên pak û delal, berdilkek reş û yaqayeke sipî jî kirî bû da ku kurê wî bi vekirina dibistanê re, bê kêmanî destpê bike.

Rojên vekirina dibistanê êdî bi hejmar bû, ha îro ha sibê li bendê bûn ku mamosteyên wan ê îsal were da ku zarokên wan jî dest bi dibistana xwe bikin. Li alîkî zarok di haziriya ku herin dibistanê de bûn. Li alîkî din de avahiya dibistanê jî dihate çêkirin ku ew jî li aliyê gund ya hêla rastê ku hinekî ji gund bi dûr bû. Şêro him kêfxweş him jî kelecanî bû ku wî yê jî dest bi dibistanê bikira. Gelek caran xwe bi xwe difikirî û digot: ”Ma ez ê çawa ji mamoste fêm bikim? ew bi zimanekî û ez jî bi zimanekî din diaxifin”. Her çiqasî kêfa Şêro li cih jî bû, lê ji aliyê hevdu fêmkirinê de bi gûman û tirs bû. Ji ber ku gelek caran gotina ku ”mamosteyên tirk zarokên kurdan bi darê zorê

û lêdanê fêrî zimanê xwe dikin" dihate gotin. Lê dîsa jî ne xema wî bû, wî jî pir dixwest bixwîne û li gor gotina mezinên xwe, bibe zilamekî mezin û baş.

***

Şêro zarokekî pir bi aqil, nerm û xweş gotin bû. Wî û hevalên xwe yên li dibistanê tu caran şer nedikirin û nekiribûn. Ya rastî wî bi tu kesan re şer nedikir. Heger carna şer di nava du kesan de derketa, ew bi xwe diketa navbêra wan û ew li hev dianîn ku careke din bi hevre şer nekin. Ji çûkaniya wî de dixuya ku wê tiştek ji Şêro derkev e. Bi wê zîrekbûna xwe, bi aqilmendiya xwe, zêde dixwend û zû di mijara dersên xwe de têdigihişt. Di demeke kurt de zimanê tirkî fêr bû bû. Pir dixwend û zêde mamosteyê xwe guhdarî dikir. Vê bala mamosteyê wî jî kişandibû. Wî jî ji hemî zarokan bêtir ji Şêro hez dikir. Carna rojên îniyê ku limêja wê rojê li camiyê dihate kirin, mamosteyê dibistanê jî li wir amade dibû. Dema gotin dihate ser gotinê wî tim digot:

-Gundîno, rica min ji we tevan ew e ku hûn jî hinekî bi zarokên xwe ve mijûl bibin, bila zû tirkî fêr bibin ku bikaribin dersên xwe jî baş amade bikin. Weke hûn dizanin em hemî tirk in! (Dema mamoste dibêje em hemî tirk in. Yekî di nava cimaatê de bi Dêrikanî û di ber xwede got: Ker di diya derewçînan e ku em hemî tirk in) Ev welatê me tevan e. Ji bona parastina vî erdê ku bi xwîna bav û bapîrên me hatiye stendin, divê ciwanên me vê hebûnê biparêzin. Parastina welatekî li ser milê ciwanan e. Ji ber wê ye heta ji we tê bila zarokên we bi hevre tirkî biaxifin. Heta hûn jî dest bi tirkî bikin wê baş bibe.

Mamosteyê gundê wan, yekî tirk û nijadperest bû. Bi zimanekî xweş dixwest gundî dev ji zimanê xwe berdin û tirkî fêr bibin. Lê gundiyan ew guhdarî nedikirin. Tu kesan ne bi hevre ne jî di malên xwe de tirkî qise nedikirin.

# -7-

Her ku tevgerên welatparêz û şoreşgeran li tirkiyê û bakurê Kurdistan geş, zêde û bi hêz dibûn. Vê yekê xofa dagirkeran jî zêde dikir. Ew jî ketibûn tev, dê çawa bikaribin pêşî li vê şiyarbûna ciwanên kurdan bigirin. Derdê wan ne çep û tevgerên ciwanên wan bû. Tirsa wan ji ber hêz û xurtbûna tevgera Ciwanên kurd bû. Ji ber ku aqilmend û karbidestên dewleta dagirker jî ketibûn nava arşîva Împaratoriya Alî Osman, ketibûn pê dîroka dewletên mezin ku çawa wan kêmneteyên di nava xwe de bê deng kiribûn. Kar û xebatên wan tev mabû ev. Bawer dikirin ku heger vê carê jî weke gelek caran pêşî li vê pêla bi hêz û xurtbûna ciwanên kurdan negirin, wê kurdistan bighêje azadî û serxwebûna xwe. Metirsiya wan ne tenê ev bû. Dema ku dewletên mezin kurdistan kirin çar perçe û perçê mezin xistibûn bin dagirkeriya wê komara bi xwîna kurdan hatibû damezrandin. Di peymana sed salan de kurdan bimehînin û li komarê tenê bi navê tirk miletek bimîne, çêkiribûn. Heger di vî sed salî de dewletê ango desthilata wan hemî netewe û kêmnetewan li ser navê komara nû nehelînin dê ewên têk herin. Ji ber vê bû ku plan û proje hemî li ser vî asasî hatibû avakirin.

Tirsa wan kesên ku bi eslê xwe ne tirk, lê li ser navê wan û bi piştgiriya hin dewletan komara tirk damezrandin, dê têk here. Ji bona parastina vê komara li ser asasê rijandina xwîna kurdan û kêm neteweyên din hatibû damezirandin, têk nere, çi ji wan bê, divê bikirana. Rewşa cîhanê jî ne weke dema damezirandina vê komarê bû. Ji ber ku wê demê bi saxlemî asasê komarê danîbûn, çi lazim bû kiribûn. Ji bilî kurdan tu miletên ku bikarîbana weke xwe bimînin, nehiştibûn. Baweriya wan ew bû ku çi demê pişta kurdan jî bişkênînin û bikin tirkên baş, dê êdî rehet bikin û wê peymanê bi rehetî bibin serî. Ji bona hilneweşandina komarê heta sed salî, çi ji desthilata wan dihat bê tirs dikirin. Dikirin lê êdî li cîhanê jî rewş

guherî bû. Dinya bû bû du kamp û van herdu kampan ji bona parvekirina dewletan bi hevre ketibûn lecê. Kê ji wan çiqas dewlet bikirana ya xwe, ew ewqasî bi ser jî diketin.

Tirsek din jî ya karbidest dewleta dagirker ew bû ku êdî hin peymanên navnetewî hatibûn îmzekirinê da ku her welat li gor kêfa dilê xwe nikarin wêranî û komkojiyan bikin. Ew dem û dewran jî derbas bû bû. Evana hemî dest û nigê tirkan girêdabû. Her çiqasî hin herêm cih û waran de komkujî bi dizî dikirin, ew jî heta radeyekê bû. Wan herdu kampên (Kampa Kapîlatîst û Sosyalîs) bi hevre ketibûn dagirkerina hin welatên nû. Ya jî ji bona rê vekirina dagirkeriya hin dewletan, alîkariya hin dewletan ve radibûn. Ji bona herdu kampan jî Kurd û Kurdistan girîng bû. Ji ber ku sererd û binderdê welatê Kurdan, Kurdistan gelekî zêde bû. Loma tu dewletan nedixwestin kurd azad bibin ango bighêjin azadiya xwe.

# -8-

Li gor peymanên nav cîhanî ku êdî tu miletan nema dikarîbûn weke berê her tiştekî bi kêfa dilê xwe bikin. Vê jî karê karbidestên tirk zor û zehmet kiri bû. Loma aqilmendên wan, zana û jîrên wan, dest bi xwendina dîroka cihanê û ya Împaratoriya Alî Osmanî kiribûn. Piştî lêkolênên berfireh gihiştibûn wê baweriyê ku divê li ser navê kurdan rêxistineke ku rişma wê di destê wan de, lê weke tevger an partiyeke kurd be, damezirînin. Bi damezrandineke weha wê bikarîbana li gor dilê xwe, hespên xwe li ser axa kurdistanê bê tirs û xof bidana bezê. Dema hemiyan li gel hev, li ser vê fikrê li hev kirin. Piştî pejirandina vê biryarê êdî karbidestên wan wê çawa û li ser çi asasî bikarîbana tevger an partiyeke weha damezirînin, fikirîn.

Ji bona vê jî karbidestên dewletê bêtir serê xwe di dema Împeratoriya Alî Osmaniya ku çawa bi navê ”Yenîçerî Ocaklari” tevgerek ji ciwanên netew û kêmneteweyên din damezrandibûn û wan çawa bê tirs li hember gelê xwe şerê parastina Împeratoriya Alî Osmanî dikirin, dîtin. Hema yekser ew jî li ser vê rawestiyan û xwestin li ser navê kurdan tevgerekê, partiyekê ava bikin. Lê divê rişma wê ango hevsarê wê di destê wan bi xwe de ba. Çawa bixwazin divê weha bi kar bianîna. Hemî kar û erkê wan î damezirandina tevgereke weha qediya bû. Êdî ew bi xwe ketin nav ger û lêkolînan da ku kesekî weha peyde bikin. Ketin nav ciwanên ku Uniwersîte dixwendin, ketin nava burokratin komarê ku kurdekî bikaribe li hember gelê xwe kuştin û qetlîaman pêk bînin, peyde bikin. Ji ber ku wan jî baş fêm kiribûn ku ”Kurmê darê ne ji darê be dê nikaribin bi darê”. Ev gotina pêşiyên kurdan ji wan re jî bû weke rehberekê.

Êdî karê karbestên tirk bû bû, ger û dîtina kesekî weha. Bê ku komara wan perçe bibe, ango erdê wan dagirkiribûn ji destê wan

here. Wan jî baş dizanîbûn ku dema kurd bighêjin heqê xwe. Mafê xwe bi dest bixin. Wê hemî kêmneteweyên din yên wan kiribûn tirk jî, hêdî hêdî serî hildin û doza mafê xwe bikin. Di tevger û pevçûneke weha de komara wan dê nemîne. Ji ber ku ew komara her çiqasî weke ya tirkan jî bû, lê yên ew bi rêve dibirin ji gelek netew û kêmneteweyên nava xwe jî kêmtir bûn. Çiqasî kêm jî bûn, bi piştgiriya hin dewletên mezin û bi serpereştiya îngîlîz Kemal bi alîkariya madî û manewî li ser navê tirkan komareke bi navê komara tirk damezrandibûn. Ji bona ev komar têk nere. Ji bona xwediyê wê ê esil ku sed salan hemî hebûnên wê bixwin da ku mesrefa lê kiribûn bi dest bixin, divê ev komar li hember hemî xeteran bijiya û bi taybetî divê kurd tune bikirana. Êdî proje hemî bû bû dayîn û stendinên dê çawa vê komarê biparêzin. Hema bêjin ev jî qedandibûn û hatibûn encamên dawî.

Lê li aliyê din jî tevgerên welatparêz yên ciwanên kurdan jî nedisekînin. Kar û xebat dikirin da ku Kurdistana xwe ji bin nîrê dagirkeran azad bikin. Di nava wê tevliheviyê, şer û pevçûnê de karbidestên dewletê ji bona damezirandinekê ango tevgereke li ser navê kurdan û  benê wê di destê wan de be li hev kiribûn.

Di destêpê de wan bawerî bi yek kesî û yek tevger an partiyekê nedianîn. Tim tirsa wan hebû ku di demên dûr û dirêj de ew partî an tevger dikare ji dest wan derkeve. Loma biryara du partiyên li ser du îdeolojiyên ji hev cûda dan. Kesên di vê rêyêde dê kar ji bona komarê bikirana divê peyde bikirana. Da ku bi navê kurd û Kurdistanê rêxistina xwe, bi destê xwe û bi navê zilamê xwe damezirînin ku ew jî qira kurdan bîne. Li gor vê jî zilamên wê bidîtana yekî oldar û yek jî weke sosyalîst destnîşan kirin. Ji ber ku piraniya kurdan oldar bûn û wan jî di dîrokê de li ser ola îslamê hem kurd xapandibûn him jî ew ol ji bona berjewendiya gelê xwe bi kar anîbûn. Di gelek warande jî bi serketibûn. Loma di hemî tevgerên xwe yên li dij olperestên nava xwe de kurdên misilman ku bi ola îslamê baweriya wan hebûn, bi kar dianîn û digotin: ”Vana hemî gawûr in (Xaçperest). Çi demê gawûr firsetê bibînin wê hemî misilmanan qetil bikin, bikujin. Loma divê hemî misilman jî berxwe bidin li hember Gawûran şer bike. Heger kesên li hember gavûran şer dikin bêne kuştin şehîd in. Birîndar jî bibin gazî ne. Li wê dinyê kesê şehîd dibe xwediyê xwe û heftê horiyan û li bihuşta ku hemî

tamên cihanê li wir in, dê bitamînin. Heger birîndar jî bibin ji xwe dibin xazî û ev jî li ber dilê Xwedê û pêxember merteba herî bilind e ku di dinî me de hatiye qebûlkirin.

Ê din jî divê sosyalîst be, ji ber ku niha berê gelan berbi cihaneke nû û sosyalîst ve ye. Ji herduyan kîjana bi ser ket em ê jî ê din li gor plan û projeyên xwe têk bibin. Ji bona vê wan herdu kesên dîtibûn ê sosyalîst(!) û ê oldar(!) dê ji bona wan partî bidana vekirin û di her warî de dê alîkariya wan bikirana, heta ku li ser destê wan kurd biqedanda.

# -9-

Bênav ku navê wî ê esil zêde nayê zanîn. Loma em ê jê re bêjin Bênav da ku em bibînin bê ew kî ye? Ji ku hatiye, li ku jiyaye kar û barê wî, bav û bapîrên wî kî bûn û ew kiye? Ji ber vê jî me navê wî danî Bênav. Ji ber kurê wî bi xwe jî ne dixwest navê wî bê zanîn. Ji xwe ev bû bû weke adetekê ku tim komara tirk ji kesên bavê wan ne diyar dihate bi rêvebirin û ji xeterên li ser wê azad dikirin. Navê bavê damezinerê komara tirk jî zêde nedihat nasîn ango zêde behsa wî nedibû. Her navê dayika wê li pêş û ew jî bi navê dayika xwe dihate nasîn û ji vê jî kêfxweş bû. Ev nexweşî ji dema Alî Osmaniyan de piraniya dayikên wan biyanî bûn, lê ew bi xwe weke tirkên esîl dihatin zanîn ango nasîn, berdewam bû. Dibe ku ji ber vê adetê bû an sedemekê din bû Bênavê bavê kesekî ku dewletê ew kiribû serokê kurdan, ne dihat zanîn an ne diyar bû.

***

Bênav bi esil û feslê xwe ji malbatek Qereçî bû. Bav û bapîrên wî hemî ew bûn. Ew jî yek ji endamê wê malbatê bû û ew bi xwe jî di nav karê bav û bapîrên xwe de mezin bibû û ew kar dikir. Bavê Bênav û malbata wî tim li geşt û nanûzêkê li gund û bajaran digeriyan. Geşta xwe her êvar ji nava xelkê top dikirin. Jinên ew geşta ii nava malan top dikirin, dikirin şîv. Her demekê li gundekî û bajarekî bûn. Konên wan li ser pişta kerên wan û qonax bi qonax digeriyan. Di nav wê gerê de ew jî êdî fêr bû bûn di kîjan demsalê de li ku zêde xwarin heye. Di kîjan demsalê de dikarin li kîjan deverê zêde zad bidin hev. Di kîjan demsalê de li ku dikarin heta zivistan ji ser wan rabe, bisitirin.

Bênav jî weke Qereçiyekî temenê xwe bi vê derbas dikir ku heta roja leşkeriya wî hat. Ji ber ku ew hê azib bû. Loma leşkeriya wî de

zêde astengî ji wî û malbata wî re dernexista. Ji xwe jiyana wan nanozikê bû, ew nanozik li leşkeriyê bêtir hebû û ev ji bona wî jî baştir bû. Ji gera rojê li derekê, her demsalekê li warekî xilas bû bû. Lê gelek lêdan, tade û êşkence li leşkeriyê didît.

Ji ber ku wî bi zimanê tirkî nizanî bû û fêrî dizî û topkirina geştê bû bû. Carna ev rewşa wî li leşkeriyê jî derdiket pêşberî wî. Ji ber wê jî wî zêde lêdan dixwar. Destpêka leşkeriyê bi kêfa wî bû. Bi kêfxweşî çûbû leşkeriyê da ku li wir xwarina belaş bixwe. Di nava nivînekî germ de razê. Lê texmîn nekirîbû ku wê nanê baleş û nivînên germ, çi bîne serê wî. Wî yê çawa du sal bi vê lêdanê derbas bikira, nizanî bû. Lê ji bilî qebûlkirina vê jî tu tişt bi dest wî neketibû.

Ji bona Bênav, zeman diherikî û lêdan kêmnedibû. Xwarina li gor wî xweş û nivînên germ bi saya wê lêdanê bi dest xistibû. Dîsa jî vê kêfa wî dianî. Piştî salekê êdî ew bû bû serbazekî bi rutba herî bi çûk. Loma êdî wî bi wan lepên xwe yên mezin, bi şîdet li bin guhên kesên nû dihatin leşkeriyê dida. Ji leşkeriya wî re kêmî salekê wext mabû, loma êdî dikarîbû rojên betlanê hinekî bigire, derkeve kolanên bajarê wî lê leşkerî dikir. Yanî hindik jî ba hin azadî bi dest xistibû. Rojên şemî û yekşeman rojên betlana wî bû, li gor îmkanên heyî ji xwe re li der û dora xwe digeriya.

***

Li nêzîkî Qereqola Bênav lê leşkerî dikir, meydaneke mezin hebû û li ser axa wê meydanê çend çadirên ku dişibiya konên mala bavanê wî hatibûn vekirin. Loma niqutî dilê wî û xwe bi xwe got: ”Dibe ku xwediyê wan çadiran jî weke min Qereçî bin”. Vê fikir û ramanê berê Bênav berbi wir de dibir. Fikir û bala wî ketibû wê hêlê. Çawa be, li her derekê cihanê ji bilî zimanê wan hema rewşa temamên Qereçiyan weke hev bûn. Ger û seyran, geşt, topkirin, di bin konan an çadiran de dijiyan. Bê erd û mal bûn, ev bibû nasnameya hemî Qereçiyan.

Rojek ji rojên, betlana Bênav bû. Cilên xwe yên leşkeriyê derxist, yên sivîl ku bi saya çend hevalên xwe yên leşker bi dest xistibû, li xwe kir. Çû ber neynika mezin li bejn û bala xwe nerî. Dema li xwe dinerî xwe weke paşayekî didît. Keniya û xwe bi xwe got: ”Hela ka ez îro seredana wan çadiran bikin, bê çi ferq di nava me û wan de

heye." Ferqa wan zêde tune bû. Konên mala bavanê Bênav reş û yên vana jî çadirên sipî bûn. Yanî ên wan ne kon çadir bûn. Zimanê wan tirkî lê yê bav û bapîrê Bênav kurdî bû. Jê û pêve Bênav tu ferqeq mezin nedîtibû.

Piştî ku Bênav li bejn û bala xwe nerî, dît ku ev cara ewil bû ku wî weha xwe bi tekûz, rêkûpêk dîtibû. Ji ber ku wê biçûya seredana wan çadirên nêzîk qerekolê. Wê Qereçiyên nû nas bikira û dibû ji wan hin tiştên nû jî fêr biba. Dema leşkeriya xelas bikira, wî yê wê fêrbûna xwe di nava merivên xwe yên Qereçî de jî bi cih bianiya. Di nûjeniyeke weha de wê kêfa mirov û malbata wî jê rebihatana. Berî ku derkeve dîsa li bejn û bala xwe nerî, toza li ser qundera xwe ya ku hevalekî wî ê tirk diyarî wî kiri bû, çend libên toza ku li ser veniştibû bi destmala di bêrîka xwe de paqij kir û derket. Derket lê te digot belkê ew ne seredana Çadirên Qereçiyan dike. Weke ew ê here seredana paşa û waliyê bajêr, xwe dibuxudand (dikuburand). Dema ji qerekolê derket, li nobedarê ber derî nerî, mizmizî û got:

-Ji te re nobeteke xweş û ji min re jî gereke baş dixwazim. Nobedar weha lê mêze kir û got:

-Mirov dibêje qey tu dike here sardana paşayekî. Xêr e te weha bedilê xweşik li bejna xwe kirî ye.

-Na lo, ne ewqasî, tu dizanî îro roja min ya betlanê ye û min xwest bi van cilên sivîl, ez ê seredana kesên di wan çadiran de dijîn, bikim. Fêr bibim bê ka ew kîne, li vir çi dikin.

-Ma tu nizane ew Qereçiyên vî welatî ne, karê wan her demsalekê li derekê ne. Ji bona jiyana xwe, ji xwe re li geşt û xwarinê digerin.

-De xem nake min ew meraq kirin û ez ê herim nava wan. De bi xatirê te birakê nobedar.

Bênav, bê ku bersîvekê bigire, hema bi lez û bez ji hewşa qereqolê derket û çû. Li paş xwe jî nenêrî. Berê xwe da wê cadira mezin. Texmîn kir ku mezinê wan di wê çadirê de ye. Dema li ber çadirê rawestiya qîzek delal, çend diranê wê bi zêr, jê pirsî û got:

-Fermo, tu kî ye li van deran çi digere? Lê dema çavên Binav ketin nava çavên wê keçika delal, weke tu xiyarekî di nava wî de

bişkînîne, lê hat. Piştî nerîna li wê û gotina ewil ya fermo, çavên xwe kuta nava çavên keçikê.

Bênav li xwe hay bû ku keçikê pirsek jê kirî ye. Lê weke lal bû ye, ew jî ma heyrana wan çavên reş ku zîq li nava çavên wê dinêrî û ji nişka ve veciniqî û got:

-Ez leşkerekî vê qerekolê me. Îro roja min ya betlanê ye. Min xwest werim seredana we bikim û we hemiyan jî nas bikim. Bi vê gotina Bênav wê keça rind û delal hinekî tirsiya û got:

-Xêr e? ma tê çima me nas bike? herkes dizanin ku em Qereçî nin, karê me ger û geşt e. Ji vê pê ve tu karekî me yê din tune ye. Lê di jiyana xwe de, tu caran rastî kesekî nehatime ku dixwazî me ji nêzîk de binase.

-Erê rast e, lê karê min jî li welatê min ev e. Yanî em jî weke we ne. Ger û topkirina geşta me û ya we weke hev in. Ê me em di konên reş de dijîn û bi zimanekî ji zimanê we cûda qise dikin. De ka mezinê we kî ye? Ez dixwazim wî bibînim da ku hinekî bi wan rojên xwe yên ku ez di konan de bûm, bijîm. Min bêriya wan rojana kirî ye.

Keçika rindik bi dengekî zîz gazî kir û got:

-Bavo!!! yek hatiye û dixwaze te nas bike û li gel te hinekî sohbet bike.

Bavê keçikê, ewil hinekî tirsiya ku gelo ji teref kufletên wî, diziya hinan hatiye kirin ku camêr tê û dixwazî min bibîne. Bi vê tirs û xofê ji aliyê hundir de derket, berbi deriyê çadirê vê hat. Çav li wî zilamê bi cil û bergên xweşik û rind ket. Yek ser şika wî lê zêde bû. Û di berxwe de got: aha wele diziyeke hatiye kirin û ev camêr hatiye ku doza malê xwe li min bike. Got û hema yek ser destê xwe dirêjî Bênav kir û got:

-Tu bi xêr hatiye. Ez çawa dikarim alîkariya te bikim?

-Xêrdar bî, na ez nehatime alîkariyê. Ez li vê Qerekolê leşker im. Îro roja min ya betlanê ye, min xwest seredana we bikim.

Dema bavê keçikê behsa leşker û di qerekola li nêzîkî we de leşker im bihîst, hema bêjin yek car ji qudûm ket. Loma nehişt Bênav gotina xwe bidomîne û got:

-Belê xêr e ma tiştek qewimî ye?

-Na rehet be. Ez jî bi esil û feslê xwe, ji bav û bapîrên xwe Qereçî me. Lê em û hûn hinekî ji hev cûdane. Loma min xwest ez we ji nêzîk de nas bikim. Sedema seredana min ev e.

Piştî vê axaftina Bênav keçik û bavê xwe hinekî rehet bûm. Saba tirs û diziyê ji ser wan rabû bû. Wê rojê hemî kesên di bin wê çadirê de, çûbûn geştê. Tenê bavê wê keçika delal û keçik bi xwe mabûn. Loma bavê keçika delal bi destê xwe îşarete fermo em derbasî hundir bin da. Bavê keçikê li pêş û li dû wî jî Bênav derbasî hêla dawiya çadirê bûn. Xwe dane ser çend cilikên raxistî. Piştî wê jî mêrik gazî qîza xwe kir got:

-Keça min Filîz, hela ka tasek av bîne ji mêvanê me re. Di vê kelkela havînê de niha tî bû ye. Piştre jî ji me re çayekê bide ser. Berê xwe bi mêvanê xwe vekir û axaftina xwe domand. Belê kerem bike êdî ez li  te guhdarî bikim û sedema hatina te fêr bibim.

Bi vê pirsa bavê Filîzê, herdu ketin nava sohbeteke germ. Di nava wê germa havînê de, Bênav tam xwe ji sohbetê re germ kiri bû. Ji ber zêdeyê salekê bû bû ku wî sohbeteke weha li gor dilê xwe bi tu kesan re nekiri bû. Tam di vê naberê de Filîza delal, xweşik û rindik jî du qedeh danî bû ser tepsiyekê û berbi wan de meşiya. Meşa wê weke meşa Qaza ku berbi ava çem de diçû, bû. Nêzîkî wan bû, berê tepsî berbi bavê xwe kir, bavê rahişt çaya xwe û dûre Filîzî him li Bînav dinerî  him jî hêdî hêdî ku dixwest dem hinekî dereng here ku baş li Bênav binêre. Vê tevgera Filîzê bala Bênav kişandibû. Wî jî li wê dinerî hêdîka destê xwe ê rastê dirêjî wê qedeha çaya li ser tepsiya di destê Filîzê de bû kir. Ew girt nava destê xwe hinekî rawestiya û bi şewitandina destê xwe fêr bû ku divê ew qedeha çaya xwe deyne ber xwe û çend lib çekir bigire û bavêje nava wê.Vê rewşa Filîzê û Bênav bala bavê Filîzê jî kişandibû, dît ku herdu jî bi çavên ne ji  xêrê re li hev dinêrin, loma gazî keça xwe kir û got:

-De keça min ka binêre dayika te hat ya na. Mebesta bavê Filîzî ew bû ku wan herduyan ji hev dûr bixe. Ji nûve ketin nav sohbetên dûr û dirêj. Bênav behsa xwe û malbata xwe, geşt û seyrana li welatê xwe dikir. Di nava wê sohbetê de sekin lê tunebû, ji ber wê bavê Filzî got.

-Ka em hinekî rawestin û ez çend pirsan ji te bikim. Navê te bi xêr?

-Xêrdar bî mamo. Navê min Bênav e.

-Tu azibî ya na?

-Belê

-Tu li van derana çi dike?

-Ez leşker im. Ji leşkeriya min re jî hindik maye. Dema min çadirên we dîtin, min xwest we nas bikim. Ji bilî çadir û zimên, em weke hev in.

Pişt sohbeteke têr  û tije dem hatibû bû Bênav rabe. Loma berî rabûnê got.

-Mamo dem hatiye divê ez êdî berbi qerekolê ve herim. Lê ji niha pê de bila Filîz an hinên din dema piştî xwarina me ya êvarî were Qerekolê ez ê xwarina ji ber me dimîne û ya zêde bidimê da ku hûn jî bê xwarin nemînin.

-Baş e kurê min, mala te ava bî. Ka emê binêrin.

Bênav rabû, berbi deriyê çadirê meşiya. Bavê Filîzî jî da dû wî. Filîza delal solên Bênav paqij kiribû, weke mirêkê dibiriqand. Bênav bi çavekî kirînê dîsa bala xwe da Filîzê û tiştnî noqutî nava dilê wî. Sola xwe kire pê, destê xwe dirêj bavê Filîzê kir bi destê wî hişk girt û got:

-Mamo heger destûra te hebe, ez dixwazim carna werim vir, tu bawer bike sohbeta te gelekî xweşa min çû. Weke min got, her êvar piştî xwarinê ya Filîz ya jî hinênin din bişîne qerekolê bila navê min hildin. Ez jî ji hevalên xwe re jî bêjim ku xwarina zêde em bidin we.

-De başe kurê min, bi xêr û xweşî here. Got bavê Filîzî lê wî ji tecrubeyên xwe dizanî bû niyeta Bênav ne niyeteke ku me re bipesidîne. Loma li keça xwe nerî got:

-Keça min ma we berê hevdu dîtî bû?

-Wîîî bavo, ev çi pirse? Cara ewile ku wî dibînim.

# -10-

Karbidestên dewleta tirk, berpirsên Îstîxbaratê û serok leşkerên wan tev bi hevre civîn li ser civînan amade dikin, destûr û bernameyan, qanûn û zagonên nû dinivîsînin. Plan û projeyan pêşkêşî hev dikin. Raporên ji Kurdistanê, ji wan dihatin şandinê bi hevre dixwendin û nerînên xwe digotin.

Serê xwe zêde li ser tevgera ciwanên Kurd diêşandin. Dilê wan hema bêje sekinî bû. Her ku rewşa Kurdistanê dianîn ber çavên xwe, didîtin ku heger bi vî awayî here wê kurd bighêjin mafê xwe. Soza wan dabûn an girtibûn ku divê piştî peymana lozanê heta bi dawî anîna wê, wan hemî kurd kiribana tirkên baş da ku tu serêşî ji bona wan peyde nebûba. Mesele ji vir de destpê dikir. Destpêka karê wan jî ji bona tunebûna Kurd û navê Kurdistanê bû. Ev plana dûr û dirêj pişt peymana lozana 1923an hatibû girtin da ku kurd nemîne. Heta gelek caran Îsmetê Kerr ku piştî M. Kemal ew bû bû mezinê dewletê, tim ji leşker û polîsên xwe re digot û dianî zimên; ”Divê hûn hemî kurdan bikin tirk, ji bona wê jî çi lazim be, em ê weke dewlet bikin”.

Lê kurd jî li hember vê zilma dewleta Kemalîst ku afat û tofan dianî serê kurdan, bê deng nediman. Loma kurdan jî li hemberî vê zilmê di roja çarê meha îlona di sala 1924an de li Beytuşşebabê serî hildan. Lê ji ber yek rêzî û yekîtiya gelê kurd tune bû têk çûn. Dûre serîhildanan Şêx Seîdê nemir di roja 13 sibata 1925an û dûre jî 10 Hezîranê 1925 serîhildana Nehrî. Di meha Tîrmeha 1925 Tevgera Sosanê, 16 meha Gulana 1926an serîhildana Agiriyê ya yekem, 21.01.1926an de serîhildana Hazro 7.10.1926an de serîhildana Koçgirî, 26.05.1927an de serîhildana Mutkî, 13.9.1927an de serîhildan Agirî ya dudan, 7.10.1927 serîhildan Bişar, 2.7.1927 serîhildana H.Resûl, 20.9.1929 serîhildana Tendurik, 26.5.1930 serîhildana Savur, 20.6.1930 serîhildana Zîlan, 21.7.1930 serîhildana Orama. 20.9.1930 serîhildana sisiyan ya Agiriyê,

24.10.1930 serîhildana Pulumur, 29.9.1930 serîhildana Şêx Mahmûd Berzencî, 30.11.1931 serîhildana Şêx Ehmed Barzanî, 31.1.1937 serîhildana Sason, 21.3.1937 serîhildana Dêrsimê

Lê mixabin gelek caran hesabê malê û sûkê li hev dernakev e. Ê dewletê jî weha bû bû, plan projeyên wan ya ji bona tunekirina kurdan bi serneketibû. Wan gelek komkujî qetlîam, malwêranê koçberî kiribûn jî lê çi dikirin nikarîbûn pêşî li tevgerên kurdên neteweperwer bigirin.

Belê rast e, li bakur Kurdistanê piştî şoreşa, Dersimê ya di sala 1938an de ku di şevekê de şêşt hezar kurd di nava êgirde şewitandibûn û heta demekê dirêj bêdengiya kurdan, bû bû cihê kêfxweşiya dagirkeran. Lê bi dengê şoreşa îlonê ya li başûrê Kurdistanê ku di sala 1961an de destpêkiribû û bi teqandina wê guleyê ku zara guhê karbidestên dewletê qetandibû. Wê guleya ewil ya zîndîkirina kurdan. Ew tirs û xofa kurdan hêdî hêdî radikir û dida zanîn ku kurd namirin û dê her zîndî bin. Heta ku mafê xwe ê rewa negirin, wê her tim li ser nigan bin û dê li hemberî dagirkeran tekoşîna azadiya gelê xwe bidin.

Belê wê gulleya ewil ya şoreşa îlonê ku ji başûrê kuridistanê deng vedabû, li her çar perçên kurdisanê ji nûde belav bû bû. Kurd şiyar û zîndî kiribû. Wê şoreşê ji nû de ruh da kurdan da ku li hember zilm û zordariya dijmin bê deng nemînin.

Aha mesele ev bû. Tirs û xofa ji nû de ketibû nava karbidestên dewleta tirk, ji ber vê bû. Wan bawerî anîbûn ku piştî şoreşa Dersimê û têkbirina wê, dê kurd êdî nikaribin dengê xwe derxin. Lê weke wan nebû bû. Piştî şoreşa îlonê rewşa cîhanê û ya kurdan ku xwendin û têgihiştina ciwanên kurd, rewş bi temamî hatibû guherandin. Vê guherîna dengê azadiya kurdan weke singekî di nava dilê karbidestên dewletê de çikandibû.

Ji bona tunekirina kurdan, ya jî wan bikin weke xwe hê di niviyê rê de bûn. Di ser Lazona ewil de zêde dem û wext derbas nebû bû. Soza wan dabû an ji wan re hatibû dayin divê wan ango dewletê heta lozaneke din ya jî ya ku dema wê dê di 2023an de biqede, Kurd tune bikirana û kiribana tirk. Heger ev nekiribana îhtîmala ku dewlet birûxe, nemîne an qels bibe, hebû. Ev ji bona wan nedihat qebûlkirin. Di plan, proje û hemî şerên xwe yên li dij kurdan de bi

ser neketibûn. Yanî weke dixwestin ne bû bû. Kurd neqedandibûn û neqedandina wan jî ji bona dewletê serêşeke nû, tekoşîneke din bû. Wan baş dizanîbûn ku şert û mercên cîhanê jî hatiye guherîn. Rojê welatekî nû tê avakirin. Serhildan û berxwedana karker û gelê bindest dem bi dem bilind dibû.

Du kampên (kapîtalîst û sosyalîst) ku bi hevre ketibûn cenga şerê sar, wan jî her yekê ji aliyê xwe de alîkariya hin kêmnetewe û neteweyan dikirin da ku wê piştî azadiyê bikin ê xwe. Ji ber ku dem dema berjewendiya dewletên mezin bû û wan jî ew bi kar dianîn. Di her serîhildana neteweyekî de, ew nêzîkî kîjan kampê bana, wan jî alîkariya wê dikir û kampa din jî li dij radiwestiya da ku azad nebe. Ev şer û pevçûn li seransera cihanê bela bû bû. Kurdistana di bin nêrî dagirkeran de dinaliya Di nava wan de şiyarbûn û daxwaza azadiya gel berz dibû, bilind dibû û pêşve diçû. Kurd di alîyekê sînorên xwe de ciranê sovyetê bû, tirsa dinyê û dewletê ew bû heger sovyet bi alîkariya kurdan ve rabe dê kurd wê xwe zû ji bin dagirkeriya wan azad bikin.

Li aliyê din dewleta tirk, endama Nato bû û Nato jî bi xwe tim li hember dewletbûna kurdan û parastina dewleta dagirker bûn. Ditirsiyan heger kurd azad bibin wê bibe Kurdistaneke sosyalîst û wê bikeve nava kampa sosyalîst. Ev jî ne li gor berjewendiya dewletên Ewropî, Emerîka û Nato yê bû. Bi azadiya kurdistanê wan ne tenê Kurdistan her weha dikarîbûn rojhilata navîn jî wenda bikirana. Ji ber Nato û hemî dewletên ewropa li gel Emerîka li dij şerê kurdan ya li hember dewletên dagirker bûn. Vê rehetiyek dida wan da ku bikaribin li gor dilê xwe kurdan bikujin, qetil bikin, wêran bikin û tune bikin. Li hemberî hemî kirinên dewleta tirk yên li dij kurda Nato tim bê deng bû. heta ne bêdeng ew bi alîkariya hevkarê xwe jî radibû. Ji ber vê bû ku dewletên mezin li gel hevkarên xwe û bi rêya Natoya xwe piştgiriya wan dikirin.

Her ev jî alîyê sovyetê û pakta Varşova jî weha bû. Wan jî bawerî bi kurdan nedianîn. Loma alîkariya wan nedikirin. Ew jî weke dewletên di Nato de li hember kuştin û wêraniya kurdan bê deng bûn. Baweriya wan jî ew bû û digot in: ”Heger kurd azad bibin wê nebin dostê me.” Yanî ji dagirkeran bêtir, dewlet û welatên mezin li ser kurd û kurdistanê li hev nedikirin û baweriya xwe bi kurdan nedianîn ku wan jî bike xwedî dewleta wan. Komunîst û çepên

dewleta tirk jî hemî tevgerên kurdan weke ji bona xurtkirin û anîna dinê îslamê rê didan. Sovyet bi hevalbendên xwe bawer bû, loma ji wan raporên ku hevalbendên wan didanê bawer dikirin.

Li aliyê din jî karbidestên dewletê rapor li ser raporan dişandin, dewletên di Nato û hevkarên xwe re digot in: ”Şerê Kurdan ji bona anîna dînê îslamê ye. Hûn dizanin ku dema kurd xurt bibin wê yek xaçperestan jî nehêlin.

# -11-

Tevger û civînin karbidestên dewleta tirk, li gel aqilmendên xwe ew bû ku tevgerên kurdan ya serî hildidan, dê çawa bitefînin, bû. Helbet şert û zirûf ne weke demên berê bû, kar û xebat, berxwedan û serîhildan jî êdî bi rengekî din dihate kirin. Êdî li cihanê du kamp hebûn, bi alîkariya wan kampana dewletên nû jî ava dibûn.

Karbidestên dewletê piştî hemî amadekariyên xwe qedandin, bi hevre gihiştin wê baweriyiê ku divê tevgereke li ser navê kurdan û hefsarê wê, rişma wê di destê wan debe, amade bikin ango damezirînin. Bi avakirina tiştekî weha jî divê serokê tevgerê bi xwe kurd be, lê ji wan bêtir jî parêzvanekî komara wan be. Ev jî ne karekî rehet û hêsan bû. Ji bona vê jî biryara lêkolîn û kar dan.

Biryara karbidestên dewletê ew bû ku divê ew ne yek tevgerê, du tevgerên xwe li ser navê kurdan bi destê xwe damezirînin. Gihiştibûn wê baweriyê ku kurd misilmanin û baweriya wan ya olî gelekî xurt e. Ev yek, ya din jî fikira sosyalîzmê li cahanê û bi taybetê li rojhilata navîn û li kurdistanê geş û berfireh dibû. Ev ji bona wan fikreke nû, zanîneke li gor pêvajoyê peyde kir ku divê karbidestên dewletê serê xwe bi vê re biêşandana.

Taliya hemî tiştî, hemî aqilmend, berpirsên sivîl û leşkerî yên dewletê bi hevre gihiştin wê baweriyê ku du rêxistinan li ser navê kurdan, lê bi her awayî ya wan be damezirînin. Li ser vê biryarê li hev kirin. Piştî vê li hevkirinê jî divê ew biketana nava lêkolînan, nava unîwersîtan, daîreyên dewletê ûhwd ku bikarîbana li du zilamên xwe rast bihatana, peyde bikirana bê ku zerareke mezin bidana dewleta xwe, bidîtana.

Êdî karê karbidestê dewletê mabû, peydekirina du kesayetên weha. Yek li ser navê misilmantiyê ji ber ku kurd miletekî misilmanin û yek jî li ser navê guherîna li cihanê ya sosyalîst ku li gor îdelojiya wan, wan alîkariya neteweyê mafê gelê xwe diparast dikirin, bikirana.

# -12-

Bi seredana ewil ya Bênav ku çûbû nava çadirên Qereçiyan, ew zîyaret kiribû, hevdu naskiribûn. Bi wê yekê jî nasîna wî û ya Filîzê ji bona wî taybetmeniyek nû û destpêkek cûda bû. Piştî wê serdanê, wî ji bavê Filîzê re gotibû: ”Mamo tu dikare herroj kesekî/ê ku Filîz be baştir e, bişîne Qerekolê da ku ez ê jî xwarina zêde ku ji ber leşkaran bimîne ji bona we bişînim. Bi vî awayî hûn ê her êvar şîveke baş û xweş bixwin”. Li gor vê û li gor gotina Bênav ku bila Filîzê we re baştir e, bavê Filîzê fêm kiribû ku Bênav çav bera keçikê da ye. Ev ji bona bavê Filîzê jî ne fikreke xerab bû. Wî yê keçek xwe bi kesekî ew jî weke wan e, bizewicanda. Her çiqas ziman û axa wan ne yek û ne weke hev jî bûn, dîsa bavê Filîzê bi vê razî bû ku Bênav bike zavayê xwe.

Filîzê her êvar piştî xwarina leşkeran, ew jî li Qerekolê bû û Bênav firaxên ku wê bi xwe re anîbû, bi xwarina ji ber leşkeran mabû û ya zêde, tijî dikir. Bi saya wê xwarina leşkeran ya Bênav dida wan, rewş û halê Bênav ji hevalên wî jî ve diyar dibû ku dilê wî ketiye Filîzê. Him dixwaze bi alîkariya wan ve rabe, him jî bi çûn û hatina Filîzê wî yê ew baştir nas bikira û fikra wê jî bigirta ka bê wê jî dixwest bi wî re bizewice an na. Bi vê sedemê xwarina Filîzê dibir mal, hemî malî pê xenê bû bûn, ango kêfxweş bû bûn. Lê ne tenê ew, her weha Filîz û Bênav jî bi hevdîtina hev, li gel hev sohbet kirin û carna jî di quncên tarî de ramûsanên didan hev, ew jî bextewar bûn.

Êdî Bênav ji xwe re kiribû adet, di hemî rojên xwe yên betlanê de bi wan cilên xwe yên xweşik li mala bavê Filîzê dibû mêvan. Hingî çûyin hatina wî zêde bû bû, êdî ew jî bû bû weke kufletekî wê malê. Weke kurekî wê malê, heta weke zavayekî wê malê bi xwe jî. Ji ber bavê Filîzê rewş baş dişopand, didît ku nêzîkiya Bênav û keça wî zêde dibe. Didît tevger, dan û stendinê wan î li hember hev êdî ketibû rewş û qonaxeke din. Êdî ne weke du dostan, du heval û

hezkirên hev, tevgerên wan nişan dida ku ew hema bêjin bûne weke jin û mêr in hevdu.

Êdî rojên qedandina leşkeriya Bênav hindik ma bû. Her ku rojên qedandina leşkeriya wî nêzîk dibû, ew diket nava xemginiyekê ku wê ji Filîza xwe bi dûr biketa. Ev dûrketin jî wê ji bona wî biba êş û azarek nû. Êdî ew ketibû nav ramanên kûr û dûr da ku wê vê problema xwe çawa çareser bike? Wê çawa bibe mêrê Filîzî? Wê çawa Filîzê ji bavê wê bixwazî? Heger bixwazî jî gelo wê bavê wê, ew bida wî? Vana hemî bû bû asteng, bû bûn êş û azar di mejiyê Bênav de. Heta ev rewş ji aliyê hevalên wî yên leşker jî dihate zanîn. Ji ber ku wî tim li ba wan jî behsa Filîzê û delaliya wê, xweşkbûn û pakbûna wê dikir. Leşkerên qerakolê jî ev fêm kiribûn û dizanî bûn ku Bênav dilketiyê Filîzê ye.

Belê êdî ruh ji canê Bênav dikişiya. Dem diherikî û di nava vê herikandinê de wê çawa Filîzê bike jina xwe difikirî. Nema dizanî bû ku dê çi bike. Ketibû nav fikrên dûr û dirêj. Mesela wî vekirî dihat zanîn. Heta êdî bavê Filîzê jî li benda Bênav bû ku rojekê were qîza wî jê bixwaze. Lê Bênav cesaret nedikir, rojên wî jî her diçû kêm dibû, vê kêmbûnê ew diêşand.

Êvarekê dîsa Filîzê ji bona xwarinê hatibû Qerekolê ku bibe mal. Wê êvarê fikrek û aqilek hatibû bîra Bênav. Loma xwe bi xwe difikirî û digot gelo îro vê rewşê ji Filîzê re jî bêjim an na? Her çiqasî wî fêm kiribû ku Filîzê bi helwest dan û stendinên xwe jî li hember wî di rewşeke ya hezkirinê de ye. Lê wî hê nizanîbû wê Filîzê bi wî re were welatê wî an na. Vê pirsê serê wî tevli hev dikir. Gelo ew, bi wî re nere welatê wî dê çi bike? Heger Filîzê bixwazî ew jî li ba wan bimîne dê helwesta wî çi be? Vana tev ji bona wî bû bû êş û problem. Ji ber ku wî nedixwest li welatê xeribiyê, li welatê biyaniyan bijî û piştî leşkeriyê dixwest li welatê xwe vegere. Di nava malbat û Qereçiyên xwe de bijî. Tu armanceke wî ya ku li van deran bimîne tune bû. Lê wê çawa û çilo vê rewşê ji Filîza xwe re bêje û bide qebûlkirin û zanîn da ku ew jî vê rewşa wî fêm bike.

Belê vê êvarê tevger û rewşa Filîzê jî cûda bû. Ew jî li ba xwe fikirî bû û dizanîbû leşkeriya Bênav hindik maye. Difikirî ku gelo piştî ew leşkeriyê biqedinê wê çi bike? wê bi wê re bizewice û wê herin welatê wan ya jî wê li vir bimînin? Wê jî nema dizanîbû ku dê çi bibe.

Her wê jî dixwest rojekê berî rojekê li ser vê bi Bênav re biaxife, nerîn û dîtina wî bizanibe, da ku piştî leşkeriyê dê ewên çi bikin?

Çawa Filîzê nêzîkê Qerekolê bû, hema yekser Bênav berbi wê de beziya û hinekî gavên xwe zû avêtin. Vê zûbûnê bala hevalên wî yên leşker jî kişandibû. Lê wan dizanî bû ku dem dema hatina Filîzê ye. Her hatineke wê ji bona Bênav dibû kêfxweşiyek, şahî û şadiyek. Berî ku Filîzê bighêje Qerokolê bi qasî dengê wî nere hevalên wî yên leşker, xwe nêzîkê Filîzî kir û got:

-Filîz tu dikare sibê hinekî zû were, min dixwest li ser mijarekê bi te re qise bikim. Fikir û ramanên te jî bigirim.

-Baş e, wele min jî dixwest bi te re biaxifim.

-De baş e wê gavê sibê ez ê ji hevalan re bêjim ku divê ez hinekî zû derkevim, bila min îdare bikin da ku em rehet, rehet li gel hev qise bikin. Vê êşa dilê xwe berî ku leşkeriya min biqede ji te re vekim.

-Temam gelek baş dibe, hin gotinên min jî ji bona te hene.

-De baş e, nexwe me li hev kir. Sibê hinekê zû were ez ê firaxên te dînim qerekolê heta ku hevalên min xwarina xwe bixwin, em ê jî li dereke ewle bi hevre qise bikin. Te maç dikim û sibê li benda delala xwe me.

-Temam ruhê min tu çawa bêje dê weha bibe.

Piştî vê gotinê, li gel hev, bi hevre berbi qerekolê ve çûn. Çi xwarina hebû, Bênav da Filîzê. Firaxên wê hemî dagirtin û heta nêzî çadirên wan, wî alîkariya Filîzê kir û ji nişkave ramûsanek jê girt û got:

-De ya bi xêr, sibê li benda te me.

Bênav li qerekolê vegeriya, lê tevger û rewşa wî gelekî cûda bû. Bênav çûbû, yekî din hatibû şûna wî. Ne dikarîbû li cihê xwe rûnê. Tebatî nedihatê, ha bi wir de ha bi virde diçû dihat. Her çiqasî hevalên wî jê re digotin: ”Bênav hinekî aram be, rehet be, ev çi xezeba teye? Ev çi nerehetiya te ye? Digotin lê pere ne dikir.

Ji ber ku ji wî pêve kesekî derdê wî nizanî bû. Difikirî gelo Filîzê wê bi wî re were welatê wî? Gelo ew ê qebûl bike bi min re bê? ma dê

û bavê wê, xuşk û brayên wê dê çi bêjin? Heta berdestê sibê karê wî bû bû ev fikir û raman. Çawa di xewde çûbû wî jî nizanî bû. Bi dengê nobedarê sibê, bi xwe hesiya ku taştiya wan amade ye.

Wê rojê, heta dema hatina Filîzê jî ew weke li ser êgir be. Ha bi wirde ha bi virde diçû û dihat. Heş, raman û fikra wî li ser Filîzê bû. Gelo wê çi bêje? gelo malbata wê dê ji bona pêşniyareke ku ”ez dixwazim bi Filîzê re bizewicim” dê çi helwestê bigirin? Gelo zewacê qebûl jî bike, wê Filîzê bi min re bişînin welatê min? Serê xwe bi fikir û ramanên tevli hev tijî kiri bû. Carê li seata xwe dinerî ku bê dema hevdîtina wan çiqas maye. Saet jê re bû bûn roj, roj bû bûn sal. Ji bona vê roja ku wê ji Filîzê re bêje; ”Ez dixwazim bi te re bizewicim”. Ez dixwazim bi te re bizewicim, di serê wî de olan dida.

Ji bona wan fikir û ramanên Bênav yê ku difikirî da ku vê helwesta xwe çawa ji Filîzê re bêje. Te digot qey gundorek li ser mejiyê wî digeriya. Ew gundor digeriya û mejiyê mayî jî belav dikir. Loma ketibû tengasiyê wê çawa daxwaza xwe bi rehetî û aramî bighêjîne Filîza delala ber dilê xwe. Bi van raman û bê sebiriya wî ku her ji çendakî li saeta xwe dinêre ku fêr bibe bê ji dema hevdîtinên re çiqas maye.Te digot qey ji bona Bênav dem sekiniyê, zeman naherike, dinya li cihê xwe rawestiya ye û hemî tişt li cihê xwe sekinîne, didît. Lê bi dengê Filîza xwe ya ew bê sebir li bendê bû, ji wan xeyalana şiyar bû. Dît ku Filîza wî li pêşberî wî sekinîye û jê re got:

-Ma tu zûde hatiye?

Bi vê gotina Filîzî Bênav nema dizanî bû dê çi bibêje. Ji ber bi çavlêketina wî ya îro ne weke ya her roj bû. Îro Bênav wê doza zewacê lê bikira û helwesta wê çiba meraq dikir. Na bûna wê dê biba agirekî weke yê dojehê û dê ew bişewitanda. Erê bûna wê jî li gel kêfxweşiya wî, dê piştî zawacê li ku bijiyana bû bû weke dîwarekî ji pola. Vê jî ew diêşand. Bênav dît ku Filîzê li benda bersîvekê ye loma wî hema bi lez û bez got:

-Na, na na ez jî niha hatim. Got. Firaxên Filîzê ji bona xwarinê anîbûn, bilez û bez bir qerekolê danî û dîsa bi lez vegeriya ba Filîza xwe. Destê xwe dirêjî destên Filîzê xwe, delala ber dilê xwe kir. Li dora xwe nerî ku kes xuya nake, weke tu ecûrekî ji bîstanekê bidize ku xwediyê wî te nebîne, weha ramûsanek ji delala xwe girt. Ew

berxwe de kişkişand û hêdîka û piştî wê ramûsana ku bê destûr ji delala xwe girtibû, berbi cihekê hê ewletir bir û got:

-Aha vir baştir e, delala min. Em îro dikarin bi hevre li vir, di vî taldeyê de bi rehetî li gel hev qise bikin û agirê me dişewitîne vemrînin.

-Wî rebenê ev çi gotine tu dikî? ma qey te mejiyê xwe xwariye. Rehet be, weke her roj em dikarin îro jî qise bikin. Xwe şaşo maşo neke. Kelecanî nebe. Ez hatime vir da ku te guhdarî bikin. Bê ka tê çi ji min re bêje? Rehet be. Gelek tiştên ku ez ê jî ji te re bêjim hene. De fermo delalê min.

Bênav hinekî xwe bir û anî, hinekî kelecanî bû, nema dizanîbû ku wê ji ku de destpê bike. Loma zêde nesekinî ji ber ku wan gotinên Filîzê ew hinekî aram kiri bû. Bi vê aramiyê dest bi axaftina xwe kir û got:

-Binere Filîz. (Sekinî, hilmeke kûr kijan û axaftina xwe domand). Ev demeke dûr û dirêj e em hevdu nas dikin. Ez ji roja ewil ku hatim ber çadira we û çav li te ketim, aha ji wê rojê de ye, te xwe di nava dilê min de bi cih kiriye. Em herdu jî Qereçîne, di vir de tu astengiya me tune ye. Lê erd û zimanê me ji hev cûdaye. Ez bawer nakim ku ev jî ji bona zewaca me bibe asteng.

Bênav hê axaftina xwe temam nekiri bû, Filîzî axaftina wî birî û got:

-Tu çi dibêje delalê min? zewac! ma te îro ji bona vê bangî min kir?

-Ka bisekine delala min, ez gotina xwe bidomînim dûre ez ê te guhdarî bikim? Bîr û raya te, fikir û ramanên te jî bigirim. Belê min îro ji bona qedandina leşkeriya min hindik maye. Piştî wê jî ez ê berbi welatê xwe ve herim û dîsa bikevin nava malbata xwe û weke her caran, li geşt û nifkê xwe bigerim. Lê min baş fêm kir ku ez naxwazim êdî bê te bijîm. Min ji te hez kir û dixwazim em jiyana xwe bikin yek. Dizanim di destpêkê de wê hin astengiya erd, xerîbî û zimanekî ku tu qet nas nake, wê derkev e. Lê em ê bi hevre wê jî çareser bikin.

Destê Filîza ku hê di nav destê wî de bû, hinekî din berbixwe de kişand, xwest ramûsaneke din jê bigire, lê Filîzî ew da sekinandin, bi matmayê lê mêze kir û got:

-Niha tu bi rastî dibêje ku tu dixwazî bi min re bizewice?

-Belê bi rastî vê dixwazim. Ma ev ji te jî ne diyar e? Ma tu jî ji min hez nakî? Ma tu jî naxwazî bi min re bizewicî?

-Belê delalê min belê, lê bi rastî ez ne li benda pêşniyareke weha bûm. Û vê carê Filîzê destên xwe ji nava destê Bênav derxist li dora hustiyê wî pêçe ew berbi xwe de kişand, ramûsaneke ku te digot bi hesreta salan bû, jê girt. Kêfxweşiya xwe û daxwaza ku ew jî zûde li benda tiştekî weha bû got:

-Sihet xweş delala min, tu jî her hebî. Lê gelo ez vê pêşniyarê bighêjînim bavê te? Ma ew ê çi bêje? Heger gotina wî na be, em ê çi bikin?

-Delalê min heger tu dixwazê bi min re bizewicî, heger bi rastî tu dixwazî min bike kevaniya xwe? heger tu dixwazî bibe xwedî zarok? wê tu astengî di zewaca me de dernekev e. Ez ê li gel malbat û bavê xwe biaxifim. Dûre te agahdar dikim û tê jî berî ku here welatê xwe, were û min ji bavê min bixwazî. Ev ewqasî rehet e. Xwe zêde aciz neke, delalê min.

Bi rastî Bênav ne li benda bersîveke weha rehet ya erê bû. Wî texmîn dikir ku wê Filîzê gelek şert û şirûtan bavêje ber wî da ku wê ji bavê wê bixwazî. Lê weha derneket û te digot qey Filîzê jî li benda pêşniyareke weha bû. Her du jî êdî kêfxweş bû bûn. Tirsa ku herdu difikirîn, nema bû. Talî biryar girtin da ku rojekê Bênav, çend heval û serbazê wî herin wê ji bavê wê bixwazin û meselê biqedînin, dan. Di vê naberê de wê Bênav malbata xwe ji vê rewşê bi nameyekê agahdar bikira û wê li vir bizewiciyana dûre ew û jina xwe, wê berê xwe bidana welatê Bênav. Wan ê bi hevre jiyanake nû biafirandana. Wê bibana xwedî zarok û wê karê xwe yên Qereçitiyê berdewam bikirana. Li ser vê biryar û asasî, bi ramûsaneke ku ji dilê herduyan dihat ji hev girtin. Hevdu hembêz kirin û dawî li ramûsanên xwe anîn. Anîn ku Bênav û Filîza wê bibana jin û mêrê hev. berê xwe dane Qerekolê, lê dema nêzîkayê li wir kirin di rûyê herduyan de jî kêfxweşî, şadî û mestî hebû. Hevalên Bênav yên leşker fêm kiribûn ku wan li hev kirina. Bê ku xire-cirekê derxin, mesela xwe çareser kirine. Filîzê wek her car firaxên xwe yên tijî xwarin hilgirt, bi ken û şadî xatir ji leşkeran xwest û Bênav jî heta deriyê hewşa Qerekolê pê re derket û got:

-Di demeke nêzîk de em ê werin te ji bavê te bixwazin delala min. Bila qet şik û tirsa te tune be.

Filîzê bi rehetî hêdî hêdî ku weke nedixwest ji wir dûr bikeve, berbi malê de meşiya. Li pişt xwe zivîrî dît ku hê Bênav li cihê xwe sekinî ye. Lê nerî û vê carê bi kenê xwe xatir jê xwest û rêya xwe domand. Bênav jî li Qerekola xwe vegeriya…

# -13-

Roj bi roj tevgerên ciwanên kurd li bakurê kurdistanê xof û metirsiya dagirkeran bêtir û berztir dikir. Tirsa wan ne ji sosyalîst ango tevgerên çepên wan bû. Ji ber ku yên çep û di nava ciwanên dewletê de kar dikirin. Daxwaza wan tenê ji bona guherandina desthilatiyê bû ku ew jî bi rêya sistema sosyalîzmê bû. Loma tevgerên ciwanên wan zêde karbidestên xwe neditirsand û ji ber vê bû ku dewlet zêde bi ser wan de nediçû. Ji ber ku ew zarok, ew ciwan jî yên wan bi xwe bûn. Çiqasî tevlihevî û xerabî bikirana jî dîsa taliya talî dê komara xwe xurt bikirana, lê bi rê û rêbazên din.Tirs û xofa karbidestên dewletê ji ber şiyarbûn û bi hêzbûna ciwanên kurdan bû. Ew li ser vê pir disekinîn. Her roj civîn û hevdîtin dikirin. Aqilmendên xwe dicivandin, da ku wê çawa, bi çi rê û olaxan bikarîbin pêşî li tevgera ciwanên kurd bigire. Baş dizanîbûn ku bê çiqasî zilm û zordarî li bav û bapîrên ciwanên kurdan kiribûn. Loma nedixwestin ku ew ciwanana dîroka xwe bizanibin.

Desthilata dewletê baş dizanîbûn ku bê wan çendî çend rêber û serokên tevgerên kurdan li sêdarê xistibûn. Baş dizanîbûn ku bê wan çiqas jin û zarokên kurdan kuştibûn. Her wan baş dizanîbûn ku bê wan, çiqas malwêranî û talaniya kurdan kiribûn. Ji ber vê bû, dizanîbûn ku serîhildaneke nû ya bi rêvebiriya van ciwanên kurd yên xwenda pêk bê, dê nikaribin pêşî lê bigirin. Lewra hemî kar û xebatên wan, tekoşîn û berxwedana wan, ji bona vê yekê bû. Biryara wan ya ku divê, di vê pêla nû ya tevgera ciwanên kurd, bi destê hin kurdan bitemirandina, bû. Ya na dê karê wan zehmet ba û dibû ku bi ser jî neketana. Wan ev yeka jî baş dizanîbûn, di dema her serîhildaneke bav û bapîrên kurdan de, wan çawa hin êşîrên din kirin aliyê xwe li hember serîhildaran bi kar anîbûn. Ev yeka baş dizanîbûn. Loma ne dixwestin van ciwanên nû zana û têgihiştî, dîroka xwe fêrbibin. Heger fêr bibin baş dizanîbûn ku wê demê tu tiştek, tu hêz û qawet dê nikarîba pêşî li wan bigirta. Bi xurtbûn û geşbûneke weha ya ciwanên kurd, wê biba hilweşandina komara

wan. Vana hemî ji bona karbidestên dewletê bû bû derd, kul û êş. Vê xewa şevan li wan herimandibû. Ji ber vê bû di warekî gelek berfireh de kar û xebat dikirin da ku bikaribin çawa pêşî li tevgera ciwanên kurd bigire. Ji bona têkbirina tevgera kurd jî çiqas bedel bidana ne girîng bû. Ya girîng ku zêde serê xwe pêre diêşandin dê çawa tevgera ciwanên kurd têk bibin, bitemiranîn bû. Bi vê tirsê, wan hemî aqilmendên xwe kiribûn nava xebata ji bona tefandina agirê tevgera ciwanên kurd. Li gor aqildayina dewletên mezin yên biyanî li gor arşîvên dema Împaratoriya Alî Osamanî û hin dewletên din ku wan çawa tevgerên serîhildanên li hember xwe têk biribûn, dixwendin û fêr dibûn.

Ji bona dewletê tevgerên nav xweyî ango ya ciwanên wan, karê herî rehet bû. Her çiqasî bi mesrefeke mezin ew damezrandibûn. Lê çi demê bixwestana dikarîbûn hilweşandana jî. Ji ber ku hevsarê wan di destê dewleta wan de bû. Loma aqilmendên dewleta kûr, xwestin ku li gor xwe li ser vê erdnigarê ji bona kurdan rêxistineke ku hefsarê wê di destê wan de be damezrîne û çi demê bixwazin dikarin hilweşînin. Ev li gor gelek tecrubeyên dewletên mezin û ya împaratoriya Alî Osmanî ku wan jî di dema xwe de ji bona tefandin, têkbirin û hilweşandina tevgerên li dij xwe çawa bi navê ”Yenîçerî Ocaklarî” ku ji ciwanên miletên din pêk dihatin ava kiribûn. Ji ber vê rêya çareseriya dewleta xwe ya ji bona parastina wê di vê dema nû de bi navekî din,  rêxistinekê li ser navê kurdan û serokê wê kurd be ku ew zilamê dewletê be, dîtin. Ev fikra nû ji teref aqilmendên wan jî rast û baş hate pesinandin. Wê ev yeka zêde serê dewletê neêşanda. Lê wanê bi xwe ji bona tevgereke weha aborî, hazirî û tanzîma wan pêk bianîyana. Rê dîtina nû, ji tevgera ciwanên kurd xilasbûn jî li ser vî asasî biryara xwe dan ango dabûn.

Divê wan çend kesên bi eslê xwe kurd, lê bikarîbana li hember gelê xwe şerê tunebûna wan bikirana bidîtana. Ji bona peydekirina vê jî hemî aqilmend û zanên xwe li nava dibistan, gund û bajaran belav kiribûn ku kesên weha peyde bikin. Helbet ew dewlet bûn û dîtina kesên weha bi destê dewletê jî ne zêde zehmet bû. Li ser vî asasî hemî aqilmendên dewletê, zana û jîrên wan ji bona peydekirina kes an kesên weha kar û berpirsî li hev belavkiribûn. Belavkiribûn û li gor vê belavkirinê jî divê herkesan dest bi karê xwe bikirana. Ji bona vî karî jî hemî mesref ji teref dewletê dihat amadekirin. Ji ber ku divê

kesên vî karî bikin bizanibin ku ewên zerara aborî nebînin û ew kesana jî divê ji kesên sedî sed girêdayî dewleta xwe ango ya komara wan ba na. Loma dîtina kesên weha û pê bawerî bikirana da ku rojekê deweletê nexapîne. Divê du kesên kurd lê ji kurdan hez nedikirin bidîtana da ku bikarîbana ku kurdan tune û dagirkeran jî kêfxweş bikirana. Kesên weha divê bê şik bibana cihê baweriyê. Loma divê wan kesana bê tirs û xof bana. Li gor vê destûr û bernameyê êdî aqilmendên dewletê divê kurdekî dijminê qewmê xwe peyde bikirana, dest pêkiribûn. Lîsteya navê kesên weha ku berê li ba wan qeyd kiribû, yeko yek li ser wan rawestiyana û ji bona hinên nû jî kar, wazîfe û erk li hev belav bikirana.

Wan kesên bihatana dîtin jî divê li gor dilê xwe li ser daxwaza dewleta xwe û ji bona tevger û temama kurdan tune bike dest bi karê xwe bikirana. Lewra aqilmendên dewleta kûr, her hinan ji alîkî de, her hinan ji deverekê de, her hinan ji unîwersîte û dibistanekê de û her hinan jî ji bajar û gundên kurdistanê de dest bi peydekirina kesên weha bikirana. Di nav wî karê xwe de jî ji her mehekê carekê rapora xebatên xwe ji jor re dişandin ku kê heta niha çi kar kirine. Mezinên wan û xwediyê dewleta kûr jî ew raporên ji wan re dihatin, dixwendin û li ser wan bi hevre gengeşî dikirin ku ew kes an kesên ku bi xwe lê digeriyan bibînin. Piştî xebatên dûr û dirêj ya komîteya ku karê wan tenha di nava uniwersîteyan de bû, bi rapora xwe ya talî û mizginiya ku wan li gor dilê xwe, li gor baweriya xwe, li gor ew kesê ji kurdan hez nake û bi eslê xwe kurd e, peyde kirin. Li gor raporên wan, li gor lêkolînên wan, ew kesê ku lê digeriyan peyde kirine û kêfxweşiya xwe ji mezinên xwe re rapor kiribûn. Kî bû ew kes? ji ku bû ew kes? ji kîjan êl û eşîra kurdan bû ew kes? Piştî topkirina hemî raporên li ser wî di civîneke berfireh de, komîteya dewleta kûr li gel hev li ser wî kesî û van raporên di heqî wî de hatine dayîn, civênekê li dar dixin. Li dar xistin û êdî mesela dîtina kesekî weha hema hema qediya bû. Loma ê ku civîn îdare dikir xwest ku kesek ji komîta nava unîwersîtan ku ji bona peydekirina kesekî weha hatibûn erkdarkirin, guhdarî bike. Ji wê komîteyê kesekî bi kêf rabû ser xwe û got:

-Belê ev demeke dûr û dirêje ku we em erkdar kiribûn da ku em jî bikaribin kesekî weha peyde bikin. Divê yekî ku baweriya me lê bê û ew jî tim weke me bike. Li gor vê û di encama van xebatên xwe

de em li kesekî weha bi eslê xwe kurd, lê dayika wî tirk e, rast hatin. Ne tenê lê rast hatin, her wî jî em dîtin. Dûre me dît ku ew tim li komela olperesta ye. Tim li vir bû, li gel wan bû. Hin karên wan jî pêk dianî. Me rewşa wî meraq kir. Me çend hevdîtin li gel wî pêk anî û talî em gihiştin wê baweriyê ku ew kesê em lê digeriyan, me dît. Li gor me tu kesekî ku bikaribe bi qasî wî xizmeta dewletê bike, zehmete ku em peyde bikin. Ji ber ku him dayika wî tirk e û him jî ew bi xwe dijmênê kurdan e.

Yekî ji civînê ku hevalê xwe guhdarî kiribû jê pirsî.

-Gelo çima û bi çi awayî baweriya we li ser wî waha bê tirs çê bû? We li ser çi asasî biryar da ku bi rastî ew ê hemî karê dewletê li gor dilê me pêk bîne? Spas fermo.

-Rast e, ev ji bona me jî girîng e. Loma me jî li gor vê girîngiyê dest bi lêkolînên xwe kir û ew peyde kir. Weke me di raporê de jî nivîsiye, dayika wî bi eslê xwe tirk e û qereçî ye. Bavê wî jî qereçiye lê bi eslê xwe kurd e. Li gor pirs û bersîvan, li gor lêkolînan me dît ku ew ji bavê xwe qet heznake. Jê nefret dike û qet naxwazî navê bavê xwe jî hilde. Dûre me fêm kir ku bavê wî yê kurd, gelek tade û zilm li dayika wî ya tirk kiri bû. Ji ber wan kirinên bavê xwe ew jî him bû bû dijminê bavê xwe ê kurd û him di şexstiyeta wî de bû bû dijminê hemî kurdan. Ji ber vê, wî jî dixwest tola dayika xwe ji bavê xwe hilîne. Ev jî bi qirkirina neteweya bavê wî dibû. Ji ber wan kirênin bavê xwe, ew bû bû dijminê kurdan ku qet nebêjin. Bi rastî dema me li gel wî qise kir, wî ji me bêtir dixwest yek kurd jî li ser rûyê vê cîhanê nemîne. Lewra em weke komîta vî karî, me hemiyan bi hevre ev biryar da ku ji wî pêve zehemet e ku em kesekî din weke wî kurd û dijminê kurdan bibînin. Lê biryar ya we bixwe ye.

-Te got ew heroj li komela oldara ye. Ev ji bona me wê rehetiyekê bîne. Divê em wî ji wir bigirin û li daîreyên Îstîxbarata xwe perwerde bikin da ku bikaribe karê xwe baş pêk bîne. Yekî din got:

-Belê rast e. Divê em weha bikin. Bila unîwersiteya xwe bidomîne. Lê divê em wî, ji komeleya olderan bigirin di avayî Îstîxbaratê de bi cih bikin û teslîmî mamosteyekî bikaribe wî baş perwerde bike, bikin.

Ê ku civîn îdare dikir, rabû ser xwe berê kuxuya, te digot qey wê bistrê, li dora xwe nerî û dest bi axaftina xwe kir.

-Ez spasdarî vê komîta me ku kesekî weha peyde kirine. Ji xwe hemî raporên li ser wî, tim ji me re dihatin, min baş xwendine û lê nerîne. Ez jî bi havalên ew kes peyde kirine re me. Min jî li gor wan raporên dihatin û dema navê wî hate pêşkêşkirin, di hin çavkaniyên cûda de li ser wî lêkolîn kir. Min jî dît ku bi rastî ew kesê em lê digeriyan ji wî pêve ne tu kesekî din e. Lê divê em destên xwe sivik bigirin, tevgera ciwanên kurdan mezin û fireh dibe. Heger weha bidome dibe ku di siberojê de em nikaribin pêşî li tevgera wan bigirin. Ev jî dikare bibe şerekî navxweyî ku wê welatê me serobinî hev bibe. Ji bona xwîna gelê me zêde nerije û em bikaribin li gor xwe pêşî li tevgera ciwanên kurdan bigirin, ez raya xwe didim ku em êdî li ser wî bisekinin. Wî ji komela olderan dûr bigirin û dest bi perwerdayiya wî ya di nava avahiya Îstîxbaratê de bikin. Em ji bona wî aqilmendekî xwe peyde bikin da ku li gor dilê me wî perwerde bike.

Kesekî din ji civînê mafê axaftine girt û got:

-Belê rast karê me ê ewil qediya. Ez jî li gel hevalan im. Min jî ew şopandiye li gor min jî kesekê ku em lê digeriyan ew bi xwe ye. Ha ji bona perwerdayiya wî jî dive em profesorê xwe, aqilmendê dewleta xwe Z Kûçik erkdar bikin. Bila ew jî vê wazîfeyê bike û kêmaniyên wî temam bike da ku ew jî şaşiyan neke. Ya din Kûçik dikare wî pir xweş perwerde bike ku hemî gotin û kiryarên wî li gor ya profesor Z. Kûçik be.

Bi vî awayî civîna zilamên dewleta kûr, ya li ser wî kesî li hevkirin, bi dawî bû. Hemî jî ji girtina biryareke weha re kêfxweş bûn. Loma bi kêf rabûn, destên hev girtin û bi kêfa ku wan ê li ser destê wî kesê ku bavê wî kurd û dayika wî tirk e, tevgerên ciwanên kurdan têk bibirana. Helbet hemî bi alîkarî û piştgiriya dewletê dê biba…

# -14-

Hemî aqilmend, zana û şêwirmendên dewletê li ser pêşniyariya ku wê kurdekî bikin serokê kurdan û ji wî re ango yekî bav kurd, dayik tirk re tevereke ku hevsarê wê di destê wan de be, damezirîne, dan. Êdî karê û tevgerên wan, mabû ku wê vê çawa pêk bînin. Bi çi rê û rêbazan bi serbixe, bû. Kesê bi pêşniyara dewletê ku wê wî bikin serokê kurdan jî qebûl kiribû. Ji xwe ew jî li tiştekî weha digeriya. Loma dewletê hemî gotin û pêşniyariyên ku divê wî bikira, bi rêya komîteya xwe gihiştibûn wî û wî qebûl kiribû. Piştî vê jî, ew jî ketibû dema xwe ya perwerdekirinê. Z. Kûçik bû bû mamosteyê wî. Ji bona baş hazir û amade bike da ku şaşî neyê kirin.

Ji bona ku karbidestên dewletê baş baweriya xwe bi wî kesê ku wê bikin serok û mezinekî kurdan û bi wî emîn bin ku ew ê ji rêya wan derneke. Ev kar û erk dabû Z.Kûçik. Ji ber ew bi xwe jî zilamê dewleta kûr bû. Ew bi xwe erkdar bû ku hemî tevgerên li dij dewletê têk bibe, bû. Ji bona vî karî, ew her azad bû û çi lazim ba dewletê .texsîr nedikir.

Êdî dem dema hevdîtina wan herduyan bû. Yanî yê bibe serokê kurdan û Kûçik bû. Di avahiya ku tenha ji bona aqilmen û mamosteyên dewleta kûr ku hatibû avakirinê de herdu bi naskirina hev ya li wir kêfxweş bû bûn. Êdî karên wan û perwerdekirina serokê nû destpê kiribû. Ji bona wî jî bike weke xwe, Z.Kûçik pir cahd û xebat dikir. Serê xwe bi hemî perwerdeya serokê kurdan ê nû re diêşand. Bi hemî zanîn û kanîna xwe bi perwerdayî ya wî ve mijûl bû. Kar û erkê wî tenha ev bû. Ji ber ku divê wî, serokê kurdan ê nû weha perwerde bikira ku çi biba jî divê wî tu caran, rêya xwe ya ji bona xurtkirin û hebûna komara dewletê kûr şaş nekiriba. Ji xwe wî jî tim ji mamosteyê xwe bi henek û yarî digot; ”Ji roja ji dayika xwe bûme, li benda tiştekî weha û pêşniyareke bi vî rengî bûm”. Kêfa wî li cih, serê wî zelal û armanca wî êdî diyar bû. Diyar bû ku divê wî êdî weke serok û berpirsiyarekî kurd, kurd bikuşta da ku tola

dayika xwe ji bavê xwe ê kurd hilaniya. Ew weha difikirî û di destpêkê de weha bû.

Lê piştî ku Z.Kûçik ew pir rind, delal û bi rêk û pêk perwerde kir. Di nava vê perwerdahiyê de fêm kir ew ê tu caran ji gotina dewletê dernekev e. Wî di demeke kurt de ev mizgînî gihand komîteya dewleta kûr ya ji bona parastina wê hatibû damezrandin. Helbet di wê avahiyê de ne tenê serokê nû, gelekên din jî hebûn. Ji ber ku îdarekirin û rêvebirina dewletê ji wir dihat kirin. Loma jî kesên ji wir derdiketin, ne pêkan bû ku ew rojekê li dij komarê derkevin. Erk wazîfe û perwerdekirina wan, weha dihat kirinê ku serê wan, mejiyê wan, bawerî û hemî helwestên wan dibû tenê ji bona parastina vê komarê. Bi perwerdariyeke bi rêk û pêk Serokê nû ji bona serokatiya kurdan amade bû bû. Loma êdî dor hatibû ku çend kesên weke wî jî peyde bikin, ya jî çend kesên din ku doza azadiya gelê xwe dikirin, bibînin. Bi hevre partiyeke weha damezrînin ku bi wî navî jî bala kurdan û sosyalîstan bikşîne. Ji ber ku dem dema sosyalîzmê bû. Wan aqilmendên dewleta kûr baş di vê zanebûnê de bûn. Loma wan dixwestin wê ji bona komara xwe pêk bînin.

Piştî ku hemî amadekariya Serokê nû hate qedandin. Rojekê di civîneke berfireh ya dewleta kûr de, ji bona xelatkirina wî civînek li dar dixin. Kêfa serokê nû jî li cih bû. Wî yê bi vî erkê nû tola xwe ji civata ku ew qebûl nedikir, ji hevalên wî yên şoreşger yên di dibistana wî de ku henekê xwe pê dikirin û taybetê wê karê wî ye sereke jî bona tunekirina tevger û gelê kurd ba, hilaniya.

Dema Serokê nû û Z.Kûçik bi hevre ketin wê salona ku berpirsên dewleta kûr hemî berî wan li wir amade bûn. Serokê nû bi çavên xwe yên zexel ku di wan de qetilkirina kurdan dihate xuyarkirin, yek bi yek li wan nerî û kêfxweş bû. Ew kêxweşiya wî ji teref kesên rûniştî jî diyar bû bû. Loma ew jî bi vê helwesta Serokê nû pir kêfxweş bû bûn. Wan hemiyan bi xêrhatina Kûçik û telebê wî ango serokê nû kirin. Li ber her kesekî jî dosyayek hebû. Piştî bixêrhatin û rûniştinê, ji wan dosyana yek dirêjî Serokê nû û yek jî dirêjî mamosteyê wî Kûçik kirin û dest bi civîna xwe ya ku wê li ser qedera kurdan pêk bê, kirin. Piştî axaftinên dûr û dirêj, her yek ji wan bi axaftina herkesî re, wan çavên xwe li ser rûpelên wê dosyaya li ber xwe digerandin. Hinan di berxwe de dikirin himmmmm hin ji nivîs û axaftina wan kêfxweş bûn. Loma carna dimizmizîn û bi rûgeşî li

dosya li ber xwe dinerîn û dixwendin. Ji xwe ê herî kêfxweş jî serokê nû bû. Kî diaxifî wî bi baldarî guhdarî dikir û serê xwe dihejand. Piştî hemî kesên li wir axifîn. Her yek ji wan gotin û nerîna xwe ya ji bona têkbirina tevgera kurdan ku xurt dibû dianîn zimên.

Piştî ku herkesan axaftina xwe qedandin, yekî ji wan ku diyar bû, ew bi xwe ê herî mezin bû. Ji cihê xwe rabû, ji wan herdu dosyên li ber wî yek girt nava destê xwe û berbi serokê nû ve hat. Destekî xwe da milê wî ê rastê bi destê din ku ew dosya di navde bû danî ber serokê nû û got:

-Em hemî karê te ê nû li te pîroz dikin. Piştî demeke dûr û dirêj ku me tu dişopand, niha em hemî ji bona tu karê baş bike, ji te emîn bûn. Tu bi xêr û xweşî hate nava civata xwe ya ji bona parastina komarê ku hatiye damezrandin. Ya serokê nû! te em hemî guhdarî kirin û tu hinekî ji navaroka vê dosyê agahdar bû ye. Kurtasiya gotinê ew e ku em ê bi hevre çawa li ser destê te tevgerên ciwanên kurdan têk bibin? Ez niha vê didim te. Heta hefteyekê ji te re wext. Divê tu wê çend caran bixwîne. Hin xalên wê jî ezber bike. Hefta bê û di civîna dudan ya bi te re em ê plan û projeya têkbirina tevgera ciwanên kurdan, bi hevre û cara dawî munaqeşe bikin. Êdî tê weke serokekî tevgera kurdan ê nû dest bi karê xwe bike.

-Gelek baş e, spas ji bona ku we bawerî bi min anî. Ez jî soz didim, ez ê di karê xwe de tu kêmaniyan nekim û wê her tişt weke we plan kiriye herî serî. Ez ê bi saya we, bi alîkariya dewleta xwe, tevgerên ciwanên kurd têk bibin. Lê gelo wê tevgera ciwanên tirk  çawa be? Ma we ji bona wan jî tu hazirî kirine.

Berpirs vê care herdu destên xwe danî ser herdu milên serokê nû û got:

-Tu qet xeman nexwe. Tevgera ciwanên me hemî di bin kontrola me de ne. Me organîzekirina wan qedandiye. Ji bona me ya girîng têkbirina tevgera ciwanên kurd bi destê yekî ji wan be. Loma piştî demeke dûr û dirêj me bi yek dengî li ser te biryar da. Bila qet xema te nebe. Tenê vê dosyê bigire, here mala xwe, vê çend caran bixwîne. Navaroka wê baş fêr bibe. Hefteya bê êdî em ê bi hevre amadekariya te bikin ku tu weke serokekî tevgereke kurd bikeve nava kurdan û ji bona têkbirina wan dest bi kar bike.

Ew berpirs bi rûyekî xweş û bi ken hate cihê xwe, qurtek ji ava qedeha li ber xwe vexwar. Devê xwe zuha kir, çavên xwe li ser kesên rûniştî gerand û got:

-Hêjano, me bi hevre ji bona têkbirina tevgerên ciwanên kurd, serokekî nû ku wê wan biqedîne erkdar kir. Karê wî û erka wî ya nû lê pîroz be. Ez sipasiya we tevan jî dikim. Civîna me li vir diqede, heta hefta bê divê serokê nû wê dosya ku min daye wî tevî bixwîne û em ê dîsa bi hevre ji bona ku ew dest bi karê xwe bike, hin biryaran bidin.

***

Civîn li gor dilê zilamên dewleta kûr qediya bû. Wan li gor hemî lêkolînên xwe yekî ku pê bawer û wê bikaribe tenê li gor biryar û kiryarên ji wî re têne tev bigere peyde kiribûn. Bi peydekirina wî her çiqasî kêfxweş jî bû bûn, lê dîsa di hin waran de hin şikên wan hebûn. Ji bona hemî şikên xwe bidin alîkî û bikaribin bi her awayî êdî baweriya xwe bi serokê nû ê kurdan bînin, du biryarên asasî dan. Ew herdu biryar jî hiştin heta civîna bê. Ji ber ku di civîna bê de wê serokê nû, wê dosya ku wan dabûnê bixwîne, nerîn û dîtinên xwe ji nû de ji hevre vekin.

Rêvebiriya gel û xwedî li dewleta xwe derketandin, ne karekî hêsan e. Loma di karên weha de kesekî ji sedî hezarî, baweriyê pê neynin nikarin bixin nava xwe. Bi karê xurtkirina dewleta xwe û têkbirina hemî hêzên li dij dewleta xwe têk bibin. Her çiqasî wan li ser du biryarên ku wê ji serokê nû re bêjin, hiştibûn civîna bê. Ji xwe ji bona serokê nû jî ev ne zêde girîng bû. Ya girîng ji bona wî ew bû tiştên dixwest li gor dilê wî pêk bê, bû. Êdî wî dizanî bû dê çi bike.

Serokê nû li gel dosya xwe, hate mal û berî ku westa xwe bigire, hinekî bêhna xwe veke, destbi xwendina wê dosyê kir. Tiştên ji bona wî girîng ew bû ku gelo di wê dosyê de çi hebû? çi nivîsî bû? dê kar û erkên wî çi be?

Ji ber bê sebiriyê û ecelekirina wî, hema rûnişt, dosya di destê xwe de vekir û dest bi xwendina wê kir, dest bi xwendinê kir.

”Serokê nû!!!

Berî her tiştî em bi xêrhatine te dikin ku tu weke parêzgerekî vê dewleta xwe ya ku bi hezar zehmetiyan hatiye damezirandinê, ye. Me piştî di derheqê te de gelek lêkolîn kir, hemî jiyana te û ya malbata te baş fêr bûn. Nerîn û dîtinên te jî bi firehî lêkolan. Em gihiştin wê baweriyê ku êdî tu jî dikare bibe, zilam, berpirs û karmendekî dewletê. Heta ku ev komar hate damezrandin, gelek xwîn, şer û kuştin li ser wê çê bû ye. Ev dewlet ya gelê tirk e. Herkesên li ser vê erdnîgarê dijîn divê bibin tirk û ji bilî zimanê tirkî divê tu zimanên din tunebin ango nemînin. Dema herkesan bi tirkî qise kirin êdî ew dikarin bi rehetî bibin tirk jî. Niha li vê komara me, ya ku hemî mafên tirkan tê de misogere, ji bona ziman û pêşketinên gelê tirk çi lazimî hebe, bê taswas dê pêk bê. Lê li aliyê din ku hin ji xwe re dibêjin em kurd in û dest bi karê perçekirina welatê me kirine, ji bona deweletê xeter in. Ji ber ew dikarin bibin sedem ku wê ji xelkên din re jî bibe rêya xwe bi xwe azadkirinê. Niha me hemû xelkên din ango yên ji xwe re digotin ku em ne tirkin. Kirin tirk û niha hemî jî bi kêfxweşî li komara xwe dijîn û xwedîtiyê lê dikin. Lê me çi kir jî, heta niha kesên ji xwe re dibêjin em kurd in, dawî li wan neanî. Zimanê wan bi wan neda ji bîr kirin. Heta ku ew bi zimanê xwe qise bikin, em ê jî nikaribin wan bi temamî ji holê rakin.

Niha tevgerên wan ji nû de destpêkirîye û xortên wan ji bona welatê me perçe bikin tevgeran ava dikin. Me weke dewlet heta niha hemî tevger û serîhildanên wan bi kuştin û wêrankirinê, bê deng kiri bûn. Lê niha rewş guherî ye û êdî em jî nema dikarin li gor kêfa xwe wan bikujin. Bavêjin zîndanan û wenda bikin. Ji ber ku êdî hin zagonên navneteweyî ku me jî bi xwe îmze kirine, dest û nigê me girêdane. Em naxwazin komara me raste rast bibe muxatabê wan kurdên dixwazin li hember me şer bikin û welatê me perçe bikin. Me biryara ku em li ser navê wan, tevgerekê ava bikin, daye. Lê divê piraniya rêvebirên wê, zilam an pêgirtên me bin. Piştî damezrandina tevgereke li ser navê kurdan û ew ya me bi xwe be, me biryar da ku te bikin serokê wê. Ji ber ku em êdî bi te bawer in ku tê bi piştgiriya dewletê, bikaribe ji bin vî barî, bi rehetî rabe.

Bila qet tirsa te tune be. Dewleta te heta ku tu li gor projeyên wê bimeşe dê li pişta te be. Tu çi bixwazê dê ew ê bide. Em dizanin ku tu ji kurdan hez nake. Em dizanin ku heta niha herkesan henek û yariyên xwe bi te dikirin. Em dizanin ku ji alî bavê xwe û civata tu tê

de dijî, tim te kêm dîtinê. Lê em dizanin ku tê bi alîkariya dewleta xwe, bi serfirazî ji bin vî barî derkev e. Ji bona ku tu bi karê xwe ve rabe, me sê rê ango sê plan amade kirine, niha em ê bi te dest bi plana ewil bikin. Heger tu di vê plane de bi serket, êdî pêwîstiya ku em planên din pêk bînin tune ye.

Karê te ê ewil û destpêkirina proja ewil, wê ev be.

Dive em li gel çend kesên bi eslê xwe tirk û çend kesên ku kurd bin, lê ew jî bi me re kar dikin, ji bona vî karî amade bikin. Divê em bi navê kurdî partiyekê vekin.

Asas û rêveçûna vê partiyê divê weha be.

Ev partî wê li ser asasê derewan bê damezrandin. Divê derewên weha bê kirin ku ew derewana bi destê vê partiyê weke rastî bi civatê bêde qebûlkirin.

Ev partî divê li ser asasê kûrkirina problemên heyî, karê xwe bike. Weke dema di nava du axa an eşîrên Kurdande nakokî hebe, hûnê li gel yekê cihê xwe bigirin, li ya din bixin. Piştî têk çûna wê, rêya ku hûn ya din jî têk bibibin, bibînin. Hinan ji wan jî bikujin bixin hustiyên hinên din, bi derewan wan berra ber hev bidin.

Hûnê  weke partiyeke kurd û nehênî kar bikin, helbet di nava kar de hin ji rêvebirên hin partiyên weke we ne jî nasbikin. Navê wan bidin me ango dewleta xwe da ku em jî bikaribin wan bigirin an ji holê rakin.

Heta hûn weke partî bikaribin divê adet û toreyê kurdan xerab bikin, nehêlin kurd zimanê xwe biaxifin û bi adetên xwe tevbigerin. Heta ji destê we bê divê wana xerab bikin.

Hûnê weke partî, ji hin berpirsiyariyên partiyên din ku gelekî zîrek û bi kurdbûna xwe bi wate ne, bikujin û wê bixin hustiyên hin partîyên din da ku ew bi hevkevin.

Ji bona bê rûmetkirina kurdan divê çi lazim be hûn wê bikin. Mirovên bi aqil, zana, wêrek û têgihiştî bi awayekî bixin nava xwe, bikin xwedî berpirsiyar, dûre ya em weke dewlet ya jî li ser navê ku ew bûne xaîn û ajan weke partî hûnê wan bikujin.

Heta hûn bikaribin, sembolên kurdan ku weke temsîla wan dikin, yek bi yek ji holê rakin. Mesele tu caran divê wê ala ku kurd dibêjin ala me ye, bi kar neynin. Ji dêlva wê bi rengên weke wê ji bona alê bidin çê kirin û heta ji we hat ji dêlva ala kurdî ya xwe bi kurdan bidin qebûlkirin. Heta ji we hat divê hûn nehêlin kurd dîroka xwe bixwînin û bizanbin. Dema hûn xurt bûn bi kurdan bidin qebûlkirinê ku her tiştî ji we de destpê kirî ye. Bila kurd dîroka te weke ya xwe bizanibin.

Divê hûn weke partî civatekê bi xwe, bi tevger û kiryarên xwe mezin bikin ku ew civat tenê partiya we nas bike. Wê demê asimlekirina wan dê rehet be. Weha lê bikin da ku dema we ji gel çi xwest, bila ew jî bi rehetî bide partiyê.

Her kesên zana û jêhatî bixin nava xwepêşandan, meş û çalakiyên vekirî û eşkere. Di van çalakiyan de bi saya zilamên xwe, em ê provakasyonekê amade bikin û bi vê em ê wan kesana di wê xwepêşandanê de ya bikujin ya jî bigirin û di girtîgehên xwe de bi perwerdayiyekê ku ew jî ji dewletê re kar bikin, perwerde bikin. Em ê bi tirs û xofê li wan weha bikin ku bi partiya te re kar bikin. Dema kesên weha ketin nava kar, heta ji te hat, kar pê bide kirin. Te dît êdî bû weke sembolekê, bû hezkirê gelê xwe, bi awayek em ê li gel hev wî/wê bikujin û li ser navê wî/wê hûnê jî propaganda xwe bikin.Yanî kesên bêne kuştin wê ji bona partiyê bibe malzemeya propagandayê, da ku partî xurt bibe. Lê karê serekî ku divê partî bike, bi kuştinê dest pê bikin…

Serokê nû, him dixwend him jî dikeniya û xwe bi xwe digot: ”Tu dibije qey min gotiye û wan jî nivîsî ye. Çawa fêmkirine ku ez jî weha û heta ji vê bêtir difikirim ku bînim serê kurdan.”

Belê, serokê nû hêdî  hêdî, rêz bi rêz dixwend û her ku dixwend li ser wê jî difikirî. Bi vî awayî hemî dosya xwe di yek carê de xwend. Gelek tiştên ku divê bikira hebû. Dewletê kar û berpirsiyariyeke nû dabû wî. Ev li gor dilê wî jî bû. Loma çend carên din jî ew dosya xwend keniye û dîsa xwe bi xwe got: ”De baş e kurdno, êdî xelasiya we ji destê min tune ye. Ez ê çi bînim serê we, wê dem û zeman rê bide.

Dosya xwe girt, weke qurana pîroz maçî kir, ew dosya maçî kir, li eniya xwe xist. Xiste cihekî ewle ku kesekî din nikaribe bibîne. Û li benda roja civîna ku wê biba ma.

# -15-

Mehek ji leşkeriya Bênav re mabû, ew li gel çend hevalên xwe ê leşker û serbazekî xwe, li mala bavê Filîzî bûne mêvan. Da ku ji Bênav re Filîzê bixwazin. Ji xwe hemî amadekarî hatibû kirin. Tenê ji bona adet û ûsil jî pêk bê ev kirin.

Di bin Çadira bavê Filîzê de hazirî, çûyin û hatineke bi kelecan hebû. Ji ber ku wê qîza wan ji xwe re bizewiciya û hinekî barê wanê sivik biba. Wê rojê jî qet ji wan kesek derneketibû geştê. Ji ber ku dizanîbûn wê ji Qerekolê xwarin ji bona wan bihata.

Dema ku xwazginiyê Filîzê li ber çadira wan hazir bûn, bavê wê derket derve bi xêr hatina wan kir û ji serbaz re got:

-Fermo derbasî hundir bibin.

Berê serbaz, li dû wî jî Bênav û yên din derbasî bin çadirê bûn. Rûniştin û destbi vexwarina çaya ku Filîzê ji wan re anî bû, kirin. Piştî hin gotin û sohbetan, serbaz got:

-Weke diyar e, em ji bona xwestina Filîzê ji Bênav re, li vir in. Bênav leşkerekî qenc û bawerim wê bikaribe li gor adet û toreyê xwe jî bibe mêrê jina xwe û bavê zarokên xwe. Tiştekî ku em zêde bikin tune ye. Piştî leşkeriyê wê Bênav jina xwe bigire û here bajarê xwe. Li bavê Filîzê nerî û axaftina xwe berdewam kir. Îcar gotin ya te ye, Fermo ka tê çi ji me re bêje?

-Ez bi serê xwe daxewaza te qebûl dikim. Ma piştî cenabê te jî heta vir hatiye, ez ê çi bêjim? We çawa xwest bila weha be.

Ji bona ku her tişt ji berê de amade bû. Xwestina Filîzê zêde dom nekir. Piştî vexwarina çaya dudan Serbaz got:

-Spas ji bona van gotinên te jî. Hêvîdarim ku her du ciwanên me wê bi hevre jiyaneke dûr û dirêj, bê astengî û problem li gor qaîde û

nîzamên xwe, bidomînin. De ka em duaya xwe jî bixwînin û bila mesele li vir biqede.

Piştî xwestin û duayê, herdu ciwan jî kêfxweş bû bûn. Serbazê li gel leşkerên xwe  hatibû, rabûn berbi Qerekola xwe ve çûn. Bênav jî hewl da xwe ku bi wan re derkeve lê serbaz li wî nerî û got:

-Bênav tu du rojan bi îzin e. Tu zavayekî nû ye. Van herdu rojên xwe li vir bibihurîne. Ji xwe jj leşeriya te re jî ji mehekê hindiktir maye.

-Baş e mala te ava bî serbazê min. Bila weke te be.

# -16-

Piştî Bênav leşkeriya xwe diqedîne, bi destê xanima xwe, delala xwe Filîza xwe digire û berê xwe dide welatê xwe, cih û warê xwe. Nava heval û dostên xwe. Ew bi tenê çûbû leşkeriyê lê weke du kesan jî li mala xwe vegeriya bû.

Dem û zeman gelek zû dibihûrî û di bihurandina vê demê de Bênav bû bû bavê kurekî ku mirov xof ji çavên wê dikir. Nerîna wî dijwar, tevgera wî ya zarokitî ne dişibiya zarokên din.

Lê kêfa Filîzê û Bênav li cih bû. Ji ber ku ew bû bûn dayik û bav. Piştî hatina zarok, divê wan êdî navek jî li kurê xwe bikirana. Li ser vê zêde ranewestiyan ji ber ku nav ji bona wan ne girîng bû. Lê her çiqasî Filîzê dixwest ku navekî bi tirkî li kurê xwe bike. Ew herdu û malbat li ser navê Sapo li hev kirin. Navê kurê Bênav ê ewil ango nixuriyê dayika xwe bû Sapo.

Ha li wir û ha vir. Koç û gera Qereçiyan, topkirina geşt û dizaya malên xelkê, Bênav û Filîza wî jî bû bûn xwediyê komek zarok. Ew êdî kal û pîr dibûn. Hal, kêf, ger û seyranên wan jî êdî ne weke berê bi kêf bûn. Piştî leşkeriya xwe û ditîna hin zehmetiyan, Bênav jî biryara ku dev ji ger û seyranên weke Qereciyan berde, dabû. Ev fikira ji aliyê xanima wî Filîzê jî hatibû pesinkirin. Ji ber vê biryarê, li gundekî bajarê Rihayê ji xwe re çeneke erd bi perên topkiribûn kirîn. Wan xwestin êdî weke gundiyan bijîn û zarokên xwe mezin bikin. Heta wan bidin xwendinê jî. Bênav di dema leşkeriya xwe de gelek tişt fêr bû bû û dizanî bû dawiya wan weke Qerecitiyê wê weha nedome. Loma dixwest êdî ew jî li cihekî bi cih û war bibe û zarokên xwe mezin bike. Wan bişîne dibistanê da ku jiyaneke xweş bijîn. Bênav û Filîz xanimê li hev kirin ku li gundê bi ser bajar Ruhayê, li gundê bi navê samara ji xwe re erdekî bi çûk, bi pereyekî hindik ku ew jî li gor wan peyde dibû kirîn. Dest bi avakirina xaniyê xwe kirin ku ew jî weke gundiyan li ser erda xwe rûnên û karê ji wan hat bikin û bijîn.

Sapo jî êdî mezin bû bû, dem dema ku bavê wî, wî bişîne dibistanekê hatibû. Bênav dixwest ku zarokên wî bixwînin da ku bi temamî ji navê Qerecitiyê dûr bikevin û bibin gundiyên gundê Samara. Heta ku kar û amadekariyên xwe xilas kirin êdî Sapo jî bû bû heft salî. Loma bavî wî ew li dibistana nêzîkî gundê wan bû, navê wî nivîsî ku ew li vir bixwîne. Piştî hemî amadekariyan û bi vekirina dibistanê, Sapo jî weke zarokên gund dest bi xwendinê kir. Ew ji hemî zarokên gund bi aqiltir bû. Wî hemî dersên xwe bi serfirazî pêk dianî. Mamosteyê wî jî gelekî jê hez dikir. Lê ji ber ku esil û feslê wan Qerîçîbûn, ne gundiyan zêde ji malbata wî hez dikirin û ne jî xwendevanên dibistanê ji wî. Ji ber vê bû ku ew tim bi tena serê xwe dima. Dûre nerî ku weha nabe, dest bi derew û boxtanan kir. Dest avêt karê ku zarokên dibistanê berra berhevdu bide û da. Şer û pevçûn di nava wan de derdixist. Bi wan derew, fen û fûtên xwe ew bû bû sîxurekî bê hempa. Ji ber wan kiryarên wî. Derew û boxtanên wî, weha lê kiribû ku li dibistanê zarok bera ber hev dida û carna wî bi xwe jî li hinan dixist, tim bavê wî jî lêdaneke bi dilê gundiyan û zarokên dibistanê li wî dikir. Her ku bavê wî li wî dida, hêrsa wî bêtir bilind dibû û bêtir derew dikir. Êdî ne tenê zarokên dibistana gundê xwe berra ber hev dida. Car carna bi derew û boxtanên xwe Sapo êdî li gund bû bû bela serê gundiyan. Dayika wî jî gelek caran ji wecê wî de lêdan dixwar. Bavê wî dema hêrs dibû li dayika wî dida û digot: Aha tirk weha ne. Boxtanan dixe hustiyên mirovan, derewan dikin, diziyê dikin. Hema tu çi tiştên xerab bêje dikin. Bi van gotinên bavê xwe, Sapo dibû dijminê wî û hemî kurdan. Ji ber ku wî dizanî bû dayika wî tirk e û bavê wî ji bona tirkbûna wê zêde lêdan lê dikir. Lê sedema lêdana wê ne tenê ev bû. Ew bi xwe jî jineke li jinên gundiya ne li hev bû. Heta ji wê jî dihat nakokî dixist nava jinan. Ji ber gundiyan ji wê hez nedikirin wê jî nikarîbû weke gundiyekê wir bijî. Ji ber vê bû şer û pevçûnên wê ya bi gundiyan re her berdewam bû. Sapo di şert û mercên weha de mezin bû. Lê dersên wî jî ji yên hemî xwendevanan baştir bû. Piştî qedandina lîseyê li bajarê Ruhayê, wî êdî unîwersîte jî li paytextê tirkiyê li Enqereyê qezanckiribû û dixwend.

Lê çi ecêb bû ku tu xwendevanên unîwesîtê jî ji wê hez nedikirin. Diçû ba kê wan nema dixwestin careke din wî bibîne. Ji ber van tevgerên xwendevanan kîna wî ya li hember însanetiyê bêtir bilind dibû. Loma dibû dijminê herkesan. Sapo nerî ku nikare di nava

ciwanên unîwersîtî de bibe xwedî heval. Dest bi çûna komela misilmanan kir. Li wir hinan qîmet danê û êdî ew her roj li vir bû. Lê her di dilê wî de kîna kurdan, xwendevanên ciwan geş dibû. Gelek caran xwe bi xwe difikirî û digot, ”heger rojekê firseteke bi dest min bikeve ez ê qira van kurdan bînim”.

# -17-

Tevgerên welatparêz û şoreşger li tirkiyê û li bakurê kurdistanê xurt, geş û bi hêz dibûn. Ciwanên kurdan yên li metropolên tirkiyê uniwersite dixwendin bi doza gelê xwe yê birîndar ve mijûl dibûn. Munaqeşeyên nava wan û çepên tirkan gihiştibû qonaxa talî. Ji ber ku êdî ciwanên kurdan biryara xwe dabûn ku tevgerên xwe, partiyên xwe, komele û dezgehên xwe bi serê xwe vekin. Êdî fêm kiribûn ku doza wan û ya tirkan ne yek e. Tirk xwedî dewlet bûn û ê kurdan heta vê gavê jî tu tiştekî wan tune bû. Bi serde zordarîya leşkerên wan ya li ser gund û bajarokên Kurdan her roj zêde dibû. Leşkerên diketin nava gundan zilam hemî li meydanê dicivandin zor û zehmetî, êşkence û lêdanên nedîtî li wan dikirin. Li alîkî zordariya leşkerên tirk ya li ser kurdan berdewam bû. Li aliyên din girtin, lêdan û êşkence her ku diçû zêde dibû. Li tirkiye li bakurê kurdistanê ba û bahozeke weha rakiribûn ku êdî çav çavan nedidît. Kî/ê dê çi wextê bêne kuştin ne diyar bû. Endamên dewleta kûr ku didîtin tevgerên ciwanên kurd bi pêş diveke, ji bona pêşî lê girtinê di nava haziriyan de bûn. Li aliyekî din ciwanên kurdan bi xebat û lebatên xwe, tevger, komele û partiyên nû ava dikirin. Dixwestin bi saya wan kurdistanê ji nava lepên dagirkeran azad bike. Êdî ciwanên kurdan hêdî hêdî berê xwe didan gundan, nava karkeran, daîreyên dewletê kî/ê bikarîbana li ku kar ji bona gelê xwe bikirina ew dikirin endam û hevalbendên xwe. Bi wan kar û xebatên xwe, bi wan zanîn û têgiştinên xwe, her hinan ji xwendevan, karker û gundî dikirin hevalbendên xwe. Xebata welatparêzî gelek berfireh bû bû. Teleban ango xwendekarên kurd ketibûn nava gelê xwe û ew ji xewa wan ya şêrîn şiyar dikir. Hema bêjin erkê dewletê li bakurê Kurdistanê zêde nemabû

Şer û pevçûnên di nava gundiyan de bi saya komeleyên ciwanên kurd dihatin çareserkirin. Dermanê derd û êşên gelê wan, li komeleyên wan dihate dîtin. Bi van kar û xebatên ciwanên kurd, hêdî hêdî tirs û xofa leşker û polîsên dewletê ji dilê kurdan derdiket.

Hin partî û tevgerên ciwanên kurd êdî haziriya şerê azadiya gelê xwe dikirin. Hinan jî xelkê xwe perwerde dikirin da ku dema şerê ji bona azadiya gel destpê bike, divê bizanibin wê ji bona çi şer bikin. Her ku tevger xurt dibû, tirsa karbidestên dewletê jî ewqasî zêde û mezin di dibû. Li komeleyên ciwanên kurd li ser gelek babetan semîner û dersên perwerdahiya ku miletê bindest dê çawa li hember dagirkerên xwe şer bikin, xwe û gelê xwe azad bikin, didan. Li gel vê li piraniya komeleyan dest bi qursên zimanê kurdî hatibû kirin. Êdî di nava bajaran de kontrolkirina polîsan, li gundan zilma leşkeran kêm dibû. Her çiqasî ciwanên kurd bê westan ketibûn nava xebata ji bona azadiya gelê xwe jî, lê ji aliyê din ve dagirker û aqilmendên wan jî di nav kar û xebatê de bûn ku dê çawa van tevgerana têk bibin. Her çiqasî gelek zilam û pêgirtên xwe di nava hin tevgerên kurdan de bi cih kiribûn jî, vê têr nedikir û bi tirsbûn ku di demeke nêzîk de dikare şoreşeke kurdan destpê bibe.

Lê hezar mixabin hay û baya ciwanên kurdan ku bi wê pêşveçûnê serxweş ketibûn, nizanibûn ku dagirker ji wan bêtir û zûtir di nava tevgerê dene da ku wan têk bibin. Ciwanên kurd. bê tecrube bûn. Bi rêya îdeolojiyan tevgerên xwe damezrandibûn. Li ser navê wan îdeolojiyan, tim di qirika hevdu de bûn. Munaqeşeyên wan dan û stendinên wan î bi hevre bêtir li ser îdeolojiyan bû ku ew bi zanetî ji teref Kemalîstên ku digotin ”em çep in”, ketibû nava ciwanên kurdan. Ew bi zanetî hatibû kirin da ku Ciwanên kurd dîroka xwe fêr nebin. Di dîroka wan de çi bû bû nizabûn. Serokên tevgerên xwe yên li hember dagirkeran ku şerê azadiya gelê xwe dabûn nas nekin. Ji ber dagirkeran baş dizanîbûn ku miletê dîroka xwe nizanibin, wê nikaribin zû bi zû xwe azad bikin. Bi vê bîr û baweriyê, aqilmend û karbidestên dagirkeran di nav kar û xebatê de bûn. Kar û xebatên dagirkeran yên serekî ji bona ciwanên kurd bû. Dewletê hewl dida û dixwest ciwanên kurd zimanê xwe jî bir bikin. Orf û adetên xwe biguherînin û nasnekin. Ji ber ku ji bona miletekî ya herî girîng ev bûn. Piştî têkçûna vana êdî ew milet dê weke milet nemabana. Kemalîstan ev ji dîroka bapîrên xwe ya dema Împaratoriya Alî Osmanî dizanîbûn.

Li Tirkiyê rewş hatibû wê qonaxê ku êdî ciwanan, xwendevanan ango teleban dikarîbûn hin kar û xebatên xwe yên bi dizî, di qada eşkere de pêk bînin. Dibe ku ev jî bi zanetî hatibû kirin. Ji ber ku

piştî rêya xebatên legal ku ciwan bikaribin karê xwe bikin, vekiribûn an hatibû vekirin. Her tevgerekê li gor xwe komele û dezgehên xwe yên legal vekirin. Di wan komeleyan de gelek karên hêja dihatin kirin. Di piraniya wan de semîner û qursên li ser zimanê kurdî dihat dayin. Ciwanên endamên wan komeleyan karên xwe bêtir xistibûn nava dibistanên li kurdistanê. Di wan dibistanan de roj tunebû ku di nava ciwanande şer pevçûn, munaqeşe pêk nehatiba. Hemî munaqeşeyên wan, xwendin û zanyariyên wan bi zimanê tirkî dihat kirin. Ew ziman ji bona tevan bû bû zimanê hevfêmkirinê. Ji ber ku pirtûkên li tirkiyê dihatin çapkirin û belavkirin hemî bi zimanê wan bûn. Di gelek pirtûkên ku dema ew kesên tirk ku ew werdigerandin zimanê xwe, heger nav û tiştên li ser kurdan di wan de hebana ew jê derdixistin û pirtûk weha çap dikirin. Yanî karbidestên dewletê di her qad û warî de li ser kar bûn da ku navê Kurdistanê zêde belav nebe û heta bikaribin zimanê wan jî ji wan bigire û bide ji bîr kirin.

Ji ber tevgerên Kurd ku bi destê ciwanan dihate meşandin, nû bûn. Li ser asasê îdelojiyan, xwe bi tevger kiribûn. Lê dîsa jî van tevgerana karên baş, xebatên hêja û çalakiyên delal dikirin. Şev û şahî çê dikirin, şano û şanogeriyên li ser perçebûna welatê xwe, lê bi zimanê tirkî pêşkêşî gelê xwe digirin. Her rojê li gundekî bûn, di nava gundiyan de kar û xebat dikirin ku ew jî tim li hev bin. Li ser bawriya kurd bibin xwedî dewlet, kar û xebatên fireh dihatin kirin. Her wan ciwanan behsa dewleta kurdî dikirin. Gelek gundiyan ev weke ne karekî pêkan didîtin. Lê bi îşareta serê xwe weke bêjin erê bila weke we be, dihejandin. Her çiqas hemî kar û xebatên ciwanan bi zimanê tirkî jî bû, ev rewş hingî pêşve çûbû êdî dagairkeran hesabê xwe dikirin û dixwestin pêşî li vê bigirin. Lê çawa? Aha pirsa wan ya çawa bûnê, piştî xwendina arşîvên Împaratoriya Alî Osmanî û çend dewletên din ku wan çawa pêşî li tevgerên di nava welatê xwe de, girtibûn, baş fêr bû bûn. Fêrbûna wan jî li ser asasê damezrandina tevgereke ji kurdan, lê bi rêvebiriya dewleta kûr û ji hin ciwanên kurdan pêk anîn bû. Li alîkî zilamên dewleta kûr ji bona tevgereke kurd lê ya wan be, li zilamekî digeriyan. Hewl didan zûtirên demê vê daxwaza dewleta xwe pêk bînin da ku bi saya wê pêşî li bûyer û kiryarên mezin bigire. Li gor vê, tevgera zilamên dewleta kûr, lêkolîn, rapor û hemî xebatên wan li ser Serokê nû bû bû yek. Li gor hemî lêkolînan biryara wan ew bû ku dê nikaribin ji wî baştir kesekî din peyde bikin. Loma wan jî bi hemî raporên xwe

diyarkirin ku berê çend carekî bi wî re qise bikin, bêtir nas bikin. Zilamên dewletê hemî amadekariyên xwe qedandibûn, biryara ku êdî wî bixin nava xwe, dabûn. Lê berî ku sedî sed jê emîn bibana divê wan ew ji komela misilmanan derxistana. Bibirana avaya dewleta kûr li wir ew perwerde û hazir bikirana ku ji bona wî partiyeke bi navê kurdî lê ya dewletê ba vekirana. Li gor vê biryarê serokê nû dîtin. Ji komela misilmana dûr xistin, li avahiya Îstîxbaratê destbi perwerdahiya wî kirin, piştî ku pê emîn bûn xistin civîna ewil ya biryara li ser navê dewletê didan. Li wir dosyak dirêjî wî kirin ku ew jî êdî dest bi karê xwe bike. Ji bona bê kêmanî û bi hazirî bibe serokekî kurdan ê nû perwerdekirina wî Z.Kûçik dabû ser xwe.

Li gor vê jî wan zilamê xwe peyde kiribûn êdî dor hatibê ku li ser destê zilamê xwe, vekirina tevgereke weha û destavêtina wê ya kar mabû. Di vê rêyê de jî gavên baş avêtibûn, rojên damezrandineke weha bi hejmar bû.

Lê wan ciwanên xwîngerm, şîr helal, çalak û xebatkarên gelê xwe jî bi hemî pêşketinên doza gelê xwe kêfxweş bû bûn. Bi van kêfxweşiyan êdî mabû wê kîjan tevger li bakurê kurdistanê bibe desthilat, kar dikirin. Te digot belkî wan kurdistana xwe azad kirine, mirovên xwe gihiştine demokrasiyê, aramî û rehetî li welatê wan gelek xurt û bi pêşve çûye…

# -18-

Şêroyê ku bû bû gula hemî gundiyan û gundiyan jî qedr û qîmeteke mezin didanê, êdî weke şiwirmendekî gundê xwe jî dihate nasîn . Li gundê xwe dibistana seratayî, li bajarê Mêrdînê jî orte û lîse qedandibû. Xwendevanekî pak û delal jê derketibû. Bavê wî Ehmo ji bona ku kurê wî bixwîne çi lazimba texsîr nedikir û nekiri bû. Ji ber ku ew jî ne yekî feqîr bû. Mal, mulk, pez, dewar û perên wî têra her tiştê wan dikir. Loma ji bona Ehmo tenê ma bû ku kurê wî Şêro bixwîne. Weke gotina gundiyan digot in: ”bila ew bibe zilam û weke me gundiyan rebeniyê û hêsiriyê nebîne”. Hemî gundiyên gundê Xezebê dixwestin ku kurên wan bixwînin. Lê ev îmkan û derfet li ba herkesan tune bû. Gelek xortên gundê Xezebê dixwestin bixwînin, lê îmkanên wan î aborê dest ne dida. Piraniya zarokên gund, piştî xwendina seratayî êdî li gel bavê xwe dest bi karê malê û îdara malbatê dikirin.

Ciwanên herî zêde ku hejmara wan weke tiliyên destan bûn, lîse qedandibûn. Lê Şêro yê ku bavê wî, ji bona ew bixwîne dikarîbû hemî malê xwe ji bona wî terxan bikira. Ango bifroşe û pê kurê xwe bide xwendinê. Loma wî tim ji kurê xwe re digot:

-Kurê min tu ji bavê xwe re bixwîne. Ez ê jî heta ji min bê te li bajarê mezin ê dewletê bidim xwendin. Li te xwendin û li min jî pere û şandin.

Ev gotina bavê Şêro bi xweşa wî jî çû bû. Ji ber ku hêrsa xwendinê bi wî re jî hebû. Piştî lîseyê, Şêro di ezmûna xwe ya uniwersîtê bi serketibû û unîwersîteya doktoriyê qezenc kiri bû. Vê qezanckirina wî weke roja ji dayika xwe bû bû, kêf û şahî xistibû nava malbat û gundê Xezebê.

Dema Şêro dest bi uniwersîteya xwe kir. Li gel xwendina xwe, hêdî hêdî serê xwe jî bi mesela Kurd û Kurdistanê re diêşand. Ji ber ku dema bi çûk bû gelek caran leşkeran êrîşî ser gundê wan û yên

derdorê dikir. Şêro bi çavên xwe ditibû û bi guhê xwe bîhîsibû bê wan leşkerana çawa zilm û zordarî li gundiyan dikir. Bê çawa li zilaman didan û gelek ji zilamên lêdan dixwarin, ji heşên xwe diçûn. Çi dema leşkeran êrîşî dibirin ser gund, hemî gundî li meydana gund topî ser hev dikirin. Henek û tinazê xwe bi wan dikirin. Lêdaneke weha li wan dikir ku piştî çend rojan jî bi ser xwe ve nedihatin. Gelek caran zilam li meydana gund tazî dikirin, mêraniya wan bi destê jinên wan girê didan û digot in:

-De vî benî bikşîne heta ku ev ji mêranî de bikeve.

Helbet vana ne karê aqilan bû û van bûyerana ne tiştên baş bûn. Ji bona kurdan şermeke mezin bû ku pîrekên wan, wan di vî halî de didîtin. Lê ji ber ku dagirker û karbidestên dewletê êşkenciyên li gundiyan dikirin, ne dihatin ser. Her dixwestin hemî zilamên gund bê şexsiyet jî bikin. Pir caran pisîtî bi wan didan xwarin. Biketana kîjan gundî, rojekê seran ser karê leşkaran ev bû, bi vê zilm û zordariyên xwe dixwestin zilaman bê şexstiyet û jinan jî bitirsînin da ku rojekê doza tiştekî li wan nekin. Gelek caran serbazên leşkeran weha digotin:

-Em dibîhîzin ku hin ji gundê we, dibêjin em ne tirk in. Hin jî li dij vê dewleta ku hûn bi saya wê hene derdikevin. Binerên û baş guhdarî bikin. Ji vê dewletê mezintir dewlet tune ye, Kî bixwazin li dij vê dewletê derkevin, wê tune bibin. Ji ber vê dibêjim nebe nebe hûn rojekê rêya xwe şaş nekin û nebin mêvanê qerekolê. Heger hûn bûne mêvan jî dê çi were serê we, divê ji niha vê bizanibin.

Şêro çavên xwe bi zilma leşkerên dewletê vekiri bû. Gelek caran ew jopên li zilamên gund diketin, hin caran li nav serê Şêro jî didan. Şêro hê bi çûkaniya xwe de li hember tirkbûn û zilma wan leşkeran serî hildabû û tim xwe bi xwe digot: “Heger rojekê îmkan bikeve destê min ez ê leşkerekî jî sax nehêlim.”

Şêro li gel xebatên dersên xwe, hin caran jî diçû komeleyên ciwanan tirk û dema dibihîst ku komeleyên ciwanên kurdan jî hene, li wan jî dibû mêvan. Bi vî awayî him Şêro unîwersîta xwe dixwend, him jî xwe ji tevgerên ciwanên kurd qut nedikir. Wî jî weke gelekan bi seredana komeleyên ciwanên çep yên tirk dest bi welatparêziya xwe kir. Munaqeşeyên di nava wan de guhdarî dikir. Bawer kiri bû ku hemî çepên ciwanên tirk jî li dij doza kurdan e. Ji ber ku di hemî

munaqeşeyên wan de tu caran navê kurd û kurdistanê derbas nedibû. Derd û êşa wan, xebat û lebatên wan ew bû ku demokrasiyê bînin welatê xwe û di nava vê demokrasiyê de wê mesela hemî netew û kêmneteweyan bihata çareserkirin.

Lê şêro weha nedifikirî wî bêtir dixwend û dixwest mesele netewan fêr bibe. Dixwest fêr bibe ku çima hemî gund û  gundiyên kurdistanê her roj di bin potînên leşkeran de dinaliyan. Wî gelek bûyer û serpêhatiyên ku leşkeran çawa li gundiyan didan, zilm û êşkence li wan dikirin, dîtibû û guhdarî kiri bû. Vana hemî di serê wî de bû bûn weke serêşeke mezin û ew diêşand.

Bi van fikir û Ramanan, wî biryar dabû ku êdî nere komeleyên ciwanên tirk. Ji ber ku li gor wî wan tu çareserî ji problema kurdan re nedianîn. Hêdî hêdî çavên xwe li wan komeleyên ciwanên kurdan digerand ku gelo wê kîjan ji wan bikaribe doza gelê wî bi rêve bibe û rojekê gel azad bike.

Vê xebat û lebata Şêro bala piraniya kurdên li Enqereyê  dixwendin dikşand. Ji ber ku ew yekî zana û jêhatî bû, çalak û bi aqil bû. Hemî li dû wî bûn da ku wî bikin endamê komele an rêxistana xwe.

# -19-

Dem, roj û wext ew bû ku êdî Serokê nû ew dosya ji bona wî hatibû dayîn, xwendiba û bi wê jî beşdarî civîna dudan ya li gel zilamên dewleta kûr li dar bixistana da ku wî êdî dest bi karê xwe bikira.

Rewş û xebatên welatparêz û demokrat ên kurdan hingî pêşve çû bû ku êdî karbidestên dewleta kûr ketibûn nava tirsa ku êdî wê nikaribin pêşî li wan bigire. Ji ber wê bû ku wan jî hinekî dilezandin. Dilezandin da ku rêxistina xwe, ya bi navê kurd û Kurdistanê damezirîne. Ew bikeve nava tevgerên heyî. Ji bona bikaribe bi alîkariya wê pêşî li tevgerên ciwanên kurd bigire.

Roja civîna dudan ya dewletê bû ku wû bi serokê nû re li darbixistana. Serokê nû bi hemî hazirî û amadekiriyê, bi kêf ji mal derdikeve û berê xwe dida avahiya ku wê jiyana wî biguheriya. Wê avahiya ku ji bona parastina dewletê biryarên girîng lê dihatin girtin. Li wê avahiya ku qedera deshilat û gelên din diyar dibû. Wê avahiya ku hemî nivîs û dosyayên ku kêmneteweyên li tirkiyê, çawa xilas kiribûn. Li wê avahiya ku niha wê ji kurdan serokekî nû erkdar bikirana û ji wî re partiyek li ser navê kurdan vekirina. Ji bona wî jî hemî daxwazên deweleta kûr pêk bianiya. Ji xwe ev kar jî tam li gor dilê Serokê nû bû. Ne civatê qîmet dida wî û ne jî hevalbendên ji dibistana sereyatî û heta uniwersîtê qîmet û rûmeta wî digirtin. Her kesan jê fêm kiribûn bê ew yekî çawa derewçîn û boxtan cî ye. Loma kesan zû bi zû xwe nêzîkî wî nedikirin. Her wî jî firsetek weha dixwest ku bikaribe tola xwe ji civatê û kesên ji wî hez nedikirin hilaniya. Dema Serokê Nû derket ber deriyê mala xwe. Bi kêf li wî alî û li vî alî nerî, dosya wî ya sor ji bona ew baş wê bixwîne, dabûnê, di destê wî ê çepê de bû. Çend carên din li dora xwe nerî û xwe bi xwe got: ”Hazir bin, kurdno, hazirbin şoreşgerên tinazê xwe bi min dikin û min naxin nava xwe, hazir bin. Ez têm û ez ê qire we tevan bînim. Aha ê min dewlet li pişta min e, lê ê we? hêsîr û feqîrno”.

Bi gavên asasê berbi rawestgeha texsiyan ve çû, li yekê siwar bû û berê xwe da wê avahiya ku wê îro hemî jiyan û qedera wî biguheriya. Wê biçûya wê avahiya ku tiştên ew li ezmên lê digeriya hatibû ber lingên wî. Ma êdî wî çi dixwest? Li gor tiştên di wê dosyayê de nivîsî bûn û heger wî karê xwe weke dihat xwestin bi rêve bibira. Ew ê biba serokê kurdan û wû biba mezinekî ji tevgera kurdan. Vê mezinahiyê jî ji bona ku ew jî parastina dewletê bike, bû. Li texsiya ku ew lê siwar bû bû, hinekî dûrî wê avahiyê sekinand, heqê rê dirêjî sifêr kir û got:

-De bi xatirê te.

Ji roja ewil de tedbîra xwe girtibû. Loma wî nexwestibû ku bi texsiyê heta ber deriyê avahiyê here. Hinekî dûr sekinand, jê peya bû û kete rê berbi cihê civînê meşiya. Meşiya lê di serê wî de jî hezar pirsên ku wî bi xwe jî nikarîbû bibersivanda hebûn. Bi van fikir û ramanan kete hundir, nobedarê ber derî jî ew naskiri bû. Loma ew zêde varneqiland. Pêşkêşî qatê dudan û oday fireh ku îro di tevahiya jiyana wî de, girîngtirîn roj e, kir.

Dema kete odê dît ku tenê çend cih vala mane. Ew jî berbi kursiya ku navê wî li ber bû rûnişt. Xêrhatin dane hev. Piştî bêdengiyek çend deqîqeyan (xulek), derî vebû û camêrê herî mezin ku weke dihat xuyakirinê ku ew ê mezin bi xwe ye. Du kesên din jî li kêleka wî bûn. Ew jî rûnişt û herduyên din derketin derva. Hate xuyakirin wana parêzgerê wî bûn. Piştî ew li cihê xwe rûnişt. Xêrhatin da hemî kesên li wir. Bi nermî, germî û aramî dosya ber xwe vekir û dest bi axaftina xwe kir:

-Gelî camêran, (got û li çavên serokê nû nerî û domand). Em îro li vir civîyane ku bikaribin tevgerên ciwanên kurd têk bibin. Ji bona vê jî me li gel hemî pêşniyaran û bi yek dengî, ji bona vî karî serokekî nû destnîşan kiri bû. Ji bona ku ew jî bi kar û erkên xwe ve rabe, me di civîna berê de dosyak dabû wî. Heta vê civîna ew wê bixwîne û bêje ka ew ê bikaribe bi karekî weha ve rabe an na. Niha em li wî guhdarî bikin, ka bê wê ji me re çi bêje. Fermo serokê nû. Got û li cihê xwe rûnişt.

Hê ew kêfa ji serê sibê de li ser rûyê serokê nû veniştibû, dixuya. Bi wê kêfê ew bi baldarî ji cihê xwe rabû û got:

-Berî her tiştî spasî we tevan dikim ku we bawerî bi min anî û karekî weha pîroz diyarî min kir. Ez naxwazim zêde qise bikim. Lê tiştên we xwestine hemî li gor dilê min in û ez ê bi alîkariya dewleta xwe, bikaribin bi rehetî ji bin vî barî derkevim. Helbet kar dê ne tenê ez ê bimeşînim. Ez ê li gor pêşniyar û bi alîkariya we bi erkê xwe ve rabin. Ez ê ji bona xurtbûna dewleta xwe û têkbirina hemî hêzên li dij wê tekoşîneke bê emsal bidim. Bila qet şika we di virde tune be. Ez ê weke taşaronekî dewleta xwe ku berpirs çi ji min bixwazin ez ê wê pêk bînim. Heger di nava kar de kêmanî an şaşiyên min çê bibe, divê hûn bê ku wext derbas be, min agahdar bikin. Gotina min ya talî ev e ku hûn çi ji min bixwazin ez ê wê pêk bînim, bê ku tiştekî din bifikirim. Fermo gotin ya we ye. Got û bi kêf li cihê xwe rûnişt.

Yekî din ji cihê xwe rabû û got:

-Ew plan û projeya ku me bi hevre li ser biryar dabû niha amade ye û li ber destê we ye.  Niha rewş ne weke berê ye û êdî em nikarin hema rast e rast kurdan bikujin û bavêjin zîndanan. Ji bona kuştin û zîndankirina wan divê em hin sedemana peyde bikin da ku bê serêşî em karê xwe yê ji bona tunekirina tevgerên ciwanên kurd pêk bînin.

Ji bona wê jî me weke berê jî li gel hev qise kiribûn, ew jî bi alîkariya partiyeke li ser navê kurdan û serokê wê kurd lê pêgirtê me be, dibe. Ji bona wê jî me bi hevre li ser ku em Serokê nû bikin serok û ji wî re partiyeke bi navê kurdî vekin, biryar daye. Asasê vekirina vê partiyê weke di dosyên ber we hemiyan de jî heye. Lê dîsa ez ê bi çend xetên qalind vê vekim.

Divê nave vê partiyê bi kurdî be û ev nav berê nehatibe bi karanîn

Divê ev partî bi xwînê destbi karê xwe bike. Ango bi kuştinê derkeve ser rê, weke wê şoreşekê bike, xwe rê bide.

Bingeha vê partiyê kar û hemî xebatên wê divê li ser asasê derewan bê afirand.

Divê ev partî dest bi kuştina kadroyên tevgerên din bike. Rêyên vê jî gelek in. Em ê li ser wan jî bi hevre munaqeşe bikin.

Ev partî divê di destûr û bernameya xwe de bêje ku çi tevger, partî, axa û beg li pêşberî şoreşê bin, divê ji holê bêne rakirin. (Li dij şoreşê yanî li dij komara me be, lê bila yên din weha bizanibin).

Kadroyên partiyê divê her roj bi partiyên din re bikevin munaqeşeyan ji bona rêvebir û kadroyên partiyên din bêne destnîşankirin. Dûre kuştin an jî zîndankirina wan, wê karê me be.

Heta ku ji partiyê bê divê kesên zana û jîr bikin endam kar bi wan bide kirin, dema dît ku gelekî bi pêşve çûn, ango hatin hezkirin û pesinandin. Divê bi rêyekê ew bêne çareserkirin. Kuştin an zîndankirin.

Gelek kesên ku endamê partiyê bin û dema me dît ku ji bona dewletê bi zerar in. Di meş û xwe pêşandanan da, em ê provakasyonan bikin, di nava wê provakosyonê de bikaribin bi rehetî wan bikujin.

Divê partî bikaribe piraniya hunermend, nivîskar û siyasetmedaran di nava xwe de kom bikin û heta mecal çê bû wan bê rûmet bike. Bi vî awayî kesên bi rûmet wê kêmtir bibin.

Ji bona avakirina vê partiya, me biryara deh milyona dolar daye. Ev dikare kêm an zêde jî bibe, ne xem e. Em ê li gor pêvajoyê bimeşin. Ev kar hemî wê li ser navê partiyê bêne meşandin.

Ji bona serokê nû qet şaşiyan nekin wê prof. Z. Kûçik wî perwerde bike. Carna nehênî û carna jî wê bi eşkereyî pê re be.

Ya talî, ji bona em ji hemî karên ku wê bêne kirin piştrast bin, divê em Buran Balkan jî bidin ba Serokê nû. Di eslê xwe de ê desthilat wê Buran bi xwe be. Lê hemî kar wê bi navê Serokê nû bê meşandin. B.Balkan bi eslê xwe tirk e, loma nabe ku navê wî derkeve pêş . Lê serokê nû Kurde û di virde tu astengî tune ye. Ji ber hemî kar wê li ser navê wî bê meşandin. Em ê weke dewlet bi hemî îmkanên xwe li pişt wan bin. Çi lazimî hebe em ê pêk bînin. Lê vaya serokê nû jî di nava me de ye. Divê ew qet û qet ji gotina B. Balkan dernekev e. Ew xeta sor e. Dema ew vê pêk neyne ew jî diqede.

Dosya xwe hêdî girt. Li kesên rûniştî û li serokê nû nerî û got:

-De fermo êdî gotin ya we ye. Her yek ji we jî nerîn û gotina xwe bêjin da ku em îro vî  karî biqedînin. Ji ber ku em hinekî dereng jî mane. Axaftina xwe qedand û li cihê xwe rûnişt. Vê care serokê nû ji cihê xwe rabû û got:

-Spas ji bona van gotin û pêşniyarên te. Min bi xwe jî ne carekê çend caran ew dosya ku we dabû min, xwend. Tiştên tê de nivîsandî hemî jî li gor dilê min in. Bawer bikin weke min bi xwe ew nivîsî bin. Ez ê bi xwe li gel hemî pêşniyarên ku hûnê ji bona min bikin, tim amade bim. Hûn çi ji min bixwazn ez ê, wê pêk tînim. Roja ku min karê xwe weke tê xwestin pêk neanî an ji rê derketim qet nefikirin û bi guleyekê min bikujin.

Ji bona perwerdekirina min spasî brêz Z.Kûçik dikim. Ji bona ku ez şaşiyan nekim, karê xwe baştir pêk bînim, destnîşankirina we ya li ser brêz B.Balkan jî spasî we tevan dikim. Loma ez ji niha de amade me ku em dest bi damezrandina partiya xwe bikin. Di nava kar de çi guherandin û lazimî pêwîst be, ez ê ji B.Balkan re bêjim ji bona ew jî bighêjîne we. Dîsa spas, got û li cihê xwe rûnişt.

Serokê civînê jî li dawiya hemî munaqeşeyan, pêşniyar û gotinên kesên din guhdarî kir biryara partiyê vekin bi hevre dan û got:

-Ez jî li ser navê dewletê, spasî kesên beşdarî vê civînê kirine, dikim. Me bingeh danî û karê din yek li dû yekê dê li gor dem û zemên bêne kirin. Lê asasê partiyê wê ev be. Kêmkirin û zêdekirina wê dûre çi pêwîst be dê bêne kirin. Ji serokê nû re serketinê dixwazim, bi wan gotinên wî me jî bawerî pê anî. Heta ku ew şaşiyên berbi çav neke, ew ê jî bibe mezinê kurdan. Civîna me qediya heta civîneke din ku êdî damezirandina endamên rêvebirên partiyê jî bêne destnîşankirin.

# -20-

Biryara avakirina partiyeke li ser navê kurdan ku bi destê dewletê bê damezrandin, hatibû dayin. Ji bona vê jî serokê nû yanî Sapo yê ku qet ji bavê xwe hez nedikir û di dema dibistana seratayî û heta xwendina uniwersîteyê tu kesan ji wî hez nedikirin, bike serok, dan.

Ji ber ku serokê nû ango Sapo gelek derew dikir. Bi gotineke din qet rastî li ba wî tune bû. Ya din ji ber tevgerên bavê xwe ku gelekî li wî û li dayika wî dixist, bû bû kîndarekî baş ê bavê xwe. Di eslê xwe de Sapo kesekî bi aqil bû. Lê ji ber derew û fesadiyên wî, kesan jê hez nedikirin. Heger du hevalên wî hebana, wê bi derew û boxtanên xwe, herdu jî berra ber hevdana ku tim yekî xwe bida aliyê wî. Karê wî, heval qezenckirina wî, tim weha dibû. Sapo bi wî qarekter û ehlaqê xwe, bi zanebûn û fenokiya xwe, bi derew û boxtanên xwe, xwe xistibû çavên zilamên dewletê yên rêvebir. Ji ber vê bû piştî lêkolînên dûr û dirêj, biryara ku wî bikin serokê kurdan ê nû hatibû dayîn. Lewra, hemî aqilmendên dewleta kûr li ser wî bê munaqeşe li hev kiribûn. Bawer dikirin ku tenha ew dikare li gor wan, ji bona tunebûna kurdan kar bike. Ji bona avakirina partiyeke bi nav kurd û kurdistanî lê ya dewletê be ku serokê wê bikin Sapo hatibû destnîşankirin. Ji bona nav û damezrandina partiyê jî li hev kiribûn. Lê dîsa jî hin şikên wan hebû ku tim ji hevre digotin:

-Erê em bi her awayî bi serokê nû ango bi Sapo bawerin lê dîsa jî divê em tedbîrên xwe ji dest bernedin. Çawa be di damareke wî de xwîna kurd heye. Îcar heta ku ew damar hebe divê em jî tim jê şikdar bin. Loma divê em wî ji bin kontrola xwe dernexin. Ji bona vê û perwerdekirina wî, divê Z.Kûçik be. Ji bona di tevgerê de şaşiyan neke me Bûran Balkan wazîfedar kirî ye ku ew ê jî di komîta damezrandina partiyê de bibe yek ji wan. Lê gelo em ê çawa bi şev bizanibin ku ew ê çi bike û bi kê re bide û bistîne. Divê em serê xwe

li ser vê yekê jî biêşînin da ku ew bi şev jî di bin kontrola me de be. Divê ji niha de em li ser vê yekê jî bifikirin

Kesekî din ji komîtê, destê xwe bilind kir, mafê axaftinê girt û got:

-Li gor min çareserkirina vê jî rehet e. Weke hûn hemî dizanin zilamekî me yê herî xurt, di heman demê ji bona dewletê kar dike li Dêrsimê ye. Keça wî Tesîre ber zewac e. Em ê li rewşê binêrin, ka bê wê rewşa Sapo çawa be? Me dît ku tam li gor me ye û tu şikên me ji wî nemîne, em dikarin keça zilamên xwe ê Dêrsimî bidin wî. Weke ewên bi hevre bizewicin, bikin. Êdî bi şev jî û bi roj jî ew çi bike em ê bizanibin. Tesîre wê bikaribe Sapo kontrol bike û ji her tevgerên wî me agahdar bike.

Li ser vê yekê komîta rêvebir ya dewleta kûr li hev kirin ku bi bavê Tesîreyê re qise bikin û keça wî bi Sapo re bizewicîne ku ew bizanibin bê bi şev jî ew çi dike û wê bike. Bi vê êdî ew ê di her warî de di bin kontrola me de be. Em ê vê yekê ji Sapo re jî bêjin, bila ew bi Tesîreyê re bizewice. Em ê jê re bêjin ku bila ev jî diyariya dewletê ji bona te be. Ji xwe wê mamosteyê wî Z.Kûçik be û wê li gel wî jî zilamê me ê ku bi siyasetê ve mijûl dibe, Buran Balkan be. Ji ber ku divê ew him di damezrandina partiyê cihê xwe bigire û him jî ê herî mezin ku hemî biryar wê ji alî wî de bêne qebûlkirinê. Yanî em ê bixwazin bila di warê eşkere de herkes bizanibin serokê partiyê Sapo ye, ê xwedî biryar tenha ew e. Lê di asasê xwe de dê ne weha be. Wê Buran Balkan be.

Bi vî awayî komîta rêvebir ya dewleta kûr biryar dan ku êdî partiyê damezirînin. Dameziranên partiyê bi lez û bez bikevin nava tevgerên ciwanên kurdan. Dest bi munaqeşeyên Kurdistana serbixwe bikin. Li gor wan kurd birçiyê azadî û serxwebûnê ne. Lewra divê Sapo ji vir de destpê bike. Yanî bi daxwaz û dûrişmên (sloganên) mezin da ku kurd zû ji wî û partiya wî bawer bike, derkeve ser rê. Heger ew bi vî rengî dest bi kar neke, dê zehmet ku bi serkeve. Ya din piştî damezirandina partiyê ji bona belavkirina navê xwe divê kesekî navdar, çalak û xwedî rûmet bikujin û bixin hustiyê tevgereke din da ku du tevger bi hevkevin. Kar wê li ser vî asasî bê meşandin.

Êdî karê wan qediya bû, dem hatibû ku partiya xwe ya bi nav kurd û kurdistanê vekin, Ji bona bi saya wê pişî li tevgerên ciwanên

kurdan bê girtin. Ji bona wê jî her hazirî temam bû. Êdî kar mabû li ser pişta Sapo ku wê çawa bi vî erkî ve rabe. Li gor dewletê dîsa jî aliyekê vê vala maye. Loma biryara wan ew bû ku du tevgeran li ser navê kurdan damezrînin. Ji ber ku piraniya kurdan misilman in, divê tevgereke kurd bi navê misilmantiyê lê benê wê, rişma wê jî di destê dewletê de be, bê damezrandinê, hate dayîn.

Piştî vê biryarê divê êdî ew biketana nava kar û xebatê da ku kesekî kurd misilman û wêrek peyde bikin. Bi wî jî li ser navê misilmantiyê partiyekê damezrînin. Bi vî awayî dewletê biryar da ku partiyeke çep ku çepitî niha li tirkiyê û li başûrê rojhilata (bakurê Kurdistanê) tirkiye gelekî guncav e. Kar û xebatên ciwanan hemî li ser vê ye. Ew jî wê weke yekî çep, sosyalîst heta marksist û lenînîst jî Sapo be.

Ew ê karê xwe bimeşîne heta ku em kesekî misilman î weke Sapo peyde bikin ji bona ew jî bi rêya partiya xwe ya misilmantiyê pêşî li tevgerên ciwanên kurd yên doza kurdîtiyê dikin, bigire.

# -21-

Êdî dor hatibû bi navkirin û eşkerekirina partiya ku Sapo bû bû serokê wê. Sapo jî êdî ji hemî karan re amade bû. Ew gihiştibû hedef û armanca xwe. Êdî dem dê dema wî ba ku tola xwe ji civata ku ew di nava xwe de venedihewand hilaniya. Dor dora Sapo bû ku tola xwe ji wan kesên zana ku tim tinazî xwe pê dikirin, hilaniya. Dor dara wî bû, tola dayika xwe di sexsiyeta wê de ji kurdan hilaniya.

Z. Kûçik gelekî xweş, hêja û delal Sapo perwerde kiri bû û dikir. Hemî rê û rêçikên ku ew ê têde derbas bibe fêrî wî kiribû. Ne tenê wî fêr kiri bû, hema bêjin ew gelekî zana kiribû da ku di hemî karên xwe de bi ser bikeve. Hemî amadekarî û hazirî ew bû ku peymana Lozana ewil diqediya û ji bona peymana Lozana nû haziriyek mezin bê kirin da ku dîsa weke cara ewil hin kurdan li ser navê kurdan ku wê weke tirkan bêje, peyde bike. Wî mezin bikin û bikin weke serokê hemî kurdan û bişînin peymana lozana dudan.  Li wir jî Sapo weke mezinekî kurdan û tu daxwaza kurdan ji cûdabûna tirkan tune ye. Wê diyar bike ku em weke du bira li gel hev, bi aramî dijîn. Loma divê ev mesele weke berê be ku em jiyana xwe li gel hev bidomînin.

Ji ber wê bû ku zilamên dewleta kûr bi hemî haziriyên xwe amade bûn ku navê partiyê di nava kurdan û li tirkiyê belav bikin. Divê ew partiyeke weha be ku hemî daxwaz, gotin û sloganên wê, ji yên heyî hemiyan tujtir û mezintir ba. Ji ber ku karbidestên xwediyê dewleta kûr, kurd baş naskiribûn û li gor wê nasiniyê jî wan ê li gor xwe ji bona qedandina wan kar bikirana. Bê ku di destpêkê de kurd vê bizanîbana. Ji bona vê haziriyê jî ev çend sal in ku amadekariya vê dikirin. Haziriyên wan hemî ji bona Lozana nû bû, ji ber ku peymana berê diqediya. Loma ji bona Lozana nû heger hin pêgirtên tirkan, li ser navê kurdan, amadekariya wê civînê bikirana û li gor daxwaza ku kurd û tirk, du brayên ji hev nayên veqatandinê ku li wir bigota. Divê li ser navê kurdan kesekî weke berpirsê kurdan ku zilamên dewletê ba ev bianiya zimên. Bigota tirk û kurd naxwazin ji hev

veqetin û wê ev daxwaz bi devê zilamê xwe yê ku wan kiribû serokê kurdan bidana gotinê. Ewropî, ji nû de him bixapandana him jî bi wan bida qebûlkirin û zanîn ku ev mesele êdî li vir qediya ye.

Sapo bi hemî bawerî û bi kêfxweşiyeke mezin, derbasî odeya ku wê civîna qedara kurdan diyar bikirana, bû. Kêfa wî li cih bû, ji ber ku tiştên wî dixwest û xeyal dikir bi rehetî ketibû destên wî. Dor êdî dora wî bû ku wî jî ew erka xwe baş bi cih bianiya da ku biba zilamekî mezin ê dewleta kûr. Hedef û armanca wî tenê ev bû. Êdî wî jî baş zanî bû ku rêya vê tenha di kuştina kurdan û wêrankirina cih û warên wan de bû. Loma divê wî ev erkê xwe bê kêmanî pêk bianiya. Wê bianiya jî. Ji ber vê bû ku kêfa wî li cih û bi gavên asasê derbasî odaya civînê bû. Derbas bû û dît ku piraniya wan rûniştine tenê ew û çend kesên din ma bûn. Wî jî silaveke ji dil û germ da kesên rûniştî. Li cihê xwe rûnişt û li benda kesên ku hê nehatibûn sekinîbûn. Li bendê bûn ku dema ew jî bên, êdî wê dest bi civîna xwe bikirana. Di demeke kin de jî ew sê kesên mabûn, bi hevre ketin hundir û diyar dibû ku ev hersê ji hemiyan mezintir an erktir bûn. Bi ketina wan ya hundir hemî ji ber wan rabûn, wan jî hemî kesên li wir silav kir û kesekî ji hersiyan bi destê xwe îşarete ku fermo danişîn ango rûnên da û dûre ew jî yanî hersê zilamên mezin bi hevre rûniştin. Piştî ku hemî rûniştin, herkesekî ji wan ew dosya li ber xwe vekirin û dest bi xwendina rûpela ewil kirin ku di wê de rojeva wan, ango mijara wê li ser rawestana hatibû nivîsîn.

Civîn ji wan hersê zilamên dawî hatibûn, ji aliyê yekî ji wan hate vekirin û got

-Hêjano hûn hemî bi xêr û xweşî hatine vê civîna ku êdî em ê qedera kurdan diyar bikin. Ez bi xêrhatineke taybet didim brayê Sapo ku wî bi dilxweşî ev kar û ev erkê parastina dewleta xwe da ser milên xwe, dikim. Bila Sapo qet xeman nexwe, dema wî dest avêt kar, bila bizanibe karê ku ew ê pêve rabe, dewleta me ya mezin wê bi hemî alîkariyên heyî piştgiriya wî bike. Divê ew jî baş bizanibe ku êdî ew bi xwe jî zilamekî dewletê ê mezin e. Li gor vê berpirsiyariyê divê ew jî tevbigere. Em ê navê partiya ku em dixwazin vekin eşkere bikin. Ji xwe serokê wê dê Sapo be. Lê divê Sapo jî bizanibe ku wê Buran Balkan jî di komîteya avakirina vê de cihê xwe bigire. Ya rastî erk û wazifeyên wî dê ji ya Sapo pirtir û mezintir be. Ji bona ku ew bi eslê xwe tirk e, nabe bibe serokê kurdan. Lê di vî warî de ji bona

Sapo tu pirsgirêk tune ye. Weke me berê jî munaqeşe kiribû û me bi hevre çend xalên divê bêne kirin destnîşankiri bûn. Lê helbet wê kar ne tenê ew bin. Em ê li gor rewşê carna berê xebatê jî biguherin. Niha gotina min ev e, ez dixwazim we û bi taybetî Sapo guhdarî bikin, dûre jî ez ê hinekî din biaxifim. Belê niha gotin ya Sapo ye.

Sapo bi kêfxweşiyeke mezin ji cihê xwe rabû, li dora xwe nerî dît ku hemî li wî dinerin. Dema wî jî xwe di nava wan de dît, yek ser hat bîra wî ku ew ê li gor dilê wan û xwe kurdên zîrek û bi aqil bikuje û warên wan talan bike. Dest bi axaftina xwe kir û got:

-Belê rêzdaran gelek spas ji bona ku we ez hêjayiya vî karî dîtim e. Ez ê bi xwe ji bona tunekirina kurdan û perçekirina erda ku ew li ser dijîn, bixebitim da ku wan ji wir dûr bixim. Min di dosyê de jî xwendibû, ez ê weke serokê partiya kurdan ya ku wê bi heman helwest kiryar û gotinên xwe weke daxwaza pêkanîna kurdan be. Lê di asasê xwe de wê karên partiyê di bin berpirsiyariya dewleta me de be. Ev partî wê ji bona tunekirina Kurdan bê damezrandin. Ji bona vê jî weke cenabê we hemiyan jî anî zimên, partiyek lazim e. Bi avakirina partiyeke weha de serokekî bi eslê xwe kurd yanî weke min, lê di bingeha xwede ji kurdan nefret dike lazim e. Ew jî dê ez bim. Ez erk û wazîfeyên xwe jî baş dizanim. Dizanim ku divê hûn min berê bi kurdan bidin qebûlkirin ku ez weke serokê wan im. Dûre êdî çi lazim be em ê li gel hev biryarê bidin û ez ê wê di jiyanê de pêk bînim. Weke cenabê we jî diyar kir ku divê ev partî ji yên kurdan hemiyan cûdatir be. Rast e divê em bi daxwaz û sloganên mezin derkevin qada xebatê. Ji ber ku kurd bi salan e, bindest in, perîşan in, li ser serê wan ço  tucaran kêm nebû ye. Loma dema ku bibînin hin ji bona rakirina wî çoyê li ser serê wan kar dike, wê hemî xwe bidin dora wê. Ji ber ku Kurd ne bi aqilê xwe tevdigerin, li gor dîtina çavên xwe. Loma em ê jî li ber çavên wan, bi wan daxwazên mezin derkevin û ji bona bibînin ku em çi dikin. Di destêpêkê de em ê çend bûyerên girîng li ber çavên wan jî pêk bînin.  Di taliya axaftina xwe de jî divê diyar bikim. Pêwîste ku em hemî hêjayî, nav û navnîşanên kurdan ê hene, bê rûmet û qîmet bikin. Em ê berê xwedîtiyê li hin mezinên wan yên siyasî bikin. Wan mezintir bikin dûre jî wê çi bibe hûn ji min baştir dizanin. Loma wê, pêşniyara min ev be ku niha navê partiyeke nehênî ya kurdan heye, hê gelek kes bi vî navî nizane û li gor min ev nav tam jî wê li gor kar û xebatên me be. Divê

em karê xwe bi diziyê, wêraniyê, bi boxtan û derewan destpê bikin. Di nav hemî karên me de ez dibêjim; divê rastî tune be. Rastî tenê wê di rapor dayinên me yên ji bona vê komîtê û dewletê bin. Wekî din hemî kar li ser asasê derewan bê kirin. Ji bona wê jî ez bi xwe pêşniyar dikim ku navê partiya me bila bibe PTK (Partiya Tolhildana Kurdan) lê di asasê xwe de divê li gor me û dewletê, ev nav weha bê xwendi. Partiya Tunekirina kurdan. Çi dema me navê partiyê di nav kurdan de geş kir, xurt kir. Her ew ê bizanibin ku ev partiya tolhildana li dij dewletê ye. Bila ew weha bizanibin lê divê em jî karên xwe ji bona xurtkirina dewleta xwe bikin.

Sapo axaftina xwe qedand, serê xwe bi wî alî û bi vî alî de zîvirand, dît ku hemî ji gotina wî kêfxweş bû bûn. Loma wî axaftina xwe domand, got û li cihê xwe rûnişt.

-Spas ji bona we tevan ku we bi dilekî germ û bi baldarî ez guhdarî kirim. Heger we jî got erê êdî em ê li gor destûr û bernameyekê dest bi kar bikin. Niha em du kes li vir amade ne. Ez û brayê Buran em ê bi gotin û munaqeşeyên tûj, mezin û li gor daxwaza kurdan bikevin nava tevgerên ciwanên kurd. Ez bawerim em ê çend kesên din jî peyde bikin û êdî li gor wê destûr û bernameya ji bona têkbirina tevgera ciwanên kurd, tunekirina zimanê wan û guherandina erdnigara wan (cografiya) ku kurd li ser dijîn, bikin. Got û rûnişt

Buranê ku ji berê de zilamê dewleta kûr e, ê ku Sapo dîtibû û pêşniyar kiribû ew bi xwe bû. Buranê kesî nizanîbûn bi esl û feslê xwe kî ye, çi kes e, ji ku hatiye ne diyar e. Lê tiştên diyar ew e ku ew bi her awayî girêdayî komarê ye. Xwe weke tirkekî ji hemî tirkan bêtir, mafê wan diparêze dîtî ye û dibîne. Loma jî wî xwe bi dewleta xwe dabû qebûlkirin û gelek karê baş jî ji bona dewletû kiri bû. Ji cihê xwe rabû ser pîyan û got:

-Ez bi xwe bi her awayî piştgiriya gotinên brayê Sapo dikim. Divê em partiyeke weha damezrînin ku divê hemî karê xwe li ser asasê derew û boxtanan be. Divê em di her warî de hewl bidin ku bi derew û boxtanan bibin pispor û li gor wê jî kar bikin. Ez li gel brayê Sapo me ku bi rastî jî aqilê kurdan di çavên wan de ye. Loma divê em jî wan çavan ji bona berjewendiya komara xwe bi kar bînin. Em ê li gor dîtina çavên wan tiştên mezin bikin ku wê nikaribin li rastiyê bifikirin. Em ê di nava hemî tevgerande boxtaniyê bi kar bînin da ku

ew xwe bi xwe rabin hev. Ji bona tevgerên ciwanên kurdan xurt nebe çi ji me bê, bi alîkariya dewletê em ê bikin. Ji ber ku em dewlet in ew jî rêxistin. Loma wê tim serketin bibe para me. Navê ku Sapo pêşniyar kirî ye ez jî li gel im. Spas ji bona ku we ez guhdarî kirim.

Yekî din rabû got:

-Spas ji bona herdu brêzan, ez jî li gel we me. Lê li gor baweriya min tiştek hat ji bîr kirin. Piştî avakirina partiyê û belavkirina hin kadroyên zana ku daxwaza wan kurdistaneke azad e, em ê bixin nava ciwanan. Bila bi wan re munaqeşe bikin, di nav munaqeşeyên xwe de wê gelek kadroyên wê tevgerê jî nasbikin. Ev ê jî ji bona me baş be ku navê wan ji bona me bê zanîn. Dûre em ê çi bikin? li gel hev munaqeşe bikin. Li gor min meseleya herî girîng ne tenê xwendevanên kurd in. Divê em bi saya vê partiyê berê li hember eşîrên kurd şer bikin. Ji ber ku ew bi xwe kurd in adet û toreyê kurdan xweş bi kar tînin. Hinên zana ji nava wan derkeve, dibe ku di Lozana nû de bibin xwedî gotin. Ji ber ku eşîr mezin in, xwedî gelek îmkan in, gelek kes bi wan re ne, li gor wan tevdigerin. Ji ber vê sedemê û belavkirina navê partiyê û di belavoka ewil de divê em bêjin ew kes, şexs, partî û eşîrên ji bona kurdistanê dibin asten, divê ew ji holê bêne rakin.

Ji holê rakirina wan hêsan e. Em ê bi navê axatî û eşîrtî ku vana li dij şoreşa kurdistanê asteng in dest pê bikin. Ji xwe piraniya tevgerên ciwanan jî bi îdeolojiya ku me bi wan daye qebûlkirinê tevdigerin. Hemî partiyên ciwanên kurdan ên sosyalîst jî li dij sazûmana axatî û eşîrtiyê ne. Ev ji bona me rehetî ye. Em ê jî vê bi kar bînin û bêjin “Vana li dij şoreşa kurdistanê asteng in”. Bi qasî min kurd nas kirin e wê piraniya wan jî di şerê partiyê ya li dij axa û eşîran dengê xwe dernexin. Heta eşîrtî û axatiya kurdan hebe, wê karê me tim jî zehmet be. Her çiqas ew eşîr û axa jî bin, lê kurdin û kurdbûna wan ruhiyeta kurdewarî direşîne. Îro nebe sibê ciwanên wan jî dê weke wan bifikirin. Gotina min ya talî ew e ku divê partî di şerê axa û eşîrên kurdan dest pê bikin. Ev ê du alî be, aliyê ewil em ê bi hemî îmkanên xwe vana li dij şoreşê ne, loma divê ji hole rabin. Li aliyê din jî em û hûn jî dizanin ku axatî û eşîretên kurdan tim jî ji bona me bûne xeter. Divê di van şertên modern de em vê xeteriyê rakin. Di şerekî weha de wê bêtirîn ciwanên kurd yên sosyalîst jî alîkariya me bikin. Ji ber ku em ê bidin zanîn ku em partiyeke

sosyalîst in. Bi vê jî em ê bala hemî sosyalîstên kurdan bikşînin ser xwe. Ha divê ev jî neyê ji bîr kirin, helbet di nava kar û xebatê de wê hin tişt bêne guherandin, hinên şûna xwe ji hin tiştên din re berde, hin xeterî dikare pêk bên. Lê hedef û armanca me, tunekirina tevgerên ciwanên kurdan û ji holê rakirina sazûma axa û eşîrtiya kurdan be. Spas ji bona we ez guhdarî kirim.

Piştî ku Buran axaftna xwe qedand Sapo dîsa mafê axaftinê xwest û got:

-Em bi slogana azadkirina her çar perçên kurdistanê û sosyalîst dest pê bikin. Lê wê ji alî me tevande bê zanîn ku ne azadkirina her çar perçên kurdistanê be, di daxwaza veşartî de tunekirina her çar perçên kurdistan bi rêya Kemalîzmê be. Yanî tim wê du daxwazên me hebe, yek eşkere li gor dilê Kurdan ya din jî bi dizî li gor daxwaza dewletê be. Em ê di hemî çalakî û xebatên xwe de jî bêjin; kesên serxwebûna her çar perçên kurdistanê nexwazin xaînin. Tenê bi saya vê jî em ê gelek ciwanên xwîn germ bikşînin nava xwe. Ji xwe dema kî bikeve nava me, wê çi bê serê wan jî dê diyar be. Tiştekî din jî divê em çend kadroyên zana û çalak yên tevgerekê bi alîkariya dewletê bikujin û wê kuştinê bixin hustiyê tevgereke din da ku ew bi xwe jî rabin hev.

Sapo axaftina xwe di virde qedand, li cihê xwe rûnişt, dîsa bi wan çavên xwe yên mizawir li ser kesên ew guhdarî dikir, gerand û dît ku hemî bi wê axaftina wî kêfxweş bûne.

Cara talî ew kesê weke berpirs bû, rabû ser xwe û got:

-Baş e, spas ji bona we tevan. Mesele avakirina partiyê û hin çalakiyên ku divê demildest bêne kirin diyar bû. Helbet em ê mehê carekê li ser kar û xebatên partiyê bicivîn. Li gor rewşê jî em ê hin guherandina bikin. Partiya ji bona Tunekirina Kurdan li me tevan pîroz be. Hêvîdarim wê bighêje armanca xwe. Civîna me li vir qediya ji niha û pêde em ê li benda çalakî, bûyer û kiryarên partiyê bin. Ji bona ev partî bi serkeve, divê axa û eşîrên kurdan nemîne ya jî pir lawaz bibin. Divê ev partî şerê hemî partiyên din bike da ku wana jî ji holê bê rakirin. Divê ev partî bibe partiya herî mezin ya kurdan ji bona ku em serokê wê Sapo bişînin civîna Lozana bê, da ku ew li wir jî li ser navê kurdan daxwaza me bêje û mesele kurdan êdî wê bi temamî di nava qada navneteweyî de nemîne. Ji xwe heta

sed salekî dinê wê kurd jî weke gelên din hemî bibin tirk û hûn sax bin. Serokatiya Sapo pîroz dikim. Hêvîdarim ku wê me şermezar neke. Ji xwe ew ê tim di bin kontrola Buran de be, wê Z. Kûçik jî tim bi perwerdariya wî ve mijûl be û hin kêmaniyên wî temam bike da ku di vê xebatê de şaşî nebe.

(Erê felekê roja welatê kurdan Kurdistana şêrîn perçe kirin û di nava çar dagirkerên devbixwîn de parve kirin. Tim ji bona hin Kurd li hember brayê xwe yên ji bona azadî û serxwebûna Kurdistanê kar dikin, derkevin. Dagirkeran bi hin meqam û diyariyên ku wê bidin wan dixapandin. Loma vê carê jî dagirkerên tirk weke gelek caran ku hin ji mezinên êşîran û malmezinan bi bertîl û bi sozên derewîn ew xapandinbûn. Vê carê jî dixwestin Sapo bi bertîla ku ew ê di peymana Lozana dudan weke mezin û serokê kurdan beşdarî bike, dilê wê xweş dikir da ku ew jî bêtir wêranî û kuştina Kurdan bike. Lê piştî sed salan gelo wê peymaneke nû bibe, gelo wê ji nû de hin sînor bêne destnîşankirin û gelo wê bi temamî rewşa rojhilata navîn û cîhanê bihata guherîn an ne. Hê tam ne zelal bû. Lê tiştên zelal ew bû ku piştî dawîanîna Lozanê wê hin guherandin bibana. Ji ber ku îşaret û singalên vê jî hêdî hêdî dihatin dîtin. Loma karbidest û kemalîstên dewletê Sapo bi vê dixapandin ku ew ê weke serokê kurdan beşdarî civîneke weha bibe. Di hemî hevdîtin û civînên Sapo de ev didan pêş da ku ew jî karê xwe baştir bike. Her weha Sapo jî li gor vê tevgeriya û wê weke mezinekî kurdan beşdarî civîneke weha bike, xwe şad didît ku divê ew ji xeta dewletê dernekeve û li gor peymn, destûr û bernamehên wan tevbigeriya. Ji ber vê ye ku herikandina romanê, teger û kiryarên Sapo û dewletê li ser vî asasî hatiye hûnandin)

Civînê ji bona avakirina partiya ku Sapo kirin serokê wê biryar dan. Biryara yekem jî ew bû ku heta bikaribin divê li ser destê Sapo zimanê kurdî nemîne. Adet û toreyên Kurdewarî biqedîne û bibe desthilat da ku ji tirkan re tu asteng û serêşî nemîne. Lê berî ku civîn biqede weke ji nû de tiştek hat bîra Z.Kûçik û got:

-Hevalno, dostno parêzgerên welatê xwe, me tiştek ji bîr kir. Erê me ji bona avakirina partiyê her tişt amade kir. Lê di eslê xwe de divê partî bi awayekî nehênî li Amedê vekin. Ji bona ku kurd nebêjin, partî li Enqerê vebûye, Evê ji bona partiya nebaş be. Heger em li gor van biryar, destûr û bernameyên vir, lê weke partî û avakirina

wê li rojhilatê tirkiye bibe wê baştir be. Beşê Enqerê êdî em dizanin ya me ye. Em li başûrê rojhilata welatê xwe jî vê vekin û ciwanên kurd yên zîrek têde bi cih bikin, wê baştir be.

Li ser gotina Z.Kûçik civînê berdwam kir. Loma berpirsê wê civînê dest bi gotinê kir û got:

-Belê Z.Kûçik rast dibêje, me tiştê herî girîng ji bîr kiribû. Mala te ava be brayê Kûçik. Baş e, em niha ji bona wê jî planekî dînin û dixwazim ka bê Sapo di vê derbarê de wê çi ji me re bêje? Sapoyê ku kêfa wî bêtir hat ku êdî qîmetê didin wî jî ji cihê xwe rabû û got:

-Spas brêz, li gor baweriya min ev jî rehet e. Niha weke di vê civînê de hate destnîşankirin em ê li başûrê rojhilata tirkiyê weke me partiyeke nû damezrandiye rê bidin. Lê em ê avakirina partiyê weke nû be, bi destûr û bernameyên li vir hatine qebûkirin, di wir de jî vana bikin bingeh. Rehet e, ez û Buran û çend kesên ku me ew jî kirine heval, em derbasî başûrê rojhilatê tirkiyê bibin. Li wir êdî bikevin nava ciwanên kurdan, yên zîrek, bi aqil û jêhatî peyde bikin. Bi wan re kongreyekê li gundekî bajarê Amedê pêk bînin. Li wir em ê navê partiyê, destûr û bernameyên li vir hatine qebûlkirinê li wir jî bidin qebûlkirinê.

Ev pêşniyar ji teref beşdarên civînê de hate tesdîqkirin û li gor vê jî wê Sapo, Buran û çend kesên ku wan peyde kirine derbasî başûrê rojhilatê tirkiyê (bakurê Kurdistanê) bibin da ku li wir partiyê damezrînin û navê wê di nava kurdan de bi awayekî nehênî belav bikin.

***

Êdî hemî haziriya ku weke partî cara ewil li Kurdistanê tê damezrandin, dihate kirin. Bi dîtina çend kesên xwîngerm ku ha ha kar dikirin da ku welatê xwe azad bikin jî hatibûn dîtin. Loma wan kesên hevdu li Enqereyê ji bona partiyeke kurdan, şoreşger, sosyalîst û tekoşer vekin, biryara xwe da bûn. Ji bona vekirina vê partiyê jî Sapo pêşniyar kiribû da ku partî ne li bajarekî tirkan, li bakurê Kurdistanê bê avakirin û ragihandin. Di hemî civînan de her Sapo bi gotinên qelew û weke ji hemiyan zanetir xwe dide pêş. Ev

ji aliyê Buran ve jî tim dihate qebûlkirin da ku yên din jî vê bipesidînin.

Bi vî awayî û li gor destûr û bernameya ji Enqerê derketibû, li gundekî bajarê Amedê li Mîsê di kongreyekê de Partiya Tunekirina Kurdan ragihandin. Weke destûr û bername ji aliyê Sapo de ya ku li Enqereyê hatibû qebûlkirin hate pêşkêşkirin û ew weke destûra partiyê ya bingeh hate pesinkirin. Ji xwe di xala ewil ya partiyê de diyar bû ku çi partî, rêxistin axa, eşîr û begên li dij şoreşê bin, divê berê ew ji holê bêne rakirin. Ev bi temama dengan jî hatibû qebûlkirin. Kar li gor dilê Sapo û Buran qediya bû, kesên din jî hemî kêfxweş bûn ku wana bi saya vê partiyê Kurdistan azad bikirana. Lê nizanîbûn ku ev feqeqe li pêşiya wan hatibû vekirin ji bona ku kurdistan neyê azadkirin dê hemî kar bê kirinê.

Piştî ku her tişt qediya dora dengandana kesên ji bona komîta navendî hatibû. Komîta xwe jî hilbijatibûn û li ser pêşniyara Buran serok jî kirin Sapo. Ev serketineke mezin bû, loma li hev pîroz kirin. Belê pîroz kirin lê wan kesên ji dil û ji bona kurdistaneke azad û serbixwe ketibûn nava vê partiyê û bû bûn endamê rêvebirên wê jî, nizanîbûn û texmîn nedikirin ku wê çi bobelat bihata serê wan. Nizanîbûn ku yên wê kurdistanê ji dil biparêzin dê yek bi yek ji holê rabin ango bêne tunekirin. Li vê cîhanê tiştê herî zor ew e ku tu biryara tunebûna xwe û ya gelê xwe bi destê xwe dide bê ku tu texmîn bike an bizanibe ku çi fen, fût û feq li hember te hatine vekirin…

# -22-

Êdî partiya ji bona tunekirina gelê kurd ku zimanê wî, adet û toreyên wî biqedîne hatibû damezrandin. Serokê eşkere Sapo û yê bi dizî ku ji Sapo jî mezintir Buran Balkan bû. Li gor vê damezrandinê divê Sapo û Buran biketina nav tevgerên ciwanên tirk û kurdan û li gor vê jî divê wan çend kesên din peyda bikirana. Bi wan re weke PTK li Amedê bi belavokek nehênî navê partiyê ragihandana. Ji bona ku baweriyê bide der û dorê. Divê civîna damezirandina xwe li Kurdistanê bikirana ango weha rê bidana. Lê ya rastî asasê vê partiyê li Enqereyê li paytextê tirkiyê hatibû avêtin. Destûr û bernameyeke li gor xwe, lê bi daxwazên kurdan yên herî bilind, pêşkêşî Sapo û Buran kiribûn. Wan jî, pir vekirî bê tirs ku bikaribin her tiştekî bi ciwanên kurdan yên welatparêz re munaqeşe bikin, dest bi karê xwe kirin. Li kîjan civîn û holên munaqeşeyan de beşdarî kirin, daxwaz û nerînên wan tim ev bû; ”Divê em ji bona xelasiya herçar perçên kurdistanê kar bikin da ku şoreşekê li dar bixin. Di eslê xwe de Kurdistan yek perçeye lê Emperyalîzmê ew kirine çar. Ji ber vê divê em van sînorên wan danîne nas nakin. Ji bona azadî û Serxwebûna Kurdistanê kar bikin. Kurdên ku vê neparêzin an li dij vê bin, divê em wan weke xayînên kurd bi nav bikin.”

Çerçewe û munaqeşeyên wan hemî li ser vî asasî pêk dihat. Ev daxwaz û munaqeşeyên wan ê tûj hêdî hêdî bala hinan dikşandin û ev daxwaz ji wan re jî maqûl dihat. Munaqeşe û gengeşiyên di nava tevgerên tirk û kurdan de her ku diçî firehtir dibû. Bi saya van munaqeşeyan tevgerên ciwanên tirk û kurdan jî ji hev çûda dibûn. Di vê çûdabûnê de Sapo ê herî tûj bû ku wî tim digot:

-Divê em weke ciwanên kurdan êdî tevgerên xwe bi destê xwe damezirînin. Daxwaza me xelaskirina welatekî weke kurdistanê ye. Lê ya çepên tirk jî anîna sosyalîzmê û demokratîkbûna komara wan e. Ev daxwaz ji bona me ne guncav e.

Li alîkî Sapo li aliyên dî Buran bi van munaqeşeyên xwe ê bi tirkî, çend kesên din jî li dor xwe civandin. Çend kesên bi rastî zana û kurdperwerbûn destnişan kirin. Sapo çend caran bi wan re civîn li dar xist. Daxwaza Sapo li gor ku mamosteyê wî ew fêr kiribû, divê ev partî weke bi fermî û li ser daxwaza azadî û serxwebûna her çarperçen kurdistanê bihata damezrandin. Li gor vê daxwazê bi dîtina çend kesên dilê wan li ser kurdistanê bûn û çend kesên xwe jî peyde kirin. Bi vê peydekirinê li bajarê qedîm li gundekî Amedê amadekariya kongreya xwe kirin ku navê wî gundî Mîs bû. Di civîneke berfireh de damezrandina partiya xwe weke bi awayekî fermî lê nehênî ragihandin raya giştî ango tevgerên kurdistanî. Partî weke li kurdistanê hatibe damezrandin rê dan, di vê de bi serketin. Destûr û bernameya ku li Enqereyê ji bona wan hatibû pêşkêşkirin ew jî dane qebûlkirin. Bi vî awayî karê partiyê bi serokatiya Sapo qedandin. Tiştekî din di vê civînê zêde kirin û gotin: ”Ji bona navê partiyê zêde deşîfre ango neyê zanîn divê em bêtir, endamên xwe bi navê Sapocîtiyê bidin zanîn. Heta ji me tevan bê divê em vê bi karbînin. Bila her endam xwe weke Sapocî ne bizanibin”.

Bi vê biryarê jî li gor aqilmendên xwe kirin. Ji ber ku aqilmendê wan, ji wan re dabû zanîn ku Kurd bêtir girêdayî serokê xwe ne. Serok çi bêje kurd ji wê bawer dikin. Çi dema serok nemîne wê gavê tevgera kurdan jî namîne. Ji ber vê ye divê em, heta bikaribin divê Sapocîtiyê bi kar bînin. Yanî bila navê Sapo li pêşiya ê pratiyê be.

Li gor destûrê, karê wan ê ewil ew bû ku kes û rêxistinên li dij serxwebûna kurdistanê bin, xayînin û divê ji holê rabin. Kes û rêxistinên li dij şoreşê asteng bin divê ew jî bêne tunekirin. Lê di wê demê de ku ciwanên kurdan ha ha îro û sibê wê kurdistanê azad bikin, kar û xebat dikirin. Haya wan ji plan û projeyên dewletê weke feqeqê li pêşperî wan hatibû vekirin, tunebû. Ji xwe kesên bikarîbana tiştekî weha bifikiriyana jî pir kêmbûn. Herkes ha îro ha sipê dê Kurdistanê azad bikin, difikirîn û xebatên xwe dikirin. Ciwanên ku wê di demeke nêzîk de kurdistanê azad bikin serxweş ketibûn. Loma ne ket bîra wan ku dîroka xwe bixwînin û fêr bi bin ku di dîroka wan de çi bû bû, çi qewimî bû. Bav û bapîrên wan ketibûn çi hal û rewşê? Qetilkirina kesên wan çawa pêk hatibû? qet nizanîbûn û di vî warî de gelekî bê tecrube bûn. Firseta ketibû destê

wan û tişta dizanîbûn, tenha ew bû ku dê rojekê berî rojekê kurdistanê azad bikin, bû.

Ev kêmaniya wan, dê rojekê biba bela serê wan. Nezanîna dîroka xwe, wê biba têkbirina tevgerên wan. Lê dîsa li xwe hay nedibûn. Hemî kar û xebatên wan ew bû ku bi hevre munaqeşe bikin. Bikevin nava dibistan, gund û bajarokan da ku xelkê xwe şiyar bikin ku şoreşa azadiya kurdistanê pêk bînin.

Dewletê jî nerîna wan ciwanên dilşewat baş dizanî bû. Loma wan dizanîbûn ku wê çawa pêşî li wê tevgera ciwanan ya weke pêlên derya bilind dibe, bigirin.

# -23-

Êdî hemî kar û amadekariya PTK, qediya bû. Li gor xwe çend kesên ku bi rastî jî welatparêz bûn, hedef û armanca wan azadiya kurdistanê bû, dîtibûn. Ew jî di komîta rêvebir de bi cih kiribûn. Lê li gel vê jî hinên din ku weke Sapo û Buran bûn an nêzîkî wan bûn di komîta rêvebir de cihê xwe girtibûn. Armanc û hedefa wan mabû êdî bi awayekî berfireh bikevin nava tevgerên ciwanên kurd. Kadroyên wan nasbike ku yên zêde xeter bin bi awayekî, bi kompleyekê ji holê rakin an jî bi destê dewletê, wan bide girtin.

Roj bi roj munaqeşeyên nava ciwanên welatparêz geş û xurt dibû. Bi ketina Sapociyan ya nava wan, ew munaqeşe geştir bû bû. Ji ber ku daxwaza Sapociyan ji ya hemî tevgerên din mezintir bû. Di munaqeşe û gengeşiyên nava tevgerên civanên kurdan de daxwaza azadkirina her çar perçên kurdistanê ji bona ciwanên birçiyên azadiya gelê xwe bûn, maqultir dihat. Dewletê û Sapo ji vê gelekî kêfxweş bû bûn ku di gava ewil de bi serketine.

Lê vê têra wan nedikir divê êdî wan li gor wê projeya ku dewletê dabû wan di jiyanê de pêk bînin. Yek ji wan kuştina kesên ji dil, azadiya kurdistanê dixwest in. Kesên zana û jîrên dilê wan ji bona Kurdistanê lê didan. Bi rêyekê ji holê bihatana rakirin. Dor hatibû divê Sapociyan şerê axa û eşîrên kurdan jî bikirana. Divê wan axa û şêxên  welatparêz weke alîgirên dewetêne rê bidina. Loma divê şerê wan bikin heta ku ew axa û serokeşîr xwe bi dewletê ve girê bidin. Piştî munaqeşe û gengeşiyan divê êdî Sapociyan hêdî  hêdî wê biryara dewletê pêk bianiyana. Ew jî bi rêyên komplowarî ku kurd ango welatparêzên kurdan meselê zû bi zû fêm nekin ku ev çawa û ji ku hat hin têne kuştin. Sapociyan bi saya wan sloganên xwe yên tûj û munaqeşeyên wan î bi tevgerên din re, mezintir dibû. Piştî vê mezinbûnê jî divê êdî wan dest bi kuştina kesên dilsoz û zanayên kurdan bikirana û kuştina wan bixista hustiyê tevgereke din da ku

du tevgerên ciwanên kurdan bi hevketana. Ji bona tol hilanînê hevdu bikuştina.

Piştî hemî munaqeşe û lêkolînên wan, PTK ê biryar da ku endamekî xwe ê komîta navendî ku gelekî zane û jîhatî bû, durust û şoreşgerekî baş bû. Di hemî munqeşeyên wî de diyar dibû ku ew ne weke partiya xwe difikirî. Gotinên wî û helwestên wî yên kurdewarî, gihişti bû guhê Sapo û dewletê jî. Loma wan bi hevre plana kuştina Sakî Barer dan. Sakî ciwanekî gelekî zana û jêhatî bû. Bê tirs bû. Karê wî şiyarkirina ciwanan bû. Piraniya dîtinên wî, ne li gor ya partiya PTK bû. Ev jî ji bona destpêka partiyê zerar bû. Şexsiyeteke weke wî ku li herêma xwe gelekî dihate hezkirin, bi tevger û zanîna xwe bû bû mêrxwas û wêrekekî baş. Ji bona ku ew weke partiya xwe nedifikirî, dewletê û Sapo li gel hev biryara kuştina wî dan. Lê dibê bi çi awayî û çilo bihata kuştin? Ew plan jî weha amade kiribûn. Di şevekê de wê daxwaz ji kesekî nêzîkî wî û endamê partiyê ye bangî wî bikirana da ku heta filan derê bihata. Ji ber li ser karekî girîng li wir wê biryarekê bidin. Lê ma wê Sakî ji ku bizanîba ku rêhevalên wî li hember wî feq vekiribûn. Ew jî weke her car û bê tedbîr li gel wî rêhevalê xwe ku hatibû bangî wî kiribû bi hevre nêzîkî li cihê hevdîtinê kiribûn. Li wir, rêhevalê wî çeka li pişta xwe derdixîne û ji paş de Carçûrekê tê de vala dike. Ew û kesên li wir hemiyan xwe ji wê derê bi dûr xistin. Dema ku bihistina kuştina Sakî belav bû û hate zanîn ku ew hatiye kuştin, yek ser Sapociyan belavokek belavkirin ku rêxistina K yê hevalê wan î zana jîr û jêhatî kuştine. Divê ev ji wan re nemîne. Bi propagandaya li ser asasê derewan di nava tevgerên ciwanên kurdan jî hate belavkirin. Lê hemî ciwanên kurdan yên ji bona azadiya kurdistanê şerxweş ketibûn. Lêkolîneke nekirin ku bê ew çawa û bi destê kê hatiye kuştin. Ev bûyera ewil bi rêk û pêk ku Sapociyan zaneyekî ne weke wan difikirî kuşt û xistin hustiyê rêxistineke din da ku bikaribin serokê wê tevgerê ê welatparêz, zana û jêhatî jî bikujin. Her weha jî bû,

Sapociyan di hemî munaqeşeyên xwe yên bi tevgarên ciwanên kurdan re dikirin, ev dianîn zimên û digot in: “Em ê tucaran qebûl nekin û ji rêxistina K re nehêlin ku wan hevalekî me, kadroyekî me, zana, mêrxas û bîrewirekî me kuştine. Propaganda wan li ser vî asasî hate meşandin heta ku wan Ferhatê Dirêjê ku ji malbateke

welatparêz dihat. Xwe zana kirî bû. Ji bona azadiya welatê xwe şev û rojên wî tune bûn. Her kar û xizmeta gelê xwe dikir da ku rojekê gelê xwe bighêjîne azadiya wî.

Lê çavên Felekê kor bin û ew korbûn ketibû çavên hemî tevgerên ciwanên wê demê jî. Hemî derd û êşa wan tenê ji bona azadiya kurdistanê bû. Loma nikarîbûn û fêm nedikirin ku ji bona azadiya welatekî, divê berê mirov diroka welatê xwe bizanibe. Ji bona ku mirov bikaribe tevgerên nû li gor tecrube û bûyerên di dîrokê de pêk hatine damezirîne. Vê nezaniyî rê li ber hemî kiryar û bûyerên partiya ku bi destê dewletê hatibû damezrandin, vedikir. Rehetiyek jî dida dewletê û Sapociyan. Ji ber ku tu tevger û kesan lêkolîn li ser kuştinên çê dibûn, nedikirin.

PTK jî li gel hemî endamên xwe, bi belavok û propagandayên xwe didan zanîn ku tevgera K çawa hevalê wan, kadroyekî wanî zana kuştin, wan jî tola wî hilanîne. Kuştina Ferhatê Dirêj ji bona Sapociyan bû bû propagandeyeke baş. Vê bûyerê kêfa hemî endamên wê anîbû ku tola rêberekî wan li erdê nema. Piştî bi serketina wan herdu bûyerana ku herdu jî bi destê PTK û bi alîkariya dewletê hatibûn kirin, weke wan dixwest pêk hat û tu astengî ji bona wan derneket.

# -24-

Şêroyê kurê bavê xwe ê bi tenê, brayê pênc xuşkên xwe, delalê ber dilê dayik û hezkirê hemî gundiyên xwe jî êdî lîse qedandibû. Bi ezmûna ewil wî uniwersîteya doktoriyê qezenc kiribû. Ev bû bû hezkirina wî ya dudan ji teref malbat û gundiyên wî. Hemiyan dixwestin ku ew bibe Doktor û li nexweşên kesên ji gundê xwe binêre. Ji wan re dermana binivîsîne, derd û êşa wan bi wan bide zanîn. Êdî Şêro bû bû xwendevanekî uniwersiteyê. Ji gundê wan wê doktorekî wan heba. Ev him kêfxweşiya wî û malbata wî bû. Him jî ya gundiyên wî û gundên derdorê jî bû. Hemî bi hêvî bûn ku dema Şêro bibe doktor wê ji nexweşiyên tevan re çareseriyê bibîne. Wê sedema nexweşiyên wan bi zimanê wan, dê ji wan re bigota. Wê gavê ewên jî xweştir û baştir fêr bibana ku wê çawa xwe ji nexweşiya xwe biparêzin. Kurtasiya gotinê ew bû ku herkes bi ketina ango qezenckirina Şêro ya uniwersîteyê kêfxweş bû bûn.

Di dema xwe qeydkirina unîwersîtê de Şêro li gel bavê xwe rêya Enqereyê girtibûn. Piştî xwe dighêjîne wir, bavê Şêroyê ku leşkeriya xwe li wir qedandibû, wir hinekî nas dikir. Dema li Enqereyê peya bûn, li oteleke li gor dilê Şêro cihê xwe ê razanê veqetandin. Karkerê otelê kilîtên deriyê odaya wan girt, rahiştê çentê wan û berê xwe berbi oda ku ji wan re hatibû veqetandinê kir. Derî vekir çentê wan bi cih kir, kilîtên odê dirêjî Ehmo kir û got:

-Kerem bikin cihê we vir e. Telefon jî li wire, heger lazimiyeke we çê bû, hûn dikarin telefon bikin. Ehmo jî got:

-Mala te ava bî got û hin pere ji bêrîka xwe derdixe dixe nava destê wî û berdewam kir û got: Oxir be.

Piştî Ehmo kilît girt û karkarê otêlê jî ji ber wergirtina baxşîşa xwe bi kêfxweşî ji odê derket û derî girt. Di vê navberê de hema bi lez Şêro berbi avrêjkê de çû. Ehmo jî xwe li ser nivînê xwe bi awayekî westandî dirêj kir. Çavên wî bi berbi jora odê ket. Li wir nerî û ji nişka ve leşkeriya ku wî li Enqereyê kiribû hate bîrê, bi çavên nîvgirtî keta

nava wê xeyala leşkeriyê. Di nava wan xem û xeyalên leşkeriyê de ji xwe çû bû heta ku Şêro got:

-Bavo ka tu jî serê xwe naşo?

-Belê kurê min. Ez jî avekê li xwe kim wê baş be.

Şêro û bavê xwe, roja dinê bi awayekî kêf û ji xwe bawer rabûn. Xuriniya xwe kirin û berê xwe berbi uniwersîta doktoriyê ango " Enqere Fakulteya Doktoriyê" vekirin. Li uniwersitê qeyda Şêro çê kirin kaxita qeydkirinê girtin. Êdî Şêro xwendevanekî uniwersîtê bû. Lê hê ji vekirina wê re zêdeyî mehekê mabû. Pişt karê Şêro qedandin, bavê wî got:

-Şêro kurê min bila ev li ser xêrê be. Hêvîdarim tê me şermezar neke. Bibe doktor. Pêwîstiya gundiyan ji te heye. Ji bona xwendina te çi lazim be, bavê te amade ye. Qet meraqan neke. Ez ê ji te re xaniyekê jî kirê bikim û her meh mesrefên te jî bişînim. Tu tenê ji bavê xwe re bixwîne û bibe doktor. Aha te jî didît ku ji ber nexwendin û cahiliya me, bê leşkerên li gundan digerin bê çawa lêdanê li me zilaman dikin. Bixwîne kurê min bixwîne. Ji bona tu jî weke me lêdanê nexwe, bixwîne û bixwîne.

Dema bavê Şêro behsa lêdana gundiyan ji destê leşkerên tirk kir. Yek ser ew bûyera ku ew bi xwe jî şahîdê wê bû û ew gelekî pê êşiya bû kete bîra wî.

Şêro bi serfirazî dibistana xwe ya orte qedandibû, qarneya xwe bi serketineke mezin girtibû. Hemî dersên wî notên herî mezin bû. Pir kêfxweş bû. Wî dixwest rojekê berî rojekê here gund û qarneya xwe rê bav, dayik û xuşkên xwe jî bide û vê kêfxweşiyê bi wan jî parve bike.

Li piraniya gundên beriya Mêrdînê havînan bê av bûn. Ava vexwarinê bi ker an bergîran ji gundekî din dianîn. Pez û dawarin xwe li gundê av lê heba av didan. Di wê kela kela germê de ku hasreta gundiyan peydekirina tasek av bû.

Lê dîsa Şêro her havin li gund dima, bi heval û hogirên xwe re dilîst. Kêfa wî jî ji gund û hevalên wê yên gundî re dihat. Hevalên wî yên gund ne weke yên bajêr bûn. Ji ber wî fêm kiribû ku yên bajarî fen û derewçîn bûn, ne weke yên gund durust û ji hevalên xwe re bûn.

Şêro hatibû mala bavê xwe, kêfa wî li cih bû, Qarneya xwe rê bavê xwe dabû, lê rebenê bavê zêde jê fêm ne dikir loma got:

-Hela ka tu ji bavê xwe re bixwîne Şêrê min. Şêro jî bi dengekî bilind dixwend da ku yên malê hemî pêbihîzin. Dûre bav, dayik û xuşkên wî ew macî dikirin û xelatên wî didanê.

Bi hatina gund hefteyeke wî qediya bû. Rojekê berî nîvro leşkerên dewletê bi du cemsan ketin gund. Çekê wan di destên wan de ha ha gazî û hawar dikirin ku hemî zilam bila li meydana gund top bibin. Gundî jî fêrî êrîşên weha yên leşkeran bû bûn. Wan dizanîbû ku dîsa ferman li ser serê wan e. Dizanîbûn ku wê dîsa bi lêdana leşkeran çend gundî ji heşê xwe herin. Bi vê tirs û xofê bi lez û bez hemî zilam li gel zarokan mêr li meydanê amade bûn. Piştî amade bûna wan, serbaz gazî kir û got:

-Divê kesek di malê de nemîne ha. Ya na hûn dizanin bê wê çi bê serê wan kesên ji mala xwe derneketine.

Şêro dît ku rewş xerab e, loma nêzîkî serbaz bû got:

-Serbazê min bavê min gelekî nexweş e. Di nava nivînan de ye û nikare we re. Min xwest canabê we vê bizanibe.

Serbaz bi zirt û xeyd jê re got:

-Tu kî ye ûlan! Tu çawa dikarî li hember min weha qise bike?

-Ez xwendevan im. Min îsal orte qedand loma bi tirkî jî baş dizanim. Min xwest bi we bidim fêm kirin ku bavê min gelekî nexweş e û di mal de ye, nikare derkeve.

Dema Şêro gotina xwe qedand serbaz çend sîleyên (Şîmaq) baş lê de û jê re got

-Tê jî  sibê bibe terorîst û bibe bela serê vî welatî. Divê hûn nexwînin, xwendina we ji bona me xeter e. Û gazî du leşkeran kir got:

-Herin filan malê bênamûsekî nexwestiye were vir, wî bînin.

Leşkerên ku çûn mala Ehmo ew di nava destên xwe de girt û bi lêdanê heta ba serbaz anîn. Anîn lê Ehmo weke laşekî li ber wî avêtin erdê. Serbaz jî çend pêhîn lê da û got:

-Ew kesên ji serbazên dewletê re serê xwe danînin û emrê tê dayîn bi cîh neynin, heqê wan kuştin e. Lê ez ê vê care te nekujim. Heta careke din xwedê ji min û te re mezin e.

Çend pêhînin din li parsuyên wî da, bi wê lêdana kambax, sê parsuyên Ehmo şkand.

Ehmo û kurê xwe hemî pêdiviyên wî qedandibûn, piştî du şevên xweş, bi xwarinên delal li gundê xwe vegariya bûn.

# -25-

Hêdî hêdî nav û dengê partiya ku dewleta kûr ji Sapo re damezrandibûn û hemî karê wê bi serokatiya Sapo û bi alîkariya dewletê ve bi rêve diçû, belav dibû. Li gor dem û zemên, li gor cih û war, rojeva partiyê jî diyar dikirin. Di herdu bûyerên ku bi kuştina du şoreşgeran, bi kuştina kesekî hêja yê Kurd, bi ser ketibû. Ne tenê bi ser ketibû, her weha du rêxistinên ku dixwesin welatê xwe, kurdistana xwe ji dagirkerî azad bikin, berra ber hev dabûn. Bûyer û kiryarên wan ê ewil bi serketibû, bi vê serketinê, dewlet û Sapo gelekî kêfxweş bû bûn. Vê kêfxweşiyê hinekî pêşiya wan vekiribû. Loma dixwestin ku bûyerên bi vî rengî berdwam bikin.

***

Rojek ji roja perwerdayiya Sapo bû ku ew û mamosteyê xwe Z. Kûçik li avayiya ku karê dewleta kûr lê dihate meşandinê û li odeya ku tim li wir Sapo dihat perwerdekirin, amade bûn. Herduyan bi kêfxweşiyeke mezin xêrhatina hev kirin. Destên hev girtin û hejandin. Ji vê rewşê dixuya ku kêfa wan li cih bû. Loma Kûçik xêrhatineke germ li Sapo kir, keniya û got:

-Sapo ez te pîroz dikim. Di karê xwe yên ewil de tu pir bi xweşî û bi rehetî bi serket. Ev serketin puanekî baş da te, divê haya te ji vê hebe. Mezinê me jî ji te re silavên xwe yên ji dil şand ha.

-Spas mamosteyê min î hêja. Ev hê ne tişteke. Ez ê bi aqilmendiya te, bi alîkariya dewleta xwe, malikê li kurdan xerab bikim. Tê û hûnê hemî bibînin bê ez ê çawa dewleta xwe biparêzim. Ji bona parastina wê çi lazim be ez ê wê bikim. Bawer bike min tu caran ji kurdan hez nekirî ye û ji wan nefret dikim.

-Bijî Serokê min, tu her hebî. Êdî ji îro pêde ez ê ji te re bêjim Serokê min. Bi rastî jî tu serok e. Serokê min e. Parazgerê dewleta xwe ye. Dewletê jî li gor dilê te, te xelat bike. Vê ji bîr neke.

-Bawer bike ez, tu xelat ango diyariyan jî naxwazim. Ez dixwazim bibim xizmetkarê dewleta xwe û koka kurdan bînim. Derdê min tenê ev e.

-Gelek baş e, serokê min. Got û axaftina xwe domand. Serok êdî dem hatiye ku divê em wan eşîr, beg û beglerên kurdan jî ji hev bixin. Hebûna wan dikarê zerarê bide me. Weke tu jî dizane ku ev haziriya me destpêkiriye hemî ji bona Lozana bê ye. Em dixwazin di civîna Lozana dudan de weke perpirsê kurdan tu tê de amade be. Bi amade bûna te, em dizanin em ê çi bi dest bixin. Karê me hê pir e û giran e. Divê em vê bi hevre pêk bînin. Hay û bala tu kesan, rêxistin û partiyan ji vê tune ye. Tu û rêvebirên me vê dizanin. Kurd zêde ne bi aqil in. Tu yê ango em ê bi alîkariya te hemiyan bera hev bidin. Bila ew bi hev bikevin em jî di karê xwe û haziriyên ji bona Lozana bê ku wê di hezîrana sala 2023an de biqede, bikin.

-Bawerim hê gelek wext li pêşiya me heye. Çima tu weha lez û bez dikî? Bi saya dewletê çi lazim be ez ê çareser bikim. Sapo got û keniya.

-Erê weha ye an tu weha difikire. Lê ji bona dewletan ev ne wextekî zêde ye. Pêwîst e û divê em haziriya wê baş pêk bînin. Ji ber ku carna dikare her tişt li gor dilê mirov nere. Plana yekê bi ser neket, divê em ya dudan û ya sisayan jî bi kar bînin.

-Çine wan planên dudan û sisayan?

-Dema lazim bû wê ji te re bê gotin. Niha karê li pêşiya me, karekî dûr û dirêj e. Di nava vê dirêjahiyê de divê em Axa, beg û êşîrên Kurd jî ji hev bixin. Ne tenê ev, divê tu wan kurdên xwendevan, zana û jîrin jî yek bi yek bi alîkariya hevalên xwe destnîşan bike. Wan bi berpirsiyariyên mezin nirxdar bike da ku ew jî kar bikin. Te û partiyê mezin bike. Dûre me dît, xeterin, li gor plan û lîstikên te em ê wan ji holê rakin. Niha du karên pir girîng û divê zû pêk bên li pêşiya te ne. Yek divê tu rêyekê an sedemekê bibîne ku weke partî li hember eşîrên kurdan yê ku di nava wan de jî welatparêz derdikevin an hene, têk bibe. Ew di civîna Lozana bê de dikarin bibin bela serên me.

-Mamosteyê min tu jî baş dizane ku karê min ê asasî fesadî û boxtan e. Heta ev li ba min hebe wê kurd bi ser nekevin û ez ê nehêlim bi ser jî bikevin.

-Gelek baş e. Weke min got niha li pêşiya te du kar hene, a ewil tu bi awayekî, bi rê û rêbazekê bikaribe şerê li hember çend eşîrên mezin ku mane, destpê bike. Wan ji hev bixe. Zorê bide wan da ku ew jî ji ber hêza te, kuştin û wêraniya ku wê partî bike, xwe nêzîkî dewletê bikin. Dema ew bûn zilamên dewletê, êdî wê tirsa me nemîne. Û tê di Lozana dudan de bibe xwediyê hemî erkan ku li ser navê kurdan qise bike.

-Min gelekî baş fêm kir. Tu û dewlet qet meraqan neke. Ev kar karê min e ku ez ê ji bona dewleta xwe bikim. Xizmeta dewletê ji bona min serbilindî ye û têkbirina kurdan jî ji bona min şadî û xweşî ye.

# -26-

Sapo dersa xwe baş girtibû. Loma ew û Buran Balkan bi lez û bez ketin nava tevgerên ciwanên kurd. Dest bi propagandayê kirin û dikirin. Pesnê sosyalîzmê didan û xelasiya herçar perçên Kurdistanê ji xwe re kiribûn armanca ewil. Ev herdu daxwazên wan jî di nava hemî ciwanên kurdan de yên ku uniwersite dixwendin dihatin pejirandin. Roj bi roj hevalbendên wan, endam û alîgirên wan zêde dibûn. Êdî di nava perwerdahiyên endamên wan de heta ji wan dihat, li gor teza sosyalîzmê ku axa û beg li hember şoreşê astengên herî mezin in. Divê em berê wan ji holê rakin da ku pêşiya şoreşa xwe ya xelaskirina herçar perçên Kurdistanê vekin. Ji ber ku dem dema fikir û ramanên îdeolojiyan bû. Ciwanên kurd jî di bin tesîra wan de bûn û wan jî li gor fikir û ramana sosyalîzma ku wê bi alîkariya miletên ku hatibûn û bûne kolonî bikirana.

Kurdên li vê cîhanê ku bi tena serê xwe mabûn. Ji roja perçekirina welatê wan û heta niha tu dewletên vê cihanê bi alîkariya wan ve ranebû bûn. Piştî cîhan bû bû du kamp û li gor gotin û şiroveyên demê, tenha fikir û baweriya sosyalîzmê dikare bi alîkariya gelên bindest û kolonî ve rabe. Ji ber vê bû ku heta ji kurdan hat wan jî baweriya xwe bi wê anîn. Rêya azadiya miletê kurd di wê de dîtin. Ji ber vê bû êdî kar li gor wê bi rêve diçû.  Diçû lê dagirkerên kurdan jî ev fêm kiribûn. Loma çi berhemên ku li dewletên sosyalîst hatibûn weşandinê di wergerên wan de li gor xwe hin guherandin tê de dikirin an ew beşên behsa kurdan dihat kirinê jê derdixistin û weha li tirkiyê didan weşandin. Loma Sapo yê ku tim li komeleya misilmanan bû, li mêja xwe jî dikir bi yek carê dema ku berpirsên dewleta kûr ew kirin zilamê xwe. Jê xwestin ku ew bi rêya ango bi fikra sosyalîzmê derkeve da ku kurdên wê fikirê diparêzin jî li gel partiya wî cihê xwe bigirin, her weha jî bû. Mamosteyê Sapo Z.Kûçikê zana û weke profesorekî dihat zanîn. Sapo bi fikir û ramana sosyalîzma ji wan re lazim bû, dagirt. Perwerde kir û bi wî

da zanîn ku ew ê çawa vê ji bona berjewendî û selametiya tirkiyê bi kar bîne, fêr kiribû.

Sapo yê perwerdeya xwe baş girtibû jî li gor wê zanînê, rojê li komeleyeke ciwanên kurd bû û bi wan re diket munaqeşeyan. Gelek kesên ew ji berê de nas dikirin û ne dixwest silavê jî bidinê, dîtin ku wî xwe baş gihiştîye, zana û jîr bûye. Bi van munaqeşe û gengeşiyan her ku dihare Sapocî jî zêde dibûn. Ji xwe bi kuştina wan herdu şoreşgerana ku Sapo ew bi zilambûna dewletê nav kiri bûn, Sapocitî bêtir di nava ciwanan de cihê xwe girt.

Gelek xwendevanên lîseyê jî ketibûn nava partiyê. Ji ber ku daxwazên partiyê tam jî li gor dîtin û aqilên ciwanên demê bû. Ciwanên wê demê hemî li gor îdeolojiyan perwerdeyên xwe didîtin. Bêtirên wan jî bi wan pirtûkên ku navarokên wan li gor berjewendiya komara tirkiyî dihatin guherandin, dixwendin û li gor wê dihatin perwerdekirin. Heta zanînên xwe ji aqilmend û îdeolojiya ku rêvebiriya wê çepên tirk ku hemî Kemalîst bûn, digirtin. Wan Kemalîstana xwe weke çep rêdidan. Weke mezinên xwe dersa xwe girtibûn, dikirin. Ciwanên kurd hêdî hêdî bi vê îdeolojiyê dihatin jarkirin bê ku ew vê bizanbin. Di vê îdelojiyê de, nasîna xwe, dîroka xwe fêrbûn tune bû. Ji ber ku dagirkeran baş dizanîbûn miletê li ser koka xwe mezin nebe, ew milet wê rojekê bi temamî biqede. Loma wê îdeolojiya bi destê çepên tirkên Kemalîst dihat kirinê, ji bona ciwanên kurd dîroka xwe, zimanê xwe, adet û toreyên xwe fêr nebin, bû.

Li aliyê din jî Sapo li gor rapor û aqilmendê xwe, divê êdî haziriya şerê wan êşîr, axa û şêxên welatparêz yên kurd bikira da ku ew jî bikirana aliyê dewletê. Ya jî bidana koçkirinê, erdê wan bê xwedî bihişta.Yanî  êdî her tişt li gor dilê Sapo û dewletê pêk hatibû. Lê helbet ne tenê ev jî bû. Divê zimanê wan, kar û hemî xebatên wan bi tirkî ba. Heta ku ji partiyê bihata divê kurdî jî bi awayekî nehênî bihata qedexekirin. Di her war û alî de propagandayên xwe, munaqeşeyên xwe divê bi tirkî bikirana. Pêwîst bû adet û toreyên kurdan ji holê rakirina. Loma berî ku civîna ji bona tunekirina kurdan biqedînin Buran pêşniyar kir û got:

-Ez weke nûnerekê kurd (di eslê xwe de dixwest bêje tirk) çi kar bikeve ser milên min ez ê bikin, hûn çi emrî bidin ez ê wê pêk bînim.

Lê ji bona em baş ji hev fêm bikin û bizanibin em endamê partiya xwe ne, divê em ji niha û pêde ji hevre bêjin HEVAL.

# -27-

Ehmo û kurê xwe Şêro ji Enqereyê bi kêfxweşî li gel çend diyariyan ji bona zarokan kirîbûn, hatin gundê xwe. Malbat û gundî gelekî bi kêf bûn. Wê ji gundê wan dokterekî kurd derketa. Bi saya wî doktorî nexweşên bi tirkî nizanin wê derdê xwe û nexweşiya xwe baş fêr bibana. Şêro jî êdî ketibû nava haziriya ku dest bi uniwersîteya xwe bike. Loma di van rojên wî ku weke rojên talî bû, dixwest bi dilê xwe bigere. Bi heval û hogorên xwe re bilîze. Here nava erdan û bi kesên diçûn gundê cîranên xwe û ava vexwarin dianîn, ew jî bi wan re here. Her çiwasî bavê wî digot:

-Kurê min weha nabe. Nabe tu bi gundiyan here avê ji bona malê bîne, vayê xwuşkên te vî karî dikin. Tu yê êdî bibe doktor, xelk êdî bi van çavan li te dinêrin.

-Erê bavo tu rast dibêje, lê weleh tu dibêje qey ez ê herim û venegerim, loma min xwest hemî karê ku li gund hene, ez ê cara talî wan bikim.

-Weha nebêje kurê min! tê here û weke doktorekî were. Tê bibe dokorê gundê xwe, doktorê mala xwe. Tu qet xeman nexwe. Dibe ku rojên ewil hinekî ji bona te zor bin. Lê tê fêr bibe û dibê tu bibe jî. Êdî herkes bi çavên doktorekî li te mêze dikin.

Ev axaftna di nava Şêro û bavê wî de ku bi xweşî derbas bû bû, kêfa wî anî bû. Lewra wî jî xwe bi xwe got: Rast e, ez ê bibim doktor! lê ez nikarim xwe, malbata xwe, gund û erda xwe jî bîr bikim.

Roja dinê bi derketandina rojê û ji malderketandina Şêro hema bû yek. Sebra wî ne dihat, rojên ku ew ê ji gundê xwe bi dûr bikeve, wî diêşand. Difikirî ku gelo ew ê çawa li wir bixwîne. Heval û hogirên wî dê yên li wir çawa bin. Ji roja ew û bavê xwe çû bûn Enqereyê hema weha bê sebir bû bû. Ketibû nava fikir û ramanan. Di nava wan fikir û ramanan de dengekî xweş û nazîk kete guhê wî.

-Şêro, ha Şêro, ma xêre tu vê sibê zû ji mal derketiye? got keça meta wî Xezalê.

Şêro serê xwe berbi alîyê deng ve zivîrand, dît ku waye ew xezala ku bi çend caran çûn û hatina mala meta xwe ew dîtibû. Lê ne bi vî reng û bi xweşikbûna niha. Dûre kire nuçe nuç û xwe bi xwe got:

-Kuro ma min çawa heta niha ev xezala keça meta xwe, bi vî rengî nedîtibû. Bi vê dîtina niha Xezala keça meta wî cihê xwe di dilê wî de vekir û got:

-Na tu tişt tune, ji ber çûyina xwe ya Enqereyê ez hinekî bi kelecan im. Ez ê te (hema weha yek ser ji devî wî derket) gundiyan, xuşkên xwe, bav û dayika xwe bihêlim û gelekî ji we bi dûr bim. Ez ê li wir bi tenê bijîm û bixwînim da ku bibim doktor.

-Erê ma ji vê xweştir! Lê hêvîdarim tê me tevan ku weke te got ji bîr neke. Tê gotin ku kesên ji gund diharin bajaran têne guherandin. Lê tu xortekî bi esl e, hay ji xwe hebe û tu jî weke yên din nebe û me ji bîr neke ha. De ka were hundir waye meta te jî bi haziriya taştê ve mijûl e, were em îro bi hevre taştiyeke xweş bixwin.

-Baş e vaye ez têm.

Dilê Şêro lê dida û wî nizanîbû çima? Bi wê lêdana dil û hinekî bi kelecan keta hundir. Meta wî taştê hazir dikir û got:

-Wey tu bi xêr hatî doktorê min. Tu û vir?

-Metê wele hinekî bi kelecan im. Li benda roja çûyina xwe me. Ji ber wê ez hinekî zû rabûn û derketim derve ku hawayekê bigirim. Lê Xezalê jî li derva bû dema çav li min ket wê got: “Ka were em bi hevre taştê bixwin”. Min jî pêşniyara wê qebûl kir û hatim.

-Ta baş kir kurê min. Vir jî mala te ye. De ka ji meta xwe re bêje, çi ji te re hazir bikim?

-Ji bona min ferq nake, hema te çi hazir kiribe, em ê bi hevre bixwin.

Belê taştê amade bû. Meta Şêro çayên wan jî dagirtibû. Xezalê tam li hember wî rûnişt û dema Şêro hinekî serê xwe rakir, çavên herduyan ketin hev. Bi wê yekê te digot belkî brûsk li hev ketin. Weha di nava herduyan de jî bê ku meta Şêro agahdar be,

teqiniyek ji nava dilê hurduyan hat. Bi nerîna her çar çavên li hember hev, dilê wan geş û xweş bû bû. Kelecan û şadî dida wan. Dema Şêro hinekî hate ser xwe dît ku meta wî jî li wan dinêre û fêm kir ku wê jî maneyek ji wan dîtinên wan derxistibû. Ji ber vê nerîna wan, meta wî him kêfxweş bû bû him jî baş fêm nekiribû ku gelo berê jî di navbêra wan de tiştek qewimî bû ya na. Û got.

-Kurê meta xwe, tê bi xêr here û ji me re bixwîne û bibe doktor. Piştî wê jî divê tu ji xwe re malekê ava bike û bizewice, ma tu qet fikirî ye ku tê bi keçeke çawa re bizewirce?

-Metê niha ne wextê vana ye. Dema roja zewaca min bê û ez bixwazim bizewicim, ez ê yekê bînim ku dê û bavê min jî ji wê razî bin. Bila ne xerîb e. Bila bikaribe zimanê dayik û bavê min qise bike. De metê niha dev ji vê berde.

Bi qedandina taştêya ku meta wî bi destên xwe ji wan re amade kiribû xwarin û çaya xwe jî bi serde vexwarin û Şêro got:

-Divê ez derkevim. Hinekî li nava gund bigerim bi çend hevalên xwe re bilîzim. Rojên çûyina min nêzîk dibe metê.

-Ey de lawo tu dizanî, metê bi heyran. Dema ew rabû Xezalê jî rabû û heta ber derî bi wî re meşiya û got:

-Şêro dîsa were em bi hevre taştê bixwin û carekê jî bila meta te şîveke xweş ji xwendevan û doktorê malê re amade bike, were. Dibe?

-Temam Xezal ez ê werim. Û destê xwe dirêj kir ku xatir ji Xezalê bixwaze nerî ku meta wî li wan dinêre, dev ji dest girtinê berda û got:

-De niha bi xatirê we. Got û berdewam kir: Hay ji xwe hebe Xezal. Çima weha got wî jî nema dizanî bû. Lê tiştê zanîbû ku bi nerîna wan çavan ji Xezalê hez kiribû.

# -28-

Piştî damezirandina PTK ku ji bona kes nizanibin ew berê li Enqereyê hatibû damezrandin, kongreye xwe ya li gundê Misê pêk anî bûn. Êdî partî bû bû weke partiyeke kurd û kurdistanî. Bi komîteyeke kesên zana, jîr û jêhatiyên ciwanên kurd hatibû destnîşankirin. Êdî divê kar bihata kirin. Ji bona partî xwe bide îspatkirin ku ew azadiya her çar perçên kurdistanê bi rêya sosyalîzmê dixwaze, pêk bîne kar û xebatên bê westan dikir. Ha li wir ha li vir bû. Ji ber ku bi wê daxwaza mezin divê gelek kar bihata kirin. Ketin nava xwendevanan, li komeleyên ciwanên kurd her roj li ser mesala azadkirina her çar perçên kurdistanê bi rêya sosyalîzmê munaqeşe û gengeşiyan destpê kiribû. Sapocî ji hemî ciwanên din yên kurd tûjtir, xebatir û çalaktir bûn. Pir kar dikirin da ku xwe ji herkesan pêşketîtir bibînin û vê dîtinê bi xelkê jî re bidin diyarkirin ku ew ji bona azadiya kurdistanê kar dikin. Ji ber wan xebat û çalakiyên xortên jêhatî ku êdî sekin li wan tune bûn, Sapo gelekî kêfxweş bû bû. Loma tim ji mamostê xwe re digot: ”Bawerim em bi serketin û em ê bi serkevin. Heger em bi vî rengî berdewama karê xwe bikin, dê kesê nikaribin pêşiya me bigirin. Sapo û mamosteyê xwe Z.Kûçik ji vê rewşê gelekî kêfxweş bû bûn. Di dema perwerda Sapo de vê carê mamosteyê wî jê re got:

-Divê êdî herkes bi navê serok te bi nav bikin, da ku êdî herkes te weha bizanibin. Êdî tê li ser navê komara xwe, li tirkiyê bibe serokê Kurdan da ku tu dawî li wan bîne. Û pir pîs keniya û têra xwe keniyan.

-Belê mamoste weha ye. Bi saya te û dewletê ez ê bibim serokê kurdên ku tenê bi çavên xwe tiştan dibînin û nikarin bi mejiyê xwe bifikirin. Belê niha rewşa me, ji ya tavan baştir bû ye. Ka îcar çi li pêşiya me heye.

-Serokê min, karê te ê dudan divê tu bi rê û rêbazekê dest bi şerê wan êşîrên kurdan ku hê jî kurd in, bike. Ew siberojê dikarin bibin

bela serê me. Ji xwe ew û dewlet qet ne li hev in. Heger ne bi zorê be, gelek tiştên dewletê qebûl jî nakin.

-Rast e, ka plan û proje çi ye?

-Divê em rêyekê bibînin da ku em şerê êşîretan, axa û begên kurdan bikin. Serok û mezinên wan bikujin. Cih li wan teng bikin da ku ji tirsa kuştinê û koçkirinê bila xwe nêzîkî dewletê bikin. Dema wan xwe nêzîkî dewletê kirin û bi temamî daxwazên dewletê pêk anîn, êdî divê tu dev ji kuştin û şerê wan berde. Êdî ew dibin malê dewletê.

-Niha ew şerê dewletê nakin tu dikarî vê hinekî ji min re zelal bike?

-Serokê min! Dema tu kurdan serbest berde kîjan rojê mecalê bibînin wê li dij dewletê derkevin. Ji ber wê divê em wan bi temamî bi dewletê ve girê bidin da ku tu bi tenê weke serok û berpirsê kurdan di civîna Lozanê de amade bibe. Heger em axatî û eşîrtiya kurdan ji çapê nexin, sibê ew jî dikarin beşdariya civîna Lozanê bibin û daxwazên miletê xwe bînin zimên. Aha wê gavê em ê weke dewlet bikevin tengasiyê ku divê hin maf ji kurdan re bê dayîn. Lê dema tenê tu weke serok û berdevkê kurdan beşdarî bike, ji xwe diyar e ku tê çê bêje.

-Belê rast e, min niha ev baştir fêm kir. Yanî tu dibêje divê em rojekê berî rojekê dest bi şerê axa û êşîrên kurdan bikin?

-Belê weha ye û em dereng jî mane. Tu çek û pêdiviyên xwe meraq neke, em ê weke dewlet wan pêk bînin. Me gotibû ku kurd bê aqil in. Wê nikaribin bifikirin ku PTK çekan ji ku tîne ku ewqasî dikarin li hember axa û eşîrên kurdan şer bikin. Dema te dest bi şer kir, tê bêje û belavokê binivîsîne, ez jî dikarim amade bikim. Vana li dij şoreşa Kurdistanê asteng in, divê ji hole rabin. Ji xwe sosyalîzm jî vê dixwazî.

-Min niha gelekî baş fêm kir, ez ê ji niha de bikevim haziriya şerê li hember axa û êşîrên kurdan. Ez ê derew, rê û fenekê bibînim. Tu qet meraqan neke.

***

Hemî hazirî û amadekariyê şerê Sapociyan ya ku li hember wan axa û eşîrên welatparêz yên kurdan bikin, amade bû. Berî ku dest bi şerê eşîretên kurd yên welatparêz bikin. Dîsa weke her car berî ku bûyerek ango tevgereke ji aliyê PTK de destpê bibe, Sapo û mamosteyê xwe rûdinê û li ser wê kiryara ku divê bê kirinê munaqeşe dikin ku wê çawa serketinê bi dest bixin. Eşîr û tevgerên ciwanên kurdan çawa têk bibin. Di bûyera ewil de Sapo û partiya xwe serketi bûn. Divê êdî wan li dij axa û eşîrên kurdan jî dest bi çalakiyê bikirana û bi serketana.

Ji ber plan û çalakiyeke nû Sapo û mamosteyê xwe li wê avahiya ku biryarên girîng ji bona parastin û rêvebirina dewletê dihat dayin amade bûn. Vê carê herdu bi tenê bûn. Ji ber ku êdî pêwîstiya hemî komîtê li gel Sapo rûnên nemabû. Wan biryar û kiryarên ku wê bihata kirin didan Z. Kûçik ew li gel Sapo rûdinişt da ku plana hatiye hazirkirin pêk bîne. Her du bi hevre derbasî odaya ji bona wan hatibû amadekirinê bûn. Z.Kûçik bi germiyeke xweş, bi hembêzkirineke germ bi xêrhatina Sapo dike û li cihê xwe rûdinên. Kûçik destpê dike:

-Serokê min bi rastî ez te pîroz dikim. Bûyera ewil û kuştina du şoreşgrên ku wê siberojê bibana bela serê me, te ji holê rakir. Rakir û bê ku tu û partî zerarekê bibîne. Kongreya we ya li gundê Mîsê jî gelek baş bû. Min ji Buran Balkan ew agahdarî girtibûn. Yanî êdî xem û xeyala me û ya te ku em, kurdan tar û mar bikin, hêdî hêdî pêk tê.

Dema Kûçik dipeyivî, kêf dibû kêfa Sapo. Hingê kêfa wê ji ber serketinên wî û kêfxweşiya komîteya mezin re dihet ku hema te digot wê niha bê bask bifire. Lê berî ku bifire dîsa Kûçik got:

-Serokê min, êdî tu him serokê min e him jî ê kurdan e ku tê kurdan bi temamî bike bin emrê dewletê. Em ê weha bikin ku dema roj hat divê ciwanên kurd ji bona vê komarê canê xwe jî bidin.

-Belê brêz weha ye. Çi ji min bê ez ê bikin. Heta ku tevgerên ciwanên kurd ji hev bela wela nekim. Wan ji ser erda wan dûr nexim, ez ê qet nesekinim. Belê niha çi kar li pêşiya me ye?

-Karê niha ew e ku divê em li ser biryara te û bi destê partiyê, wan eşîr û axayên bi rastî jî hê kurd in, weke kurd difikirin ji holê rakin. Ji xwe hin ji wan jî hema bêje emrê dewletê pêkanîne. Ji bona em hemiyan bixin bin sîwana dewletê divê partî şerê wan bike heta bi temamî şertên dewletê li ser xwe ferz bikin.

Lê bila tirsa te tune be. Weke tu dizanî ku çek ji teref dewletê, pere û pêdiviyên din hemî jî wê dewlet bide. Wekî din jî em ê hewl bidin da ku hin çekdarên girêdayî dewleta xwe ne, bixin nava PTK ku tê jî û Buran jî bêjin ku me çend endamên nû peyde kirine. Divê em bi her awayî şiyar bin ku kurdên bi rastî bawer dikin wê partî ji bona kurdistanê şerê azadiyê bikin, dûr bixin. Yên bûne weke te û te bawerî bi wan anî ji xwe mesele tune ye. Yên li dij te derkevin weke li dij dewletê derketibin e. Em ê wan bi çend rêyan çareser bikin.

-Weke çi gelo?

-Em ê ya wan bidin girtin, ya jî bidin kuştin û kuştina wan bixin hustiyê dewletê û hêza wê ya tarî. Ya em ê wan bigirin bavêjin zîndanê di wirde wan perwerde bikin ku ew êdî bibin zilamên me. Yên vê qebûl nekin ji xwe dê qedera wan jî ne diyar be.

-Gelek baş e, wê karê min û Buran ew be ku em ê hemî kesên di komîta ku di komcivîna me ya Mîsê pêk hatibû kontrol bikin û serokatiyê ji destê xwe dernexin.

-Erê eynen weha ye. Niha em li ser, tê çawa şerê wan eşîr û axayên kurd ku baweriya wan bi dewletê nayê ku bibin an bikevin bin sîwana dewletê kar dikin. Divê êdî ew jî ji bona vê dewletê kar bikin, proje û planan çê dikin ku wan teslîm bigirin.

-Ma gelo bi rêya şer em ê vê bikin?

-Belê, bi rêya şer. Ji xwe tu û partiya te hûn Sosyalîst in, li gor sosyalîzmê jî axa û êşîr tim li hember şoreşê asteng in. Divê tu û em vê di nava endamên partiyî de bi hemî kesan bidin qebûlkirin. Ji xwe me gelek haziriya vê jî kiriye. Her weha wan kesên me yên çekdar ku wê bibin endamên partiyê, dê karê wan tim ew be ku

provakosyonan ango tevliheviyan pêk bînin. Di nav van tevlîheviyan de jî wê çi bibe êdî tu û em dizanin. Ji xwe Buran van hemiyan dizane. lê dewlet tenê te muxatab digire. Wê Buran jî karê xwe li Kurdistanê bike. Bi xelkê re bi tevgerên ciwanên kurdan re bikeve munaqeşeyan. Kesan ji bona dewletê xeter in, tespît ango destnîşan bikin da ku em jî li çara serê wan binerin.

(Belê piştî damezrandina PTK û dema dixwestin li kurdistanê propaganda xwe bikin, ne disekînin. Rojê li komeleyeke ciwanên kurd bûn. Tam di wê demê de komeleyeke mehelî(navçe) ango li ser navê herêmeke Dêrika Çiyayê Mazî jî hatibû vekirin ku di .bin sîwana vê komeleya herêmî de ji bona xurtkirina PGK (di eslê xwe navê partiyê Partiya Neteweyî ya Kurdistanê bû. Lê ji ber kok û bingeha wê ji gundiyan bû, şoreşgerên wê demê bi navê partiya gundiyan ew bi nav dikirin. Loma ew nav di virde jî weke PGK hate nivîsîn) û rêxistina wê RNK Bûbê û Nezîr bi hemî hêz û qawetên xwe dabûn wir da ku piraniya endamên wê komelê bikin endamên xwe.

Komele gelekî çalak û bi endamên xwe jî xwedî hêz bû. Dema Sapo û Buran dixwazin xwe li Kurdistanê bi rêxistinî bikin, her rojê yek ji wan li komeleyekê bûn. Rojekê kesekî zîrek û li gor xwe jêhatî jî tê wê komeleyê. Lê li wê komeleyê tim Bûbê û Nezîr amade bûn, hemî munaqeş û gengeşiyên li wir dihatin kirin, herduyan bi rêve dibirin. Ya jî beşdarî nava munaqeşeyên dibûn, dikirin. Rojekê Buran tê wê komeleyê, li masayekê rûdinê, çayekê dixwazî. Dema Nezîr çawa wî datîne ber wî. Nezîr wî nas dike ku ew Buran Balkan e û Buran dibêje:

-Heval ez li ser navê Sapociyan dixwazim bi kesekî berpirs ku ez karibin li gel wî qise bikim, hebe em hinekî sohbet bikim.

Li ser vê gotina Buran, Nezîr gazî Bûbê dike û hersê li ser maseyekê rûdinên dest bi gengeşî û munaqeşeyan dikin.

Di nava wê gengeşiyê de, Nezîr yek ser fêr dibe ku ev zilam ne xalîye, loma naxwaze zêde munaqeşeya wan bidomê. Ev yeka û şika ku Buran zilamê dewletê ye bi Bûbê re jî çê dibe û fêm dike ku çima Nezîr naxwazî munaqeşê bidome. Dema Bûbê ji vê rewş agahdar dibe, dibê:

-Em êdî vê munaqeşeya xwe li vir diqedînin û li Buran dinere û axaftina xwe didomîne. Bawer be em tê gihiştin ku tu ne kesekî paqij e. Ji kerema xwe here û careke din jî neyê vê komelê, heger tu hat jî êdî em neberpirsin ku wê çi bûyer biqewime.

Her çiqasî Buran dixwest vê munaqeşeya bi wan re bidomîne jî, Bûbê êdî rê nade û bi vî rengî munaqeşe û gengeşiya nava wan diqede Bûbê û Nezîr endaman agahdar dikin ku dema careke din Buran hat, divê kes li gel wî nekeve gengeşiyan û heta ji wan hat jî divê nehêlin ew li komeleyê rûnê).

-Bila qet şika te tune be. Hemî kar û çalakî di bin kontrola min û Buran de ye. Ez serokê partiyê me û me biryar girtiye ku çi çalakî bibe divê berê min agahdar bikin. Ez jî rewşê binirxînim. Heger pêwîstî hebe, ez ê bi te jî bişêwirim ku wê ew çalakî ji bona komara me çi qîmet û hêjayiya wê hebe an tune be.

-Rast e. Divê bêyî dewletê gavek jî neyê avêtin. Belê her çiqas Buran ji te erktir e jî lê bila tim ew li dû te be, ango navî wî zêde dernexin pêş. Lê bila bê te û Buran tu tiştek nebe ha.

-Na qet meraqan neke. Ez nahêlim tiştekî weha bibe. Heger hin ji rêzê derketin jî em dizanin em ê çawa bikin. Ka îcar tiştê li pêşiya me ango şerê eşîret û axayên welatparêzin kurdan em ê çi demê destpê bikin.

-Niha biryar hatiye dayîn. Êdî tu û Bûran jî li gel hev rûnên. Plana xwe hazir bikin, civîna komîta rêvebir amade bikin û bi wan jî bidin qebûlkirinê ku divê wan axa û eşîrên kurd li pêşiya şoreşê astengin û ew nahêlin şoreş bi pêşve here. Dema we biryar di komîtê de jî da pesinandin. Êdî bi saya wan zilamên me ku endamê partiyê ne, wê dest bi şerê wan axa û eşîran bikin heta ku hemî eşîr û axayên kurd şert û mercên dewletê qebûl bikin.

-Temam tu meraq neke ez ê vê hal bikim û di demeke nêzde wê şer destpê bibe.

# -29-

Êdî ji vekirina uniwersîteya Şêro re hindik mabû. Ew û malbata xwe tev ketibûn kelecana ku wê Şorê here Enqereyê wê gelekî ji wan dûr be. Ew ê li wir bixwîne, bibe doktor. Li mal û gundê xwe vegere. Lê ji aliyakî de jî her dilê Şêro bi ser Xezalê de mabû. Bi wê dîtina ku wî ew li hewşa wan dîtibû, weke tu şûşinekê li dilê wî bixe bû bû. Her ku diçû êdî wî jî xwe ji ramanên wê dûr nedixist. Hezkirin û evîna wî ya li hember Xezalê bi pêşve diçû. Wî jî fêm kiribû ku ew bûye dilgirtiyê Xezalê. Dema rojekê Şêro û diya xwe bi tenê li mal bûn, Şêro hema ji nişkave radibe ser xwe, diya xwe hembêz dike. Rûyên wê ango herdu gepên wê maç dike û dibêje:

-Dayê wele ez dixwazim îro, wê êşa dilê xwe ji te re bêjim, bê ka tu çi dibêje?

-Bêje dayik bi qurman! derdê te, êşa te, ya dayika te jî ye. Ka bêje çiye ew?

-Wele ev demeke ku weke dilê min ketibe Xezalê. Tê bîra te ku roja min li mala wan taştê xwar û baş bala xwe dayê, bi wê nerînê de weke tu şûjinek li dilê min bide. Ji wê rojê û virde her ew di bala min de ye. Êdî xewnên min jî bûye ew.

-Aha dayik bi qurman, ji wê re dibêjin, dilgirtin, evîndarî û hezkirin. Ev nexweşiyeke zor û zehmet e. Heta ku mirov negihêje miradê xwe, ew her mirov dişewitîne.

-Erê wele dayê ez jî bi wî agirî dişewitim. Lê niha ji bavê min re nebêje. Min tenê xwest fikra te bigrim û bizanibim ka tê ji kurê xwe yê bi vî agirî dişewite re çi bêje?

-Temam kurê min, bila bi xêr be. Ne zehmet e. Ew keça meta te ye. Ma wê ji te çêtir yekî din bibînin qey? Gelo keçik li hember vê helwesta te çawa tevgeriya yanî wê jî ji te hez kirî ye?

-Belê dayê em çend caran bi dizî li gel hev axifîn. Ew jî weke min difikire. Lê dibêje here dibistana xwe biqedîne bibe doktorê malê, dû re.

-Rast gotiye. Temam kurê min tu meraq neke. Vemirandina wî agirê kurê min dişewitîne wê bi destê dayika te bê temirandin. Ez ê bi meta te re û dûre jî bi bavê te re biaxifim vê meselê çareser bikim ku bal û hemî xemên te ne li vir be. Ji bona tu dersên xwe bixebite û bibe doktor, dûre em dikarin daweteke mezin ji kurê xwe re li dar bixin.

Dema çend rojek bi ser axaftina nava Şêro û dayika wî re derbas dibe, dayika wî li meta wî dibe mêvan û dibêje:

-Helê! ma tu dizanî ku kurê min dilketiye Xezala te ye. Wê rojê wî dilê xwe ji min re vekir. Got Xezalê jî ji wî hez dike. Ka tu çi dibêje? Em çi bikin? Lawik dike here Enqereyê bixwîne, pêwîst e tenê Xezalê nefikire divê ew dersên xwe çê bike.

-Belê; rast e, bala min jî kişandibû. Heta rojekê li ba Xezalê min hinekî behsa Şêro, xortekî delel û jêhatiye, xwendevanekî uniwersîtê ye û wê bibe doktor, kir. Hema bi yek carê rûyê wê sor bû. Min fêm kir ku mesele çiye. Loma min zêde qise nekir. Êdî tu û Kekê min dizanin. Hûn çawa bêjin em ê weha bikin. Madem ji hev hez dikin, divê em jî ji wan re bibin pîbar.

Piştî ku dayika Şêro bi meta wî, bavê wî û mêrê meta wî re qise kir. Wan di nava xwe de herdu hezkirên hev, herdu evîndarin hev, bi awayekî fermî dergistî kirin. Bi vê yekê dilê wan herdu ciwanan jî germ bû bû. Hin caran dema ew herdu bi tenê diman, ji xwe re behsa siberoja xwe, zewaca xwe û wê çend zarokan çê bikin dikirin. Rojekê dîsa herdu bi tena serê xwe bûn. Piştî Şêro ji keça meta xwe, ji dergistiya xwe, maçekê distîne, rûdinên û Şêro dibêje:

-Biner Xezal ez gelekî ji zarokan hez dikim. Ez dibêjim dema em zewicîn bi kêmanî divê em şeş zarokan çê bikin ha.

-Kuro malnexerab ma em ê ewqas zarokan çi bikin. Dudo ya sisê bes e.

-Na wele ez qebûl nakim. Ji şeşan kêmtir nabe.

-De tu dizane hela bila ew roj bi xêr were. Te çawa xwest bila weha be, delalê berdilê min.

Roja ku wê Şêro here Enqereyê hatibû, bavê wî teksiya ku wê wan ji gund bibe bajêr û ji wir jî bi balafirê here Enqereyê amade bû. Hemî gundiyên ku ne çûbûn kar jî li benda çûyina wan bûn. Şêro yek bi yek destên kesên li benda rêwîkirina wî bûn, girt hejand û got:

-Duayên xwe ji bona min kêm nekin.

Dûre wî û xuşkên xwe jî hev du hembêz kirin, Şêro çû destê dayika xwe maç kir dît ku dayika wî çend hêsirên ji ber rêwitiya wî rijandin. Lê nerî û got:

-Dayê tu çima digirî? Divê tu kêfxwşbe, kurê te wê bibe doktor.

-Erê lawo dizanim, lê hema bêxwediya xerîbiyê zor e. Tê gelekî ji me dûr be.

Taliya talî Şêro dergistiya xwe, delala xwe, Xezala xwe hembêz dike û êdî ew û bavê xwe li siyarê siwar dibin, berê xwe didin bajêr û ji wir jî dê Şêro bifiriya Enqereyê…

***

Şêro li Enqereyê xaniyê bavê wî jê re kirê kiribû de dima. Bi xwendina dersên xwe mijûl bû. Lê di wê dem û dewranê de jî li seranserê tirkiyê û bakurê kurdistanê ji ber tevger, şer û pevçûnên teleban di dibistanan de, xwendevan bû bûn du beş. Yên pêşverû û sosyalîst û yên faşîst. Xwendevanên li Enqereyê û bajarên mezin jî divê bibana terefê alîkî ji wan da ku bikarîbana dibistana xwe bixwendana. Jê û pêve tu rê li ber wan tune bû. Şêro jî gelek caran tûşî hin bûyerên nexweş bû bû. Hinan ew bi faşîstê hina ew bi sosyalîstî nav dikirin. Yanî ew bi xwe heta vê gave jî him ji dêrê him jî ji Camîyî bû bû. Ev jî ji bona wî zehmetî bû ku bikaribe dibistana xwe bi rehetî bixwîne û biqedîne. Loma wî hin caran bi çend nas û dostên xwe yên uniwersîtê re qise dikir. Rewş ji wan re digot. Lê çare tune bû, divê ew miheqeq bibe endamê aliyekî. Li gor pêşniyarên hevalên wî, terefdariya çep ango sosyalîst ya herî baş bû. Ji ber ku dibistan jî di destê çepan de bû. Loma ev ê ji bona wî

baş ba ku bi rehetî xwendina xwe biqedanda. Ew jî li gor pêşniyarên heval, nas û çend dostên xwe dibe endamê an alîgirê aliyê çepan ango sosyalîstan. Dema dibe endam êdî endametî têr nedikir. Gelek caran hin nas dihatin mala wî û mesela netewebûn û sosyalîzmê jê re vedigotin:

-Biner Şêro, ev dinya bûye du kamp, kampa emperyalîstan û ya sosyalîstan e. Ya emperyalîstan li ser zilm û zorê hatiye avakirin. Di vê sîstemê de milet û xelk dipelçikin, feqîrî heye, neheqî pir e. Xelk ne rehet û aram in. Lê di sîstema sosyalîzmê de, ev eksê wê ye. Ji ber vê em jî weke kesên feqîr û bê welat li vê hêlêne.

Êdî karê Şêro jî bû bû ku di hin meselan de jêhatî bibe, xwe zana bike. Da ku ew jî bikeve nava wan xwendevanên weke bilbilan ku di munaqeşeyên xwe de diaxifîn. Êdî sosyalîzm û ew sazûmana wê li gor gotinên hevalên wî, bi xweşe wî jî çû bû. Çû bû lê ne tenê ev, her weha wan hevalên wî endamên PTK bûn, hêdî hêdî jê re digotin:

-Biner Şêro em kurd in û welatê me perçe kirî ye, xelkê me feqîr û bindest e. Divê em hemî bi hevre kar bikin da ku bikaribin azadiyê ji gelê xwe re bînin. Biner bê bi saya sosyalîzmê û teza wê, çend miletên feqîr bûne dewlet. Aha ji bona me jî tiştekî weha lazim e. Ji bona azadiya Kurdistanê jî divê partî hebe, bi yek û yek ev kar nare serî. Di bin siwana partiyê de, em ê bêtir kar bikin û bi alîkariya sovyetê em ê Kurdisanê azad bikin. Hemî tiştên wan digot in û tiştên li ber çavên Şêro diqewîmî hev digirtin. Lewra piştî demekê êdî Şêro jî dibe endamê PTK. Şêro êdî ne tenê endam e, ew bi zanabûna xwe, bi têgihiştina xwe bû bû endamekî rêvebir jî. Kar û xebat, berxwedan û lêdan bû bû karê wî jî, lê dîsa dersên xwe jî dixebitî.

***

Li tirkiyê û li bakurê Kurdistanê rewş gelekî tev li hev bû bû, şer û pevçûn, kuştin û malwêraniyê destpê kiribû, roja li uniwersîteyan şer derneketa tune bû. Di gelek şer û pevçûnan de Şêro jî xwe di nav de didît. Piştî her şer û qewimandinekê endamên partiyê li mala partiyê ku xaniyekî mezin hatibû kirêkirin diciviyan. Li wir bêtir perwerdayî ya partiyê, fikir û ramanên wê, bîr û raya wê bi endamên wê re didan zanîn. Endam li gor wê plan û projeya ku dewletê danî bû dihatin perwerdekirin. Lê hay û baya ciwanên kurd ku dixwestin

ji bona gelê xwe kar û xebatekê bikin da ku welatê xwe bighêjînin azadiya wî, tune bû. Piştî avakirina partiyê li gundê Mîsê, dest bi perwerdahiyê jî hatibû kirin ku endamên wê hemî li gor wê proje û stratejiya dewletê ji wan re danîbûn tevbigeriyana. Di nava kar û baran de jî hêdî hêdî serokatiya Sapo didan pêş da ku civatekê gav bi gav hêdî bi hêdî bi wî mezin bikin. Ji ber ku Sapo zilamê dewletê bû. Ew tim bi awayekî dizî dihate parastin. Loma vê parastinê bêtir rehetiyek dida wî ku ji herkesan bêtir rehet û serbest tevbigere.

Ne tenê li tirkiyê her weha li bakurê Kurdistanê jî di nava çep û rastan de, di komeleyên li dij hev, di dibistanan de jî her şerê xwendevanan jî berdewam bû. Vê rewşê ew firseta ku PTK bikeve Kurdistanê û ew ji hemî partî û komeleyên heyî bêtir çalak û bi daxwaza azadiya her çar perçên kurdistanê bi rêya sosyalîzmê diparastin, bêtir bi pêşve diçû. Di wan deman de tenê azadî û serxwebûna kurdistanê ji aliyê endamên Partiya Neteweyî ya Kurdistanê weke serxebûn dihat parastin. Ev jî ne li gor hesab û deftera PTK bû. Loma li gor aqilmendên xwe, wan hêdî hêdî şerê li hember partî û dezgehên kurdan dikirin. Gav bi gav karê xwe dimeşandin û zêdetir tade û zilm dikirin.

Piştî ku civana Sapo û Z. Kûçik ya ku divê şerê wan axa û eşîrên kurdan bikirana jî, hatibû. Karê li pêşiya PTK gelek bûn. Ji ber wê wan li gor aqilmendên dewleta kûr, plan û projeyên ku wan dabûn partiyê, berî ku şerek an guherandinek bibe, Sapo û Kûçik dicivîyan li ser wê bûyera ku wê biba dihatin encama talî û dûre jî ew bûyer an kiryar dihate destpêkirin.

Ji bona şerê axa û eşîrên welatparêz yên kurd ku şerê wan bê kirinê hatibû dayîn. Loma di hemî perwerdeyiyên PTK ji bona endamên xwe dida, di wan tevan de jî dihat gotin: ”Axa, Şêx û Eşîr li dij şoreşê asteng in. Ji ber vê divê em şerê wan bikin, xwe ji vê astengiyê azad bikin, da ku bikaribin ji bona xelasiya kurdistanê karê baş bikin”. Mêjû, bawerî û fikirên hemî endamên PTK bi vê yekê dagirtibûn. Loma di civîna komîteya rêvebir ya PTK de, Sapo weke aqilmend û mamosteyê xwe Z.Kûçik destpê kir û axifî:

-Hevalên hêja em weke PTK baş bi pêşve diçin, karê me baş dihare. Bi vî awayî em ê hemî astengên li dij, şoreşê ji pêşiya xwe rakin, da ku em di şoreşa xelaskirina kurdistanê de bi ser bikevin.

Piştî wî axaftina xwe qedand, Buran jî mafê axaftinê girt û got:

-Serok, rewş rast û baş şirove kir. Heger em wan astengên li pêşiya şoreşê ranekin em ê bi ser nekevin. Wê wendakirin, kuştin û girtin her bibe para me. Em li vir biryarekê derxin da ku şerê wan eşîrên weke dîwarekî bûne asteng, ji bona xelasiya her çar perçên Kurdistanê, ji hole rakin. Wê gavê karê me bi hêsanî dê bê domandin. Armanca me xelaskirina her çar perçên Kurdistanê ye.

Lê hezar mixabin ku wê demê û di wan şer û pefçûnan de herkesan serê xwe bi azadiya kurdistanê re mijûl kiribûn û dikirin. Ji bona wê çi lazim ba dê bikirana. Lê tu kesan wê demê li wê gotina Sapo û Buran hay nebûn ku ew dibêjin; “Em ê Kurdistanê xelas bikin. Ango tune bikin”

Di wan demana de kes li ser bêjeyên weha bi çûk lê di eslê xwe de yên herî manîdar bûn, nedifikirîn. Ya jî nediket bîra wan ku ew çi dibêjin. Ji ber ku xelaskirin û azadkirin du têgehên ji hev çûda bûn.

Li gor axaftina çend kesên din jî, biryar hate girtin ku PTK li hember hemî axa, eşîr û malbatên mezin yên kurd û tam jî kurd bûn hate dayîn. Li gor vê jî wê ev protokola ku di civînê de hate girtin li ser navê Sapo ji hemî herêman re (bi taybetê yên Kurdistanê re) bihata şandin. Ji bona haziriya xwe û şerê eşîrên kurdan yên li dij dewletê bûn, dest pê bikirana. Ji bona ku wan eşîrenana nêzîkahiya xwe bi dewletê re danîna û şertên dewletê qebûl bikirina. Bikevin bin sîwana dewletê û êdî di nava wan de bahsa Kurd û Kurdistanê nehata kirin. Li gor wê biryarê û fermana Sapo ku encama ji civînê derketibû, ji hemî herêmên bakurê kurdistanê re hat şandinê da ku ew haziriya şerê li hemberî eşîr û axayên kurdan bikin.

***

Dor hatibû ji holê rakirina wan eşîr û axayên kurd. Loma PTK hemî endamên ku wê şerê wan bikirana bi çek kirin, di nava wan çend kesên ku zêde jêhatî û xwedî tecrubeyên mezin yên dewletê jî weke endamên PTK hazir bûn ku dest bi şer bikin. Şerê wan ê ewil ji herêma Siverek û Batmanê dest pêkir, Ji ber ku li Sîverekê ji malbat û eşîra Sûcakan ji roja ewil de, him welatparêz bûn him jî zêde bi dewletê re ne li hev bûn. Heta serokê partiya neteweya Kurdistanê

ê ewil ji vê eşêrê bû. Lê dewletê serokê wê dabû kuştin. Loma jî vê eşîrê tim di nava xwe û dewletê de xeteke sor danî bû. Ango bi dewletê re ne li hev bûn. Dewlet tim ji wan bi şik û hesab bû ku rojekê ev eşîr dikare li hember wan serî rake. Loma hedef û armanca wan ya ewil ew bû ku bi şerê wan û PTK ew mecbûr bimînin da ku xwe nêzîkî dewletê bike. Bi vê nêzîkbûnê jî qe nebe li ser axa xwe bimînin û ji hev tar û mar nebin.

PTK bi alîkariya dewletê, bi çekên wan û bi saya hin zilamên wan yên çekdar, şerekî mezin li hember eşîra Sûcakan hat kirin. Ji ber ne tenê PTK şer dikir, ya rastî dewletê li ser nav PTK şerê vê eşîra welatparêz ku gelek ciwanên wan di nava tevgerên welatparêz de cihê xwe girtibûn, dikirin. PTK bi saya dewletê bi şerekî qirêj û dirêj, eşîr ji hêz xistin. Tar û mariyeke mezin di nava wan de pêk anîn. Ji xwe ev tam li gor dilê dewletê bû. Ango eşîr mecbûr ma da ku bi dewletê re têkiliyên xwe dîne û êdî ji bona parastina dewletê çi lazim be, wê bikirana. Wê agahdarî hemî ciwanên xwe bana da ku ew ciwanana neketina nav tevgerên ciwanên welatparêz.

Piştî teslîmbûna vê eşîrê û bi dewletê re têkiliyên xwe danînê êdî Sapociyan qet eleqedarê xwe ji wan neanîn. Lê di hemî propagandê xwe de, di belavok û medya xwe de û her weha di gelek rojnameyên tirkiyê de jî li ser vî şerê gelek agahdarî dihat dayîn ku Sapociyan pişta eşîra ku bi dewletê re nakok bûn, şikandiye. Loma niha ew mecbûr mane ku bi dewletê li hev bin û li gor daxwaza wê tevbigerin. Bi vî reng û awayî şerê PTK li hember êşîrên kurd berdewam kir. Piştre bi êşîrên li herêman Batmanê ew eşîrên welatparêz mecbûr kirin ku bi dewletê re têkiliyên xwe dînin. Ango bikevin bin emrê dewletê û dewlet çi ji wan bixwazî wê pêk bînin.

Dema ku PTK bi saya alîkarî û çekên dewletê û hin çekdarên wan ê taybet, wan eşîrên hin herêman hemî bi dewletê ve girêdana wan çêkir. Piştre, Farqîn û wan deverana jî bi vî rengî hemî eşîr hêsîr girt, da ku li gel dewletê rûnên. Yek ji eşîrên herî xurt ku di sînorê sê dewletên dagirkran de bû, eşîra Sîrka bû ku hema bêjin ciwanên wan leşkeriya tirk jî nedikirin, helwest û hemî kiryarên xwe ya li hember dewletê piştî têkçûna Împaratoriya Alî Osman û heta niha berdewam bû. Vê eşîrê pişt li tirkan şikandibû. Hêsîrgiritina wê û li hember wan şer hinekî zehmet bû. Ji ber ku eşîreteke mezin, bi ruhiyeta xwe kurd bûn û cihê wan gelekî asê bû. Loma ev ji bona

dewletê zehmet bû ku li hember wan di vê dema nû de şerê ku weke ew dixwazin bikin. Çareseriya vê jî bi destê PTK de dîtin. Loma heta ji wan hat alîkariyeke mezin da PTK da ku berê weke endamên vê partiyê bikevin nava eşîrê û hin ji xortên wan bike hevalên xwe.

Piştî cihê nigê xwe di nava wan de saxlem kirin. Bi kuştina hin ciwanên eşîrekê, xistin hustiyê hinên din. Fesadî xiste nava wan. Dûre PTK xwedî li wan kesên ku wan bi xwe kuştibûn derket û got filan kes hevalê me kuştine û gelek tiştên din kirin ku mecala şer di nava wan de jî bike, dît. Şerekî mezin derxistin û di şerê wan de bêtir berê xwe didan mezinê vê eşîrê. Eşîrê dît ku nabe, bi vî awayî here wê eşîr ji hev bikeve û her hin ji wan, wê bi derekê de bêne koçkirin, wê jiyana wan tevan bi koçberî de derbas bibe. Ew jî mecbûr man bi saya serê PTK ku digotin em ê kurdistanê xilas bikin, xwe radestî dewletê kirin.

Ma gelo dewletê tenê ev dixwest. Helbet na, dixwest ku piştî têkçûna eşîrên mezin, hemî çek hilgirin û bibin parêzger ango korocî her weha jî bû. Dem hat, wan eşîrên ku welatparêz bûn ji bona erda xwe, mala xwe, eşîra xwe biparêzin çek girtin da ku şerê PTK bikin. Ji xwe daxwaza dewletê jî ev bû. Di şerê nava herdu aliyan de jî bêtir wê kesên ji dil welatparêz bûn û Sapo dizanîbûn ew ji bona wî û PTK wê zerar bin, dida kuştin.

Dema ev eşîra mezin û welatperwer ku ji dewletê nexweş bû, çekê dewletê ji bona xwe biparêze girt. Êdî demeke nû pêvajoyeke nû dest pê kir. Eşîrên kurdan yên mezin bi saya serê PTK nêzîkayî li dewletê kirin û mecbûr man ku li ser navê xweparastinê çekên dewletê jî bigirin. Êdî eşîrên mezin yên kurd ku welatparêz bûn, bûne parêzger (korocî) û ketin bin emrê dewletê ku dewlet êdî ji wan çi bixwestana dê wan ê jî ew bikirana. Bi wan bûyer û kiryarên PTK ku eşîrên kurdan jî kirin korocî. Kêfa Sapo li cih bû ku aferîmeke baş ji dewleta xwe girtibû. Tiştê ku dewletê bi salan nikarîbû bikira bi saya zilamê xwe Sapo di demeke kin de ev jî pêk anîn. Êdî firset ji dewletê re xweş bû bû, loma ew bi vê jî nedisekinî. Wan dixwestin gelek tiştên din jî bikin da ku tenê li ser navê kurdan PTK û weke serok Sapo bimîne û hege Lozana dudan ku di sala 2023an de pêk bihata an wê tiştekî weha biba divê li ser navê kurdan Sapo beşdarî bikira û di civînê de bigota: ”Kurd tu tiştekî naxwazin”. Ji ber ku hê

karên PTK Sapo û dewletê pir mabû, divê li Kurdistanê hemî tişt li gor dilê wan bihata bi rêvebirin.

# -30-

Piştî bi serketina PTK û Sapo ya li hember eşîrên kurdan û têkbirina wan. Nêzîkirina wan ya bi dewletê re, dewlet kêfxweş bû bû. Lê hê jî vê têr nedikir. Her ku diçû sedsaliya Lozanê nêzîk dibû. Divê berî

pêkhatina Lozaneke dudan an tiştekî weke wê, hemî tişt li gor dilê rêvebirên dewletê bihatana çareserkirin. Ya na wanê di dawiya sedsaliya Lozanê de gelek tiştên xwe wenda bikirana. Ji ber ku ji dewletên mezin pêve tu kes û dewletan nedizanîbûn dê dawiya sedsala Lozanê de çi biqewime û çi pêk bê.

Bi teslîmbûna eşîretan ya bi saya Sapo û PTK, êdî dor dihat tevger, zana û tunekirina kesên kêrhatî. Dor hatibû ku projeyên nû bihatana amade kirin. Van projena ji teref aqilmendên deweletê dihatin hazirkirin û bi rêya Kûçik ji Sapo re dihate pêşkêşkirin da ku ew jî wan di jiyanê de pêk bîne. Dem dema civîna wan ango ya Kûçik û Sapo bû. Sapo him kêfxweş him jî bi kelecan bû ku gelo wê Kûçik vê carê ji wî re çi bigota. Gelo ji bona vê serketina xwe wê çi diyarî bigirta. Kelecana wî ya ji bona civînê bilind, kêfa wî li cih û serê wî tevlî hev bû.

Roja civînê, dîsa herdu li avahiya dewleta kûr û li odaya xwe ya herdem, li hember hev bi kêf rûniştî bûn. Z. Kûçik bi dilekî germ bi kêfxweşiyeke mezin pêşîwaziya Sapo kir û got:

-Ez serokê xwe pîroz dikim. Heta niha hemî kar li gor dilê me û weke me dixwest te pêk anî. Ev ji bona te serketineke mezin û bê hempa bû. Em hêdî hêdî gav bi gav dighêjin armanca xwe. Ez dixwazim bêjim ku divê tu qet ji bîr neke, heger kar weha bi serketinên te bidome, sedî sed tê li ser navê kurdan, weke mezin û serokê wan, lê weke mezinekî dewleta me jî beşdarî civîna Lozanê bibe. Ji xwe berî ku tu here civînê em ê bi hevre hemî amadekariyên te jî bikin. Lê divê tu vê jî ji bîr neke ku hê gelek kar li pêşiya me heye. Got û bi rûkenî, de ka îcar tê ji min re çi bêje:

-Ma ez ê çi bêjim, bi saya we ez serketinên ji bona dewleta xwe bi dest dixim û heta ji min bê û tê ez ê kurdan têk bibim. Her ez ê weke xizmetkarê welatê xwe li gor emir û temiyên we tevbigerim. Çi karê ji bona tunekirina kurdan, wêraniya wan hebe ez ê weke serokê wan(!) (got û mizmizi xuya ye kêfa wî jî li cih bû) çi erk bikeve ser milên min, ez amade me pêk bînim.

-Gelek baş e, tu her bijî serokê min. Piştî têkdana wan eşîrên dixwestin welatê me ê şêrîn perçe bikin û gelek caran bê emiriya dewletê dikirin hate çareserkirin. Ji bona ku tu jî bizanibe, em ê weke dewlet ji wan bixwazin êdî ew rahêjin çeka me û em ê berê ji wan re bêjin, ji bona parastina xwe divê hûn çekê hilgirin. Ya na PTK dikare koka wê bîne û erdê we ji we bigire. Dema wan çekên deweletê hilgirtin, êdî em ê çawa bikin ew dibe karê me. Ji xwe wan eşîr û axayên ku çeka dewletê hilnegirin jî wê li ser pêşniyariya te, li ser destê te û partiyê dawî li wan jî bê.

Lê niha karê bi wan re baş dimeşe, hema bêje hemî daxwazên me qebûl kirine. Heta demeke kin bi saya tekoşîna te ya li hember wan, em ê hemiyan bikin parêzgerê xwe û kurdan xwe bi xwe berra ber hev bidin.

Karê niha maye ku tu wan tevgerên ciwanên kurdan hemiyan têk bibe. Piştî têkbirina wan jî êdî tu û partiya te weke li ser navê kurdan dimînin û dibin desthilat. Ji xwe dema tu bû desthilat. Li seran serê rojhilata tirkiyê êdî tê bi kêfa xwe be. Te çi û çawa xwest tê weha bike. Yanî êdî tê bibe mezinekî kurdan. Di raya cihanê û di civîna Lozanê de tê bi tena xwe li ser navê kurdan hebe.

-Gelek spas tu her hebî, ez xizmetkarê dewleta xwe me. Çi ji min bê xwestin ez ê bi alîkarî û piştgiriya dewleta xwe wê bikim.

Kûçik bi kêf bû, gotinên Sapo jî bêtir kêfa wî anî bû û baweriya wî zêdetir kiri bû. Ew paçê sor ku tim li dora hustiyê wî bû. Weke ji raya giştî re bi wî paçê sor, xwe weke sosyalîstekî dida nasîn ku ew sosyalîst e. Ew hinekî li dor hustê xwe ji nû de gerand û ji nişkave û bi dengekî berz

-Belê serok! dor hatiye dive êdî tu hemî tevgerên ciwanên ku daxwaza Kurdistanê dikin ji holê rake. Heta ku ew hebin wê rehetî ji me re tune be û ew dikarin projeya me ya ku tê weke serokekî

kurdan û li ser navê wan beşdarî civîna Lozanê bibe, têk bibin. Ji ber vê niha dor hatiye da ku ew jî ji holê rabin.

-Gelek hêsan e, dewletê çawa xwest weha dikim. Elhemdulîlah ji derew, boxtan û fesadî pêve tu tiştekî din li ba me nema ye. Ji ber ku weke cenabê we jî gelek caran anîbû zimên ku aqilê kurdan di çavên wan de ye. Em jî li gor çavên wan tevdigerin. Loma fêm nakin ku tiştên li ber çavên wan baş diherin, wê rojekê dawiya wan jî bîne. Li gor wan derew û boxtanan em ê hemî daxwazên xwe bi wan bidin qebûlkirin. Her weha em ê bi wan bidin bawer kirin ku em bi rastî ji bona azadiya Kurdistanê kar dikin, lê nizanin, fêm nakin û nikarin bifikirin ku em asasê wan ê kurdbûna wan têk dibin, got. (Kenekî bi deng kir û ji serketinên xwe ji xebatên xwe yên ji bona tunekirina kurdan jî gelek kêfxweş bû bû)

-Êdî dor hatiye ku tu şerê tevgerên ciwanên kurd bike. Berê ji kuştina endamên tevgera herî qels destpê bike. Ji xwe ev kar jî karê te ye. Êdî tê çawa bike tu fêrî wê jî bûye. Piştî ku te çend endamên wê tevgera herî qels kuştin, em ê hinekî rawestin bê ka tevger, partî û kurdên din wê çi helwestê rê bidin.

-Hêsan e, bi rastî jî êdî hemî endamên me, hema dibêjin Sapo û hew. Yanî bi alîkariya dewletê em dikarin bêjin ku ji niha de bûme serokê kurdan. Spas ji bona vê pêşniyare dewletê ku ez kirim serokê kurdan. Ez ê di demeke nêzde bi saya çend derew, boxtan û fesadiyan mecala ku em çend kesên wê tevgera herî bi çûk û qels bikujin û bibînin ka bê rêxistinên din çi helwestê rê bidin.

-Ha min ji bîr kir Serokê min. Divê heta ji te bê kadroyên tevgeran bikuje, mezin, aqilmendên û kesên bêtir bi doza kurdistanê re mijûi in, ji wan de destpê bike.

-Mala te ava bî ku em weke hev difikirin.

-De baş e, ka em herin xwarinekê jî bixwin, niha xwarin amade ye. Restoranda vir tenê ji bona berpirs û karmendê vir e. Êdî carna bi xwarina vê restorandê tê gelek mirovên me nasbike.

(Komîteya rêvebir ya dewleta kûr di nava xwe de civînek li dar xistibûn û di vê civînê de bangî Sapo nekiribûn. Di civînê de gelek meseleyên dewletê eleqedar dikir axifîbûn. Di nava axaftinên wan de yekî ji wan got:

-Êdî her tişt li gor dilê me li ser destê Sapo û partiya ku me ji wî re damezrandiye pêk tê. Lê ez dixwazim bêjim, dor hatiye ku em Sapo bi temamî bixin bin kontrola xwe. Bi roj qet problem tu ne ye. Lê divê em tiştekî bikin da ku bi şev jî ew çi dike, wê çi bike, em bizanibin. Têkiliyên wî bi kê re hene, çi difikire û dixwazî çi bike. Erê em pê bawer in. Lê divê em ji bîr nekin ku hin xwîna kurdan jî di damarên wî de he ye. Dikare rojekê rêya xwe şaş bike. Loma dor hatiye ku êdî em wî bi keça dostê me yê Dêrsimî re bizewicînin. Camêr û keça xwe bi temamî cihê baweriyê ne û ji bona vê jî bavê Tesîreyê nabêje na. Dema me Sapo bi Tesîreyê re zewicand êdî wê tu tirsa me nemîne. Bi roj em û Buran, bi şev jî wê Tesîre wî kontrol bike. Niha li pêşme civîna Kûçik û Sapo heye bila êdî Kuçik vê ji wî re bêje.

Ev pêşniyar ji aliyê hemî beşdaran jî hatibû qebûlkirin û biryar dane ku Kûçik vê jî bighêjîne Sapo).

Piştî xwarina xwe xwarin, qedehên xwe yên alkolê bi hevre rakirin û Kûçik got:

-Noş be serokê min, ji bona serokatiya te û bi destê te tunekirina tevgerên kurdan. Got hinekî sekinî û dîsa ji nişkave û bi dengekî berz: Ha min ji bîr kir ku mizginiya komîtê jî bighêjînim te.

-Xêr e çi mizginî ye gidî?

-Serokê min, êdî tu weke serokekî kurdan tê nasîn. Loma me biryar da ku tu bizewice. Bi vê zewacê jî tê bêtir di nava kes û civatê de bê pesindarkirin. Me hemiya bi yek dengê biryar da ku em te û Tesîreya keça heval û dostê dewletê Elî re bizewicînin. Tu jî dizane ku heger ne keseke saxlem be, nabe ku tu pêre bizewice. Keçik xweşik e û ew jî weke te girêdayî dewleta xwe ye. Ji xwe bavê wê ji roja roj de zilamê me ye. Çi biryar û kiryarên li Dêrsimê diqewime an wê biqewime ew me agahdar dike. Ka tu çi dibêje?

-Ma ez ê çi bêjim! We çi çawa baş dît ez ê jî weha bikim. Tu rast dibêje bi saya zewacê wê bêtir qîmeta min ji teref kurdan de bê girtin. Ji ber ku di civata kurdan de ferqa kesên azib û yên zewicî ji hev cûda ne. Ji teref min de temam e. We çi demê xwest em ê bizewicin.

Êdî zewaca Sapo jî temam kirin. Tesîre kirin jina wî û Tesîreyê jî dema Sapo li mal ba, kontrola wê li ser ba. Wê yê Sapo bişopanda ka bi kê re têkiliyên wî hene.

# -31-

Şêro yê ku ji bona bikaribe li Enqereyê bixwîne û bibe doktorekî baş. Di nava wan tevliheviyên ciwanan û xwendevanan de, şer û pevçûnên wan de, mecbûr mabû ku ew jî bibe endamê komeleyekê an terefê aliyekî. Heger weha nekira wî dê nikraîbû uniwersîta xwe biqedanda. Bi vê armancê, ew bû endam an alîgirê tevgereke kurd, lê ma wî yê ji ku bizanîba ku ev tevger an partî ji bona tunekirina kurdan hatiye damezrandin û xebatên wê hemî ji bona vê yekê ye.

Ji xwe di destpêkê de, vê weke gelekan bala Şêro jî nekişandibû, komelaya ku ew bû bû endam ya PTK bû. Armanaca destpêka wî ku bikaribe bi saya endametiya vê komeleyê dibistana xwe biqedîne û bibe doktor. Lê ma wê PTK û serokê wê Sapo ji ku bihiştana ku kurd bixwînin, bibin xwedî kar û pîşe (Meslek). Bibana doktor, ango pijîşk, Endezar, Parêzger ûhwd. Wî jî weke gelekan ji bona armanca xwendina xwe bibe serî, kêfa malbata xwe, bêtir ya dayika xwe, gundî, nas û dostên xwe bîne, cihê xwe li komeleyeke kurd ku girêdana wê bi PTK re hebû, girt û bû endamê wê. Ma wî rebenî dê çawa bizanîba avakarina PTK feqeqe ku ji bona tunekirina kurdan hatiye vekirin. Ma wî yê ji ku bizanîba ku ev partî heta jê bê wê nehêle ciwanên kurd bixwînin û nehêle çavên wan vebe da ku ji bona azadiya gelê xwe kar bikin. Ew jî bi sedema bikaribe bixwîne bû bû endam. Lê heta pê hesiya û fêr bû, êdî tiştekî ku bikarîba bike jî nema bû.

Ji ber rewşa Şêro ya aborî baş bû, xaniyê wî, perên wê hebûn, dema bû endamê komelê. Piştre bû endamê partiyê. Loma wan jê xwestin ku ew du kesên feqîr û rewşa aboriya wan xerab e, bigire mala xwe. Bi hevre him dersên xwe çê bikin û him jî li wir bi hevre perwedahiya partiyê bibînin. Her çiqasî di destpêkê de ev ne bi dilê Şêro jî bû, lê nikarîbû bigota NA. Nabûna wî dikarîbû biba sedema gelek tiştên xerab ku wê bihata serê wî.

Mala Şêro êdî bû bû weke mala partiyê û sê endamên wê bi hevre li wir bûn. Lê dîsa jî Şêro heta jê dihat dersên xwe dixebitî. Erê dixebitî lê ji ber kar û perwerdahiya siyaseta partiyê wextê wî zêde nedima. Ya din jî ciwanekî bi aqil û jêhatî bû. Maldar û dihat hezkirin jî. Ev ji bona partiyê dibû pariyek nanê tenûrê ku dema ew weke endamê partiyê tevbigere, wê çiqasî fêdê jê bibîne.

Di destpêkê de û bi cihkirina du kesên ku Şêro qet ew nasnedikirin, li ba wî di mala wî de bi cih kirin, ne bi dilê wî bû. Lê êdî ev mesele qediya bû. Di demeke dirêj de ew jî bû bû endam û bi zîrekiya xwe, ji endametiyê wêdetir jî bi dest anî bû. Êdî berpirsekî xwendavenên dibistana xwe bû. Ew jî weke gelek ciwanên wê demê ketibû nava tevgera ku dixwest dawî li kurdan bîne. Gihiştibû wê qonaxê ku êdî tam baweriya wî pê dihat ku ev partî wê kurdistanê li gor gotina Sapo xelas bike. Lê wî jî weke gelekan nizanibî ku xelaskirina Sapo bi nav dike, ji binî de tunekirina kurdan e. Ne azadiya wan e. Lê heta wî ev jî fêm kir hasil di mûsilê de derketibû.

Dema dibistana Şêro, sala pêncan, deriyê xwe ji bona bêhn vedanê girtibû. Şêro jî weke her sal berê xwe da gund. Lê vê çûyina wî ne weke yên berê bû…

Roja çûyina wî hatibû. Berî ku here, êvarî wî û wan herdu hevalên wî yên ku belaş belaş li ba wî diman, dixwarin û vedixewarin, bi hevre li ser rewşa welêt, tevgerên partiya wan û roja nêzîkbûna xelaskirina welatê wan hatibû, diaxifîn. Erê ew roj hatibû. Piştî sohbeteke weke perwerdahiyê, hevalekî wî ji çentê xwe nameyeke ku devê wê girtîbû, dirêjî Şêro kir û got:

-Heval kerem bike ev nameya Serok e ku tê bi xwe re bibe gund. Dema te xwe gihişt gund wê du heval bêne seredana te û tê vê namê bide wan. Weke tu dizane ku hemî tiştên me, kar, xebat û lebatên me bi dizî ne, divê tu vê veneke ha. Qedexe ye. Divê êdî tu xwe fêrî vî karî jî bike.

Ji ber çûyina gund, dîtina malbata xwe û bi taybetî ya Xezalê zêde li ser wê nameyê ranewestiya ew ji destê hevalê xwe girt û got:

-Temam heval tu meraq neke. Ez ê wê bi saxlemî bighêjînim gund.

***

Roja Şêro xwe gihiştibû gund, li gund û di nava malbatê de kêf û şahî bû. Êdî Şêro li gund di nava hezkirên xwe, malbata xwe, xuşk, dê û bavê xwe de bû. Ew bû bû hezkirinê hemî gundiyên xwe û her weha ê gundiyên der û dorê jî.

Bi hatina wî ya gund hemî gundî kêfxweş bûn, lê ya herî kêfxweş, şad û bextewar Xezala wî bû. Xezalê her cara ku Şêro didît, diket nava xem û xeyalan. Di wan xeyalan de daweteke mezin ku hemî gundên der dora wan, her gav dê behsa wê daweta ewqasî mezin xweş û delal bikirana, didît. Wê daweta wan li kurdistanê jî nav bide ku cara ewil daweteke weha dihat pêk anîn.

Hemî xeyal, rabûn û rûniştandina wê li ser xeyala daweta wê û Şêro bû. Difirkirî ku wê bi hevre bibin xwedî çend zarokana. Wê navê wan ê çi ba û divê Şêro navê hemiyan li wan bikira. Heta carna dema li ba Şêro yê xwe bû û hingê diketa nava wan xeyalana, hebûna Şêro ya li ba xwe ji bîr dikir. Heta ku Şêro ew şiyar dikir, ji nû de dihate ser heşê xwe.

Lê vê hatina Şêro ya malê, ne weke carên berê bû. Ji ber vê carê Şêro behsa hin tiştan dikir. Ev ji bona gundiyan û Xezalê tiştekî nû bû. Loma bi bahskirina wana tirs û xof diketa nava dilê bavê wî. Şevek ji şevên havîna beriya Mêrdînê li gundê Xezebê û Şêro bi xwe jî li wî gundî hatibû dinyê. Erê li wir hatibû dinyê, lê piştî xwendina li Enqereyê êdî hin tişt fêm dikir. Fêm dikir ku çima evqasî zilm û zordarî li wan tê kirin. Sedema ku çima van zalimên leşkerên romê, dema dihatin gund ewqasî lêdan û êşkencê bi gundiyan dike? Difikirî gelo sûcê gundiyan çi bû ku van leşkerên bê bav ewqasî tade û lêdan li wan dikirin? Çima nedixwestin zarokên gundiyan bixwîne? Ji bona xwendina wan tenê li gundekî dibistan vedikirin û hemî gundên cîran zarokên xwe dişandin vir. Lê her çûn û hatina zarokekî bi serê xwe arîşeyeke mezin bû. Bêtirîn ev problem zivistanan serê xwe hildida. Zivistanan di wê sar û sermê de xwendevanên ji gundê xwe diçûn wî gundê ku dibistan lê hebû, pir zehmetî dikşendin. Rêya her kesekî ji wan jî li der dora saeteke bû. Yanî bi hezar zor û zehmetiyan diçûn û dihatin. Ev jî weke mecbûriyetekê bû ku divê zarok biçûna wê dibistanê.

Lê bi saya bavê Şêro ku wî li gor îmkanên xwe dibistaneke ava kiribû ku ew jî xaniyê wî yê mezin bû, Heta hukumetê ji wan re

bidistaneke weke adetan vekir, zarokên gund li wir dixwendin. Di virde Şêro zêde ew zehmetiyên ku zarokên ji gundên din dihatin wir, nedîtibû û nizanîbû. Her çiqasî carna wî ew guhdarî dikir ku wan zarokana çiqasî di rêya çûn û hatina dibistanê de zehmetî didîtin.Yanî dewletê xwendina pênc salan jî li zarokên kurdan kiribû dojeh. Di nava wê dojehê de wan zarokên bê sol, bê kincên zivistanê, bê xwarin û bi ser de jî hezar zehmetiyên din. Ya herî xerab û mezin jî derdê mamosteyên tirk bû. Ji ber hemî mamosteyên tirk ne dixwest xwendevanên dibistanê bi kurdî qise bikin. Zimanê wan li wan qedexe kiribû. Heta çend sîxur jî peyde kiribû ew zarokên bi kurdî qise dikirin navê wan didan wî. Dema wî jî nav digirt têra xwe û wan sîxurên xwe lêdan li zarokên ku hê bi tirkî nizanîbûn, dikir.

Bi hatina Şêro vê carê weke yekî nû û bi gotinên xwe gelekî xerîb bû. Ji ber ku vê carê Şêro êdî vekirî û eşkere behsa zilma leşkerên romê, zilm û zordariya dewletê dikir. Her çiqasî gundiyan ew guhdarî jî dikirin, lê ne weke carên din. Carna hin ji gundiyan di nava xwe de bi awayekî dizî ji hevre digotin: ”Lawo hela bala xwe bidinê ev behsa çi dike. Behsa zilma dewletê dike. Erê lawo em jî zanin, lê kes nikare bi vê dewletê”. Her kesekî tiştnî ji hev re digot in: Lê ya bêtir bala wan dikşand, gotina Şêro ya ” Heval bû”. Vê gotinê bi temamî Şêro dida dest ku li gor gundiyan ew êdî xurifî ye. Bav, Xal, Metik, Ap û Amojn, Kek û bra hemû êdî li ba Şêro bû bûn heval.

Aha vê gotina Heval nava Ehmo yê ku li bendê bû ku kurê wî bixwîne û bibe doktorekî baş, qetand. Ji bona bi alîkariya xelkê xwe ve rabe, qutifî bû. Lê êdî Ehmo jî baş tê gihiştibû ku tiştnî bi kurê wî ango Şêro yê ber dilê wî hatibû. Dema gundîyan seredana wî dikirin wî her digot: Heval, divê em li dij vê deweleta zalim derkevin. Pêwîst e hûn jî bi azadî bijîn, divê êdî hûn ji vê feqîritiyê xilas bi bin. Vê şêla, Şêro bala gundiyan jî kişandibû. Lê wan nema dizanî bûn wê çi bikirana. Hinan digot in: ”Wele Şêro bi heq e. Wî halê me jî baş fêm kiriye. Camêr dixwazî me ji vî halê derxe” . Hinên din digot in: ”Wele ez dibêjim vî camêrî mejiyê xwe xwariye, ma wê bi çiyên xwe li hember vê dewleta mezin ku xwedî top û tank in, xwedî balafir û cêşeke mezin e, derkevin. Lawo heşê xwe bi serê xwe de. Hûn nikarin bi vê dewletê”

Lê êdî vê havînê karê Şêro ji bû bû propagandeya şoreşekê. Wî wextê xwe bêtir dida ciwanên gundiyan. Dixwest wan li ber meselê bixe da ku dema şoreşa wan bi serkeve, wê ji herkesî re kar hebe. Herkesê bibin weke hev. Êdî wê axa nikaribe erdê gundekî bike yê xwe. Ew erd wê bi awayekî wekhevî li gundiyan bê parvekirin. Ciwan wê ji ber qelendên qîzan zehmetiyê nekşînin. Ji ber ku piştî şoreşê wê qelend rabe û kîjan keç û xort bixwazin, wê bikaribin li gor dilê xwe bi hevre bizewicin. Dema bizewicin jî wê dewleta wan ji herkesên nû dizewicin re xanî çê bike û diyarî wan bike. Yanî Şêro hingê pesn û behsa xweşiya ku piştî şoreşa wan, dê pêk bê dikir. Wan ciwanan jî dixwest rojekê berî rojekê ew şoreş bibe. Loma bi hemî hêjayiyên xwe, li gor hêz û taqatên xwe, li gor aboriya xwe, ji wê partiya ku Şêro behsa wê dikir û pesnê wê dida ku di demeke nêzîk de herkesên bighêjjin armanca xwe. Wan jî bi hemî hêza xwe, alîkariya wê partiyê dikirin. Xort û ciwanên xwe li gor daxwaza wan dişandin nava hêza partiyê.

Bi van xebat û lebatên xwe Şêro ku wê biba doktor, karekî baş ji bona partiya xwe dikir. Ji ber ku ew yekî xwenda bû dê di demeke nêzde bibe doktor. Loma gotinên wî bandor li ciwanan dikir da ku ew jî bibin endamê partiya ku wê şoreşê bike û piştî şoreşî jî dê hemî daxwazên wan pêk bihatana.

***

Belê Şêro bi ketina nava partiyê, bi endambûna wê, bi perwedahiyên ku ji partiyê girti bû, zû bi zû xwe fêrî hemî kar û berpirsiyariyê jî kiri bû. Ji xwe dema wî nameyek ji hevalên xwe yên ji Enqerê bi xwe re anî bû ku wê du kes bên, nameyê jê bigirin, bi temamî xwe radestî partiyê kiri bû. Roja sisiyan du kes li gundê wan bûne mêvan û pirsa mala Şêro kiribûn. Ji wan zarokên li binya gund ji xwe re bi xaran (Şaqûl) de dilîstin, yekî ji wan bi kêf got:

-Xêre heval hûn çima li heval Şêro dipirsin? Vê kêfa wan herduyan anîbûn ku li gund êdî ciwan jî dibêjin, heval. Loma wan jî lê vegerandin:

-Heval ew jî hevalê me ye. Me xwest, em bi xêrhatina wî bikin.

-Baş e. Got xortê bi navê xwe Osmên, da pêşiya wan û dema ketin hewşa mala bavê Şêro bi dengekî berz û ji xwe bawer, qêriya:

-Heval Şêrooo, heval Şêrooooo vaye du heval hatine dixwazin te bibînin.

Bi bihîstina dengê Osmên, hema Şêro firset nedît ku terlikekê bi ser nigê xwe veke, hingî lez kir hema bê pêlav bi bazdan derket derve. Destê xwe dirêjî wan kir got:

-Hûn gelek bi xêr û xweşî hatine heval.

-Spas heval tu jî bi xêr hatî gund heval.

-Spas got û çaveke da Osmên ku ew here êdî karê wî qediya bû. Şêro ew vexwandin hundir, bavê wî Ehmo jî hat bi xêrhatina wan du kesên ku wî hate niha nedîtibû, kir. Piştî ketin sohbetê, Ehmo dît vana bi awayekî dipeyivin ku ew tiştekî ji wan fêm nake û zimanê wan jî bi tirkî bû. Loma wî tenê çend bêjeyên tirkî ew jî li leşkeriyê fêr bû bû dizanî bû. Loma Ehmo got:

-Braziyên min, ez ê we bi tenê bihêlim bawer bikin ji sobhet û axaftinên we min tu tiştek fêm nekir. De gavê bi xatirê we. Dema derket li Şêro nerî û axaftina xwe domand. Kurê min heger mêvanên te wê dereng vegerin ya jî îşev li ba me bin, divê tu haziriya wan û şîvê bike. Çi lazim be, ji xuşka xwe re bêje wê pêk bîne, ez ê berbi dahnê (dema) êvarî vegerim mal. Derket û çû. Çû lê helwesta wî ya ku min ji sohbeta we tu tişt fêm nekir, bi xweşiya wan herdu hevalan ne çû bû, lê di serde qefisandin.

Piştî sohbeteke dirêj ya navxweyî ji wan hevalana yekî got:

-Heval ka wê nameya te jî me re anî ye.

Şêro ji cihê xwe rabû, berbi çentê xwe gavên bi kêf avêt, ji ber ku kesên hatibûn seredana wî ji du kesên mezinên partiyê yên herema Mêrdînê bûn. Dema Şêro name anî û dirêjî wan kir:

-Kerem bike heval, ez heta du mehan li gund im. Dûre ez ê li Enqereyê vegerim. Li wir jî karê me gelek e. Him em dixwînin him jî heroj di nava teşqeleyên kesên xwe nas nakin ku em kurdbûna wan bi wan didin zanîn. Weke hûn jî dibihîzin şer û pevçûn li wir jî kêm nabe. Serok û hevalên din jî biryar dane ku hêdî hêdî bi kadroyên li

Kurdistanê bikevin nava karker, gundî û xwendevanên vir da ku em bikaribin di demeke nêzde hêza xwe li Kurdistanê bikin hêza herî mezin.

-Spas heval ji bona anîna vê nameyê û van gotinên te yên delal.

-Spas ji bona cenabê we jî heval, ka ji malê re bêjim bila haziriya şîvê bikin. Hûn çi dibêjin?

-Na heval karê me zêde ye û zêde wextê me ji bona xwarin û sohbetên vala re tune ye. Em ê qasekî din herin, zehmetiya tiştekî din neke.

Herdu heval çûbûn û Ehmo li mala xwe vegeriyabû. Ew û kurê xwe bi tenê li odê rûniştîbûn, Ehmo li kurê xwe nerî û got:

-Kurê bavê xwe vana kî bûn. Min qet ew nedîtibûn. Em gundî hemî hevdu nasdikin. Lê vana nedişibiyan gundiyên me.

-Belê tu rast dibêje heval. Ew du kesên ji mezinên ku wê şoreşê bikin bûn. Wê we û me tevan ji bin zora dewleta romê, tade û êşkenciyên wan xilas bike. Gotina xwe temam kir lê ew bêjaya ji bavê xwe re got: Heval, gelekî bi zora bavê wî çûbû. Loma bavê wî bi awirekî tûj û bi dengekî hinekî bilind got:

-Kurê min! Ma çi bi te hatiye! Ev çi halê te ye ku hema tu dibêje heval û heval. Ez ne hevalê te me, ez bavê te me. Yên di male de jî dê û xuşkê te ne. Ev çi heval hevaltiya te ye. Hinekî ji xwe şerm bike û hurmeta xwe û hezkirina xwe ji dest nede.

-Heval ev parolaya partiya me ye ku em êdî herkesan weke hevalê xwe dibînin. Êdî hemî kurd hevalên hev in. Ji ber wê jî em dibêjin heval.

Lê ev gotin jî bi xweşa Ehmo neçû bû, hinekî bi şik li kurê xwe nerî û got:

-Kurê bavê xwe, erê me nexwendiye, em cahîl mane. Lê ev nayê wê watayê ku em hin tiştan nizanin. Her miletek bi hêjayiyên xwe hene. Ji roja me çavên xwe vekirî ye û heta niha, me nedîtiye ku cahilekî (qesta wî zarokekî) heta niha ji mezinekî xwe re gotibin heval, gotine, xal, ap, metik û xeltîk ûhwd. Lê dema hûn herkesan bikin heval, wê ev bibe bobelatek û dê bibe bela serê vî miletî.

Weha xuya bû ku sohbeta Ehmo û lawê wî zêde bi xweşa wî neçû bû. Bê dilî xwe derket û berbi odeya xwe ya razanê ve çû. Piştî bavê wî çû odeya xwe ya razanê. Êdî xuşkên Şero yek bi yek ketin oda wî û xwe li derdora wî komkirin da ku ew jî hinekî behsa şoreşê û karê ku tê kirinê, ji wî bibihîzin.

Herdu kesên hatibû ba Şêro û ew nameya ku ji wan re hatibû şandin, digirin lê cihê xwe vedigerin. Nameyê vedikin û dest bi xwendina wê dikin.

”Heval,

Ev kesê ku wê vê nameyê ji we re bîne, kesekî jîr û jêhatiye. Niha bawer kirîye ku em ê şoreşekê bikin û kurdan bikin xwedî dewlet. Kar û xebatên ku ew dike li ser vî asasî ye. Ji ber doktoriyê dixwîne gotinên wî derbas dibe. Lê ew ne weke me ango weke min difikire, ew hinekî cûda ye. Divê çavên we tim li ser wî be. Dema hate gund û heta ji we bê hûn jî carna seredana wî bikin. Hûn jî di hemî propagandayên xwe de tim navê wî bidin. Navdayina wî dê ji bona me baş be, dewlet jî û gundî jî dê wî baş nas bikin.

Heger hat ser rê û weke me fikirî ji xwe tu problem tune ye. Lê hat û wî her ya xwe domand, êdî kar dikeve ser milên we.

Serok Sapo”

***

Şêroyê ji bona bêhnvedana vê sale ku hatibû gund. Êdî weke şoreşgerekî ku wê di demeke nêzde şoreşek bikin ku hemî axa û begên kurdan ji hole rake, dixuya. Loma Şêro vê care hindik wextê xwe ji Xezala evîna xwe û malbata xwe re vediqetand. Bêtirîn demên wî di nava ciwanên gundiyan de derbas dibû. Zilma dewletê û sedema feqîriya wan ku nikarin bi dilê xwe bizewicin. Tiştên dixwazin bikin û rehet bijîn jî dewleta romê, axa û eşîrên kurdan dibîne. Ew di hemî axaftinên xwe de bi dûr û dirêjahî li ser vê radiwestiya ku ew wan ciwanan jî bide bawerîkirin ku piştî şoreşê her tişt wê li gor dilê wan bê kirin. Heta gelek caran wî digot;-Şerê me ya li hember axa û eşîrên kurdan ji bona vê yekê bû. Niha dor hatiye ku ew tevger, partî û rêxistinên li dij şoreşê jî yek bi yek ji hole rabin.

Wan gotinên Şêro di nava kesên nezan de zû cihê xwe digire. Loma jî her ku Şêro dihat gund, li ser asasê wê şoreşê bikin da ku hemî kurda ji bin zilma dewleta romê derxin. Ji ber vê bû ku wî çend kesên li gor gundiyan zana jî kiribû heval, êdî ji gundê xwe derdiketin li gund û gundiyê der û dorê digeriyan da ku hevalan zêde bikin. Wî bi wê zanebûna xwe, bi zîrekbûna xwe û bi jêhatîbûna xwe, hezkirina xwe ya ji dil, di dilê her gundiyekî de bi cih kiribû. Wî çi digot kesên pêre tesdîq dikirin. Bi vî awayî Şêro, nav û dengê wî ji nava her gundekî beriya Mêrdîn dihat.

# -32-

Ji rojan roja hevdîtina Kûçik û Sapo bû. Li Enqerê û di avaya wan kadroyên dewleta kûr tim lê bûn, hatibû. Hemî amadekarî, rapor û nameyên ji hemî berpirsên herêman ji Sapo re hatibûn, xistibû çentê xwe û berê xwe berbi wê avahiyî vekir. Sapo bi kêf ji mala xwe bi çentê tijî rapor û ewreqên ku wê bida Kûçik, derdikeve. Berê çend caran li der dora xwe dinêre, bê ka kesên nas hene ya na, dibîne ku kes tune ye. Dihare li wê siyara ku bi çend gavan ji mala wî dûr ku ew siyare ya zilamên dewleta kûr bû, siwar dibe û berê xwe dide wê avahiyê.

Siyare li hewşa nêzîkê derî disekine. Sapo derî vedike û bi gavên saxlem û ji xwe bawer berbi oda civîna xwe û Kûçik ve dihare. Vê carê Kûçik berî Sapo li wir amade ye û dema Sapo dikeve hundir, ew ji cihê xwe radibe berbi Sapo tê bi kêf û ken destê wî digire, dihejîne û dibêje:

-Wey tu bi xêr hatî Serokê min. Bi vê jî nasekine ew Sapo hembêz dike. Hembêzkirina wî germahiyê dide Sapo ku êdî fêm dike ew di karê xwe de bi ser ketiye. Kûçik axaftina xwe didomîne û dibêje; fermo em rûnên, karê li pêşiya me gelek in. Serokê min.

Her yek ji wan li ser kursiya xwe rûdinên, dosyên li ber xwe vedikin û Kûçik dibêje:

-Serokê min, ez li ser navê dewletê spasiya te dikim. Bi rastî te karê xwe baş bi pêşve bir û di hemî karê xwe de jî tu bi serket. Niha jî hin karê girîng ku li pêşiya me mane, em ê li ser wan sohbetekê bikin. Heger tu bi wan jî bi serbikeve, êdî tu mezinê kurdan e. Ha îro wê kesekî din jî ku dibe te ew tenê di civîna ewil de dîtibû, bê. Ew jî yek ji perpirsê komîta me ya îdarekirina dewletê ye. Ez ê zêde behsa wî nekim. Dema hat em ê bi hevre li ser projeya nû kar bikin. Ji ber ku ev proje gelekî mezin e, ez bi tena xwe ji heqê wê nayêm der. Vê

carê em ê sê kesên parêzvanê dewleta xwe, bi hevre ji bona siberojê dê çi kar bê kirinê biaxifin.

Hê gotina Kûçik neqediya bû, deriyê odaya ew lê rûniştibûn vebû, yekî qamkin û bi simbêl bi ken kete hundir. Herdu ji ber wî rabûn û bi xêrhatina wî kirin. Ew jî li cihê xwe rûnişt, berî ku dest bi axaftina xwe bike li Sapo nerî got:

-Ez li ser navê dewletê te pîroz dikim. Tu ji texmîna me jî bêtir derket. Siheta te xweş. Karê îro li pêşiya me ye, mezin û giran e. Heger tu di vî karî de jî bi serket, êdî mesala kurdan namîne. Got û li Kûçik nerî û axaftina xwe berdewam kir, ka tê tiştekî bêje ya ez rast e rast derbasî mijarê bibin.

-Na, tiştekî ku ez ê bêjim tune ye. Ji xwe niha em ê hersê li ser vê projeya nû rawestin. Got li Sapo nerî û axaftina xwe domand.

-Serokê min! ev brêz Dogu Birincîk e. Ji niha pê de dibe ku ew jî carna beşdarî civîna min û te bibe. Lê karê wî bêtir medya ye. Ji bona karê ku dê fêda xwe bide dewletê û zerarê bide kurdan bi kar tîne. Wê tim berê rastiyan bide şaşiyan. Bi saya vê medya yê wê te di raya giştî ya kurdan û tirkan de mezintir bike. Wê her roj di rojname û kovara wî de wê proganada te, li gor dilê kurdan bê kirin. Gotina min jî ewqas û de ka em dosyên berxwe vekin û dest bi karê ku yê bê kirinê bikin.

***

Belê karê bê kirin ji bona tunebûna kurdan û tevgerên ciwanên wan e. Niha di dosyên li ber wan de biryara tunebûna tevgerên ciwanên kurd heye. Di dosyên li ber wan, tunebûna miletekî û bi dîrok û hebûna xwe miletekî herî kevn li cihanê ye. Di dosyan de tunebûna zimanekî li cihanê zimanekî mezin yek ji wan e. Di dosyên li ber wan de şer derxistina di nava tevgerên kurdan û berra berhev dayîna wan heye. Ya talî jî, di wan dosyayan de, xweşkirina Kemalîzmê li ser destê PTK û bi gotinên Sapo heye. Di van dosyayan de dîtin û nerîna di bi dawî hatina Lozana yekê wê piştî wê dê çi kar bê kirinê heye. Aha di dosyên li ber wan de qir û tunebûna kurdan ku di vê avahiyê û di vê odê de wê bê biryar dan.

”Erê felekê ji xwe piştî perçebûna Kudistanê ya di nav imparatoriya Alî Osman û Farisan de, heta ji wan hatine bi destên hin kurdan, axa an mezinên kurdan kuştine da ku doza kurd û kurdistanê nemîne.

Piştî rûxandina herdu împaratoriyan û di lozana 1923an de perçê kurdistanê ê mezin dane komara tirk ku di nava sed salan de divê kurdên di nava xwe de, bimehîne, nehêle, ziman û adetên wan jî nemîne. Ji ber ku heta niha komara tirk ev pêk neanîne û ji qedandina peymana lozanê jî re hindik dem maye. Rêvebirên komara wan ketine taswasekê ku bê wê çawa di vî sedsalî de kurdan tune bike. Wê çawa bikaribin ên sax mabin bimehînin, dê wan çawa bikin hezkirên Kemalîzma ku ew bi xwe qirkirine. Hemî hazirî û tevgerên komarê ya niha ji bona vê ye. Ji bona vê ye ku tevliheviyan derdixin, kuştin û zîndankirina kurdan zêde dibe. Ji ber vê ye dewlet bi hemî îmkanên xwe ketine kurdistanê û di nava gelek tevgerên wan de, di komele û saziyên wan de, heta ji wan hatiye zilamên xwe bi cih kirine. Lê evê têra wan ne dikir, loma hewldana rêxistineke li ser navê kurdan ya komarê pêk bînin û li ser navê wê rêxistinê ku serokê wê jî dê kurdek be û hewl bide kurdan nehêle.

Tevgerên ciwanên kurdan ku bê tecrube bûn, ketine nav karên siyasî, ha îro ha sibê dê kurdistanê azad bikin, dixebitîn. Bi xwe nehesiyan ku wê sosyalîzma li tirkiyê belav dibe, pêşve dihare ew e ku li ser navê wê, ciwanên kurdan mezinên xwe, dîroka xwe, hebûna xwe, orf û adetên xwe nasnekin û zimanê xwe jî ji bîr bikin in. Ji ber wê bû ku wan ango desthilata komara tirk bi zanebûn, bi sedan heta bi hezaran pirtûkên li ser navê sosyalîzmê, di nava xwendevanan de belav dikirin û di wan yekê de jî mesela kurd û kurdistanê tune bû. Behsa hemî dewletên cîhanê hebû, lê kurd û kurdistan tune bû. Dibe ku hebû li di wergerê de hemî jê derdixistin û didan weşandin û belav dikirin. Da ku kurd li gor wê perwerdaya xwe bistînin û mezinên cîhanê nas bikin. Dîroka hemî gelan bizanibin lê ji ya xwe ne haydar bin. Li gor wê sosyalîzma ku ciwanên kurd fêr dibûn, divê tim; perçe bi qurbana tevahiyê ba. Yanî Kurdistan perçe bû û divê ew biba qurbana tevahiyê ango sosyalîzmê. Bi zimanekî din, divê kurd bibana qurbana dagirkerên xwe.

Piraniya Ciwanên kurd jî weha hatin perwerdekirin. Loma wan dîroka xwe, mezinên xwe nasnekirin. Dema miletek dîroka xwe û zimanê xwe ji bîr bike, êdî zehmete ku bikaribe azadiyê bibîne. Loma hemî xebat û lebatên dagikeran li ser vî asasî û bi rêya îdeolojiyan, kurd hêsîr girtibûn."

Dogu cihê qûna xwe li ser kursiya xwe xweş kir. Dosya xwe vikir û got:

-Em ê niha dest bi xwendina li ser niqaşa ku karê li pêşiya me ye bikin. Piştî têkbirina êşîretên kurd, axa û mezinên wan, dor hatiye ku em tevgerên ciwanan jî ji holê rakin da ku Sapo û partiya wî bi tenê li ser navê kurdan bimîne. Yek ji wan xebatên asasî jî divê Sapo haziriya xwe û şerê wan tevgerana bike. Helbet ew ê ne bi serê xwe tenê be. Yek ji wan wê ew be ku ew kesên me yên çekdar ku me di nava PTK bi cih kirine û çekdarên zîrek in, ew ê dest bi kuştina ciwanên kurdan bikin. Em ji rêxistina herî qels de dest pê bikin. Em ê binerin bê li hemberî bûyerên weha kurd û tevgerên din çi helwestê rê didin. Em ê jî li gor wê tevbigerin. Got û li Sapo nerî û domand. Ka tu çi dibêje Sapo.

-Li gor min ev, wê karekî him rehet him jî zor e. Rehet e ji ber ku niha hemî tevger jî bi rêya îdeolojiyan bûne dijminê hevdu. Dema em kadro û endêmin rêxistina herî qels bikujin bawer nakim ku yên din ji bona vê li dij me derkevin. Ji xwe di nava hemî rêxistinan de şer û gengeşî heye. Tenê em ê vê derbasî çekê bikin. Loma problem di vir de tune ye. Lê tenê tirsa min ji endam û rêvebirin PGK û rêxistina wê RNK ye. Ewqasî min û çend hevalên din bi wan re niqaş kir, lê me çi kir, me nedikarî endamên komîteya wan ya rêvebir nas bikin. Me di vî warî de pir hewl da lê em bi serneketin. Ji ber ew rêxistineke gundiyan e û girêdana wê bi partiya Kurdên bi Iraqê re heye. Wekî din li gor min kar ji bona tevgerên din pir hêsan e. Dema gotina xwe qedan Dogu got:

-Hinek rastî di virde heye. Lê divê em ji derekê û di cihekî de destpê bikin. Madem ku biryar hatiye girtin, destpêkirina wê jî wê ji te destpê bike, Sapo!!!. Ha di nava şer de helbet em ê li rewşê binerin bê ka rewş dê berbi kude here. Ev karekî girîng û bi rîsk e. Loma ne tê bi tenê, em ê hemî li gel hev ji vê re çareseriyekê peyde bikin.

Tu xeman nexwe. Li Kûçik nerî axaftina xwe domand û got: Nerîna te çi ye?

-Ez jî weke te difikirim, Bi şerê PTK û bi serokatiya Sapo û di nav wan de bi cihkirina çekdarên me, wê kuştina kadroyên partî û endamên wan ê çalak ne zêde zehmet be. Ji xwe tê bi rêya medya di destê te de ye ku tim bi nivîs, wêne û propaganda, navê Sapo û partiya wî bide. Ji xwe ez tim bi perwerdahiya wî ve mijûl im. Dema kêmaniyek bû em ê dîsa weke her car li hev rûnên. Tenê li hember me PGK dimîne, piştî halkirina partiyên din wê dora wê jî bê. Qet bila ne xema te be. Ez ê hewl bidim ku rojekê hemî endamên PTK û kurdên din ji bona komara me canê xwe bidin, xebatê bikim. Helbet rêya me dûr û dirêj e, lê ez û dewlet jî em ne kêm in.

Dogu destpê kir û got:

-Baş e, wê gavê em biryara li ser navê dewletê hatiye dayîn ku wê Sapo pêk bîne, me li hev kir. Got û li Sapo nerî û axaftina xwe berdewam kir. Binerê Sapo!!! divê qet tirsa te tune be, dewlet bi tere ye. Tu bi ku de here parêzgerên ku wê te ji hemî xeteriyan biparêzin li ser kar in. Em ê heta qedandina peymana Lozanê nehêlin qet tiştek bi te bê. De niha karê te bila bi xêr be. Êdî erk dikeve ser milên te û kar dibe ya te. Çi wextê çi demê û tu çawa destbi şerê wan dike, tu azad e. Gelek tiştên ji vê projeyê di dosyê de hene. Çi dema tu ket bê çareseriyekê, dosyê veke û tiştên li wir bixwîne. Karê te bila bi xêr be.

Xatirê xwe ji hev xwestin, her yekî dosya xwe girt û derketin.

# -33-

Bi plan û projeyên dewleta kûr, bi serokatiya Sapo êdî tevger û rewş, li bakurê kurdistanê bi awayekî din ket rê û wan meşandin. Bi gotineke din êdî di nava tevgerên ciwanên kurdan de bi saya hin îdelojiyan ku dewletê ew jî bi zanetî li ser destên çepên xwe yên Kemalîst di nava tevgerên kurdan de belavkiribûn. Di wan îdeolojiyan de xwe nasîn, dîroka xwe fêrbûn û mezinên xwe naskirin tune bû.  Her tişt li ser asasê revebiriya wan îdelojiyan dihat meşandin. Û di wan hemî îdelojiyên hebûn de jî, qet behsa kurdan tê de tunebû. Heger di hin pirtûkên qaşo rewşenbîrên tirkan wergerandibana zimanê xwe û navê kurd û kurdistanê di wan de hebana jî, wan di wergerê de ew jê derdixistin. Yanî ne tenê dewleta kûr çep û rastên wan jî nedixwestin û heta ji wan dihat navê Kurdistanê û mezinên kurdan û berxwedanên wan vedişartin.

Yanî dewleta kûr li gor xwe, bi saya serê Kemalîstên xwe ku xwe weke kesên sosyalîst bi nav dikirin, dixwestin civateke nû ji ciwanên xwe pêk bînin.  Wan ciwanên Kemalîst jî serê ciwanên kurd tevlihev bike. Bi wan bide zanîn ku civat êdî ji kesên pêşverû û sosyalîst pêk tê ango em ê pêk bînin. Di vê civatê de wê tenê mezinên îdelojiya sosyalîzmê, dewlet û miletên bindest yên hemî cihanê bi wan ciwanên xwîngerm bide zanîn. Lê heta ji wan dihat navê Kurd û Kurdistanê vedişartin. Gotina wan tenê ev bû: ”Çi dema me sosyalîzm li tirkiyê kire serdest aha wê demê hemî meselên xelkên li ser vê erdnigarê dijîn wê bê çareserkirin. Bi anîna sosylazmê li tirkiyê, wê êdî herkes azad û rehet bijîn.” Lê disa jî wan çepên Kemalîst, li gel hin kurdên hevalbendên xwe, ew ji navê kurdistanê bi dûr dixistin ango ji wan vedişartin.

Komîteya dewleta kûr ku tim li avahiya xwe civîn li ser civînan pêk dianîn û civînên xwe de tim ji Sapo re digotin: ”Sapo heta ji te bê, divê endamên partiya te bila bi kurdî qise nekin. Niha ji bona xebatên demkurt sê tişt pêwîst e tu pêk bîne, heye. Yek divê tu rê nede ku ciwanên kurd zimanê xwe bi kar bînin, bi karanîn hemî

propaganda, xwendin û munaqeşeyên wan divê tenê bi zimanê dewletê be. Dudo divê tu bi nakokî û boxtanên mezin wan berra ber hev de. Ya sisiyan jî divê tu li Kurdistanê bibe desthilat da ku tu jî bikaribe bi rehetî hemî komele, partî û tevgerên ciwanên kurd têk bibe. Di xebatên dûr û dirêj de em ê li gor şert û mercan dîsa bi hevre biaxifin û biryarên nû bigirin.

Endamên komîta rêvebirên dewleta kûr jî kêfxweş bû bûn ku Sapo û partiya wî şerê eşîran gûr kiribû û bi saya çekdarên wan hemî têk biribûn. Niha karê asasî ew e ku Sapo û partiya wî tevgerên ciwanan jî têk bibe. Ji xwe hemî tiştên divê bihatana kirin di wan dosyên ku her yekî yek bi xwe re birin mal, de hene. Divê Sapo wê bixwîne da ku navaroka wê baş fêm bike. Dûre jî dest bi karê xwe ê nû bike

Ji bona Sapo bikin mezinekî ji mezinên kurdan piştî agahdariya kongreya avakirina partiyê li gundê Mîsê dan. Her navê wî di hemî çalakiyên ku ew tê de hebû ya tune bû derbas dibû. Gelek kesên bi azadiya kurdistanê bawer û ji bona wê armancê tevlî partiyê bû bûn. Gelek mirovên zana jî di nava wan de hebûn û bû bûn endamê PTKê. Baweriya wan tenha ji bona azadiya kurdistanê bû. Ev daxwaza wan bi awayekî hê berfirehtir bû bû daxwaza partiyê jî. Loma wan kesên zana û partiya ku dewletê asasê wê li Enqereyê danîbûn û Sapo kiribû serokê wê, bawerî dianîn ku wê zûtirîn demê kurdistanê azad bike.

Ciwanên wê demê xwîngerm bûn, ji teref dewletê jî gelekî tade, êşkencî û lêdan didîtin û dîtibûn. Bi vê hêrsa ku ji bindestiyê xelas bibin, gelekan di nava partiyê de cihê xwe girti bûn. Serokê xwe jî weke Sapo naskiri bûn. Ji ber ku Sapo zilamê dewlet kûr bû. Ji herkesan bêtir û rehetir di hemî çalakî, semîner û minaqeşeyên di nav tevgerên ciwanan de beşdarî dikir. Vê beşdariya wî û çalakbûna wî, bala ciwanan dikşand ku ev bi rastî ne tenê serokê PTK ye, ew weke serokekî hemî kurdan didîtin. Ji ber ku wan bi çavên xwe kesekî din weke wî, weha çalak û li her derê hazir nazir nedidîtin.

Sapo ha li wê komelê û li vê navendê bi ciwanan re dikete minaqeşeyan, bi wan minaqeşeyên xwe jî wî kes nasdikir û yên li gor wî û dewletê xeter bûn, dihat girtin an kuştin. Wê demê dîsa ciwanên kurd yên xwîngerm ev jî nedidîtin. Mejiyê wan tenê bi şoreşa azadiya kurdistanê ve hatibû dagirtin. Lê Sapo bi plan û

proje tev digeriya. Hêza xwe ji dewletê digirt.Tirsa wî û girtinê jî tune bû. Li gor Sapo heta vir kar gelekî baş hatibû û li gor plana dewletê êdî dor hatibû şerê tevgerên kurdan. Ji bona yek bi yek ji holê rabin. Sapo û partiya wî bi tenê bimîne da ku di Lozana 2023an de ku wê pêk bê, ew li ser navê kurdan wekî berpirsekî wan î mezin di wê civînê de beşdarî bike. Ji xwe hemî tevger, kuştin tevlihevî, nearamî, şer û pevçûn ji bona civîna Lozanê bû. Sapo ev baş dizanî bû. Loma wî bawerî bi soza karbidestê dewletê anîbû ku ew ê li ser navê kurdan beşdarî civîna Lozana dudan bibe.Li ser vî asasî mamosteyê wî Z.Kûçik ew baş perwerde kiribû. Lê hemî tevgerên ciwanên kurdan hay û bala wan jî vê tune bû. Bi hev ketibûn, şerê hev li ser baweriyên îdeolojîk dikirin. Heta hin caran şerê giran jî di nava wan de derdiket. Ji vê rewşê Sapo û partiya wî kêfxweş dibûn ku bi vî awayî dê karê wan jî rehet bibe. Dê rehet bibe ji ber ku hemî rêxistinên tevgerên ciwanan jî ji ber sedemên îdelojîk ne li hev bûn.

***

Ji vê rewş û tevliheviya ciwanên kurd û ne yekbûna wan, karê Sapo dê rehet bihata pêk anîn. Loma wî daxwaza civîna komîteya rêvebir ya PTK dikir ku bicivîn û li ser hin çalakiyên nû biryaran bigirin. Ji ber ku di medya dewletê û ya Sapociyan û ya hin kurdan de, di çalakiyên eşkere de her navê Sapo li pêşbû, loma jî ew di nava partiyê de jî bû bû desthilatê hemî karan. Dawiya hemî civînan de biryar ya wî bû.

Roja civîna komîteya PTK ya ji bona tunekirin ango ji holê rakirina tevgerên din yên ciwanên kurd destpêkiri bû. Sapo di civînê de ji xwe bawer û weke serokê wan û tavaya kurdan, civîn vekir bi xêrhatina tevan kir û got:

-Me heta niha karên gelekî baş ji bona xelaskirina herçar perçên Kurdistanê kir. Wan eşîr û axayên li dij azadiya kurdistan û şoreşê, bû bûn asteng, niha bêdeng in û ji bona hebûnên xwe ê eşîretî li ba dewletê cihê xwe girtine û bûne dijminê me. Ji ber ew bûne dewlet, êdî pêwîstiya ku em şerê wan bikin nemaye. Ji ber ku êdî ne li hember me û ne jî li hember xelasiya her çar perçên Kurdistanê, dengê xwe derxin. Bi saya we û endamên zîrek ev pir xweş hate pêk anîn. Lê karê me yên ji bona xelasiya kurdistanê hê dûr û dirêj e. Divê em yek bi yek wan astengên li hember şoreşa Kurdistan

bikin, rakin. Ji bona dewlet û cîhan jî bizanibin em tenê dikarin ji bona mafê kurdan bi dewletê re rûnên. Heger dewlet vê qebûl neke, helbet em ê şerê wan jî bikin. Lê ya girîng û karê niha ew e ku em bi hevre li gor biryara vê civînê dest bi şerê wan tevgerên ciwanên kurd yên li hember şoreşê ne bikin. Ka hûn çi dibjin?

Got lê di eslê xwe de wî kes guhdarî nekir. Çi bihata gotin an çi biryar bihata dayîn jî, ya talî li gor dilê Sapo û Buran dibû. Yanî wan ji axaftina civînê û biryara wir bêtir bi ya xwe dikirin. Êdî biryara tunekirina tevgerên ciwanên kurd hatibû pesinkirin û bi emrê Sapo ji hemî komîteyên çi yên li tirkiyê û çi jî yên li Kurdistanê bihatina şandinê.

Êdî dor hatibû dê çawa, ango çi sedemê bixuliqînin da ku dest bi şerê tevgerên ciwanên kurd bikin. Di vir de dîsa gotina talî ya Sapo bû, loma wî dest bi axaftinê kir got:

-Em ê ji rêxistina herî kêmhêz destpê bikin, çend hevalan hazir bikin, bila bi endamên wê tevgerê re têkevin minaqeşeyan û bi wan minaqeşeyan de bila tevli heviyê derxin, şer û pevçûnê bikin, heta rê dîtin bila bi çekên xwe wan gulebaran bikin, kî mir, kî man ne xem e. Piştre ewên jî bixwazin tola xwe hilînin û wê şerê me û wan destpê bike. Hûn dizanin ku em partiyeke çekdar in, Hûn dizanin ku Kurdistan ancax bi rêya çekan dikare xilas bibe. Di civînê de tu kes li dij gotina Sapo derneketin û bi yek dengî biryara li hember tevgera ciwanên kurd ya bi hêza xwe herî kêm, derket.

Li gor plan û projeya dewletê dabû Sapo da ku wê çawa dest bi kuştinê bikin hebû. Loma di demekê kin de ji wê rêxistina herî kêm û qels, şerê xwe destpê kirin. Şerê nava wan zêde ne ajot ji ber tevgera wan ciwanên welatparêz zû ji aliyê PTK de hate teslîm girtin. Ev jî kêfxweşiyek xistibû nav endam û alîgirên wê. Kêfxweş bûn ji ber ku di demek kinde tevgereke ciwanên kurd qels û bêdeng kirin. Lê li hember vî şerî û kuştina hin endamên wê tevgerê, tevgerên ciwanan yên din bê deng man. Weke bêjin; ”Ne şerê me ye, çi ji me re lazim e ku em xwe bixin nav karekî weha”. Ji xwe dewlet û Sapo jî li tiştekî weha digeriyan. Di vir de dewletê fêm kir ku dema şerê kurdan yên li hember komarê destpêkiribû û dewletê çawa dest bi kuştina zilamên eşîra herî kêm kiribûn û eşîrên din bê

deng mabûn, niha jî ew rewş bi awayekî din li ser rê bû. Dijmin ev yeka baş dizanî bû û ew baş bi kar dianîn.

Dema rûxandin an qelsbûna Împaratoriya Alî Osman dest pê kiribû û M. Kemal weke generalekî dema Osmaniyan ku dest bi şerê hilweşandina desthlatiya wan kiribû, alîkarî û qawet ji eşîrên kurdan xwestibû, yek bi yek li nav wan geriya bû û gotibû: ”Werin em b hevre Împaratoriya Alî Osam birûxînin,  komareke nû damezrînin û di vê komarê de wê mafên herkesan weke hev bin. Wê ev komara ya Tirk û Kurdan be. Lê piştî rûxandina Împaratoriya Alî Osamn bi alîkarî û piştgiriya hin kurdan pêk hat û komara tirk hate damezrandin. Di damezrandina vê komarê de, tu mafê kurdan tune bû. Heta dûre ji bona wan eşêrên bi alîkariya M. Kemal ve rabû bûn yek bi yek şerê wan hate kirin û heta ku hemî teslîm girtin ango bê deng kirin.

Ji ber wê niha jî wan dixwest hêdî hêdî, gav bi gav, yek bi yek rêxistinên kurdan tevgerên wan ji holê rake. Loma biryara şerê wan hatibû dayîn. Weke çawa di dema şerê êşîr û malmezinên kurdan li hember komara tirk destpê kiribû û komarê ewil dest bi kuştina êşîr an malbatên qels kir û yên din bê deng man, niha ew li ser tevgerên kurdên dilsozên gelê xwe jî, pêk dianîn. Bi tunekirin an bêdengkirina wê tevgera ciwanên kurd a bi çûk û bi kuştina hin kesayetiyên kurd, partî bi serketibû. Piştî serketin bi dest anî di civîneke din ku dihatin ba hev biryara şerê tevgereke din li gor daxwaza Sapo û Buran derdiket.

# -34-

Şêroyê xwendevan ku wê biba doktor, biryara şopandina xwe û tevlihevbûn û nakokiyên gundiyên xwe bi destê xwe anî bû û dabû wan herdu kesên wî qet berê nedîtibû û nasnedikirin.

Bi saya wê nameya ku Şêro ji Enqereyê anî bû û dabû wan herdu kesên nenas, êdî rêya Sapociyan ku bikeve gundê Şêro û yên derdorê vebû bû. Ji ber ku di nav xelkê de hatibû fêm kirin û zanîn ku vana hevalên Şêro ne. Ji ber ku gundiyan ji Şêro hez dikirin û pê bawerî dianîn. Loma wan texmîn dikirin ku wê hevalên wî jî weke wî bin. Rebenê gundiyên nexwenda, ma wê ji ku bizanîbana ku Şêro bi dayîna wê nameya ku da bû wan herdu kesên hatibûn ba wî, biryara bê aramî, şer û pevçûnan jî dabû. Êdî Sapocî hêdî hêdî dihatin gund bi hatin û çûyinên xwe, çend heval jî peyde kiribûn. Bi saya wan çend kesên nexwenda û nezan karê wan ên li gund rehet bû bû. Hêdî hêdî gund û gundî diketin bin emrê wan. Şerên wan î li hember axa û eşîrên kurdan û ew tevgerên Sapociyan ji bona wan bû bû cihê propagandayê ku her dianîn zimên û digot in:

-Binerên!!! partiyê çawa eşîr û tevgerên li dijî xelaskirina her çar perçên kurdistanê tên, qels û lawaz kirin. Partî bi her awayî şerê wan dike da ku Kurdistanê xelas bike. Di heman şerî de partî bi serdikeve. Loma azadî nêzîk e.

Wan şer û pevçûnan carna kêfa gundiyan dianîn. Ji ber ku piraniya gundên bakurê kurdistanê di destê axa û begande bû. Sapociyan jî serê xelkê bi derewan dagirti bû, loma tim digot in; ”Dema şoreş bi destê partiyê bi serbikeve. Em ê herçar perçên kurdistanê xelas bikin. Aha wê demê em ê erdê wan axa û begleran li we tevan weke bra parve bikin”. Ev gotin bi xweşiya gundiyan jî diçû. Ji ber gundî him bê erd bûn, him jî tade û zilm, him ji dewletê û him jî ji axa û beglerên xwe didîtin. Ew tim feqîr û rêncberê axa û began bû. Loma kêfa wan jî dihat ku ewên bibin xwedî erd. Loma çi ji wan dihat wan

jî piştgirî didan partiya ku wê siberoja wan jî ji holê rake, lê wan ev yeka fêm nedikirin.

Şêro jî asasekî baş li gundê xwe danî bû ku ew kesên wî kiribû endam. Komîteyek ji wan amad kiribû ku ew jî êdî dest bi propaganda partiyê bikin. Hevalan li gundan peyde bike û partiyê bi wan jî bide hezkirin. Bi saya serê vê xebata Şêro xebateke berfireh hate kirin ku endam û alîgirên partiyê çê bûn.

Rewş lê weha hatibû ku ne tenê Sapocî hemî tevgerên wê demê jî di nava karkeran de, di nava gundî û xwendevanan de, dest bi propaganda partî û tevgerên xwe dikirin, Li ser meseleyên dinyê û miletên bindest, li ser rewşa sovyetê û dewleta xelkê, gengeşî û niqaşên ku gundiya jê fêm nedikirin, dihat kirin.

***

Êdî bi awayekî gelemperî û bi berfirehî karê tevgerên ciwanên kurd di nava gundan de, di nava bajar û karkeran de, bi xurtî dihate kirin. Ji ber wê bû ku dewletê dixwest li hemî gundan Sapocî bibe desthilat da ku tevgerên din nekeve nava gundan û gundî li dû wan nerin,

Piştî dewleta dagiraker van pêşveçûnên xwendevanan didîtin tirs û xof dikete nava wan da ku wê rojekê Kurdistanê ji bin desthilatiya wan derkev e. Gihiştibûn wê baweriyê. Loma her dixwestin wan tevgerên ciwanên kurdan têk bibin. Wan ango dagirkeran bi zanetî û li ser destê hin şexs, kes û kesayetî û bi rêya hin partiyên bi nav kurd û weke ya kurdan e, lê li ser destê wan hatibûn avakirin, dixwestin tevgerên ciwanên kurd têk bibin.

Ji ber vê bû wan bi ragihandinekê partiya li ser navê kurdan, lê ya xwe didan zanîn. Di hemî rojnameyên xwe de weke partiyeke nû û dijminê Tirkan (di eslê xwe de ya kurdan) didan belavkirin. Ji ber vê êdî wan bi destê xwe, li gor baweriyên xwe, partiya bi navê PTK ku serokê wê jî kurdekî bi temamî zilamê dewlet kûr bû. da ku li ser destê wî û Sapociyan tevgerên ciwanên kurd, yek bi yek têk bibe. Ji bona têkbirina tevgerên ciwanên kurd û bi temamî ji holê rakin, di destpêkê de çend kurdên welatparêz û zana bûn, kuştin lê ew kuştin dixistin hustiyê tevgereke din da ku ew herdu tevger bi hevkevin.

Dûre jî dest bi kuştin û talankirina eşîr, axa û begên welatparêz kirin da ku ew jî nêzîkî dewletê bibin û têkiliyên xwe bi dewletê re dînin. Ji ber êşîrên ku Sapociyan şerê wan dikirin mecbûr diman ku têkiliyên xwe bi dewletê re bikin û dewlet jî bi alîkariya wan ve rabe. Ev jî ji bona gund û erdê wan ji destê wan nere, dikirin. Ji xwe projeya dewletê ya damezrandina PTK jî li ser vî asasî bû ku tevger, axa û eşîrên welatparêz ji hev bikeve, belav bibe an bikevin bin sîwana dewletê.

Piştî kuştina Sakî û Ferhadê Dirêj, Sapo vê carê jî şerê wan eşîrên kurd yên welatparêz kir û ew ji tirsa xwe ketin bin sîwana dewletê. Vana hemî bi xweşa wê komîteya dewleta kûr ku wê Sapo bikin serokê kurdan û PTK a kurdkuj, kêfa wan li cih bû. Heta vir karên wan li gor dilê wan meşiya bû û pêk hatibû. Dewlet ji vê rewşê kêfxweş bû bû. Her roj bi rêya zilamên xwe û mamosteyê Sapo name û brûskên pîrozbihayê ji wî re dihatin. Ew jî ji ber van tu nedima ku hema bê bask bi ezemana bikeve. Her ku pîroznameyek digirt, hêrsa wî bêtir bilind dibû da ku bêtir kurdan bikuje. Yanî bi gotineke din tam jî weke deweletê dixwest derket. Ji dewletê bêtir ew bû dijminê qewmê xwe.

Li gor serketina Sapo û partiya wî ya ku li gor destûr û bernameya dewletê karê xwe dikirin. êdî dor dora tevgerên ciwanên kurd ji holê rakirinê bû. Di destpêkê de şerên xwe ê li hember tevgerên heyî, ji tevgera herî kêmhêz destpêkirin da ku fêm bikin bê wê ev şerê wan di nava tevgerên din de çawa bê dîtin an şirovekirin. Piştî şerê ku çend kadroyên wê tevgera kêmhêz kuştin, Sapo û dewletê dîtin ku ji teref partiyên din ve tu helwest rê nedan û li dijderketandin tune ye. Loma biryara yek bi yek şerê yên din jî bikin, misoger kirin.

# -35-

Hay û baya tevgerên ciwanên kurd ji vê feqa li pêşiya wan hatibû vekirinê tune bû. Her yek ji wan bi propaganda xwe û endam qezenckirina xwe ketibûn. Her yek ji wan ha îro ha sibê dê şoreşekê bikin, xebatên xwe dimeşandin. Ji bona wê jî qet nikarîbûn li ser kiryar û tevgerên PTK rawestiyana. Bê ka ew ji bona kê kar dike. Nikarîbû bidîtana, bê çima Sapocî şerê eşîrên kurd yên welatparêz kir û dike. Fêm nedikirin û tê nedigihiştin ku wê dema wan jî bê. Hemî tevgerên ciwanên kurd di nava karên xwe de û di demeke nêzde wê şoreşekê bikin şerxweş ketibûn. Şerxweşî jî nahêle ku mirov pêşiya xwe bibîne û bi aqilana tevbigere.

Lê PTK, Sapo û dewletê bi plan hereket dikirin û wan dizanîbûn dê çi bikin. Li gor wê, bê wan ê bi çi planan bikarîbana şerê tevgerên ciwanên Kurd bikirana. Wan jî weke êşîrên kurd ji holê rake da ku partiya Sapo û Spocî bibin mezin û desthilatê kurdistanê. Li ser navê kurdan tenê ew bibe xwedî maf. Ha ji ber vê jî gelek ciwanên kurd li ser asasê du tiştan tevlî wan dibûn. Yek wan kesên ji civatê dûr, bê qîmet û ne dihat hezkirin, yên din jî ji wan kesên bi rastî jî bawer dikirin ku wê PTK kurdistanê azad bikin. Lê wan kesên durust li xwe hay bûn û rastiiya meselê fêm kirin, êdî zehmet bû ku ji nava wê derketana. Ji xwe biryara şerkirina bi tevgerên kurd yên ciwanan ji Enqereyê hatibû misogerkirin. Lê weke formalite û bi endamên komîta navandî, civînekê li dar dixin û ew jî şer û ji hole rakirina tevgerên din dipesidînin. Ji xwe weke her car dawiya civînê bi gotinên Sapo diqediya û belavoka encama civînê jî li gor gotinên wî dihate, nivîsîn û belavkirin.

Ev biryara PTK a ku li gor gotin û dîtinên Sapo hatibû hazirkirin weha bû: “Me weke PTK di civîna xwe de biryara bi yek dengî girt ku em ê ji niha û pêde, çi tevger, kes û kesayetiyên li hember şoreşê (di eslê xwe de tirkiyê) bûne asteng ji hole rakin. Van tevgerên ku kurdistaneke serbixwe naxwazin ew hemî xayînin. Loma divê xayîn

li kurdistanê nejîn. Ji bona wê em mecbûr in ku her kes û partiyên li dij serxwebûna herçar pêrçên kurdistanê bûne astên tune bikin.”

Li gor vê daxuyaniyê êdî Sapocî bi çekên dewletê û bi kesên bi karanîna çekan zîrek bûn û di eslê xwe de zilamên dewletê bûn, lê bû bûn endamê PTK ji bona ku kes wan nasnekin ku ew kî ne. Ji bona kuştina ciwanên kurd amade bûn. Dema dest bi şer bikin wê van kesên ku zilamên dewletê ne û baş çekan jî bi kar tînin, dê kurdan bikujin. Dema ku şer destpê bike ewên bi xwe ango bi çeka dewleta xwe ya di destê wan de, yek bi yek wan tevgerên welatparêz û sosyalîst ji hole rake. Ji bona vê biryarê jî divê Sapo li gel mamosteyê xwe Kûçik civînekê li dar bixîne da ku wê çawa û li ser çi alîkariya dewletê destpê bikin. Ji bona vê jî çend rojên din divê wan civîna xwe li Enqereyê û di avayiya dewleta kûr da pêk bianîna. Loma Sapo bi hemî hazirî û amadekariya xwe berê xwe ji Kurdistanê dide Enqereyê da ku li gel mamostê xwe civanekê li dar bixe. Amadekariyê bikin da ku Sapo rewşa talî ji wî re vebêje û aqil ji wî bigire. Kêmaniyên heyî temam bike. Proje û rêbaza şerê li hember hemî tevgerên ciwanên kurd bide destêkirin. Çi cara Sapo di çû Enqereyê ji bilî Buran kesên din ev nizanîbûn.

***

Roja civînê Sapo li gel mamosteyê wî bû. Loma ew berî mamosteyê xwe hatibû wê avahiyê û bi wî re jî dosyak qalind hebû. Piştî wî jî Kûçik tê. Destên xwe didin hev, bi xêrhatina hev û pirsa hev dikin. Derbasî odê dibin, lê Kûçik, Sapo dide pêşiya xwe û dibêje:

-Fermo serokê min, divê tu berê derbas bibe, ji ber ku te gelek neqebên asê derbas kir û di qonaxa ewil de, tu baş bi ser ket. Got û bi destê xwe derî nîşan da û domand. De fermo serokê min. Îro jî karê me pir e, divê tu zêde li Enqereyê nemîne ku kes ji vê hatine te şik nekin.

Van gotinên Kûçik serî li Sapo kire weke dawilê (defê) bi kêf û eşqeq mezin kete hundir. Bi wê ketinê êdî xwe weke mezinekî deweletê didît. Ji xwe her ku aferîmek ji mamosteyê xwe digirt, ew dibû sedem da ku bêtir kurdan bikuje.

Berê Sapo, dûre jî Kûçik ketin hundir, rûniştin û dosya li ber xwe vekirin. Vekirin û Kûçik îşaret kir ku berê Sapo biaxife. Loma Sapo got:

-Mamosteyê delal ez bawerim heta vir, ango vê gavê ez li gor plan û projeya dewleta xwe ya ji bona min nivîsîbûn, meşiyame ango karê xwe kirî ye. Heta niha me çi kir ji me re ma. Bi gotineke din, tu tevgerên ciwanên kurdan li hember van êrîşên ku wê sibê wan jî biqedîne derneketin. Her yek bi serê xwe ketine pînika xwe û bi xeyala, wê kurdistanê azad bikin tevdigerin. Min weke dewletê gotibû û te jî rê li ber min xistibû ku ez jî li gor wê meşiyam. Weke cenabê we jî dizane, kongreya me ya li Gundê Mîsê pir nav da. Me di wê kongeyê de çend kesên dilsozê gelê xwe ne jî kirin endamê komîteya navendî ku dema roja wan hat, emê wan jî ji hole rakin an bi alîkariya dewleta xwe bidin girtin. Di vir de tu problema min tune ye û tu astengî jî li hemberî me nemaye. Ji xwe serokatiya min bi alîkariya Buran Balkan misogertir dibe. Êdî hemî endamên partiyê, min weha dinasîn. Ji xwe karê heta niha me kirî ye û cenabê we jê agahdar e. Dor dora rakirina tevgerên wan ciwanên bi xeyala Kurdistaneke azad dijî ne. Bi kurtasî min xwest vê bêjim û ez te guhdarî bikim ku em ê ji niha û pêde çawa û li ser çi asasî tevbigerin.

-Te pîroz dikim serokê min. Ez jî, dewlet jî ji karê te yên heta niha gelek kêfxweş in. Endamên komîtê hemî jî bi serketina te kêfxweş in. Lê divê tu bizanibe her ku dihare, dema Lozanê hindik dibe. Erê em dizanin ku ev yeka nayê bîra tu tevgerên kurdan. Loma hay û bala wan ji vê tune ye. Lê hemî haziriyên me jî ji bona wê ye ku tu weke serokekî kurdan di wê civînê de amade bibe û bêje; ”Tu daxwaza me ya perçebûna tirkiyê tune ye. Em û tirk ji goşt û nenûkekê ne. Jiyana me ya bi hevre azadiya herdu gelan e. Aha hûn dibînin ez weke serok û temsîlkarê kurdan li vir, li hemberî we me û gelek tiştên din”. Bi kurtasî hedef û armanca me ev e. Ka tu yê çi bêje.

Dema Kûçik digot tu yê weke serokekî kurdan bi dewletên navneteweyî de li ser pirsa kurdan qise bike, bê çiqas Sapo kêfxweş dibû. Bi hêrsa wê çawa hemî tevgerên ciwanên kurd têk bibe, dihate avdan. Loma Sapo bi kêf got:

-Ez weke xizmetkarekî dewleta xwe, çi kar ji min re bê pêşkêşkirin ez ê wê bikin. Wekî din jî tu her sax bî, Ji cihê xwe rabû, dosya li ber xwe dirêjî Kûçik kir û axaftina xwe dommand. Di vê dosyê de rapora heta niha me çi kar kirî ye, em di çi warî de bi serketine, kêmaniyên me çine? hemî diyar e. Tu û hûn jî bixwînin û kêmaniyên hene ji min re bêjin da ku ew jî bêne temam kirin. Ez dizanim niha karê li pêşberî me û ê herî zor ji holê rakirina wan tevgerên ciwanên kurd in. Ez bawerim em ê bê problem vê jî bikin. Lê tirsa min ew e ku em ê çawa şerê PGK bikin. Weke hûn jî dizanin koka wan gundî ne û serî bi gundiyan re jî dernakev e. Dûre vana hêza xwe ji partiya hevalbendên xwe ku herdu partî jî li ser rêbazekê ne, ya Irakê digirin. Ez bawerim çekên wan ji yên me kêmtir in, lê baweriya endamên wan ji yên me xurtir in. Ew bê tirs xwe diavêjin nava hemî agiran. Min pir hewl da ku serok û berpirsê wan ê mezin nas bikim da ku hûn wan têxin zîndanê. Lê wan qet carekê jî ev mecal nedane min. Her min daxwaz ji wan dikir ku ez weke serokê PTK dixwazim bi endamekî an çend endamên we yên serokatiya partiya we re jî minaqeşe bikin. Erê dikirin lê her carekê kesekî ne endamê komîta navandî dihat peşberî min û minaqeşeyên xwe bi min re dikirin. Yanî bi wan re şer dikare gelek zehmetiyan ji me re derxe. Wekî din hemî karê me ê çend rojan e ku em ê wan biqedînin.

-Belê tu rast dibêje, em weke dewlet jî gelekî hesabê wan dikin. Em jî bi hemî fen û fûtên xwe li ser kar in ku wan û mezinên wan nas bikin, lê gelekî zehmet e. Ew partiyeke bi rastî jî tam binerd e ango îllegal e. Li gor bihistina me ku ew jî haziriya şerekî li hember dewletê dikin. Lê me heta niha jî tu tişt bi destnexistine. Endamên wan yên têne girtin jî em êşkenceyê gelekî xeter û mezin li wan dikin. Lê dîsa jî ji me re navê mezinên xwe kar û barên partiya xwe nabêjin. Bi rastî jî em jî ketine tengasiyekê. Me texmîn dikir tê heq ji vî karî bê, lê weha xuya ye ku dîsa nebû. Lê ne xem e, ka berê tu dest bi kuştina endam û kadroyên tevgerên din bike, em ê rêyeke ji wan re jî bibînin. Ha berî ku ji bîr bikin, berpirsan daxwaz ji min kirin vê jî bigihêjînim te. Gotin: “Ji niha pê de di hemî şerên bi tevgerên ciwanên kurdan re divê çekdar hemî ser çavên xwe ango rûyên xwe bigirin. Bi paçikê sor ya jî ê reş ku jê re dibêjin çefî, bila êdî di hemî şerên bi tevgerên kurdan re wê li ser çavên xwe girê bidin. Bi nedîtina ser çavên kesan re em ê zilamên xwe ê çekdar û gelek zîrek bixin nava wan ciwanên endamên we. Ji bona kes nizanibin

kî, kî ye. Loma hin caran hin endamên te dikarin ji kuştina hin kurdan aciz bin û wan nekujin. Ji bona vê jî dema herkesên bikevin şeran wê kes kesan nasnekin û hemî jî wê hevdu weke endamê partiyê bizanibin. Di wan şeran de jî wê zilamên me çawa bikin, de êdî tu jî texmîn bike.

-Bi rastî jî dewlet baş fikirî ye. Ev qet nehatibû bîra min. Ev tiştekî nû û xweş e ku êdî em dikarin çekdarên dewleta xwe jî bixin nava çekdarên xwe ku yên dewletê dê baştir karê xwe bikin.

-Belê serokê min. Em dewleteke mezin in. Li ser koka Împeratoriya Alî Osmaniya mezin, perewrdahiya xwe girtine. Em arşîvên mezinên xwe dixwînin ku wan di çi waran de serketin bi destxistine ji bona em jî vê pêk bînin, kar dikin.

Li ser asasê bi tevgerên ciwanên kurdan re şer bikin, civîna xwe diqedînin û dûre jî berî ku ji hev belav bibin. Kûçik dosyakê dirêjî Sapo dike û dibêje:

-Berî şer vê jî baş bixwîne, dûre em ê wan çekdarên xwe, yek bi yek bikin endamên partiyê û bila şerê te ê ji bona xurtkirina dewletê û tunekirina kurdan pîroz be.

# -36-

Bi hemî haziriyên li gor daxwaza dewletê şerê ku wê bi tevgerên ciwanên kurdan re bihata kirin hazir û amade bû. Çekdarên dewletê jî her hin ji derekê de bû bûn endamên partiyê. Çi dema di civînên partiyê de bihata gotinê: “kî dixwazin bi dilê xwe bikevin nava şerê wan rêxistinên li hember xelasiya kurdistanê bûne asteng?.” Berî herkesan wan zilamên dewletê yên çekdar destê xwe hildidan. Loma bi desthildana wan êdî piraniyê destê xwe bilind dikirin û di nava wan çend kesên din jî li gor dîtina Sapo û partiyê li gel çekdarên dewletê dihatin hilbijartin.

Êdî roja qîyametê nêzîk bû. Roja tunekirina tevgerên ciwanên kurd destpê kiribû. Heta vir jî wan tevgerên ciwanên kurd hingê li xwe û li karê xwe jidandibûn nema dikarîbûn tiştekî din bifikiriyana. Ji ber lez û beza’ wê şoreşê bikin, feqên li hember wan hatibû vekirin nedidîtin. Ji ber vê jî, li kiryar û bûyerên li ser destê Sapociyan û partiya wan dihate kirin fêm nedikirin. Ciwanên Kurd li vê rewşê hay ne dibûn ku bê Sapociyan dixwestin çi bike û dikirin. Nikarîbûn li ser wê yekê bifikiriyana. Ji bona çi Sapociyan şerê eşîran û welatparêzin kurdan dikir. Li ber wan kurd dihatin kuştin, lê nikarîbûn bifikiriyana ji ber çi bû?. Vê jî rehetiyek dida Sapo û dewletê ku bê astengî karê xwe dimeşandan.

Tevgerên ciwanên kurd fêm nedikirin bê gelo çima, çawa û ji ber çi sedemê  hemî Sapocî bi çek in û bê tirs di nava bajar û gundan de digerin. Ne difikirin ku vana li her derê û di hemî minaqaşên xwe de daxwaza wan xelaskirina her çar perçên kurdistanê bû. Lê dîsa fêm nedikirin ku xelaskirin ne di maneya azadkirinê de bû.  Xelaskirin yanî ji kokê rakirina wan bû. Têkbirina kurdistanê û hilweşandina warên wan û cihên welaparêz lê zêde bûn.

Di roja qîyametê de Sapociyan êdî bi aweyekî fermî dest bi kuştina endamên PGK ango RNKê hê destpênekiribû. Loma Sapociyan dest bi kuştina hin endamên, Partiya zarokên Burjuva (PZB) kirin. Ev nav jî endamên PGK li wan kiri bû. Sapociyan di destpêkê de

çend kesên wan, hin endam û hin rêvebirin wan jî kuştin. Piştî ku tevgera zarokên burjuva dibînin ku dê nikaribin serî bi wan re derxin. Doza li hevkirinê dikin ku êdî bi tu awayî şer di navbêra wan de dernekeve. Sapociyan û wan êdî eleqedarên xwe ji hev neanîn. Êdî propagandayên li dij hev jî nekirin. Ev biryar jî li gor dilê Sapo û dewletê bû. Yanî bi awayekî din, wan tevgera zarokên burjuwa jî teslîm girtin. Lê hezar mixabin ku hê jî tevgerên din negotin, ma ev çi afat û bobelate ku bi damezrandina PTK kuştin û malwêraniyê dest pêkiriye. Lê rêxistinên ciwanên kurd hêja ev nedidîtin, bîr nedibirin û nefikirîn ku ewên jî weke demên berê û şerê li hember eşîran ku yek bi yek ji hole hatin rakirin û hilweşandin û koçberkirin. Ji ber ku dîroka xwe nizanîbûn. Ciwanên miletekî dema dîroka xwe nizanibin wê tim wenda bikin. Niha jî wendabûneke nû destpêkiribû. Lê ciwanên kurdan ji ber nezanîna dîroka xwe ev nedidîtin.

Ji ber ku ciwanên tevgerên wê demê hay ji dîroka xwe tune bûn, nizanîbûn û nexwendibûn ku dewleta dagirker çawa bav û bapîrên wan di şikeftande bi bombeyên jahrî kuştibûn û eşîrên din piraniya wan bê deng mabûn. Bêdeng mabûn heta ku dora wan jî dihat. Loma dema nivşek li ser koka xwe, bi dîroka xwe, bi çand û adetên xwe mezin nebe aha ew tiştên berê ku hatibû serê bav û bapîrên xwe nizanibin, wê nikaribin xwe ji şaşî û nezaniyê azad bikin. Loma dema Sapociyan şerê tevgereke ciwanên kurd dikir, yên din hemî bê deng bûn. Ji ber ku bi rêya îdeolojiyan ji hev aciz bûn û vê aciziyê rehetî dida dewletê ku qira wan, li ser destê yekî ji wan bîne.

Piştî têkbirina tevgera zarokên burjuva jî, êdî wê dor bihata wê tevgara ciwanên kurdan ku ew jî li Enqereyê hatibû damezrandinê. Endamên wê tevgerê jî ji serî heta binî bi îdelojiya sosyalîzmê hatibûn xemilandin. Loma wan jî dîroka xwe û mezinên xwe û tiştên hatibû serê bav û bapîrên xwe nedizanîbûn. Endamên wê partiyê jî carna xwe li Moskovayê û carna jî xwe li Havanayê ditîn, Moskova û Havana ji welatê xwe bêtir nasdikirin û pesnê wan didan. Heta hinên wan serok û rêberên xwe yên bi îdeolojiya sosyalîzma ku doza kurd xeter didît, xemilîbûn, nasnedikirin. Şerê li ber serê wan ya Barzaniyên ku doza Kurdistanê dikirin nedidîtin. Tu dev ji dîtinê berde, hema wan jî weke PTKê Barzanî bi ajantiya Emerika bi nav dikirin. Ji ber ku li dij şerê çekdarî bûn. Endamên wan jî hemî bê çek bûn û ev jî bona Sapociyan karekî rehet bû. Dema Sapciyan dest bi

kuştina endamên wê tevgerê ango partiyê kir, wan nema dizanîbû çi hat serê wan. Sapociyan hin ji endamên wan kuştin û hin birîndar kirin. Talîya talî bi peymanekê şerê wan jî bi serketina Sapociyan dawî bû.

Bi vî şerê xwe Sapociyan çend tevgerên din jî ku yên ciwanên kurd bûn. Çav tirsiyayî kirin û armanca xwe bi serketineke bêdengkirina wan tevgeran pîroz dikirin. Pîroz dikirin lê li hember wan û dewletê ew hêza ku ew jê ditirsiyan, mabû. Ji bona ji holê rakirina wê jî çivîn li ser civînan amade dikirin. Li rê û rêbazên wê çawa vê jî çareser bikin digeriyan. Dewlet jî ketibû tev, ketibû wê heyra da ku vê çarê jî wan ê bi çi lîstikan PGK û rêxistina wê ya ciwanan RNK bêdeng ango tune bike.

***

Êdî astengek tenê li pêşberî dewletê û Sapociyan mabû, ew jî PGK bû. Dewlet û Sapo ji wan bi tirs bûn. Di çavê dewletê de ew gelekî mezin bû. Loma hemî haziriyên li dij wan ya şerkirinê bi baldarî dikirin. Bi tirs bûn ku di şerekî weha de Sapocî bi sernekeve. Difikirîn ku heger bi sernekevin divê kîjan plana din derxin pêş. Li aliyê din jî, li kurdistanê di nava gundiyan de PGK û rêxistina wê ya ciwanan RNK cihê xwe, hezkirina xwe, bi bîr û baweriyên xwe, wê Kurdistanê azad bikin, dabûn gelê xwe. Ev bawerî dabû hevalbendên xwe yên gundî û xwendevanên wê demê jî. Hemiyan bawer dikirin ku di demeke nêz de wê partiya wan li hember zilm û zordariya dewletê şêrê azadiya kurdistanê destpê bike. Her weha bi awayekî pir nehênî, partiyê haziriya xwe û şerê azadiya gelê xwe dikir. Ji ber vê bû gelek herêmên ku hevalbendên wan lê xurtbûn, bi çek kiribûn. Hin endamên xwe jî fêrî ango perwerdeyî şerê aman û nemanê dikirin. Lê hemî karên xwe bi dîzî dimeşandin. Hay û baya gelek endaman jî ji vê haziriya şer tune bûn.

Ciwanên PGK jî bê westan karên xwe di nava dibistanên li kurditanê geş û xurt dikirin. Di warê teorîk de, gelek ciwanên xwe jî hazir û amade kiribûn. Bi wan kesana jî li hember endamên tevgerên ciwanan yên din bi hevre gengeşiyên teorîk dikirin. Loma jî divê ciwanên PGK ku ya bi navê RNK ê xwe bi nav kiribûn û bi wî navê hemî karê xwe yên bi tevgerên din re dimeşandin. Sedema bi karanîna vî navî jî ew bû ku navê partiyê û endanêm rêvebir tim

veşartî bin ku ne tevgerên din û ne dewlet wan nasnekin. Ji ber wê bû, wan jî weke tevgerên din, ciwanên xwe di bin sîwana komeleyên demokratîk de bi cih dikirin. Êdî wan jî dest bi vekirina komeleyan dikir. Her çiqasî di destpêke de piraniya endamên rêvebirên PGK ne li gel vekirina komeleyan bûn jî, dûre weke wan nebû. Ji ber ku roj tune bû ku êdî xwendevanên dibistanan û heta yên uniwersîtan jî diketin nava hêza RNK ê. RNK hingê mezin bû bû, êdî hema bêjin herkesan navê partiyê ji bîr kirin û bi hemî baldariyên xwe, bi munaqeşe û tevgerên xwe karê partiyê ji teref RNK ê dihat meşandin.

RNK di nava hemî dibistanan de xurt bû bû û karê xwe di warekî gelemperî de dimeşandin. Çend ciwanên weke îdelogên wan jî hebûn ku bi  minaqeşeyên di nava xwendevanan de kesî di warê teorîk û îdelojiya sosyalîzmê, zora wan ne dibirin. Hin ji ciwanên RNK hebûn ku bû bûn agir û bi wî agirê xwe, piraniya tevgerên ciwanên din dişewitandin. Hingê bû bûn agir dûxanek ji ku bilind biba, herkesan fêm dikirin ku ew agir ji aliyê teorisiyenê ciwanên RNK Bedrî pêketiye. Hingê nav û dengê wî belav bû bû gelek ji tevgerên din dixwestin wî bibînin û pêre bikevin minaqeşeyên teorîk.

Rojekê Bedrî li gundekî beriya Mêrdînê ku gundî bi tevayî bû bûn hevalbendên PGK. Piraniya kesên ji vê pêvajoyê dihatin û bi salên xwe mezin bûn wan dizanî bûn ku RNK tevgereke ciwanên wan e. Lê karê xwe bi vî navî dikin ku navê partiyê û kadroyên wê yên rêvebir veşêrin.

Bedrî di dema dixwendina xwe lîseyê de, xwe di warê teorîk de baş gihiştî bû. Ji dersên dibistanê bêtir pirtûkên teorîk dixwend û bû bû teorisiyenekî jîr û jêhatî. Loma di dema dibistanan de ew rojê li dibistanekê û di nava gengeşiyeke teorîk bi ciwanên tevgerên din re de bû. Dema dibistan dihat girtin, vê carê jî hevalên wî yên rêvebir ew dişandin gundan. Ji ber ku êdî endamên PTK jî ji xwe re ew rê vekiribûn û wan jî di nava gundiyan de propaganda xwe dikirin.

Rojekê dema Bedrî ji bona propaganda partiya xwe, dihare gundê Şewatê, gundî bi hatina Bedrî kêfxweş dibin. Ji ber ku ew berê jî çend caran li wan bû bû mêvan û ya din ew gund ne zêde dûrî gundê mala bavê Bedrî bû. Gundiyên herdu gundan jî hemiyan

hevdu nasdikirin. Ji ber wê bû him kêfa gundiyan hatibûn ku Bedrî li wan bû bû mêvan, him jî hemî nas û dostên hev bûn. Dema Bedrê li mala mezinê gund dibe mêvan û ji bona dîtin û bi xêrhatina wî çend gundî jî têne wir. Yek ji gundiyan xwe nagire û dibêje.

-Bedrî lawo tu gelekî bi xêr hatiye, selamet hatiye. Lê bawer bike ev bû demek em ji ber propaganda Sapociyan hetikîne. Her kî ji wan tê vî gundî destpê dikin û weke bilbilan diaxfin. Erê her çiqasî em ji wan fêm nakin ku behsa çi jî dikin. Lê dema diaxfin tu dibêje qey agir di devê wan de ye û dibêje qey kaxeta li berxwe dixwînin. Lê bawer bike naxwînin tenê diaxifin. Gelek tiştên ecêb ji me re dibêjin. Dibêjin hûn û hemî hevalbendê we gundî ne, nezanin û nexwenda nin. Bi gundiyan jî şoreş nabe. Kesên nezan nikarin tevgeran li hev ragirin. Nikarin pêşiya xwe bibînin da ku çi demê destbi şoreşa proleterya bikin. Hingî tiştan dibêjin serê gelek hevalên endamên me tevlihev kirine. Ew niha bi hemî hêza xwe gund bi gund digerin. Heta bi van karên xwe yên girêj ku hin gundiyên navbêra me nexweş ku hema hemî endamê RNK ne, bi wan propagandayên Sapocî hêdî hêdî hin ji ser fikra xwe diharin û dibin Sapocî.

-Baş e madem hûn agahdarî vê rewşê bûn, we çima em agahdar nekirin? Bedrî got.

-Bawer bike em vê qet nefikirîne, ya jî em baş tê negiştin ku em we agahdar bikin. Heta hin hevalên me digotin, dev ji wan berdin ew tenê telebene, nikarin tiştekî bikin û di nava gundiyan de cih bigirin. Lê niha sê gibgibên(mezin) wan li wî gundê nêzîkî me ne. Heger tu bixwazî em dikarin wan agahdar bikin, bila bên tu û ew bi hevre li ber çavên hemî gundiyan minaqeşe bikin da ku gundî jî bizanibin bê kî ji we rast in.

-Gelek baş dibe, vaye ez li virim. Gundiyekî din xwe avêt ortê û got:

-Ez dibêjim ew Sapociyên zana û zîrek in. Dibe ku Bedrî tenê nikaribe bi wan, heger hûn bixwazin ez dikarim herim Dêrikê çend kesên din jî bînin da ku bi alîkariya Bedrî ve rabin.

-Na na keko na. Ez bi têra xwe heme. Tu û hemî hevalên xwe bila rehet bin. Ji dêlva tê here Dêrikê here wî gundê Sapocî lê ne. Bêje kerem bikin hevalekî me hatiye mêvandariye me û niha li gund e.

Heger hûn jî amade bin, werin gund hûn û ew li pêşberî me gundiyan bi hevre minaqeşe bikin da ku em jî rastiyê bibînin.

Ê gundî xwe dighêjîne wî gundê ku hin berpirsên Sapociyan li vir in. Piştî silav û halê hevdu pirsînê ê gundî li wan Sapociyan dinere û dibêje: Niha hevalekî me hatiye gundê me, heger hûn bixwazin werin hûn û ew li gel hev munaqeşe bikin da ku em jî rastiyê fêr bibin.

-Baş e, ê hatiye kî ye, navê wî? Ê Sapocî dipirse.

-Bedrî ye.

-Temam here haziriyê bikin hema piştî te em tên.

Camêr di nigde vedigere tê oda Bedrî û gundiyên wan hemî rûniştîne û dibêje:

-Min ji wan re got, niha ew jî haziriya xwe dikin wê bêne gund. Ji bona ew Bedrî bi hevre minaqşe bikin. Em ê jî wan guhdarî bikin. Lê çi dibe, çi nabe divê em jî hazir bin, vana çavsorî bûne. Dema weke wan nebe û di minaqeşeyên xwe de bi ser nekevin şer derdixin.

Gundiyan li ser gotina wî camêrî fêm kirin ku rewş dikare berbi xerabiyê here. Loma wan jî dest bi haziriyên xwe kirin, Bedrî defterekê ji bêrîka xwe derdixe û qelemekê datîne ber û li benda Sapociyan radiweste. Zêde wext derbas neba, camêran bi du siyaran hatin gund. Kesekî ew vexwandin mala Bedrî lê. Hatin wir, lê diyar bû ew û kesên bi wan re hatine hemî jî bi çek bûn. Ji xwe gundiyan jî haziriyên xwe kiribûn. Çi yên li ba Bedrî û çi jî ji derve haziriyeke baş kiribûn û çekdarên xwe di çend waran de bi cih kiribûn. Haziriyeke weha kiribûn ku heger şerek derketa wê yek ji Sapociyan sax ji wir derneketana. Ji xwe dema ew ji siyarên xwe peyabû bûn wan yek ser ev rewş fêmkiribûn.

Bi hatina wan ya hundir hemî kesên li wir tevlî Bedrî ji ber wan radibe,  destên hev digirin û bi xêrhatina hev dikin. Lê Bedrî wan nas dike ku ew kîne. Lê wan jî Bedrî  bi nav baş nas dikirin. Piraniyê hatibûn navê Bedrî bihîstibûn. Piştî çay vexwarinê êdî dor tê ku dest bi minaqeşeya xwe bikin. Loma ji nava grûba Sapociyan yekî bi dengekî berz got:

-Heval ka em ê bi kê re minaqeşe bikin? Û bi awayekî ji xwe bawer axaftina xwe didomîne. Ez niha kesekê ku em ê pêre minaqeşe bikim nabînim.

Bedrî bi awayekî mitawazî, ji xwe bawer dîsa bi xêrhatina wan dike û dibêje:

-Fermo bira ê ku wê îro bi we re minaqeşe bike ez im. Dema Bedrî weha dibêje, ê Sapocî û hevalên wî dimizmizin ku wê çawa bi kesekî zarok re minaqeşe bikin. Lê madem hatibûn û ode jî ji zilaman dagirtibû, herkes li benda wan in ku destbi minaqeşeyê bikin.

Bedrî kesekî zêde zaif û dirêj bû. Dema me re li wî dinêrî mirov digot hema tu dibêje qey ew tu caran nên naxwe. Hingê zeîf bû, mirov qet jê bawer ne dikir ku bikaribe li gel hin mezinên Sapociyan bikeve munaqeşeyên siyasî. Cara ewil ê Sapocî axifî û dît ku wê bi yekî weha zeîf û temen bi çûk re têkeve munaqeşeyê bi zora wî û wan diçe. Heger ne şerm ba wê bi şûnde vegeriyana. Ji ber ku wan li hemberî xwe zarokek dîtibûn.

Çi dema yek ji gundiyên hevalbendên RNK dibîne ku vanê hatine hemî gibgibe ne. Zana û gelekî jîr in. Ew bû bû şahidê gelek minaqeşyên wan ku her car jî ew bi serketine. Loma xwe bi xwe dibêje, ”weha nabe, divê ez bi lez xwe bighêjînim Dêrikê hin kesan ji wir bînim ku bi alîkariya Bedrî ve rabin.” Derdikev û li siyara xwe siwar dibe û berê xwe dide Dêrikê. Ew dihare lê minaqeşê dest pê dike. Di minaqeşeya ewil de ne Sapociyê herî zana û mezin, ji ber ku wî layiqî xwe nedîtibû ku bi yekî zarok û weha zeîf re bikeve gengeşiyê. Loma rê dide ku hevalekî wan destpê bi niqasê bike. Piştî axaftina wî û bersîvên Bedrî ê berpirsê wan fêm kir ku hevalê wan wê nikaribe zora Bedrî bibe. ji ber ku Bedrî gelekî ji wî zanetir derdikeve û bi gotinên xwe mecalê nade ku ê li hember biaxife. Loma êdî ew xwe diavêje ortê û dest pê dike, piştî qederekê minaqeşa di navbera mezinê Sapocî û Bedrî berdewam dike. Lê Bedrî ji yê mezin gelek pirsên ku ew nikare bibersivîne dike. Ew jî li hember wan pirsên Bedrî bê deng dimîne. Devê xwe dibe û tîne, lê nikare bersîva pirsan bide. Loma yekî din xwe diavêje nava minaqeşê û dixwazî bi awayekî rûyê hevalê xwe ê reş sipî bike, lê Bedrî rê nade û dibêje:

-Binerin ez yek im û hûn jî sê kesên kadroyên mezin û du kesên din jî bi we re ye. Heger hûn dixwazin em encamekê ji vê miqaneşeya li ber çavên gundiya dikin, derxin divê hûn yek bi yek kerem bikin da ku ez jî bizanibin ez ê bi kêre munaqeşeyê bikin.

Dema Bedrî weha dibêje, ev bi xweşa wan nare û yê berpirsê herî mezin dengê xwe hinekî zêde bilind dike û dibêje;

-Fermo heval ez û tu em bi tenê minaqeşe bikin.

Lê minaqeşa nava wan û guhdarîkirina gundiyên hazir, dîtin ku her ku dihare ew kesê ku gundiyan tim hafiza xwe ji wî dikirin û nikarîbûn li hember wî qise bikirana, qels dikeve. Bederî jî vê fêm dike loma ew her pirsan ji wî dike û dixwaze ew tenê pirsên wî bibersîvîne. Lê ew jî tim çivan dide xwe da ku derbasî mijarekê din bibe. Bedrî wê firsetê nade wî. Hemî kesên li wir, li wan guhdarî dikirin û gelekî bi kêf bûn ku Bedrî bi wê zanebûna xwe û bi wî qilafetê xwe ê zeîf û bi wê zarokitiya xwe zora wî dibe.

Hê minaqeşa nava wan destpênekiribû, camêrê bawer ne nedikir ku wê Bedrî bikaribe zora wan bibe. Loma bi lez û bez çû bû Dêrikê da ku çend kesên ku bikaribin bi alîkariya Bedrî ve rabe, anî bû. Lê dema ji Dêrikê bi rê dikevin û berbi gund de tên, Salo ji ê gundî re dibêje,

-Bra divê kes nizanibin em hatina ku bi alîkariya Bedrî ve rabin, ez baş dizanim ku ew ê ji heqê wan bê der. Lê heger kêmaniyek derkeve an lazimiyek bibe ez ê biaxifim. Lê weke min got, bila kes vê rewşê nizanibin, em ê jî weke gundiyan li cihêyekî rûnên û guhdarî bikin.

Bi ketina wan ya hundir hatibû fêmkirinê, Faro hinekî bi şik bû dê Bedrê nikaribe zora wan bibe. Loma wî çend kesên din ji Dêrika anî bû da ku bi alîkariya wî ve rabin. Bi ketina wan ya hundir hin kesan ew nas dikirin û dizanîbûn ku ew ji bona çi hatine. Lê tu kesekî weke wan nasdike tevnegeriyan. Rewş hatibû fêm kirin. Wan kesana silav dan û di nava guhdaran de rûniştin û guhdarî kirin. Minaqeşa Bedrî û wan her berdewam bû, Bedrî cih li wan teng kiri bû, çi kirin jî nikarîbûn pirsên ku Bedrî ji wan dike bibersîvîne. Pir aciz bûn, loma ê berpirs fêm kir bi wî awayî here dê rezîl û riswa bibin Bi zirt got.

-Na be heval nabe, hûn çavên xwe dixin nava çavên me, dixwazin me şaşo maşo bikin. Bi vê tu bala me ji minaqeşeyê dûr dixe. Minaqeşe bi vî awayî nabe, got û li hevalên xwe nerî û domand. Em rabin heval rabin, divê bersîva vana bi awayekî din bê dayîn.

Dema wî axaftina xwe qedand, ji nava gundiyên rûniştî yek berbi Bedrî hat rahiştê û bilind kir û got:

-Nerevin, nerevin aha hûn dibînin ev çeneke ha. Weke zarokekî xuya dike, we di destpê de henekê xwe pê kir ku hûn bi wî re minaqeşe bikin. Lê we dît ku ew ji we zîrektir derket, niha jî dixwazin birevin. Û çend carên din jî wî Bedrî di nav destên xwe bilind kir û got:

-Bijî brayê Bedrî, got û li kesên rûniştî, li mêvanên ku ji bona alîkariya Bedrî ji Dêrikê hatibûn, nerî û axaftina xwe domand. Biner gundîno, em ne xwenda nin. Her roj vana dikevin nava gundan, bi derew û boxtanan dixwazin me berra berhev din. Em hemî xwediyê li ser vî erdî, ji teref dagirkeran ve hatine perçekirinê, ne. Ji bona azadiya vî erdê pîroz divê em hemî bi hevre weke bra kar bikin. Divê em ji derve xelkê nexin nava xwe, (Xwest bêje ku ê berpisê Sapocî ji bajarek din û kî bû kesî nasnedikir) aha em têra xwe dikin. Heger kesên nenas bikevin nava me wê halê me jî gelekî xerab bibe.

Minaqeşeya wê rojê bi serketina Bedrî dawî hatibû, ev serketin di nava hemî gundên Derika Çiyayê Mazî de hatibû belavkirin. Vê serketina Bedrî di nava hevalên wî yên RNK olan dabû. Ev serketina wî gihiştibû Amedê û di nava xwendevanan de bû bû cihê guftûgoyan.

Piştî wê minaqeşeya bi Bedrî re hatibû kirin, êdî heval ne weke demên xwe ê berê azad û serbilind bûm. Wan darbeyeke mezin xwaribûn û divê ev ji endamên RNK nema ba. Loma kar û propagandayên wan êdî ji teoriyê bêtir bû bû fesadî û sîxurî.

# -37-

Dewlet, Sapo û PTK li gel hev kar dikirin, plan û proje çê dikirin ku wê çawa zora RNK ango partiya gundiya bibin. PGK li gel rêxistina xwe ya ciwanan jî haziriya xwe dikir da ku li hember dewletê şer bikin. Xuya ye dewletê fêm kiribû an bihîstibû. Ji ber ku Sapociyan hemî tevgerên din têkbiribûn an jî bêdeng kiribûn. Li hember wan li pêşberî wan tenê PGK mabû. Wan ango PTK û dewletê jî zanîbûn ku heta PGK hebe ewên nikaribin bi rehetî di Kurdistanê de karê siyasiyeta tunebûna kurdan weke ew dixwazin bikin.

Sapo jî gelek aciz bû bûn ku  çawa nikarên vana jî ji hole rake da ku ew bibe mezinê hemî kurdan û li ser navê wan bibe xwedî heq û hiqûq da ku bi rehetî di hemî platforman de gotina wan derbas bibe. Li ser vê yekê wan û dewletê bi awayekî fireh proje, nerîn û dîtin amade dikirin. Ji ber ku dewlet jî ji PGK û rêxistina wê ya bi nave RNK gelekî bi tirsbû. Her weha heta wê gave jî wan tu berpirsên mezin yên vê tevgerê nasnekiribûn. Di gelek minaqeşeyan de Sapociyan daxwaz dikirin ku bi mezinên wan serok û endamên rêvebirên wan re jî minaqeşan bikin, bi ser neketibûn. Ev ji bona Sapo û dewletê rûreşiyek bû ku nikarîbûn vê tevgerê ji hundur de biroxîne. Ji ber vê bû ku êdî biryara şerê çekdarî li hember wê bê kirinê, dabûn. Êdî şer li ber derî bû, lê wê çawa û çi demê şerê li hember wan bikirana ew hesab û plan çê dikirin.

Her çiqasî PGK jî ev rewş fêm kiribû lê wê nedixwest ku bikeve şerekî weha. Di şerekî weha da kesên bihatana kuştin yên ji herdu alîyan de jî, wê xortên kurd bana. Ev nedihat hesabê PGK. Loma di nava endam û hevalbendên xwe de tim digotin: “Heta ku ew êrîş nekin, divê hûn bê deng bin, heger êrîş jî kirin divê dîsa hûn ne êrîşker bin, lê xwe jî biparêzin. Her ku dengê şerê PTK û PGK bilind dibû, Wan jî ciwan û hemî hevalbendên xwe bi çek dikirin, çekên wan hebûn, lê ji ber ku di  haziriya şoreşê de bûn, nedixwestin heta mecbûr nebin, bikevin şerekî nav xwe yî.

PTK û Sapo weha nedifikirîn. Sapo dixwest ku daxwaza dewletê ya tunekirina tevgerên ciwanan pêk bîne. Dewletê jî dixwest dema ew xwe bi xwe bi hevkevin ji xwe yên wê bêne kuştin dê kurd bin. Ev jî, wê ji bona wan baştir ba. Loma her ku diçû dengê şerekî navxweyî bilind dibû. Kurdên sal mezin û xwedî tecrûbe dizanîbûn ku di şerekê navxweyî de dê destê dewletê di nav de hebe. Wan dizanî bûn ku di şerekî weha de ê ku wenda bikin wê dîsa kurd bin û wê dewlet jî bi serkeve. Ji bona şerekî weha dernekev e, gelek kar û xebat dikirin, li gel mezinên PGK rûdiniştin da ku ew pêşî li derketandina şerekî weha bigirin.

Her ku diçû dengê şer bilind dibû û şerekî navxweyî li ber dirî bû.

# -38-

Şêro yê ku wê biba doktor û ji ber ku bikaribe bixwîne ji mecbûrî bû bû endamê komela Sapociyan. Tu armanc û hedefa wî jî weke yên din tune bu ku weke wan bike. Lê dema du kesan li ba xwe bi cih dike û mecbûr dimîne ku wê nameya wî ji Enqerê biribû gund û du çekdarên wê herêma hatibûn ew jê girtibûn û tê de hatibû nivîsandIn ku divê çavên wan li ser Şêro be. Wî ji bona armanca partiyê bi kar bînin, heta hûn bikaribin ji wî fêdê bibînin.

Lê bi vê keft û leftê êdî Şêro jî weke wan dibû. Heta ji wan jî derbas bû bû. Havînan di nava gundiyan û di dema dibistanê jî di nava xwendevanan de propaganda û minaqeşêyên teorîk û îdelojîk dikir. Ji bona ew di munaqeşeyên xwe de bi ser keve, êdî ji dersên xwe bêtir bi xwendina pirtûkên îdelojiyan ketibû. Serê wî tam hatibû dagirtin û êdî bû bû propaxandîsekî partiyê. Ê ji vê rewşa her kêfxweş jî Sapo bû. Ji ber dema Şêro tam kiribûn weke xwe. Dizanîbû ku gotina wî ji bona armanca partiyê li Kurdistanê û di nava gundiyan de qîmeta xwe hebe. Dewletê jî ev yeka dizanî bû. Ji xwe çi kesên zana û jîr bana Sapo an Buran navê wan digihişt deweletê da ku ew ji wan agahdar bin.

Şêro hingî di nava karê partiyê de çalak bû bû, êdî kêm caran delala ber dilê wî ango Xezala wî dihat bîrê. Çi dema wî xwe ji xebatên siyasî hinekî dûr dikir, wê gave jî Xezalê dihat ber çavên wî. Loma difikirî ku hema çawa dibistanê biqedîne wê zewaca xwe çê bikin û bibin xwedî zarok. Erê ew û Xezala wî jî weha difikirîn. Lê Şêro qet feqa li hember wan hatibû vekirinê ne didît. Şêro jî weke gelek kesên bi rastî ji bona Kurdistaneneke azad kar dikirin, ketibû nava fikra ha îro ha sibê wê Kurdistanê ji destê dagirkeran azad bikin. Ji ber vê sedemê bû ku bi kêfxweşiyeke mezin, kar û xebatên PTK dikir, heta ji berpirsiyarekî bêtir jî kar dikir.

Li aliyê din jî PTK, Sapo û mamosteyê wî Kûçik civîn li ser civînan li dar dixistin plan û projeyên dê bi şerê PGK çiqasî bi serkevin. Wê

wan jî weke tevgerên din têk biba an na, xebat dikirin. Şika wan, tirsa wan hemî li ser vê bû. Ji ber ku PGK û rêxistina wê ya ciwanên RNK ew jî li gel hemî endamên xwe, bi baweriyeke mezin, bi fikir û ramanên kurd û kurdistanî karê xwe li ser xeta neteweyî dikirin. Her çiqasî dewlet li pişt Sapo û partiya wî jî bû, lê tim bi hesab bûn.

Roj hatibû, şerê wan li Serêçem bi provakasyona du kesên weke berpirsê wê herêmê ên RNKê destpê kir. Agirê şerê kuştina ciwanan hatibû pêxistin. Di eslê xwe de çi PGK û çi jî rêxistina ciwanên wê RNK ne dixwestin ku şerekî weha di nava ciwanên kurdan de derkev e. Wan baş dizanîbûn ku di şerekî weha de tenê wê dewlet qezenc bike. Yên wenda bikin wê weke gelek caran dîsa kurd û ciwanên wan bin. Ev rewşa şer dema PTK dest bi kuştina endamên tevgerên ciwanên kurd kirin, diyar bû bû. Ji ber wê û ji bona şerekî weha wan jî haziriyên xwe kiribûn û biryar dabûn ku heta Sapocî êrîşî wan neke dê ewên êrîş nekin.

Biryardana şerê PTK di civîna komîta navandî ya li gundekî derdora Amedê hatibû dayîn. Di civînê de Sapo dîsa weke her car kêm axifî û endamên rêvebir guhdarî kir û di encamê de destpêkirina şer hate ragihandin. Li gor vê jî Sapocî ketibûn nava ku hema piçek şaşî an êrîşek ya jî pevçûneke û minqeşeyek derkev e ku şer destpê bibe. Loma tiştên PTK dixwest, li serê cem ji teref du rêvebir yên wir ên PGK ku nezan bûn, wan mecala şerderxistinê dabûn destê PTK. Loma agir ji wir pê ket, ev jî li gor daxwaza dewletê û Sapo bû.

Ji xwe gelek Sapociyên beşa kurdistanê jî çavsorê bû bûn, ew jî bê sebir li benda destpêka şerekî weha bûn. Çend kesên weha çavsor ku ji bona bibin xwediyê kurdistanê divê wan tevgerên din nehiştibana. Yek ji wan jî rovî bû. Tu kesan navê wî ê esil nizanî bûn, herkesan û hemî tevgeran ew bi navê Rovî nas dikirin. Çav li serê wî sor bû bû, ofte ofte wî bû, hema dixwest şerê navbera PGK û PTK destpê bike. Wê çirûska agirê şer ku pêketibû êdî sekin li Rovî nemabû. Çeka wî di dest de ji herkesan bêtir ew li niçîra endamên RNK digeriya da ku wan tune bike.

Gelek caran ji bona şer geşnebe û ev şer raweste, tevger û hin sal mezinan hewl dan ku vî şerê bê mane, rawestînin. Ji ber baş dihat zanîn ku di vî şerî de kesên tenê kuştin ciwanên kurd in û tu fêda vê ji bona tu kurdan tune ye, Lê Rovî bi çend kesên din ku ew jî

weke wî bûn, destên xwe dabûn hev û ji bona li hevkirin çênebe provakasyon li ser provakasyonan dikirin, Heta Rovî ji bona şer raneweste û li hevkirin pêk nayê, gelek caran wî bi xwe şer derdixist. Bi derew û boxtanan weke RNK êrîşî wan kirî ye dikir. Loma jî ew tim êrîşkar bû. Li hev hatin û rawestandina şer ne li gor berjewendiya wî ya sexsî bû.

Her weha vî şerê bi destê Rovî bi pêk dihat bû bû sedem ku şerê ciwanên kurd êdî xwe bi xwe qira hev bînin, destpê kiribû. Geşkirina vî şerî tam li gor dilê Sapo û dewletê bû. Êdî şer ango agirê ku wê ciwanên kurdan di nav de bişewitin, li seran serê Kurdistanê destpê kiribû. Ji bona şerê nava van herdu hêzan ku yek a dewleta kûr bû ya din jî ya ji bona azadiya kurdistanê bû. Loma dewletê ji bona ev şer bêtir geş bibe, bêdeng bû. Di nava bajaran, bajarok û gundan herdu tereftarên van partiyan bi çek digeriyan, di nava kuçe û kolanên bajêr, li dibistana, di nava gundî û karkerên wan herdu aliyan jî dema li hev rast dikhatin hev gulebaran dikirin. Wê gulebarankirina wan xelkê kurdistanê kiribûn hêsîr, kes nema bi rehetî dikarîbûn ji malê xwe derketina, agir bi Kurdistanê xistibûn.

Sapo mizginiya wî şerî bi kêfxweşî dişopand. Wî hemî rêvebir û berpirsê vî karî dabû Rovî. Ji xwe Rovî jî zûde li benda tiştekî weha bû. Li bendê bû da ku bi vê yekê ew him ji kesên ku wî ji wan hez nedkirin û hem jî bi kuştina endamên PGK li wê herêmê ew ê biba desthilat. Kîn û hêrseke weha pêre bilind bû bû ku qet nebêjin. Rovî bi wan kiryar û neçîra kuştina ciwanên RNK bû bû pispor. Ji Sapo jî bêtir Rovî dixwest qirra endamên RNK bîne. Ev kîna wî ji ku dihat, çima wî ji herkesan bêtir dixwest kuştinê bike, nedihat zanîn. Tiştên dihat zanîn, bêtir şerê nav PTK û PGK wî germ û geş dikir. Ji ber van kiryarên xwe xelkê û şoreşgerên wê demê navê Rovî lê kiribûn. Bi lêkirina vî navî jî dihat zanîn ku ê bêtir kuştina ciwanên PGK dixwazî ew bi xwe bû.

Her ku hewldana ji bona şerê ciwanên PTK û PGK bê rawestandin û li hev bên û şerê nava wan dawî lê bê, hin hewldan çê biba jî miheqeq Rovî provakasyonek li dar dixist ku ev nebe. Şer bi her awayî berdewam bû. Loma ji bona encama vî şerî dê çi bibe hê ne diyar bû. Şer roj bi roj weke tu êgir berra pirêzeyan bide pêk dihat. Loma dor hatibû civîna Sapo û mamosteyê wî Kûçik ku wê ji bona

vî şerî ku nikarin bi ser bikevin çi projeyên nû destnîşan bikin, hatibû.

***

Destpêka şerekî weha ne bi dilê Şêro bû, her çiqasî ew jî li gor hêz û taqata xwe tevdigeriya ku şer bê rawestandin û yê dixwest şer bitimerînin yek ji wan ew bû. Wî gelek hewl da xwe, lê çi kir bi sernediket. Her weha gelek sedemên ne diyar ku ne dixwestin ev şer raweste, hin şik ji wî re çê bû bûn. Lê êdî şer gûr bû bû, ji dengê gulleyan, dengê aşîtana û hewldanên ji bona rawestandina wî şerî nedihat bihîstin. Ev nebihîstin jî li gor dilê Sapo û dewletê bû. Ji ber ku yên dihatin kuştin ji herdu aliyan jî ciwanên kurd bûn. Bi kuştina ciwanên kurd Sapo, dewlet û yên weke Rovî kêfxweş bûn. Hinan ji bona berjewendiya xwe nedixwestin ku ev şer raweste û her şer gûr dikirin. Yek ji wan jî Rovî bû. Rovî bi navê xwe ê Rovîtiyê bû bû sembola şerxwazan.

Êdî weke gelek caran dor dora civîna Sapo û mamosteyê wî û vê carê jî wê Dogu Birincik jî amadeyê vê civînê biba. Sapo bê ku ji hevalên xwe yên di nava şerê kuştina ciwanên kurd debûn, qet tiştek negot û rêya Enqereyê girtibû. Şeva xwe ya ewil li mala xwe ya li wir, westa xwe digire. Roja din bi destpêka serê sibê ku taştêya xwe dixwe. Haziriya xwe dike, radihêja wî çentê ku tim fermana kurdan têde bû û derdikeve. Dema derdikeve weke hercar, berê hilmek kûr dikşîne, li dora xwe dinere û dibîne ku waya siyara ku wî dibe û tîne, weke her car hinekî ji mala wî dûr li benda wî ye. Ew jî bi gavên xwe bi serbilindî û bi kêfxweşî berbi wê de diavêje û carna jî li dora xwe dinere bê hela tu kesên nas û dostên wî li wan derena hene an na. Nêzîkê siyarê dibe, deriyê paş vedike derbas hundir dibe û silavekê dide şiforê xwe yê her car. Sifêr silava wî lê vedigerîne û berê siyarê dide avahiya ku tim mezin û aqilmendê dewleta kûr li wir diciviyan.

Gihiştibû cihê xwe, Sapo vê carê ji carên din bêtir kêfxweş bû. Bi gavên asasî hilkişiya qatê dudan. Deriyê odê vekir, ket hundir dît ku herdu ango mamosteyê wî Kûçik û Dogu Birincik jî rûniştibûn. Şaş mabû ku gelo çima vê carê wan herdu kesana berî wî li wir hazir bûn. Wî yek ser fêm kir ku tiştekî girîng heye. Loma di eynê

xwe de dernexist silav da wan û ew jî li cihê xwe rûnişt û Kûçik destpê kir.

-Serokê min bawerim tu Dogu nasdike, ew jî berpirsekî ji komîta dewletê ye. Lê ew weke sosyalîstekê di nava tevgerên çepên kurd û tirkan de tê nasîn. Karê wî ê herî girîng ew e ku çi dema lazimî hebe, ew medya xwe ango ya dewletê bi kar tîne. Me medyayek xurt jê re amade kirîye. Bi saya vê medyayê, him ew kesên dijberî xwe bi rehetî nas dike, him jî em vê li ser destê wî ji lazimiyên pêwîst bi kar tine. Ji ber wê ew jî beşdar e ku di kovar û rojnameyên li ser destê wî derdikevin, bi alîkariya te ve rabe.

-Wê gelek baş bibe, ji xwe min jî pêwîstiyeke weha texmîn dikir û dixwest îro vê bînim zimên lê waye hûn berî min li ser vê rawestiyan e û biryar dane. Spas mala we ava bî.

Piştî ku Dogu jî got:

-Dê karê min ê asasî medya be. Di nava vê medyayê de ez ê carna hewl bidim ku weke rojnamevanekî li gel te dîtinan pêk bînin. Yanî ez ê jî ji niha û pêde ji bona bi hêsanî bikaribin hev bibînin em ê vê rêyê bi kar bînin. Got û li Kûçik nerî û berdewam kir. Gotinên min niha ev in, ka êdî ez te û Sapo guhdarî bikin.

Kûçik dosya ber xve vekir û destbi axaftina xwe kir:

-Belê serokê min. Hemî karê tu dike, em baş dişopînin. Heta niha jî çi ji te hatiye te kirî ye. Şerê me dixwest te agirê wê pêxist. Heger bê bîra te min berê jî gotibû ku ji bona tunekirina PGK dibe ku hêza te tenê têr neke. Loma em ê li kîjan herêmê çiqas çekdar lazim bin, bixin nav PTK ê, ewên weke endamên we bin. Ya din weke min berê jî gotibû ku divê hemî çekdarên te rûyên xwe bigirin da ku kesek nayên naskirin. Ev ê çawa bibe em ê bi hevre bikin. Ev ne zêde girîng e. Ya din me hay ji Rovî jî heye ku ew pir bi înad e ku dixwazî dawî li PGK bîne û bi serkev e. Ev jî ji bona me baş e. De kerem bike em niha te guhdarî bikin serokê min.

-Bawer bikin şerê li hember PGK-RNK hinekî zor e. Piraniya wan gundîne û bi baweriyeke mezin karê xwe dikin. Gundî jî zehmet e ku mirov wan weke xwe bike. Ya din aqilê wan di çavê wan de ye. Yanî nikarin bi mejiyê xwe bifikirin. Çi bibînin ji wê bawer in. Niha şerê tunebûna ciwanên kurd destpêkirî ye. Ez dizanim hin

astengiyên me hene. Çekên me ji ê wan bêtir e. Lê ê wan jî baweriya wan ji ya hevalbendên me xurtir e. Belê niha rewş ev e, ka cenabê te wê çi pêşniyaran ji bona me bike an çi aqilî bide min.

Piştî wê axaftina Sapo êdî dora Kûcik û aqilê ku wê bide Sapo bû. Berî dest bi axaftina xwe bike, Dosya li ber xwe vekir û got:

-Belê serokê min. Heta niha te kar baş meşandiye. Di virde problem tune ye. Te şerê bi PGK-RNK ê destpêkir ev jî gelek baş e. Te kongreya xwe ya li gundê Mîsê çêkiribû jî bi serketiye. Di şerê tevgerên din de jî tu nexerab bû. Ji ber ku ez te û raporên li ser te dişopînim. Niha em agahdarin ku çend kesên xwedî karyereke mezin jî di nava PTK hene. Em ji ber hebûna wan jî kêfxweş in. Em wan yek bi yek dişopînin, ji xwe te navê wan gîhandiye me ku em jî bizanibin ka çi dikin. Dema ji ser xetê derkevin jî em ê wan bidin girtin. Tu xeman nexwe. Lê tiştê li hemberî me û astengiya te ew e ku divê tu PGK têk bibe, piştî têkbirina wan û ciwanên wan tu astengî êdî li pêşiya dewletê û te namîne. Aha wê gave tê bi rehetî weke serokekî kurd beşdarî Lozana dudan bibe û li wir daxwazên me li ser navê kurdan tê pêşkêşî wan bike. Ji ber vê ye ku dewlet bi her awayî piştgiriyê dide te da ku tu wan jî têk bibe. Heger te ew jî têk bir êdî mesele namîne. Heger tu nikaribe bi ser keve û wanda bike, em ê wê gavê mecbûr bimînin ku darbeyekê (hukmê leşkerî) pêk bîne û bi saya wê darbeyê her tiştan weke xwe, bixe ser rê. Lê mezinên me ne li gel darbê ne. Hêvîdarim tê bikaribe bi serkevî, serokê min. Got li Dogu nerî û berdewam kir, ka tu çi dibêje brêz Dagu.

Doguyî dewleta kûr û yek ji wan ê mezin, dosya ber xwe vekir, çavek lê gerand û got:

-Niha hemî astengî û problema me ya girîng, ji holê rakirina PGK û ciwanên wê RNK ye. Ji bona wê jî divê em hemî bi hevre tevbigerin. Sapo bi çekdarên xwe yên kurd û yên me, divê di hemî waran de şer germ bike. Dudo divê ew hin kesên weke Rovî peyde bike wan bike berpirsê şer da ku bi saya wan şer berbi serketina me ve here. Niha Rovî karê xwe gelekî baş dike, lê ez bi xwe zêde jê ne bawerim. Ji ber Rovî yê weke roviyan tevdigere, îro li ba meye, karê baş ji bona me dike. Bê ku ew bizanibe di xizmeta kê de ye. Lê sibê wê çi bike ne diyar e. Loma divê em baş agahdarî wî bin. Dema ji

xetê derket divê em wî bidin girtin an bi komplekê di nava vî şerî de bide kuştin. Lê niha ew bi xwe karê baş ji bona me dike û ew jî weke me li hember RNK şerê aman û nemanê dide. Got li Sapo nerî û domand, ka tu çi dibêje Sapo?

-Bawer bin ez jî weke we difikirim. Ne tenê Rovî, min çend kesên din jî tespît kirine ku ew jî ne kêmî Rovî ne. Ji xwe hemî jî hêrsa wan ewe ku bibin berpirs û di nava partiyê de bibin mezinek. Lê ew ên negihêjin wî miradê xwe. Ez û Buran bi şev û roj wan dişopînin. Kî ji xeta tunekirina ciwanên kurd derkevin, ew ên bi xwe wî bedelî jî bidin. Bila dewleta me û çekdarên wan ê nav partiyê her hebin. Gotina min ev e, em ê berxwe bidin heta ku bikaribin bi serkev in. Lê ya herî girng ji bona min ew e ku ez çi dikim jî nikarim berpisê wan bibînim an nas bikim. Her min çiqas ev daxwaz kirî ye jî lê gelekî zehmet e, ji ber ku pir veşartî ne. Êdî gotina we ye. Karê ewilî çi ye em li ser wê qise bikin.

Kûçik destpê kir û got:

-Niha rewş li gor min ne zêde xerab e. Sapo jî karê xwe baş dike. Bila şerê xwe bi awayekê hê zêdetir bidomîne. Heger bi serket baş e û tu asteng li pêşiya me û wî namîne. Heger bi serneket, em ê bi rêya darbeyeke leşkerî vê çareser bikin. Ez dizanim ku wê darbe li ser dewletê gelek biha rûnê. Îhtîmal e ku em ji gelek têkiliyên navneteweyî dûr bikevin, em ê di warê aborî de gelekî wenda bikin. Ya din li hemberî darbê em ê tûşî çi bibin, hê jî ne zelal e. Lê karê niha li pêş me ew e ku bila Sapo karê xwe yê şer berdewam bike. (Li Dogu nerî got) ji xwe rojname û kovarên li ser navê te derdikevin, bi hemî hêza xwe propaganda Sapo dike ku ew di şerde bi ser dikeve an wê bikeve. Ev jî dikare morala endamên RNK xerab bike ku di şerde têk here. Êdê em tiştekî li ser biaxifin nemaye. Bila şer berdewam be. Em ê li encamê binêrin.

Civîna wan li wir diqede, Sapo piştî çend rojan li Kurdistanê vedigere, kesên di wan rojan de ew nedîtibûn, jê pirsîbûn ku gelo ew li ku bû; wî jî bi sedema karekî çibû Enqereyê bersîvên wan dida. Lê hezar mixabin rojekê nehat bîra wan kesana ku jê bipirsin ew dihare Enqereyê çi????

# -39-

Şerê tunekirina tevgera ciwanên kurd û wêrankirina milet di her aliyan de berdewam bû.

Şêro her li dibistanê bû û bi dersên xwe mijûl bû. Wekî din jî karê wî hazirkirina hin kadroyên partiyê bû. Yanî bi perwerdariya hin ciwanan ve mijûl bû. Ew ne li gel wî şerê di navberê du hêz, du qawet û du partiyên kurdan bû. Wî dizanîbû û fêm kiribû ku di vî şerî de ê ku wenda bike dê kurd bi xwe bin. Ji bona rawestandina şer hin hewldan dikir lê bêfêde bû.

Şer li Kurdistanê gelekî geş bû bû. Roj tune bû dayikek kurd xwîn nerijiya. Lê çi fêde, dengê wê nediçû tu kesan. Hawar û gaziya dayikan, xuşk û bran bû. Lê fêde nedikir. Ji ber Sapociyan li gor projeya dewletê dabû Sapo karê tunebûna kurdan dikir û PGK jî mecbûr mabû ku xwe û endamên xwe biparêze. Wan jî êdî fêm kiribûn û bihîstibûn ku endamên PTK tim digotin an gotibûn ku ”Heger em PGK-RNK ji holê rakin, êdî em ê li bakurê Kurdistanê bibin desthilat. Niha li hemberî me tenê ew maye.”

Rovî weke berpirsekê leşkerî ha li wir ha li vir bû, halan di endamên xwe yên çekdar de hildida û digot: ”Haydê çavên min, hindik maye hûn van gundî mindiyan jî temem bikin. Êdî hûn xwediyê Kurdistanê ne” yanî wî jî ji bona ew agirê ji bona ciwanên kurd hevdu bikujin pê ketibû, geş bike, çi ji destî wî dihat texsîr nedikir.

Ew şer bû bû sedem ku li Kurdistanê agir pê ketibû. Herkes bi tirs bûn, herkes bi gûman bûn, herkes di şikê de bûn ku çima ev agir li Kurdistanê pê ketiya? Êdî bi şev û roj ciwanên kurd di kozikande bûn. Çek di dest wan de û li nêçîra hev digeriyan. Her teqîn, kuştin û brîndarkirin li ser wê erda dagirkirî di nava ciwanên kurdan de hebû. Bi şev, kes nema diwêrîbûn ji malên xwe derkevin, endamên herdu partiyan jî tim bi tirs diçûn kar û dihatin malên xwe. Kî yê çi demê bihata kuştin ne diyar bû. Ev rewş li ber çavên polîs û leşkerên

dewletê dihate kirin. Lê mixabin wan jî qet midaxeleyî vî karî nedikirin û ji bona rawestandinê jî tu hewl ne didan xwe. Şer hingî geş bû bû, kontrola rêyan ji teref ciwanên kurd dihat kirin. Kes ji otubusan, ji siyaran derdixistin û dibirên li cihên ne diyar dikuştin. Gelek ji malên wan derdixistin û dikuştin. Hin li ser karên wan, hin ji malên wan jî dihate revandinê û vana hemî bi destê endamên Çekdar ên Sapociyan dihat kuştin. Te digot qey dewlet tune ye an van bûyerana li welatekî din pêk dihatin. Loma dewletê ne dixwestin vê rewşê bibînin. Ji ber ku ev rewş li gor dilê wan jî bû. Ên dihatin kuştin ji herdu aliyan de jî kurd bûn. Ji ber vê bû ku dewlet ne diket navberê wan. Tu kesek jî wan kesên bi çek ku bi şev û roj di nava bajaran de digeriyan, nedigirtin.

Lê aqilmend û rêvebirên PGK ev rewş fêmkiribûn ku dewlet bi xwe di nava wî karî de ye. Bi hewldana dewletê ev şer gûr dibû da ku ciwanên kurd xwe bi xwe hevdu bikujin û tune bikin. Ji ber vê jî PGK biryar girtibûn ku divê endamên çekdarên RNK tu caran nebin êrîşkar. Li hember êrîşên bêne ser wan jî divê bê helwest nemînin. Dawiya vî şerî dê li ku rawestiya ne diyar bû? Herkes bi tirs û şik bûn. Çima li wan weha hatibû? çima xortên wan ketin ber hev û hevdu dikuştin? brîndar dikirin, kesekî nizanî bûn. Heta carna rîhsipiyan dikirin gazî û digot in.

-Lawo bes e, bes hevdu bikujin, bese şerê hev bikin, hûn herdu alî jî kurd in û bi xwe wenda dikin.

Ma dengê kesên weha diçû kê? Herkes li benda ya xe bûn ku bi serkevin. PGK ji bona azadiya kurdistanê ketibû nava wî şerî û PTK jî ji bona têkbirina tevgerên Kurdistanî. Aha mesele hemî ev bû. Endamên RNK ji bona azadî û serxebûna Kurdistanê canê xwe didan, endamên PTK bê ku bizanibin ji bona parastin û xurtkirina komara tirk canê xwe didan. Ew şerê ji bona tunekirina ciwanên kurd yên ji bona azadiya Kurdistana xwe ketibûn şer, hatibû destpêkirin. Şer û pevçûnên weha heta sala 1980 meha heftan berdewam kir, lê hê jî PTK weke dewletê xwestibû, bi ser neketibû. Ne bi serketina wan jî dewlet, Sapo û Kûçik aciz kiribû. Loma wan di nava xwe de civîn li ser civînan pêk dianîn da ku wê ev şer bighêje çi encamê.

Di çivîna endamên rêvebirên dewleta kûr ya talî de, biryar hat girtin ku darbeyekê ango hukmê leşkerî pêk bînin. Wan êdî fêm kiribûn ku Sapo û PTK nikarin zora PGK bibin, Di civîneke berfireh û hemî endam û aqilmendên dewleta kûr li gel leşkerên xwe biryara darbeyekê dabûn.

# -40-

Ey dîrok, ey felek, ma wê hemî kiryar û bûyerên qirêj bi destên kurdên nezan û nenas bê serê me kurdan? Ji roja Kurdistan perçe kirine û heta niha, tim hin kurd bûne pariyên devên dagirkeran. Li ku tekoşîna brayên wan ya ji bona azadiya kurdistanê geş bû be, bi destê hin birayên din wê têk dibin. Dûre jî dagirker li van vegeriyane û ew jî yek bi yek ya kuştine ya jî koçberî nava bajarên xwe kirine. Gelo çima tim weha çerxa felekê ya ji bona tunebûna kurdan li ser serê wan digere? Ma gelo heta çi dem û dewranê dê rewşa kurdan weha be?

Çi dema hin kurdên ji welatê xwe hez dikin. Hinên xwestibin ji bona azadiya kurdisanê tekoşîn bidin. Miheqeq hin kurdên ji xwîna wî û li ser wê axê, bi hevre mezin bûne, li dij birayê xwe ê ku dixwaze wî û gel bighêjîne azadiya wan, şer kirine. Kesên weha tim xwestine ku kurdan li ser erda wan azad bike û bihêle ku bila ew sererd û binerda gelê xwe bixwin.  Di vî welatê dewlemend û mezin de têra her kurdekî dike ku weke paşayê mala xwe bijîn. Lê çi mixabin vê nezaniyê malik li wan xerab kirî ye. Ne xwenda ne, kesên nexwenda jî nezanin û kesên nezan jî, ji xwe û ji berjewendiyên xwe pêve nikarin tu tiştekî din bifikirin. Ji ber ku nizanin û bîr nabin ku dema ew li ser erda xwe azad bijîn, ew erda têra hemî kesên li ser wê dijîn, dike.

Ey felekê, ey nezanî, Kurdan heta niha çi kişandibin, ji ber nexwendin û cahîlmayina xwe kişandine. Çi eziyet, tade û êşkence li wan hatibe kirin ji ber nezaniyê ye. Ma ne serokê nemir Mistafa Barzanî her gotiye: ”Ew kesên nezan, dikarin ji ber berjewendiyên xwe ê şexî, xwe û welatê xwe jî bifroşin”. Loma dagirkerên kurdan jî her xwestine û dixwazin tim kurd weha nexwenda û nezan bimînin. Ji ber ku ew jî dizanîn kirîna kesên nezan rehet e. Ji ber vê, heta ji dagirkeran hatiye kurd nezan û ne xwenda hiştine. Dema hin kurdan mecala xwendinê li hin metropolên dewletê dîtin. Çepên

dagirkerên Kemalîst ji bona Kurd dîroka xwe nizanibin, zimanê xwe fêr nebin, bi adet û toreyên xwe nejîn, her wan bi rêya olî ew dixapandin û heta demekê bi vê jî bi serketine. Lê piştî ku êdî dîtin ev hêdî hêdî qels dibe û li cîhanê dema îdelojiyan destpêkiriye. Dagirkeran jî ew li gor xwe vê carê bi destê çepên Kemalîstên xwe, bi rêya sosyalîzmê ew xapandin ku sosyalîzmê bi firehî li gor xwe di nava ciwanên kurdan de belav dikirin. Xwestin ciwanên kurd jî wê fêr bibin û bi fêrbûna dê ji hêjayiyên xwe bê par bîminin.

Mesala çepîtiya ciwanên tirk yên Kemalîst ev e. Komar û rêvebirên wê jî gihiştibûn wê zanînê ku wan jî xwe tevlî vê kirin. Lê li gor xwe, li gor berjewendiya komara xwe bi kar anîn. Zana û jîrên xwe li gor berjewendiya gelê xwe, weke sosyalistan perwerde dikirin û ew jî weke kesayetin vê îdeolojiyê tevger dadimezrandin û di hemî çalakiyên xwe de ew didan pêş.

Çi dema çavên ciwanên kurdan vebû û bi meseleya xwe ya neteweyî hesiyan, hêdî hêdî gav bi gav xwestin tevgerên xwe weke yên kurdan bi serê xwe damezrînin. Lê wan çepên dewletparêz û Kemalîst her li dij vê yekê derdiketin û digotin: ”Hewce nake ku em cûda tevgerên xwe ava bikin. Em ê di bin siwana Sosyalîzmê de xwe bi hevre rêxistinî bikin. Dema me bi hevre weke tirk û kurd komara tirkiyê li ser asasê sosyalîzmê damezirand û bi hatine sosyalîzmê jî wê hemî astengî û arîşeyên kurdan bêne çareserkirin. Ji bona ku ciwanên kurdan bi serê xwe rêxistinên xwe danemezirînin bi salan gengeşî li ser vê hate kirin û taliya talîyî, ciwanên kurd gihiştin wê baweriyê ku êşa ciwanên tirk yên sosylîst êşa sinifî ye. Lê êşa kurdan ya neteweyî ye. Loma nabe ku bi hevre di yek rêxistinê de kar bikin. Piştî vê êdî ciwanên kurd jî dest bi avakirina tevger û partiyên xwe kirin.

Partiya PGK ji roja damezrandina xwe de li ser asasê xeta neteweyî, xwe li bakurê kurdistanê bi awayekî nehînî rêxistinî kiri bû. Ji ber vê bû ku hemî tevgerên çepên tirk û hin jî ji yên kurdan li dij wan bûn. Lê ferqa ciwanên kurd û tirk helwestên wan yên li hember avabûna PGK ne weke hev bûn.

Ji ber ku ciwanên tirk yên çep û Kemalîst, ji xwe hemî di eslê xwe de Kemalîst bûn. Wan dizanîbûn ku tevger an partiyên weke PGK daxwaza wan azadî û serxwebûna Kurdistanê ye. Ev jî li hesabê

wan nedihet. Loma bi tundî li hember PGK propagandên nebaş û gelekî xerab dikirin û digot: ” Ev partî ji axa şêx û begên kurd pêk tê, ji xwe vana li dij sazûmana sosyalîzmê ne. Loma di vê dema me ya ku sosyalîzm li cihanê ji bona azadî û rehetiya karkeran kar dike, bi hatina vê jî wê herkes bighêjin mafê xwe. Lê hedef û armanca PGK ne ew e. Ew dixwazî tim û tim sazûma wan desthilat bin. Her weha çepên tirk û Kemalîstên wan gelek fikir û ramanên xwe yên xerab di nava hin ciwanên kurd yên li metrepolên wan dixwendin, belav dikirin û gelek ciwanên kurdan jî heta demeke dûr û dirêj li xwe, li gelê xwe, li dîroka xwe hay nebûn.

Çi dema ciwanên kurdan êdî tevgerên xwe bi xwe damezirandin, ji xwe ev yek bû bû kelemê çavên hemî çep û sosyalîstin tirk. Ciwanên kurd êdî roj bi roj xwe ji çepên tirkan dûr dixistin. Rêxistinên xwe damezirandin. Aha çi bû di virde bû û dagirkerên me ji nûde ketin nava tirsa ku wê kurd azad bibin. Welat û dewleta xwe damezirînin. Ji wê roja ku êdî ciwanên kurd biryara rêxistina xwe bi serê xwe damezirîne, dan. Hemî plan û projeyên dewletê û sosyalîstên wan yên bi eslê xwe Kemalîst bûn, têk bir. Bi têkbirina vê yekê dewletê ji nûde stratejiya ku wê çawa van tevgerên ciwanên kurd têk bibe, plan û projeyên nû ava kirin.

Di nava vê stratejiya wan de tevgereke li ser navê Kurdan û ya wan be, girtin û ji bona vê bi salan kar û xebat kirin, heta ku Sapo peyde kirin. Armanc ji peyde kirina wî ew bû ku Sapo bi xwe kurd û sosyalîst bû(!). Loma ew dikare li gor vê bi rehetî bikeve nava tevgerên ciwanên kurdan. Bi wan re têkeve minaqeşeyan û rêberên wan nas bike. Navê wan bide dewletê. Ji bona ku dewlet jî bi girtin an kuştina wan, pêşî li tevgerên ciwanên kurd yên bi serê xwe, xwe bi rêxistinê kiribûn, têk bibe. Proje hemî li ser vî asasî hatibû danîn. Ev proje ji bona bê tecrûbebûna ciwnên kurd jî, hêdî hêdî bi ser diket.

Ji ber ku dewletê dît, êdî bi minaqeşe û gengeşiyan ev mesele çareser nabe. Loma ew biryara tevgereke weke ya kurdan lê di eslê xwe de ya wan be, damezirîne. Wê di hemî warande xurt û bi çek bike. Aboriyeke wan xurt hebe ku bikaribin bi rehetî karê têkdana tevgerên ciwanên kurd bike. Loma armanca şerê PTK ya li hember tevgerên ciwanên Kurd ev bû.

***

PTK bi hemî hêz û qawetên xwe, bi alîkariya dewleta xwe, rê û rêbazên çepên Kemalîstên dewletê şerê PGK dikirin û kirin. Lê endam û rêberên PGK jî li hember tu êrîşên dihatin ser wan bê deng nediman. Ji bona xwe û hevalbendên xwe biparêzin, RNK ê hemî endamên xwe bi çek kiribûn. Bi çek kiribûn ku şerê dewletê bikin û Kurdistanê azad bikin. Loma tenê cihên ku li hin herêmana hevalbendên wan bê çek bûn, an jî çekên li wir kêmbûn ew kêmanî temam dikirin. Her biryara rêverên PGK ew bû ku RNK êrîş nekin, lê divê li hember êrîşên bêne ser wan jî bêdeng nemînin.

Şer li seranserê bakurê kurdistanê û li hin metropolên tirkiyê ku li hin derên xwendevanên herdu alîyan hebûn, belav bû bû. Wî şerî agirekî nû li kurdistanê pê xistibû ku tu fêda kurdan tê de tune bû. Yên li hember hev şer dikirin, ciwanên kurd bûn. Yên dihatin kuştin kurd bûn, dayikên digiriyan jî kurd bûn. Lê çi fêde di wê dema ciwanên kurd bi slogana ha îro ha sibê wê kurdistanê ava bikin, tê nedigiştin ku ê ev agirpêxistina dewlet bi xwe ye. Kurdan bi hev dide kuştin da ku tevgerên wan yên netewî qels bibe. Aha ev jî ji ber ku ciwanên kurd li ser koka xwe mezin ne bû bûn. Dîroka xwe nizanîbûn ku di wê dîroka qirêj de çi hatibû serê bav û bapîrên wan. Mezinên xwe, rêberên tevgerên xwe yên netewî nas nedikirin. Hemî mejî û nasîna wan dewletên sosyalîst û mezinên wan bû. Lê fêm nedikirin ku ew bi vê yekê dawîya xwe tînin. Yên ev fêm dikirin hebûn, lê kêmbûn. Ji ber ku piraniya ciwanên kurd li ber bayê sosyalîzm û îdeolojiya çep şerxweş ketibûn. Kêmanî û şaşiya ciwanên kurd ev bû. Heger wan tekoşîna Abdulselam Barzanî, şêx Ehmed Barzanî, Qazî Mihemed, Seyît Riza, Elîşer, Şêx Seîd û Barzaniyê mezin naskiribana wê neketibana parastina îdeolojiyan û wê meselaya xwe ya neteweyî nekiribana xala dudan. Dagirkeran jî ev rewş baş dizanîbûn, wan jî baş dizanîbûn ku miletê li ser koka xwe mezin nebe, orf û adetên xwe ji bîr bike, mesela sinifî bixin xala ewil. Wê rojekê têk herin. Ji ber wê bû niha gavên dagirkeran diavêtin ev bû ku kurd dîroka xwe nasnekin, zimanê xwe ji bîr bikin, orf û adetên xwe bi kar neynin.

Çi dema wan Sapo kir serokê partiya PTK, rê nîşanî wî dan ku ji destpêkê de ziman, orf û adetên kurdan ji holê rake. Li gel vê jî şerê

tunebûna wan bike. Lewra şerê PTK û PGK her geş dikirin, dixwestin bi vê geşkirinê ciwanên kurdan tûne bikin ji bona kes êdî doza kurd û kurdistanê nekin. Wan dixwestin Sapo bikin serokê temama kurdan. Loma kêfa wî ku ew ê weke serokê kurdan beşdarî Lozana dudan bibe dianîn. Hezar caran mixabin, ciwanên xwîn germ û tenha daxwaza wan ji bona kurdistaneke azad û serbixe bû, ev fêmnekiribûn. Bîra wan plan û projeyên li hember wan hatibû danîn, nedibirin û nedidîtin. Ew bi xwe jî ne li hev bûn. Di nava wan de li ser minaqeşeyên îdelojiyan gengeşî şer û pevçûn hebû. Lê dijmin rewş baş dişopand û ji rewşa heyî jî kêfxweş bû.

***

Şerê PTK û PGK bi hemî hêza xwe berdewam bû. Di vî şerî de PTK wenda dikir an têk diçû û gelek endamên wan dihatin kuştin. Wan û dewletê li gel hev çi dikirin jî bi ser nediketin. Nebiserketina wan, tirsa dagirkeran zêde kiri bû. Loma wan çivîn li ser civînan amade dikirin. Bangî Sapo dikirin rapor ji wî digirtin ku çima nikare bi serkev e. Hemî rê û rêbazên wan ji bona têkbirina RNK li ser kar bû, lê ne dibû. Çi dikirin nikarîbûn Sapo bi ser bixin. Di şerê nava herdu partiyan de zêdeyê dused ciwanên kurd hatin kuştin. Hin di ber welatê xwe de û hin jî di ber komara tirkan de. Lê hemî kurd bûn û zarokên vî welatê dagirkirî bûn. Hin bi niyetên xwe yên paqij bûne qurban, hin jî ji bona azadiya gelê xwe bûna cangorî.

Êdî dewletê fêm kir ku dê bi rêya Sapo û partiya wî bi ser nekeve. Biryara Darbeyek leşkerî girtin. Loma xwestin berî vê jî civîneke fireh li gel Sapo û mamosteyê wî jî amade bikin, rewşê binirxînin û bizanibin ka dê çi bikin.

Roja civînê hatibû, Sapo weke her car ji hevalên xwe re bi sedema karekî wî li Enqereyê heye, xapandibûn û çû bû Enqereyê. Civînê destpêkiribû. Loma daxwaz kiribûn ku berê Sapo rapora xwe pêşkêş bike. Lewra Sapo dosya ber xwe vekir û dest bi axaftina xwe kir:

-Hêjayan, serok, mamoste û rêberên min. Ji bona ez li ser navê PTK hemû kurdên welatpêrêz ku ji welatê xwe hez dikin û ji bona azadî û serxwebûna wî kar dikin, têk bibin, erkdar bûm. Heta niha çi ji min hatiye min li ser navê dewleta xwe bê taswas û şik pêk anîye.

Têkbirin an bêdengkirina hemî tevgeran ji bona me hêsan bû. Lê weke cenabên we jî dibîne ku ne em weke PTK ne jî weke dewlet bi awayekî dizî nikarin wana ango PGK û tevgera ciwanên wan ya bi navê RNK têk bibin. Di şer û pevçûnan de bêtir endamên me têne kuştin. Yên têne kuştin jî hemî kurd in. Ev ne xema min û dewleta min e. Her çiqasî bi saya dewletê û li gor aqildayîna mamosteyê min î hêja Kûçik jî em tedbîrên xwe digirin û li ser kêmaniyan radiwestin. Em agahdarî wan çekdarên ku dewletê xistina nava me ne, ku bi hêsanî ciwanên kurdan bikujin. Ji ber ku rûyê hemiyan girtîne kes kesan nas nakin. Herkesên di nav şer de xwe endamên partiyê dizanin û ji bona têkbirina PGK li ser kar in. Heta niha me wendabûneke mezin daye. Lê me ji çekdarên xwe yên ji teref dewletê tu zaîyatek (wendabûnek) nedaye. Ji ber ku ew li nokteyên asasî û karê wan tenê kuştina ciwanên kurdan e, hatine û têne bi cihkirin.

Lê bi rastî min hê jî fêm nekir ku RNK vê qawet û hêzê ji ku tîne. Li gor min hin agahdarî girtine yên alîkariya wan dike kurdên li Iraqî ango Barzanî ne û dema lazimî hebe bo alîkariya wan pêşmêrgeyên xwe jî wan re dişînin. Çekên wan Barzanî dide wan, (Sapo ev ji ber xwe ve li ser kir). Qaweta wan ji wir tê. Ya herî xerab jî ev e ku ew partiya gundiyan e. Piraniya gundî bi alîkariya wan ve radibe. Dîsa jî em li hember wan ne zêde xerab in. Lê karê me zehmet e. Heger ne ji Barzaniyan bana, vî şerî de jî em ê bi serketina. Hê me bi temamî wenda nekirî ye. Şer berdewam e. Îcar ji niha û pêde hûn çi stratejiyê deynên pêşiya min, hûn bi xwe dizanin. Ez ji bona hemî karan amade me. Ji bona tunekirina tevgerên ciwanên kurd û PGK çi erk bikeve ser milên min ez amade me pêk bînin. Spas ji bona ku we ez guhdarî kirim.

Sapo yê hemî jiyana wî derew û berovajîkirina meselan bû. Bi vê derewa xwe jî xwest xwe weke berpirsê şerê bi kurdan û nebiserketina wî ya li hember RNK diyar bike ku sedem Barzanî ne.

Hemî endam û rêvebirên dewleta kûr axaftnên xwe kirin. Minaqeşeyên dûr û dirêj li ser vê bi hevre kirin û taliya talî hemî bi hevre gihiştin wê baweriyê ku divê darbeyeke leşkerî pêk bê. Yanî PGK di her warî de, di her qonaxê de bi saya ciwanên xwe yên bi nave RNK bi serketibûn. Ev serketina wan weha bidomê wê firseta ku êdî pêşî li wan bigirin ji destê Sapo û dewletê derkev e. Ji ber

hemî li ser pêkanîna darbeyê li hev bûn. Xwestin cara talî, çend mehekî din jî mohlet ango wext bidin Sapo ku ew êdî êrîş û hemleyên xwe yên dawî pêk bîne. Heger bi serket, problem namîne, na heger wenda kir, divê em êdî darbeyeke leşkerî pêk bînin. Bihayê wê çiqasî li ser me rûnê jî divê em bikin. Heger em nekin wê welatê me perçe bikin û başûrê rojhilatê welatê me, jî me veqetînin.

Belê li hev kiribûn û ji bona Sapo çend hemleyên din jî bike, mohlet ango wext dane wî. Sapo bi vê biryarê him kêfxweş bû, him jî şikdar bû. Loma difikirî ku ew di vî şerî de wenda bike gelo dewletê çi bike ji wî? dê rewşa wî çawa bibe?

# -41-

Şêroyê hê demek ji qedandina dibistana wî re mabû da ku bibe doktor, bi wê doktoriya xwe jî hemî hezkirinên xwe kêfxweş bikira. Lê ji ber zilm û zordariya dewletê, ji ber şer û pevçûnên li uniwersîtan û li hemî dibistanên Kurdistanê, ew jî êdî bû bû kadroyekî zîrek weke Sapocî. Gotina wî êdî pere dikir. Hemî endamên ku ew nas dikirin, li hember wî bi hurmet û disîplîn tevdigeriyan. Di munaqeşeyên bi giregirên tevgerên din re wî beşdarî dikir. Ji ber ku ew çalak û zîrek bû. Tim ew ji aliyên çend endamên xwe yên çekdar ve jî dihate parastin. Wî ev zanîbû, lê nizanî bû yek ji wan çekdarên wî diparêzin çekdarê dewletê ye ku weke endamên partiyê ye. Sedema ku tim ew ji teref wan de dihate parastin jî ev bû. Di minaqeşeyekê de ku ew bi serneketa, wan parêzvanên wî û bêtir ê zilamê dewletê, bi tehdîdên xwe dixwestin ku Şêro bi ser bixin. Heger hin li dij wan jî bihatana ew ji aliyê wan çekdarên dewletê ve dihat gulebarankirin. Tevlihevî şer û pevçûn dikirin ku tim PTK bi ser diket. Ev jî her dibû weke propagandeyekê jî bona wî.

Şer û tevliheviyên dibûn êdî mecala ku hin bifikirin ne dida. Ev tevliyên dibûn. gûrkirina şer. Pevçûn û tevlihevî ji teref dewletê, bêtir dihate kirin ku herkes ji vê rewşê of bibin û di dilê welatiyan de, ji bona rawestandina wî şerî, hêzek an qawet derkev e, didan zanîn. Ya na herkes difikirîn ku ev rewş weha bidome, welatê wan bi tevayî dikare têk here. Ev jî ne dihat hesabê welatiyên dewletê. Ev ne dihat hesabên wan. Loma yên ev agir gûr dikir jî dewleta wan bi xwe bû. Ji ber ku dewletê êdî biryara wê darbeyekê çê bikin da bû. Loma bi wan tevlieviyên derdixistin, dixwestin xelkê ji ber şer û kuştina ciwanan bêzar bikin da ku ew jî li rêya çareseriyekê bigerin. Herku şerên di nava PTK û RNK gûr dibû. Her ku şerê li dibistanan û li ûniwersîtan geş û mezin dibû. Ew gûrbûn dibû hêsirên dayikan. Dayikên zarokên xwe wenda dikirin, li hêviya qawetekê û hêzekê bûn da ku vî şerî rawestîne. Ev tevlihevkirin û gûrkirina şer. Ji aliyê

gelek welatparêz û şoreşgeran ve jî êdî dihate fêm kirin û ji hevre an ji endamên xwe re digotin; ”Dengê potînin leşkeran tê”. Belê rast bû, deng dihat, lê li hember wî dengî jî tû tedbîrên ku divê bigirtana jî nedigirtin Ya rastî nizanîbûn dê çi bikin.

Ji wan kesên dengê potînin leşkeran dibihîst jî yek ji Şêro bû. Loma wî dixwest vê zanebûnê bide Sapo. Berî vê jî çend caran bi hatina xwe ya Enqereyê Sapo, Şêro jî dîtibû, ew gelekî ecibandibû û jê re gotibû:

-Şêro ez te pîroz dikim. Ez agahdarim ku tu karê baş dike. Tu xortekî me yî zane ye. Divê tu tim hay ji xwe hebe ku tiştek bi te neyê.

Di eslê xwe de ev sînyalek bû. Ma Şêroyê reben dê ji ku bizanibaya ev sinyala dema ew ji gotina Sapo derkeve wê bê kuştin, bû.

Bi wan gotinên Sapo ew jî gelekî kêfxweş bû. Eferîma Sapo an pesindana wî ya ji teref Sapo ew kiribû ku bêtir hurmeta Sapo weke serokê xwe bigere. Bi wan gotinên wî yên xweş û delal, Şêro di bin bandora wî de mabû. Loma berî pêkanîna darbeyê dema Sapo hatibû Enqereyê ku di civîna komîteya qirkirina kurdan de beşdarî bike, wî xwestibû Şêro bibîne û Şêro ji vê yekê gelekî kêfweş bû bû. Dema hevdu dibînin Şêro jê re dibêje:

-Ya serok, bi qasî ez dişopînin û dibînin, dengê potînin leşkeran tê, lê wê çi bikin, wê fêm nakim. Di darbeyekê leşkerî de tê çawa bê parastin û xwedî li te bê derketandin? divê tu ji niha de haziriya vê yekê bike.

Sapo bi wî kenê xwe yê genî weke her car lê vedigerîne:

-Tiştek bi min nayê, em êdî ordî ne, qaweteke me ya mezin heye. Em haziriya şoreşek mezin dikin ku her çar perçên kurdistanê xilas bikin. Tu behsa çi dike Şêro? Ez nawazim endam û rêvebirin ve paratiyê tirsonek bin. Divê li gel hemî zordariyan hûn berxwe bidin. Em niha di haziriya şoreşê dene. Ka wekî din, karê te li vir çawa dihare? Divê tu vê havînê haziriyeke mezin li gundên kurdistanê bike, gundiyan bi çek bike.

Di eslê xwe de dema Şêro ji Sapo re dibêje, dengê potînên leşkeran tê, wî yek ser ew naskiribû ku yekî zîrek û jêhatiye. Jêhatî û dûrbîn

e jî. Dema wî ew rewş ji Sapo re got, helbet Sapo yek ser fikirî ku dixwest vê fêr bi be ku çawa ew vê yekê dizanî.

***

Ya rastî ne tenê Şêro di nava hemî partî û rêxistinên kurdistanê de jî ev gotegot hebû. Heta hin hevalbendên RNK ku ji ber xebatên xwe di girtîgehê de bûn, wan jî bi rêya zîyaretçiyên xwe xeber dişandin ji hevlên xwe re û digotin: ”Em texmîn dikin wê tiştnî biqewime, îhtîmala darbe jî çi bibe heye. Divê rêvebir û endamên partiyê hay ji vê hebe. Lê hemî gotinên weha qet tu tesîra xwe li rêveberên tu partiyên kurdan nedikir. Hin ketibûn derdê xwe û dê çawa xwe ji ber tofana Sapociyan biparêzin. Hin ketibûn wî derdê ku çi demê ev şer wê rawest e. Hin jî ketibûn derdê ku wê çawa vê tevger an vê partiya şerê kurdan dike biqedînin.  Şoreşa xwe ya ji bona azadiya gelê xwe li dar bixin. Loma tu haziriya ku wê darbeyek leşkerî çê bibe û di vê darbeyê de dê partî û tevgerên welatparêz xwe çawa biparêzin, tune bû. Lê ê bi hazirî û ev rewş êdî li ber çavên wî zelal bû bû Sapo bû. Ji ber ku jê re hatibû gotin, heger ew di şerê bi RNK bi sernekeve wê dewlet mecbûr bîmîne ku darbeyekê bike. Helbet rîska darbê jî mezin bû, lê wekî din tu rê û çareyeke din nedîtibûn.

Ji bona vê jî dema Sapo li Kurdistanê vedigere û komîta rêvebir dicivîne û dibêje:

-Em çi dikin, nikarin li hemberî ciwanên PGK bi serkevin. Ma hûn qey ne zilamin? Ma hûn ne çekdar in? Ma hûn ne xwediyê kurdistanê ne? Ma qey we kitana jinên xwe bi xwede kirine? Hûn çawa zilam in? Min ewqasî xebat ji bona we kir. Min ewqasî zanyarî daye we. Min nan û ava we da. Çekên we temîn kirin, êdî hûn çi ji min dixwazin. Ma hûn dixwazin ez bi xwe jî têkevin nava şer û bême kuştin û partî bê serî bimîne. Ma hûn diwazin evqas kar û xebatên me di avê de here? Hûn çawa xwelîserin ku nikarin bi van îmkanên min ji bona we amade kirî ye, zora çend gundiyan bibin?

Ya rastî ev çivîn bû bû civîna haqaretên Sapo ji bona rêvebirên partiya wî. Ji kesekî deng dernediket lê Buran mafê axaftinê xwest û got:

-Serok rast dibêje, heger van îmkanên wî ji bona me amade kirine di destê partiyeke din de bana, niha Kurdistan xilas kiribana. Lê em hê nikarin zora çend gundiyan bibin û dilê Serok rehet bikin. Bi rastî jî serok ji bona me, ji bona xilaskirina Kurdistanê her fedekariyê dike. Lê em çi dikin?

Piştî vê civîna bi heqaret û sixêf, hemî endamên rêveber bi tirs û hêrsek mezin ji civînê derketin. Derketin û xwestin bi mezîntirîn hêzê êrîşî RNK bikin, Kirin, li hemî êrîşên wan di qirika wan de ma. Tenê bi van êrîşên hovana, hin ciwanên kurdên din jî canê xwe ji dest dan.

***

Şêro tim di mesela vî şerê navbêra PTK û RNK bi şik bû. Gelekî serê xwe bi vê meselê re diêşand. Çi dikir nedigihişt wê armanca ku ew li ser difikirî. Him karê xwe ê rêxistinê di nava gundan de dimeşand, him di dema vekirina dibistanê de jî li Enqereyê ev kar dikir. Nav û dengê wî jî gelekî belav bû bû. Lê bi serde jî gelekî di bin bandora gotinên Sapo de ma bû û bû bû heyranê wî. Aha ji ber vê bû wî nema dikarîbû rastiyê bibîne. Herku dengê potînên leşkerên tirk bilind dibû, şerê PTK û RNK gûrtir dibû. Ji ber ku Sapo nedixwest darbe pêk bê. Wî nizanîbû ku wê piştî darbê dê çi pêk bê. Ew ê êdî roleke çawa bilîze? Ew ê çawa tunekirina kurdan bi destê xwe bîne? Van fikir û ramanan lê weha dikir ku bêtir şer gûr bibe. Ew û partiya wî bi serkevin. Ev serketin wê ji bona wî biba xelateke mezin. Ji ber vê, piraniya çekdarên xwe û yên dewletê ku ew jî weke endam bûn, derbasî nava gundan jî kir, derketin serê rêyan. Siyare disekinandin, kesên hema çenekî bêhna welatparêzî jê bihatana weke endamên RNK dibirin û dikuştin. Xezebeke nû, agirekî bi hêz ji teref Sapo de li Kurdistanê pê ketibû. Hêrs û kîna wî berz bû bû. Ketibû tatêla xwe dê çawa PGK û tevgera ciwanên wê RNK têk bibe. Çi kir û nekir bi sernediket. Li aliyê din jî hemî endam û çekdarên RNK hatibûn agahdarkirin ku çi dibe bila bibe, divê ew êrîş nekin û li hember êrîşên bê jî, bê deng nemînin.Şer di hemî aliyan de bi hêzek mezin bi hêrsek bilind berdewam bû. Leşker û

polîsên dewletê jî her weke temaşevan bûn. Tenê li rewşê dinerên û dixwest PTK bi serkev e. Wan çi bi dizî û çi jî bi eşekereyî piştigiriya Sapo dikirin, lê dîsa bi sernediketin. Di neticê û encamên dawî de nêzî sêsid xortên kurdan canê xwe dan, piranîya wan jî ji endamên PTK bû. Dewletê dît ku nabe, mecbûr ma ku darbeyekê çê bikin. Dîsa xeberek ji Sapo re şandin ku ew were Enqereyê li ser vê meselê qise bikin da ku darbeya xwe pêk bînin.

# -42-

Sapo weke her car, li odaya ku emrê tunekirina kurdan jê derdiket amade bû. Ew amade bû lê ne kêfa wî ne jî ya wê komîteya rêvebiriya dewleta kûr li cih bû. Ne li cih bû ji ber weke wan dixwest Sapo bi alîkariya çekdarên dewletê yên dinava PTK û bi karanîna hemî îmkanên dewletê, ya ji bona tunekirina tevgerên ciwanên kurd amade kiribû, bi ser neketibû. Ji ber ku yên li hemberî wan ango PGK li gel hemî endam û alîkarên xwe. Bi baweriyeke mezin bi helwestên ji xwe bawer û ya girîng jî ji bona azadiya kurdistanê ji dil û can, bi baweriya neteweyî karê xwe dikirin. Lê ev bawerî û ev hîs bi qasî bi endamên ciwan yên RNK re hebû bi yên PTK re tune bû. Ji ber ku piraniya endamên PTK, bi wê ruhiyeta neteweyî nehatibûn perwerdekirin. Ji ber ku dîroka wan, ya gel û mezinên wan ji wan hatibû veşartinê.

Lewra di vî şerê ku dewleta kûr bi destê Sapo, ji bona hemî tevgerên ciwanên kurdan têk bibe û Sapoyê zilamê xwe bikin serokê kurdan bû. Her weha ji bona ku Sapo jî di Lozana bê de li ser navê kurdan biaxife û li wir bi zelalî diyar bike ku ”ew ango Kurd tiştekî naxwazin. Tiştên dixwazin ew e ku ew û tirk li gel hev bijîn. Ez (Sapo) weke serokekî wan vê daxwaza gelê xwe niha li vir ji bona we hêjayan zelal dikim. Jiyana me ya li gel tirkan ku em weke du biran in. Jiyaneke xweş û li hevkirî ye. Li ser vî asasî jiyaneke li gel wan, ji bona me baştir e û di berjewendiya miletê me de ye.”

Sapo bi serneketibû, loma hêrs bû bû. Ne tenê ew her weha hemî rêvebirin dewletê jî ne kêfxweş bûn. Ji bona wan pêkanîna darbeyekê ku wê gelek zerarên xwe jî hebaya, dabûn. Ji ber ku dem û dewran hatibûn guherandin. Êdî dema darbeyan derbas bû bû. Her weha tirkiye jî him endamê Nato bû û him ji bona têkeve nav yekitiya ewropa kar û xebat dikir. Lê pêkanîna darbeyekê dikarî bû bibe sedema têkiliyên wan bi ewropiyan re, bikeve xeterê. Lê mecbûr mabûn darbeyekê pêk bînin. Rêvebirin dewletê êdî baş fêr bû bûn ku ew darbeyekê pêk neynîn dê welatê wan perçe bibe.

Berpirsê komîtê û rêveberên dewletê yên ku xwedî selehiyeteke mezin, dest bi axaftina xwe kir got:

-Hûn hemî bi xêr hatine. Ya rastî em bi xêr nehatina (dema weha got, li Sapo nerî ku wecê Sapo qelibî, tirs û xofek kete nava wî, loma nikarîbû li kesên axaftinê dike binêre) belê em bi xêr nehatine ji ber ku plana me ya ku wê Sapo û partiya me jê re damezirandibû, dê dawî li kar û xebatên ciwanên kurd bianiya, neçû serî û bi serneket. Ev jî ne tenê sûcê Sapo ye (dema weha got hinekî wecê Sapo xweş bû). Sapo tiştê ku me jê xwestibû hemî bê kêmanî anî cih. Lê bi ser neket. Niha emê darbeyekê bidin kirin, ji ber ku tu rêyên din li ber me nama ye. Belê di vê derbarê de kesên bixwazin nerîna xwe bêjin, hebe, fermo.

Yekî din mafê axaftinê xwest û got:

-Belê rast e, weka canabê we got, mixabin weha bû. Yanî em bi serneketin. Lê gelo em nikarin darbeya ku em ê pêk bînin hinekî din jî bi şûnda bidin. Hin firsetên din bidin Sapo ku ew me bi serbixe. Nizanim lê ka gelo wê Sapo çi bêje.

Sapoyê him bi tirs him wecnexweş, ji cihê xwe rabû û got:

-Belê, rast e, ez bi serneketim, lê bawerim ev ne tenê girêdayî min bû. Heta ku ji min hat, ji bona tunekerina wan tevgerên kurd yên terorîst, min kar kir. Plan û projeyên we ji bona vê amade kiribûn, min yek bi yek di jiyanê de pêk anîn, lê nebû. Ji ber ku yên li hemberî me jî, ne kêm in. Li pişta wan Barzanî hene û ew Barzaniyên ku bûne bela serê me û dostên me, plana me têk birin. Ez dizanim nebiserketina vê sûcê herî mezin ê min e. Ez baş li ser difikirim ku bibînim bê hela min di ku de kêmanî kir û çima ez ango em bi serneketin. Niha li ser wê dixebitim û heger îmkan hebe, şeş mehekî din jî wextê bidin min ez dibêjim, bi alîkariya dewletê vê care ez ê bi serkevim. Ka hûn çi dibêjin?

-Na nabe, ew dema me derbas bû. Em bi serneketin û bawer nakim ku ji niha û pêde em bi ser jî bikevin. Loma biryar hatiye girtin ku wê êvara 11 meha îlonê 1980 darbe dê pêk bê. Wê ev darbeya ne weke yên berê be. Îhtîmaleke heye ku pir xwîn birije. Ji bona vê jî dewletê her tişt dane ber çavên xwe. Êdî vegera vê nemaye. Tenê divê Sapo wan navên kesên ku wê rojekê ji me re bibin xeter, an serêşekê ji

bona me bîne, bila bide û heta ji wî tê divê li ser vê baş raweste da ku em hemî kesên çi endamên wî û çi jî kesên ew nas dike, navê wan bila bi dirêjahî binivîsîne bide. Dûre em ê wî li Sûrî bi cih bikin. Ji xwe ew hazirî jî hatiye kirin.

Em êdî li ser vê minaqeşe nekin. Gotin û pêşniyarên me wê bêtir li ser wê yekê be ku ka piştî darbeyê dê em ê çi bikin? Ya girîng ev e. Loma biryar hatiye girtin ku em berî darbê Sapo bişînin Surî û li wir jî hin hewldanên me hene. Ji bona bi cihkirina wî ya wir me û desthilata Sûrê li hev kirî ye. Lê karê Sapo li wir naqede, plana me heye ku em ê piştê darbê hin karên nû bidin Sapo. Lê niha divê em darbeyeke bi serketî pêk bînin. Ev darbe wê çi bîne û çi bibe, hê ne diyar e.

Li gor raporên ji me re hatine, hemî yek fikirin ku bi pêkanîna darbeyê dibe ku PGK jî dest bi şoreşî bikin. Ji bona wê divê em di nava haziriyeke baş de bin. Ji ber ku me berpirsên vê partiyê yên mezin ango rêvebir hê jî destnîşan nekirî ye ku ew kîne. Ev ji bona me serêş e. Wekî din tu astengên me tune ne. Bi saya Sapo û hevalbendên wî me hemî an jî piraniya berpirsên tevgerên ciwanên kurd destnîşan kirine. Bi pêkanîna darbeyê em ê wana yek bi yek bigirin, bixin zîndanê. Divê em dîsa jî pir bi hazirî bin. Heger PGK dest bi şerekî li hember me kir. Êdî ev dibe, hebûn û tune bûna me. Li gor vê dive êdî herkes haziriyên xwe bikin.

***

Dewlet bi biryar bû, ji ber ku ew û pêgirtê wan Sapo û PTK bi serneketibûn, Dewletê bi aboriyeke mezin, bi alîkariya çek û çekdarên xwe jî bi serneketibûn. Loma biryara darbê hatibû dayîn. Li ser wê yekê, li hev kiribûn ku berî darbe pêk bê, divê Sapo ji welêt derxin û li Sûrê li Şamê bi cih bikin. Di avahiya ku wê lê bi cih bibe jî qatê ser wî û ya bin wî jî divê zilam û berpirsên dewletê, bin. Ji ber ku Sapo hê gelekî ji wan re lazim e. Û dewletê êdî bi her awayî bawerî pê anîbûn. Dîsa jî tu caran kontrolkirina xwe ya li ser wî kêm nedikirin. Roja darbeyê nêzîk dibû û hemî amadekariyên wê jî hema temam bû bû. Dengê potînin leşkerên tirk nêzîktir dibû. Hezar mixabin ku hê jî tevgerên ciwanên kurdan, fêm nekiribûn ku wê çi bibe. Hin şikên wan hebûn. Lê qet tu haziriyên wan î ku darbeyeke

pêk bê, dê çi bikin tune bû. Dewletê jî ev texmin kiribûn û dîsa jî dewlet di nava haziriyeke mezin de bû.

Wan zilamê xwe, weke endamekî ji wê komîta rêvebir ya dewleta kûr, li Sûrî bi cih kiribûn. Lîsta navên ku divê bêne girtin ji wî girtibûn ku piştî darbeyê wan endamên PTK yên bi şik û piraniya endamên tevgerên din, bigirin. Êdî rojên bi hejmar ji bona darbeyê mabû.

Êvara 11.09.1980 li tirkiyê û li bakurê kurdistanê agirê ku ji bona kurdan tune bike, pêxistin. Ji destpêka serê sibê de destpêkirin û ketin kuçe û kolanan, ketin parlemena xwe, dest danîn ser serok û berpirsên partiyên xwe. Li bakurê Kurdistanê berê li gor wê lîsteya kesên divê bêne girtin, ya Sapo dabûn wan destpêkirin. Yek bi yek ew jî wê sibê ku kesên ketin destê wan girtin. Leşkeran dest danîbû ser hemî dezgeh, radyo û tv. Di radyo û tv yan dest bi xwendina û fermanên xwe kirin. Milet bê deng bû, partî û rêxistinên qet bîra vê rojê nedibirin, ketin hev. Kî yê bi ku de bazdin ne diyar bû. Ji xwe qedexeya derketandina derve jî hatibû dayîn. Leşker û zilamên Îstîxbaratê rê girtin da ku kes neçin û neyên, li Kurdistanê li gor wê lîsteya Sapo pêşkêş kiribû, yek bi yek êrîş birin ser malên wan.

Tofan û agirekî weha pêxistin ku bê hey hawar. Ev hê destpêk bû, gelo wê dawî li ku derketa ne diyar bû. Dîsa hezar mixabin, vê darbeya ku agir bi kurdistanê xistibû, hê jî heşê gelekan neanîbû serê wan. Munaqeşeyeke nû, goftoguyên cûda destpê kiribûn. Ji dêlva ku tevger û partiyên welatparêz û şoreşger li ser hatina vê darbeyê û xwe parastinê goftugo bikin. Ji nû de ketin qirakên hev û digot in: ”Gelo ev darbeyeke Faşîst ya jî demokrat e.” Dîsa ev ji nava çepên tirkan ango Kemalîstan derbasî nava tevgerên kurdan jî bû bû. Li alîkî girtin, lêdan û kuştin, li alîyê din xwe parastin, rev û xwe veşartin hebû. Li aliyê din jî gelo ev darbe darbeyeke Faşîşt an demokratîk e. Hingê mejiyê ciwanên kurdan bi ava Sosyalîzma li ser destê Kemalîstan hatibû şûştinê, nikarîbûn, bibînin ku ev darbe bêtir ji bona tunekirina tevgerên ciwanên kurdan bû. Nikarîbûn bidîtina û bi hevre minaqeşe bikirana da ku wê çawa xwe ji vî agirê xilas bikin. Tevliheviyeke mezin, tirs û xofefek nedîtî ketibû dilê kesan.

Lîsteya navan û wêneyên gelek ji kesên çi yên Sapo dabû û çi jî yên deweletê bi xwe tespîtkiribûn, di destên leşker û polîsan de bûn. Li

ser rêya otobusên rêwiyan, siyare û komyonên dihat û diçûn disekinandin. Li gor wê lîsteyê li nasnameyên kesên rêwî dinêrin. Hin caran pênc şeş kes ji otobusan derdixistin û dibirin. Li gundan leşkerên bi perwerdahiya dijminatiya kurdan hatibûn perwerdekirinê zilm û êşên mezin didan gundiyan. Ji xwe tu caran zilma leşkeran li ser serê Kurdan ranewestiya bû. Lê niha bêtir bû bû. Gelek caran bi komyonên tije zilam ji gundan dibirin bajêr têra xwe êşkenca bi wan dikirin û piraniya wan dişandin zîndanê.

Vê rewşê bi meh û salan domand, lê dîsa ev ne li gor dilê dewletê û Sapo bû. Ji ber ku li gor wan heta niha jî hê tu serok an berpirsên partiya PGK nehatibûn girtin. Çi yên xwe li ciyan veşartibûn û çi jî yên derbasî başûrê û rojavayê kurdistanê bû bûn, da ku xwe ji bona şoreşekê amade bikin. Lê mixabin nekirin û heta taliya wan tevan li ewropa derket.

Helbet êdî dewlet nedisekînî, firseta ku hemî tevgerên ciwanên kurd ji kok de tune bikin, kar û tadeyên xwe li ser xelkê û bi taybetî li ser kurdan kêm nedikirin. Girtin, kuştin, seqetkirin, rev, xwe veşartin û parastin jî bû bû para kesên welatparêz û şoreşger. Ev ê heta çi demê bidomiya kesan nikarîbûn texmîn bikirana. Li gel vê jî dewletê her karê xwe dikir û ji bona qedandina tevgerên welatparêz her di nava amadekariyê de bû.

Vê rewşa bi tirs û xof, bi salan ajot, hingî ajot ku êdî xelk ji ber hebûna xwe, aciz bû bûn. Bi hezaran kes ji karên xwe hatibûn avêtin, bi hezaran ji dibistanên xwe hatibûn dûrxistin. Êdî di nava xelkê de birçîbûn, bê karî hingî zêde bû bû, hema herkesan çavên xwe li rohaniyekî ku pê biketa digerandin. Çavên wan li qawetekê û hêzekê bû ku li hember vê zilma dijmin rawestiya, digeradin. Xelkê hemî hêviyên xwe kiribûn ku wê rojekê wan tevgerên kurdan, wan rêberên kurdan yên weke bilbilan bi hevre diketin niqaşan. Wan egîtên her roj li gundan digeriyan û di nava gundiyan de bûn. Ji wan re digot in: Qet meraqan nekin, em ê şoreşekê bikin û hemî erdên axa û begleran li we gundiyan parve bikin, digeriyan. Milet şaş mabû. Wan egît û mêrxwasana nedidîtin. Wan ciwanên Kurda ku hemî bi çek bûn, wenda bû bûn. Wan welatparêz û şoreşgerên digotin: ”Ha îro ha sibê em ê kurdistanê azad bikin”. Li pîyasê tune bûn.

Êdî gundî jî ketibin tatêla xwe, nan û têrkirina zikin zarokên xwe. Bê karî, bê peretî, bê aborî, milet ji qudûm xistibû. Di zîndanên tirkan yên li Kurdistanê cih nebû ku girtiyan têde bi cih bikin. Êdî cihê êşkencan bû bû weke cihê heywan şerjêkirinê. Li dîwaran, li erdê, xwîna ciwanan û kesên girtî hebû. Bi êşkence û tahzîbên nedidîtî, li xelkê û li ciwanên kurdan dikirin. Dewlet dîn û har bû bû. Ji ber ku ew tiştên lê digeriyan bi destnexistibû. Ji ber wê bû, bê ser û ber kî biketana ber wan digirtin, tade û êşkence lê dikirin dûre jî dişandin zîndanên xwe ku wir ji cihê êşkencan jî zortir bûn.

# -43-

Bi hatina darbeya leşkerî ku welat şewitandibû û herkesan xwe di nava wî agirî de dîtibûn. Hin ji mecbûrî reviyan, hin hatin girtin û hinan jî xwe parastin, ji ber ku navê wan nehatibû dayîn. Ya jî yên dihatin girtin, di êşkencê de navên nas û hevalên wan nehatibûn bîra wan ku bidin. Ji ber wê bû ku hin bê qeza û bela ji wê tofanê xelas bû bûn. Ji wan yek jî Şêro bû. Ew jî ketibû nava tirsekî û tim li bendê bû ku ha îro ha sibê dê bê girtin. Lê nehat girtin. Wî jî weke gelekan tevgerên xwe yên bi gundiyan û teleban re kêm kiribû, dev ji hemî minaqeşe û gengeşiyan berda bû. Ji nû de xwe li dersên xwe jidandi bû. Ketibû wê heyrê ku bê qeza bikaribe dibistana xwe biqedîne û bibe doktor da ku bi saya doktoriya xwe bikeve nava gundiyan. Şêro şaş mabû ku çawa nehatibû girtin. Ji ber vê wî, xwe li dersên xwe jidandibû. Di fikirî û didît ku hemî kesên wî nas dikir û rêwiyê yek rêyê bûn, piraniya wan hatibû girtin. Ji gundê wî û gundên derdorê jî gelek hatibû girtin, lê dîsa jî ew nehatibû girtin. Gelekî li ser vê difikirî lê tu rê jê dernedixist.

(Erê rast e ma wê çawa rêyek jê derxista, ma wî yê çawa bizaniba ku Sapo di derheqî wî de rapor da bû û gotibû: ”Heta ji we bê û hûn pir mecbûr nebin, Şêro negirin, ew heyranê min e, em ê di siberojê de wî ji bona hedef û armancên xwe baş bi kar bînin.” Ma wê Şêro ji ku bizanîba Sapo jî zilamê dewletê ye. Ma wê ji ku fêm bikira ku avakirina PTKê ya ji bona tunebûna, tevgerên ciwanên Kurd û miletê kurd bû ku ji teref dewleta kûr ve hatibû damezrandin”.

Şêro jî weke gelek ciwanên kurd, çavên xwe bi lêdana leşkeran ya gundiyan vekirî bû. Wî bi çavên xwe dîtibû ku bê leşkerên romê çawa êşkenca û tadê li gundiyan dikir. Wî dîtibû, dema nexweşê bavê wî, lêdan ji destê wan xwaribû. Loma hemî kîna wî, hêrsa wî ew bû ku ew jî bikaribe rojekê tola bavê xwe, gundiyên xwe ji wan leşkerên barbar bigire. Ji ber vê bû wî xwe bi temamî dabû kar û xebatên siyasî yên di nava Sapociyan de. Ma wî yê ji ku zanîba PTK

partiya dewletê ye û Sapo bi xwe jî zilamê wan e. Ew jî weke gelekan bi hîsên xwe yê paqij, bi baweriya xwe ya pîroz ku dê ji bona gelê xwe kar bike da ku rojekê ew û hevalên xwe, ew û partiya wan, xelkê ji bin vê zordariyê azad bike. Loma ew jî bû bû endamekî çalak, zîrek û qenc, dûre jî dibe weke berpirsekî. Lê tê nedigihişt ku vana hemî feq in, li ber wî û welatê wî hatibû vekirin.

Piştî darbeyê hinekî mecal dît ku xwe bi xwe bifikire. Ji ber zilma leşkerên romê mirov rêya ku bi mejiyekî rast bifikire nedidît. Di nava wê tirs û tevliheviyê de qaşo PTK bi serokatiya Sapoyê li hember zilma dewletê dest bi şerê çekdarî ya ku wê hemî hêjayiyên kurdan têk bibe, kirin)

Wê derbeya leşkerî agirekî weha li tirkiyê û bêtirîn li bakurê kurdistanê pê xistibû ku kesan nikarîbûn çavên xwe vekirana. Her roj kuştin wêranî, girtin, zilm û zordariyeke weha dihat kirin ku bê ya star. Wan tade û êşkenceyan li kurdan weha kiribû ku hema li rêyekê, li pêxistina agirekê azadiyê digeriyan. Bi hemî hêviyên xwe li benda wê çiroska agirê ku wê ji bona wan re azadiyê bîne, bûn. Piraniya gundiyên kurdistanê û gelek telebe ango xwendevan endamê PGK bûn. Ew jî her li bendê bûn ku ha îro ha sibê wê hevalên wan dest bi şoreşê bikin. Vê hêvî û baweriyê heta roja şerê PTK dest pê kir hebû. Piştî wê jî êdî hêviya tu kesan ji partiya wan, ji hevalbendên wan yên ji bona neyên girtinê reviya bûn, nema bû. Tam di nava wê bêhêvîtiyê de dema şerê çekdarî li gor daxwaza dagirkeran hate destjpêkirin, dilê hinan geş bû. Êdî bawerî anîn da ku ev şer wê wan bighêjîne azadiya wan. Ew weha difikirîn. Li aliyê din jî dagirkeran dixwestin, di şerekî weha de hemî hêjayiyên kurdan têk bibe.

Plan mezin bû, lê ma wê xelkê çawa ew plan bizanîbana. Ma gelo ew xelkê di nava wî agirî de dişewitîn dê çawa bizanîbana ku ew şerê ku destpêkribû dê dawiya wan jî bîne. Ew miletê ji ber zilm û zordariya dagirkeran, gihiştibûn radeyekê ku hema li bendê bûn, hin çirûskekê pêxin ku ev zilmdarî ji ser wan bê rakirin.

Aha tam di nava wê bêhîvîtî û malwêraniyê de, bi alîkariya û piştgiriya dagirkeran PTK dest bi şerê tunebûna kurdan kir. Lê kurdan jî ew şer weke wê ji wan re azadiyê bîne, dizanîbûn. Loma jî bi hemî alîkarî û fedekariyan piştgirî dane PTKê.

# -44-

Piştî ku Sapocî li hember RNK bi serneket û dagirkeran zilamê xwe Sapo derxistin Sûrî li avahiyekê bi cih kirin. Bi vê jî xwestin, li Sûriyê jî her Sapo di bin kontrola wan de be da ku rêya xwe şaş neke û peymana wan ya li gel Sapo eşkere nebe.

Plana yekê ya dagirkeran ku ji bona hemî tevgerên ciwanên welatparêz yên kurdan ji holê rake an gelekî qels û bê deng bikin bi serneketibû. Ji xwe di dema şerê navbera PTK û RNK de tim Sapociyan digot in; Ha îro ha sibê em ê RNK jî weke partiyên din ya ji holê rakin ya jî qels û lawaz bikin ku êdî wê ji me pêve mafê tu kes û partiyên din tune be ku li ser navê kurdan biaxifin.

Ji ber wê bû ku hemî Sapocî bi navê perwerdekirinê, bi mejiyekî din, bi dîrokeke din mezin dikirin ku kurd û ciwan dîroka xwe ji bîr bikin. Ji bona nizanibin ku çi hatibû serê bav û bapîrên wan, dihatin perwerdekirin. Dema biryara perwerdekirina Sapociyan jî hatibû dayîn. Karbidestên dewletê ango zilamên dewleta kûr divê wan hemî amadekarî wan bikirana. Mijarên perwerdekirinê dê ewên hazir bikin û wê bi destê Sapo pêk bînin û her weha jî dikirin. Di hemî perwerdeyên wan de berê rewşa cihanê, bindestbûna kurdan û başiyên sosyalîzmê û dijminatiya Barzaniyan rêya xelasî di wê de ditîn, didan Sapociyan. Dîroka kurdan, mezinên Kurdan, tekoşer û qehremanên kurdan her vedişartin an jî di tu perwerdeyên endaman de qet behsa dîroka kurdan ne dikirin. Ji ber wê giranî didan wê yekê ku weke dîrok ji Sapo de destpêkirî ye didan zanîn.

Ji bona dagirkeran ev hemî kar hêsan bû ku bi Sapociyan bidin zanîn û qebûlkirinê. Problema wan ya mezin ew bû ku tevgera Barzaniyan ya ji bona azadî û serxwebûna kurdistanê li ber guhên wan dihate kirin. Dihate kirin û Barzaniyan bi tekoşerbûna xwe, bi welatparêzbûna xwe, bi gulleyên li hember dijmin bi kar dianîn. Gemara guhên kurdan paqij dikir ku ew li doza xwe hay dibûn, fêr dibûn ku ew tekoşîn û şer dê rojekê welatê wan azad bike.

Loma ev ji bona dagirkeran û bi taybetî jî ji bona dagirkerên tirkan bû bû problemeke mezin. Her çiqasî hemî dagirkeran li hember Barzaniyan şerê tunebûna wan kiribûn jî lê di her ketinekê de Barzaniyan bi hêzeke mezintir û geştir, bi ruhiyeteke neteweyî şerê xwe ya ji bona hebûn û nebûna Kurdan her berdewam dikir. Lewra jî ev ji bona hemî dagirkeran bû bû êş ku kurd bi saya wan naqede an dagirker bi xwe jî nikare wan biqedîne. Ji ber ku wan bawerî anîbûn ku ancax bi saya Sapociyên kurd û bi serpereştiya Sapo dê hewl bidin vê carê Barzaniyan têk bibin. Ji ber wê bû ku hemî malzemeyên perwerdekirina Sapociyan ji teref zilamên dewleta kûr ve dihatin amadekirin ku Sapo jî wan pêk bîne. Her weha jî bû.

(Belê dagirkeran tespîtek rast kiribûn ku heta Barzanî hebin dê tekoşîna azadiya gelê kurd jî her berdewam be. Ma ne ew Împaratoriya Alî Osman bû ku Abdulselamê Barzanî ji ber li hember dagirkiriya wan serî rakiribû, ew bi fen û fûtan girtin û li bajarê Mûsulê darvekiribûn ku serîhildana Barzaniyan têk bibin. Ma ne Îngîlîz û dagirkerên Iraqê bi hemî hêzên xwe li dijî Barzaniyan şer kiribûn da ku wan ji holê rakin û tune bikin. Ma ne bi çek û cebilxanên Îngîlîzan yên ku didan Iraqê û desthilatiyên wan jî pê kurd dikuştin. Ma ne Îngîlîzan bi wan balafirên xwe yên şer, her roj weke barana biharê gund û çiyayên Kurdistanê gulebaran dikirin. Lê dîsa jî nikarîbûn tevgera azadîxwaz ya Barzaniyan têk bibirana.

Ne tenê dagirker herweha dostên wan jî bû bûn dijminê kurdan û hemiyan bi hevre ji bona Barzaniyan ji holê rakin, li gel hev li hember wan şerê tunebûna Barzaniyan didan.

Ma ne napalmên rûsan bû, pê kurd dikuştin û birîndar dikirin. Ma ne plan û projeyên dewletên mezin bû ku welatê kurdan kirin çar perçe. Ji bona kurd azadiyê nebînin ji bona berjewendiyên xwe dewletên mezin, li gel dagirkeran şerên kurdan dikirin. Ma ne ew eşîr û serok eşîrên kurdan yên xaîn bûn ku wan jî li gel dagirkeran şerê Barzaniyan dikirin. Lê taliya talî negihiştibûn armanca xwe. Di her ketinekê de û di her serîhildaneke nû de Barzanî bi hêztir radibûn. Evana hemî ji bona dagirker û dewletên Kurdistan di nava çar dewletan de kiribûn çar perçe bû bû êş, derd û probelemeke mezin ku ew nikarin Barzaniyan biqedînin.

Belê ji ber vê yekê bû ku karbidestên dewletê êdî xwestin wê projeya wan û ya hemî dagirkeran û dewletên mezin bi rêya partiya wan ya ku li ser navê kurdan damezirandine tune bike. Ji ber wê bû ku di hemî perwerdeyên Sapociyan de, ew di warekî zanistî ku dê çawa Barzaniyan li hember kurdan xerab rê bidin, kar dikirin. Di nava karê wan de ê herî sereke ew bû ku Barzaniyan li ber çavên kurdên bakurê Kurdistanê û yên din jî nebaş rê bidin kar dihate kirin û Sapociyan li ser vî asasî ango li ser asasê dijminetiya Barzaniyan, dihatin perwerdekirin.

Loma dagirkerên kurdan, li gel Sapo û bi destê rêvebirên PTK di hemî perwerdeyên endamên xwe de li ser xerabî û nebaşiya Barzaniyan ku yên wan bi xwe berovacî dikirin didan Sapociyan. Belê endamên ciwan yên ku hay û baya wan ji tevgerên mezinên wan, ji tevgerên serîhildan û berxwedanên mezinên wan tune bûn. Ew ciwanên ku bi rêya îdelojiyan hatibûn perwerdekirin, di hemî perwerdekirinên xwe de jî li gor xet û baweriya sosyalîzmê divê berê li hember axa, şêk û eşîrên kurdan tekoşîn bidin. Ji ber ku bi perwerdeya ku Barzanî li hember şoreşê asteng in, dihatin perwerdekirin.

Ji ber vê bû ku wan Barzanî kiribûn xala axa û şêxên kurd ku yên herî xeter ew bi xwe ne. Hemî Sapocî weha perwerde dikirin. Loma wan jî Barzanî û hemî serîhildanên ku berê li hember dagirkeran hatibûn kirinê, dikirin xala axa, eşîr û şêxbûnê û didan zanîn. Mamosteyê Sapo û hin ji rêvebirên wê komîta wan ya ji bona tevgerên kurdan yên berê paşverû bûn, loma  bi serneketine, didan endamên xwe. Endamên ciwan û xwîngerm jî bi vê yekê dihatin perwerde kirin û li hember axa, şêx û bi taybetî jî li hember Barzaniyan bûne agir. Bûne agir ku dixwest wana hemiyan bişewitînin. Heta ji wan hat şewitandin jî. Lê tenê di destê dagirkeran û Sapociyan de Barzanî mabûn, loma li hemberî wan jî propagandên li ser asasê derewan endamên xwe perwerde dikirin. Ji ber vê bû hemî Sapocî bû bûn an kiribûn dijminê Barzaniyan da ku ew doza xwe nasnekin û bibin dijminê wan tevgrên ku dixwazin ji bona kurdan dewletekê ragihînin.)

Plana dagirkeran ya yekê bi serneketibû. Weke wan xwestibûn nikarîbûn dawî li tevgerên bakurê kurdistanê bînin. Ji ber ku dema wan di şerê xwe yên ji bona kuştina ciwanên kurdan de wenda

kiribûn. Êdî fêmkirin ku heger weha here wê tevgerên ciwanên kurdan û ya PGK ku haziriya şerê çekdarî dikirin, dê nikaribin pêşiya wan bigire. Her weha bi vê jî wê ciwanên kurd, tevgerên xwe û desthilatiyên xwe zêdetir bikin. Êdî destbi haziriya plana dudan kirin.

Loma Sapo li Sûrî bi cih kirin. Lê kontrola wî jî ji dest bernedan. Êdî wan weke Z. Kûçik û Dogu Birincîk li ser navê çepitiyê kirin dostên Sapo da ku ew li ser vî navî bi rehetî bikaribin li ba wî cihên xwe bigirin. Ji bona bikaribin plana dudan bi wî bidin destpêkirinê. Z.Kûçik aqilmendê Sapo û Dogu jî wê bi medya xwe ango ya dewletê propaganda wî bikin da ku wî bêtir bi kurdan şêrîn bike. Bi kurdan bidin zanîn ku Sapo ji bona şoreşekê li hember dewletê li dar bixe, hatiye li sûrî bi cih bû ye. Bi vê yekê Z.Kûçik aqil dida Sapo û Dogu jî di medya di destê xwe de, her propaganda wî û mezinbûna wî dikir. Wan bi vê yekê Sapo kirin mezinekî bakurê kurdistanê û dijminê dewleta dagirker(!).

# -45-

Dema Sapo li Sûrê bi cih dikin. Bêtêlekê (tilsiz) jî didin wî ku ew jî girêdayî Îstîxbarata wan bû. Dema wî çi qise bikira yek ser Îstîxbarat hay jê çê dibû. Ji ber wê bû ku êdî pêwîstiya Tesîrê jî li gel wî bimîne nemabû. Sapo him ketibû bin kotrola dewleta Sûrî him jî bi saya wê bêtêla dewletê dabûyê ji hemî axaftinên wî agahdar dibûn. Loma berî destpêka şerê tunebûna Kurdan êdî ji bona berdana Tesîrê, Kûçik Sapo agahdar kir ku divê êdî ew wê berda. Ji ber ku karê wê qediya bû. Êdî Sapo jî cihê baweriya dewleta kûr bû. Ji xwe bi rêya wê bêtêla dabûnê û di wê avayiya jor û jêrê wî zilamên dewletê bi cih kirî bûn, nemabû.

Dema biryara şerê çekdarî hatibû dayîn. Her çar dagirkeran bi hevre gelekî li ser vê û destpêka şerekî weha de dê çawa bi alîkariya hev rabin. Dê çawa bikaribin hemî li gel hev vê ji kontrola xwe dernexin û li gor berjewendiya xwe bi kar bînin, axifîbûn. Li gor wê jî biryara ku wê vê ji dest bernedin dabûn. Dema ev biryar dan xwestin hin Sapociyan ji Bekayê bibin Qandîlê. Ji ber vê bû ku desthilatiya Iraqê ew da ser xwe û got: ”Ev li min. Wir erdê min e, ez ê wan li wir bi cih bikin û bi perwerdahiya wan ya leşkerî jî mijûl bibin”. Ev kêfxweşiyeke bû ji bona dagirkeran. Ji ber ku çiyayê Qandîl gelek asê bû.

Li gor vê biryarê dagirkeran bi hevra çi ji kê hat li gel hev û bi alîkariya hev hin ji grîllayê PTK û serpereştiya wan jî ji kesên zilamên Îstîxbarata dewletê pêk dihat amade kirin. Li gor Saddam jî soz dabû bi perwerdekariya grîlla re him mijûl bû him jî pêwîstiyên wan pêk dianî. Êdî hemî amadekarî temam bû, li gor wê jî berê civîneke berfireh li Enqereyê ji teref zilamên dewleta kûr pêk hat û ji bona destpêka şerê tunekirin û wêrankirina kurdan dê çawa û li ser çi asasî destpê bike, biryar dan. Ji ber ku divê wan biryareke bi rêk û pêk bidana ku di vî şerî de bi serkevin. Armanc ji vî şerî jî ew bû ku ew welatparêzin ku hê li welatê xwe bi awayekî nîv dizî û nîv eşkere dijiyan wan jî biqedîne. Li gel vê Kurdistanê wêran bike,

xelkê koçberê nava welatê xwe bikin da ku li wir, dest asîmlekirina kurdan bike. Loma jî rêvebirên dewleta kûr, haziriyên xwe baş dikirin ku bi vî şerê ku kurdan tune û welatê wan wêran bike jî bi serkevin. Piştî civîna Enkereyê ku biryara şer hatibû dayîn, divê ev bigişta Sapo da ku wî jî li gor wê biryarê, haziriya xwe bikira û dîsa li gor wê biryar û destûrê dest bi şerê tunebûna kurdan bihata kirinê.

Ji bona vî karî, wan Kuçik wazîfedar kirin ku vê biryarê bighêjîne Sapo da ku ew jî hin hazirî bike û dest bi şer bike. Karbidestên dewletê ji bona vî karê jî plan û projeyekê dirêj ji Sapo re şandin. Ji xwe Sapo jî li benda rojekê weha bû. Ji ber ku ew di projeya xwe ya ewil ku hemî tevgerên bakurê kurdistanê têk bibe, bi serneketibû. Loma hêrsa wî bilind, kîna wî zêdetir bû bû. Ji ber vê jî ew li benda biryarekê bû ku dewlet firseteke din bide wî da ku ew jî bikaribe wî karê xwe yê nîvco mabû temam bike. Temamkirina vî karî jî ew bû ku divê wî vê carê li gor dilê xwe û dewletê, kurd bikuştana û welatê wan Kurdistana şêrîn wêran bikira da ku êdî kurd him nikarîbana vegerin ser erda xwe û him herkesên ku hê damara welatparêziyê bi wan re mabû bi rêya qesas ne diyar biqedanda.

Êdî biryara şerê tunekirina kurdan ji teref dewletê ku bi agahdarî û alîkariya dewletên dagirker, hatibû dayîn. Plan û proje temam bû. Ji bona agahdarkirin û perwerdekirina gerîllan, Kuçik bi dosyake qalind şandin Şamê ku Sapo bi xwe jî li wir di avahiya dewletê jê re amade kiri bû de dima.

***

Kuçik weke sosyalîstek û dostekî tevgera kurdan xwe gihişt Şamê. Ji xwe ji berê de ew û Sapo du dostên hev bûn. Ê Sapo perwerde kiribû Kuçik bi xwe bû. Loma bi hatina wî ya Şamê kêfa Sapo gelekî hatibû û dizanî bû ku ew vala nehatiye. Sapo dizanî bû an texmîn dikir ku biryareke nû ya ji bona tunebûna kurdan hatiye dayîn û Kûçik jî ji wî re aniya da ku ew jî pêk bîne. Ji ber vê bû ku ew gelekî kêfxweş û şad bû ku wî yê plana xwe ya tunekirina kurdan vê carê bibira serî.

Sapo û Kuçik li gel hev weke du brayên hev bin û zûde hevdu nedîtibin li odayê rûniştibûn. Piştî halê hev pirsênî Kuçik bi kêfxweşiyeke mezin destê xwe li milê Sapo da û got:

-Serokê min, me vê care erk û wazîfeyeke mezintir da te. Em bawerin ku tê vê carê weke daxwaza gelê xwe ji bin vî barî rabe. Ji xwe dewletê li gel dewletên cînar têkilî danîne ku hemî bi alîkariya te ve rabin. Hêvîdarim tê vê carê me fedîkar dernexe û di vî şerê nû ya ji bona tunekirina kurdan, bi serkev e.

Herku Kuçik diaxifî Sapo bi baldarî ew guhdarî dikir û carna dimizmizî. Ji ber ku ev biryara şer bi xweşa wî jî diçû ku ew ê vê care kurdan têk bibe. Wê ew û dewleta xwe bi serbikevin. Loma qet axaftina Kuçik nedibirî û tenê guhdarî dikir. Weha dixuya ku kêfa Sapo ji vê biryara nû re gelekî hatibû. Yanî ev biryar tam jî li gor dilê wî bû. Piştî ku Kuçik axaftin û şîretên xwe qedand, li Sapo nerî û got:

-Ka tu çi dibêje serokê min?

Li hemberî vê pirsê Sapo nema dizanî bû ku wê çi bêje. Berê sekinî, hinekî li dora xwe nerî, çavên xwe yên fenok berra erdê da û got:

-Ev zêdeyê du salan e ku li benda biryareke weha bûm. Spas ji bona dewletê ku ev biryar dane. Di nava van du salan de min bi xwe jî têkiliyên xweş û germ bi dewleta Sûrî re danî ye. Bi îstîxbarata wan re têkiliyên min xweş e. Ji xwe ez çi bikim wan agahdar dikim. Loma ew jî her amade ne ku bi alîkariya min ve rabin. Daxwaza wan jî ew e ku bi saya vî şerê ez ê bi navê kurdistanê tu serêşiyê ji bona wan jî nehêlim. Ez û wan li ser daxwaza dewletê hev dibînin, didin û distînin.

Belê kêfa Kuçik ji vê axaftina Sapo re hatibû loma hinekî mizmizî û got:

-Binere Serokê min, em ango dewlet vê carê gelekî cidî ne ku vê serêşiya kurdan ji ser xwe rake û wan ji weke gelek xelkê din bikin tirkên baş. Biryara şer wê çawa destpê bike, di virde kar û erkên te dê çibe, di vê dosyê de nivîsandiye. Divê tu vê baş bixwîne dûre em ê dîsa li gel hev biaxifin û biryara ku em ê bidin ez ê bighêjînim dewletê.

-Temame, tu problem ji alî min de tune ye. Ji xwe ez jî heta niha li benda biryareke weha bûn. Ez ê vê dosya pîroz ku ji min re şandine baş bixwînim, tê bighêjim û ezber bikim ku divê em çawa dest bi şer bikin.

Bi vê gotina Sapo, Kuçik gelekî kêfxweş bû bû, loma wî dîsa dest bi axaftinê kir:

-Ha berî ku ji bîr bikim, dewletê him silav û him jî ev bêtêl ji tere şand in. Tê êdî gelek tiştên xwe bi rêya vê bighêjîne me. Ew şîfreyên ku tê bi kar bîne hemî di vê dosyayê de hene. Bêtêla te wê girêdayê îstîxbarata me be. Ango wê her dem ev bê guhdarî kirin. Tê jî bi rêya şîfreyên di dosyayê de hatine nivîsîn mesajên xwe bighêjîne dewletê.

Sapo bi mesela bêtêlê gelekî kêfxweş bû bû loma hema bi wê kêfxweşiyê got:

-Bi rastî jî ev gelekî baş bû û mala dewleta me ava bî ku tiştekî ji bîr nakin. Mesele hemî hate fêm kirin. Tu jî êdî li kêfa xwe û li îstîreheta xwe binêre. Ji xwe min ji berê de navê te û yê Dogu daye hevalên xwe ku hûn du sosyalîstin û dostên me kurdan in. Hûn carna werin seredana min û bikevin nava Gerîlayên min ku bê Buran û çend kesên wekî wî, çawa gerîla perwerde dikin. Ji xwe hemî perwerdekirinên me bi zimanê dewletê ye da ku bi vê yekê hemî zimanê xwe ji bîr bikin. Çi dema ziman ji bîr kirin êdî wê hêdî hêdî xwe jî ji bîr bikin û wê bibin tirk. Ji xwe perwerdekirina wan jî piranî li ser vê yekê ye.

Herduyan li hev kirin, Sapo dosya xwe girt derbasî odeya xwe bû ku wê baş bixwîne û têbigihêje. Li aliyekî xwarina wan li aliyê din jî çend kesên din hatin û bi Kuçik re mijûl bûn.

***

Sapo dosya ku Kuçik ji wî re anî bû girt û derbasî oda xwe bû, da ku wê bixwîne û fêr bibe bê dewletê li ser çi asasî qîmet dane wî. Di karê nû de wê çi jê bixwazin. Ji ber vê bû ku wî bi kêfxweşî dosya xwe vekir û dest bi xwendina wê kir ku li gor biryara dewletê dest bi karê xwe ê nû bike.

”Sapo

Te karekî baş ji bona gelê xwe kir. Lê em û tu bi temamî bi serneketin. Helbet biserneketinê de kêmanî ne ya te tenê bû. Me jî weke dewlet hesabê gelek tiştan nekiribû. Lê xem nake tu êdî li ber

çavê dewletê kesayetiyekî mezin û serokê kurdan e, ku tu bikaribe wan ji bîr û baweriyên wan î neteweyî dûr bixe.

Em ê êdî plana dudan ya ji bona tunekirina aqilmend û kesên neteweperestên kurdan kar bikin. Ji bona em bikaribin piraniya kurdan ji erdnigara (Cografiya) wan dûr bixin kar dikin, loma dewletê biryara şerê çekdarî bi serokatiya te daye.

Helbet ev biryareke gelekî girîng e. Loma çi dibe bila bibe pêwîst e em weke dewlet divê bi serbikevin. Di serketina vê de dê para te gelek be. Wê medya me bi temamî her behsa te û serokatiya te ya ku tu serokê kurdan e bike. Wê propagandeke weha bikin ku hemî kurd êdî bi destpêka vî şerî de te ji bona xwe weke rêberîkî nasbikin û tê jî weke wan ji zilm û zordariya dewletê xilas bike, bibîne. Ya girîng ew e ku vê carê rola xwe baştir bilîze. Çi kêmanî û lazimî hebe em ê temam bikin. Di vir de dê tu astengî dernekev e. Ji xwe dewletên din (Surî, Iraq û Iran) jî wê ji şer agahdar bin û ji bona serketina vî şerê dê ewên jî bi alîkariya te ve rabin.

Van rêzên ji te re têne nivîsandin dê weke manîfestoya te ya şer be. Ji xwe dema şer destpê bike wê hemî kurd bê ku bikaribin bifikirin dê piştgiriya vî şerî bikin ango bi saya vî şerê wê fêm nekin ku di eslê xwe de ev şer ji bona tunebûna wan bi xwe ye. Lê ewên vî weke azadiya xwe bibînin.

Divê tu pir bi baldarî tevbigere û wê tim Îstîxbarata Sûrî te biparêzin. Ji bona vê jî wê çend çekdarên wan weke kurdên sûrîne bibin endam û bêtir ewên te biparêzin. Ew tiştên pêwîst ku em nikarin bikin wê bi destê îstîxbarata sûrê bibe.

Di vî şerî de armanca sereke dê ew be ku em bi saya te û vî şerî, kurdan têk bibin bê ku ew vê fêm bikin. Em û tu em ê bi her awayî propaganda vî şerî bikin da ku weke tê kurdan azad (xilas) bike. Tê bi saya vî şerî, gundan xerab bike, erdên wan wêran bike. Helbet ne ku tê bike. Tu li hember me şer dike û em ê jî ji bona kuştina gerîla şerê te bikin. Yanî wê plan ev be. Şer wê ji deverê kurdbûn lê herî xurt e destpê bike. Da ku em bikaribin bi rehetî wir wêran bikin. Em ê weke sedema ku em şerê gerîla dikin, destnîşan bikin. Em ê weke şerê gerîla dikin, xwe rê bidin û bi vê jî em ê gundiyan jî bikujin û malên wan jî di ser wan de hilweşîne. Çi dema şer germ û fireh bû, wê bêtirîn kurd êdî baweriyê bi te û bi şerê te bikin ku tu ji

bona azadiya wan kar dike. Loma wê bêtir bi alîkariya te ve rabin. Em ê her tiştekî ku heta niha kurdan nedîtine bi saya te û bi kontrola me bidin wan da ku baweriya wan li hember te zêdetir bibe. Em ê di hemî medya xwe de tim behsa te û şerê ku tu li hember dewletê dike derxin pêş. Ev ê bibe sedem ku wê kurd bêtir ji te hez bikin û baweriyê bi gerîla bînin.

Niha me bêtêlek ji te re şand û ev bêtêl dê tim di bin çavderiya dewletê de be. Te çi demê xwest mesaja xwe bide an hinan bidin kuştinê. Dê şîfreya te weha bê: Filankes li felan derê ye an herin filan derê qîmeta wî bigirin. Êdî kar dibe karê me ku em wî ya bixin zîndanê ya jî bi destê zilamên xwe bidin kuştin. Dema ew hate kuştin tê jî daxuyaniyeke derxwe ku ew zilamê Îstîxbaratê bû loma hate kuştin. Yên ku em bigirin jî em ê bêjin gerîla bû. Ya rastî em ê li ser serê kurdan ji xwe re şanoya tunebûna wan bilîzin. Kesên bêne girtin em ê di zîndanên xwe de wan perwerde bikin ku êdî ew ji bona me ango ji bona dewletê kar bikin. Li gor şert û mercan bi zorê em ê vê bi wan bidin qebûlirinê ku piştî berdana wan ji zîndanê em ê îmkanan amade bikin ku wan bişînin ba te. Êdî tu dizane tê çi bike ji wan. Lê kesên nexwazin bi me re kar bikin em ê wan jî ji te re bişînin. Tê jî li ser wan zordariyekê bike da ku ew bibin zilamên te û me. Lê dîsa jî qebûl nekin, wan bişîne şerekî û di wî şerî de bila gerîlayê ku zilamê me ye wî\ê bi guleyekî bide kuştin. Tê jî bi daxuyaniyekê weke ew di şerde hatibe şehîdkirin belav bike. Wêneyê wî belav bike, afîşên wî derxin û li her derekê wî bike şehîd û xwedî lê derkev e.

Em ê îmkaneke baş ji bona medya amade bikin. Kesên dinivîsînin tu û em ê hewl bidin ku ew kesana jî di medya te de binivîsîne û tê eyareke baş bide wan ku ew jî weke te bikin. Nekin dawiya wan jî dê diyar be. Armanc ji vê xebatê wê ew be ku kesên dinivîsînin hemî girêdayî te bin û li ser xeta te bin.Tu û em ê hewl bidin ku kesên bi siyaseta kurdî ve mijûl in, dibê tu wan bikşîne nava xwe. Ji bona siyaseta wan jî li gor rê û rêbazên te bêne kirin. Ji xwe pêwîst nake ku em yek bi yek bijên ku tê çi bike. Divê tu karê xwe ji me baştir bike da ku dewlet bi serkev e. Her carekê em tiştên ku divê tu bike bi rêya Kûcik an Dogu ji bona te bişînin.

Dibe ku di vê nameya ewil de her tişt nehatibin nivîsandin. Em ê tim li gor rewşê divê tê çi bike te agahdar bike. Tu jî dikare bi rêya vê

bêtêlê, me agahdarî tiştan bike. Divê vê care tu û em bi serkevin da ku tê êdî bibe zilamekî mezin ê komara me. Divê tu bibe M. Kemalê dudan ku Tirkiyê ji hemî nakokî û alaziyan azad bike. Divê tu kar bike da ku ciwanên kurdan di ber komara me de xwe bidin kuştin. Weke ew di ber gelê xwe de hatine şehîdkirin rê bide û em ê jî weha di medyayên xwe de binivîsînin.

Em difikirin ku piştî germbûna şer û alîkariya kurdan ji bona te, Televizyonekê vekin ku kurd êdî bi temamî bi te bawer bin ku wê ev ê bibe cara ewil ku kurd wê bibin xwedî televizyonekê. Ew televizyon dê çawa kar bike divê tu wê jî ji bîr neke.

Karê te yê herî girîng ji wan jî dê ew be, li ku kurdekî baş ku ji gelê xwe hez dike hebe, hewl bide ku ew bikevin nava xwepêşandanên te yên li bajarê kurdan. Di wan xwepêşandana de em ê bi awayekî ku kes nizanibin çawa bû, bidin kuştin û piştî wê jî berê tu, dûre hemî endamên te bila xwedî li wî\ê derkevin û wî\ê jî bike şehîd. Yanî her kurdekî hate kuştin bike şehîd û xwedî lê derkeve û bêje ew bi destê dewletê hate kuştin. Bêje em ê tola wî\ê hilîne. Wê gavê kurd dê bêtir nêzîkî te bibin. Yanî him em ê kesên qenc û ji gelê xwe hez dikin, bi hevre bikujin û mirovên wan jî bikin endamên te da ku bawer bikin wê bi saya te û partiya te bikaribin tola wan hilîne. Ji xwe yên ketin nava te, tê çi bike diyar e.

Hê gelek tiştên din hene ku ji bona te bêjin. Lê hêdî hêdî û gav bi gav. Li gor rewş û demê dê çi bê kirinê em ê te agahdar bikin. Niha dest bi şerê xwe ku wê dawiya kurdan bîne bike. Ev karekî pîroz e û em weke dewlet ji te re serketinê dixwazin. Em û tu divê em weha bikin ku her kurdek bawerî bi wê yekê bîne ku ev şer li hember dewletê ye ku wê ji wan re azadiyê bîne. Lê di eslê xwe de wê ev şer dawiya wan bîne.

Serketin ji bona te û dewletê. Em bi te bawerin ku tê bi serkev e. Şerê ji bona tunekirina kurdan li te û li me pîroz bî.”

# -46-

Şêro li ber wê xezeba ku bi hatina 12 îlona sala 1980 neketibû. Loma jî wî hinekî karê xwe ê rêxistinî kêm kiribû û yên dikir jî gelekî bi dizî bûn. Wî texmîn dikir ku ew ji ber wê xezebê hatiye azadkirin. Lê nizanî bû ku Sapo ji dewletê re gotibû ku ”wî negirin, ji ber ku ew nêzîkî min û heyranê min e. Em ê rojekê wî ji bona tevgera xwe bi kar bîne”. Ji ber vê bû ku ew nedihat girtin.

Belê Şêro her çiqasî ji ber xezeba 12 îlonê hatibû azadkirin jî lê nizanîbû ku agirê Sapo ji niha de dest bi şewatandina wî kirî ye. Ew û gelekên weke wî tu caran bawer nedikirin ku Sapo zilamê dewletê ye.

Belê di vê navberê de Şêro dibistana xwe qedandibû û dîplamaya xwe ya doktoriyê jî girtibû, yanî ew êdî doktor bû. Bi vê jî kêfa xuşk, bra, dayik û bavê wî gelekî hatibû ku êdî bra û kurê wan doktor e. Hemî gundîyên wan jî bi vê nûçeya ku Şêro bûye doktor serbilind û kêfxweş bûn ku ji gundê wan kesek bûye doktor.

Şêroyê me êdî doktor e. Bi alîkariya nas û dostan li gundekî herêma bajarê Mêrdînê di nexweşxaneyeke bi çûk de dest bi karê xwe kir. Dest bi kar kir lê, ma gelo ev ê jê re bima. Wî ev yeka texmîn jî nedikir û li ser vê yekê ne difikirî jî. Piştî li cih û ware xwe bi cih bû, ev nûçe zû bi zû di nava herêma Mêrdînê, nas û dostan jî belav bû bû. Lê weke diyar bû ku ew her di bin kontrola dewletê de bû, lê hay û baya wî ji vê yekê tune bû.

Dema ku dest bi karê xwe kir, êdî Sapociyan jî hêdî hêdî dest bi ziyareta wî dikirin. Nûçe û agahdariyên nû didan wî da ku ew êdî bi alîkariya Sapociyan ve rabe û dest bi karê xwe bike. Ji bona şerê li hember dewletê ew jî bikaribe xortan bişîne nava gerîllayên partiyê. Di destpê de ev çûyin û hatina hin ji kadroyên partiyê, zora wî çû bû û hinekî aciz jî dibû. Lê dema wan tade û êşkenceyên leşkeran li gundiyan kiribûn û dikir dihat bîra wî, dixwest ku ew jî tiştna bike da ku bikaribe gelê xwe ji bin vê zor û zulmdariya dewletê azad bike.

Ji xwe destpêkirina şerê çekdarî ji bona wî jî bû bû weke rêya serketin û azadiya gelê wî.

Şêro êdî doktor bû, dest bi karê xwe kiribû. Gundî û devera wî lê kar dikir gelekî jê hez dikirin. Ji ber ku wî bi gundiyan re bi zimanê wan ango kurdî qise dikir da ku derdê wan baş bi wan bide fêmkirin. Nav û dengê Şêro kar û xebatên ku wî ji gundiyan û xelkê xwe re dikir, belav dibû. Hezkirin û pê bawerîkirina wî zêdetir dibû, Helbet ev jî ne li gor pîvan, rê û rêbaza Sapo bû. Ji ber wê bû ku ew ketibû deftera Sapo da ku rojên wî kin, jiyana wî dê ne zêde dirêj be. Her kesên bi hezkirina xwe, bi xebat û çalakên xwe, bibana hezkirên gelê xwe, divê ew bi awayekî ya ji holê rabana ya jî biçûna nava gerîla. Ji xwe kî biketana nava gerîla û weke wan nekirina ew jî dihatin kuştin. Loma kar û xebatên Şêro bû bûn weke kelemekî li ber çavên Sapo û dewletê.

# -47-

Li gel hemî hazirî û amadekariyên ku bi sedan zilamên istîxbaratên dagirkeran xistibûn nava partiyê û biryara şerê çekdarî dan ku êdî li hember zilm û zordariya dewletê şer bikin (!). Û ew şerê ku wê kurdan tune û koçber bike, gundên wan bi ser serê wan de xerab bike û rojê wê bi dehan ciwanên kurdan bikujin destpê kir. Dengê şer, xwe bi êrîşkirina çend qerekolên li ser sînor destpê kir. Gulebaran kirin û bi daxuyaniyên xwe ragihandin ku şerê xilaskirina kurdan destpê kir. Ma camêran jî bona çi Dogu jî kiribûn nav tevgerê û weke dostê kurdan bû, rê didan. Êdî ji Sapociyan bêtir di medya Dogu de behsa şerê kurdan ya li hember dewletê destpêkiriye, dikir. Wan nûçeyên wî bi alîkariya Îstixbarata xwe di hemî medyayên tirkan de dihatin weşandin.

Ew şer di eslê xwe de ji bona tunebûna kurdan û wêraniya welatê wan hatibû destpêkirin. Ev ji bona kurdan bû bû heviyeke nû, bû bû rêya azadî û serxwebûna wan. Ew şevreşa kurd têde bûn ku çav çavan nedidît, bi destpêka şoreşa Sapociyan qaşo rohnî dibû. Kurd çawa bi guleya ewil ya Barzaniyan ku bi şoreşa Îlano zîndî kirin û nehişt wenda bibin. Qaşo vê şoreşa di eslê xwe de ji bona tunebûna kurdan destpê kiribû. Kurd li bakurê kurdistanê zîndî kir û hemiyan ji ber wê zilma dagirkeran bi kêfxweşî û serbilindî piştgiriya wê kirin. Bûk, jin û qîzan bi bazinên xwe, bi can û malên xwe piştgirî dane vê şoreşê(!). Bav û lawan bi hemî hêzên xwe yên madî û manewî piştgirî kirin. Wan ciwanên ji ber wê zilm û girtinê direviyan ango xwe vedişaratin, dîtin ku agirê şoreşî destpê kiriye bi qeflan direviyan çiyan û diketin nava Sapociyan da ku welatê xwe azad bikin.

Ma wê ji ber êş û azarên ku dagirkeran didan wan dê çawa li ser vê şoreşê bifikiriyana. Wan tenê bawerî anîbûn ku ev şer wê ji wan re azadiyê bîne. Loma qet nefikirîn ku wê ev şoreş(!) afat û malwêraniyê ji bona wan bîne. Ya jî dijmin ji ber wê zilma li wan

dikirin nedihişt an nikarîbûn bifikiriyana ku şoreşê bi çi rê û îmkanan destpêkiriye. Ev ê ji wan û welatê wan re çi bîne û bibe. Tenê ketibûn wî derdî ku ev şoreş wê bikaribe vê zilma li ser wan rake.

Çi medya Dogu û çi jî medya dewletê û heta ya hin kurdan propaganda dikirin û digotin: ”Vaye şerê azadiya kurdan destpêkiriye”. Lê nikarîbûn bifikiriyana ku ev şoreş û destpêka wê çawa bû û dê dawiya wê li ku biqede. Bi alîkariya dewletê û ya dagirkerên din şer geş dibû û baweriya xelkê dihat ku rojên wan î ku ji bin zilma dewletê xilas bibin nêzîk dibe.

Êdî dor dihat Sapo ku ew benê şoreşê ji destê xwe bernede û wê li gor daxwaza dagirkeran pêk bîne. Bi saya zilamên Îstixbaratê weke endamên PTK bûn, bêtirîn çalakî û tanzîmkirina mifrezeyên gerîla di destê wan de bû. Wan jî emir û çalakiyên xwe li gor daxwazên Buran pêk dianîn.

# -48-

Ji bona destpêka şerê tunekirina kurdan, Sapo dersa xwe baş girtibû û hemî hazirî li gor wê dosya ku Kuçik ji wî re anî bû amade bû. Roja destpêka şer jî diyar kiribûn. Lê ji bona ku benê şer ji destê Sapo dernekeve û tim jî çalakiyên wan agahdar bî, dewletê bi hezaran kincên gerîla û hin bêtêl ji wan re şandibû Qandilê.

Her wan kesên zilamên dewletê ku ji hemî gerîlayan zîrektir bûn, wan perwerdeya gerîla dane ser xwe. Bi vê jî wan her berpirsê Mifrezeyeke gerîla fêrî bi karanîna wan bê têlên ku dewletê ji wan re şandibû û ew jî girêdayî îstîxbarata wan bûn. dikir. Kî/ê bi wan bêtêlan qise bikirana yek ser ji teref Îstîxbarata dewletê ve dihatin guhdarî kirin. Ev jî ji bona tim rişma şer di destê dewletê de ba, pêk anîbûn. Ji xwe ji roja dewletê Sapo ji welêt derxistibû û li Sûrê bi cih kiribûn, Bêtêlek ya ku di bin kontrola dewletê de, dabûnê. Ew jî ji bona bikaribin agahdariyan bighêjîne wan û ji bona ku ji hemî gotinên Sapo agahdarbin, bû.

Berî destpêka şerê ji bona tunebûna kurdan dewletê bi alîkariya dewleta Sûrî hemî amadekariya Sapo qedandibûn da ku çi bûyer û kiryar bibe divê Sapo bi xwe jê agahdar be. Ji ber vê bû ku hemî haziriyên teknîkî ya bêtêlan weke navend kirin mala ku Sapo lê dima.

Loma dewletê bi alîkariya dewleta Sûrî hemî berpirsên mifrezayên gerîla kirin xwedî bê têl û fêr kirin ku divê mirov wan çawa bi kar tîne. Kî li ku çi qise bikin haya Sapo jê çê dibû. Her weha hemî berpirsên herêman jî yek bi yek bêtêl dane wan ew jî fêr kirin ku ew û gerîlla dê çawa ji hev û çalakiyên hev agahdar bin. Di eslê xwe de ê  organzekirina wan dikir Buran Balkan bi xwe bû ku hemî bêtêl bi navandekê ve hatin girêdan. Navend jî mala Sapo bû ku ew bikaribe bi rehetî ji her tiştekî agahdar bibe. Ji xwe berpirsê mezin ê Qandilê jî Buran û çendên din yên weke wî bûn.

Kar, xebat û berpirsên eyaletan jî hatibûn destnîşankirin. Ji bilî çend îstîsnayan hemî berpirsên eyaletan û berpirsên mifrezeyan weke deweletê ji Sapo re nivîsî bû ku divê ew ji kesên nezan ku heyrana te bin da ku ji gotina te dernekivin. Ji ber ku dewletê jî dizanîbûn kesên xwenda û zana wê rojekê li hember şaşiyên têne kirinê derkevin. Ya jî wan kesên zana wê weke dihate xwestin emrê kuştina Kurdan nede. Zerarên mezin nedin wan. Malên wan talan û wan jî koçber neke. Lê kesên ku berê ji civatên hatibûn dûrxistin ango ji wan nedihate hezkirin ku bibin berpirs, wê xanî û malên hemî gundiyan di ser serê wan de hilweşînin. Wê tola xwe ya ku civatê ew di nava xwe de venedihewandin hilînin. Ji ber vê bû ku piraniya kesên weha kirin berpirsên mifrezeyên gerîla. Êdî sekin dê li wan tunebana. Ew kesên di civata kurdan de nedihatin qebûlkirin tu qîmet û rûmeta wan jî tune bûn. Êdî bû bûn berpirs û li gor vê berpirsiyariya xwe jî wan çi bikirana tu kesan nedikarî bûn ji wan re dengê xwe derxin an rexne bikin. Ji ber piraniya berpirsiyariyên wan ji teref Sapo de hatibû destnîşankirin.

” Di zîndana Amedê ya bi navê 5 nolî de jî hemî Gardiyanên wir, ji bona li gor dilê yuzbaşî Esat Oktay lêdan û êşkenceyan li girtiyan bikin ew jî azad bûn. Ji ber vê bû ku wan bi dehan kesên girtî di wê zîndanê de kuştin, bê ku hesabekî bidin. Bi saya lêdana wan î gelekî dijwar bi sedan kes şêt ango dîn bû bûn. Gardiyanên zîndana Amedê jî hemî ji kesên nezan ku dibistan nexwendibûn pêk dihat. Derdê wan ew bû ku wan çiqasî li girtiyan bidana wanê ewqasî diyarî û bêhnvedana çend rojan ji Yuzbaşî Esad bigirtina. Ji ber vê bû ku wan jî bi hemî hêz û qawetên xwe li girtiyên wê zîndanê didan. Dema wan Gardiyanên nexwenda li girtiyekî ku parêzger, mamoste an xwedî erkekî mezin, didan, ji hevre digotin: Aha binêrin ev qaşo parêzger e, aha ev mamosteye ûhwd”

Tiştekî gelekî seyr û girîng bû ku berpirsên mifrezeyan û gardiyanên zîndana Amedê hema hema weke hev bûn. Nezan û kîndar bûn. Serokên mifrezeyên gerîlla ji ber ku di demên xwe de nikarîbûn bikevin nava civata kurdan da ku weke mirov cih bigirin. Loma jî niha tola xwe ji civata kurdan û kesên zana digirtin. Li gor xwe çi bûyer pêk bianîna, çi bikirana her azad bûn. Kî bikuştana, kîjan gund wêran bikirana azad bûn. Ji ber vê bû ku wan jî her tişt li gor dilê xwe û Sapo pêk dianîn. Wan tola xwe ji civatê hiltanîn û

armanca Sapo ya wêrankirina gundan û kuştina kesên zana pêk dianîn.

Dema serokên mifrezeyên gerîla yên nexwenda nezan û cahîl, diketin nava gund, êşkence li mezinê wî gundî, li mele û mamosteyên wî gundî dikirin. Henek û tinazên xwe bi wan dikirin û gelek caran digotin: ”Aha binerên qaşo ev axayê gund e, mezinê gund û ev jî mamosteyê gunde ”. Him tinazin xwe weke çawa Gardiyanên wê zîndanê jî tinazin xwe bi serok, berpirs û mezinên tevgerên kurd dikirin. Kesên xwedî erkekî mezin, çawa li ber çavên girtiyan pîs û xerab dikirin. Te digot qey serokên mifrezeyên gerîla û Gardiyanên wê zîndanê yek in. Ji ber ku herdu aliyan jî rêber û welatparêzên kurd bê şexsiyet û rusva dikirin.

Bi qasî dihat zanîn rastî ew bû ku Gardiyanên wê zîndanê û berpirsên piraniya mifrezeyên gerîla heman kar weke hev dikirin. Yek di hundirê wê zîndanê de çi bixwest ew dikir û bikira azad bû. Yên din jî tiştên dikirin hemî li gor daxwaza dewletê bû. Ji ber ku bi salan sal dewletê dixwestin ku gundên li ser sînor vala bikin lê nikarî bû. Gelek caran dixwestin mezin an zaneyekî kurdan bikujin ji bona dewletê serêşî bû. Ji ber evana bi destên gerîla û li gor dilê dagirkeran pêk dihat. Loma fikir û raman ew bû ku piraniya berpirsên mifrezeyên gerîla ne xwenda bin.

***

Berî ku şerê ji bona tunekirina kurdan destpê bike, êdî dewletê ji Sapo û Tesîre re got ku divê hûn hevdu berdin. Ji ber bi hatina Sapo ya Sûriyê êdî hemî tiştên wî bi şev û roj dihate kontrol kirin. Êdî tirsa karbidestên dagirkerên tirk nema bû ku Sapo rêya xwe şaş bike. Ji xwe ji bona rêya xwe jî şaş neke ew li Şamê bi her awayî dihate çavdêrkirin. Ji ber vê bû ku êdî karê Tesîrê jî qediya bû û bi awayekî weke ji hev nexweş bin, hev du berdan. Weha xuya bû ku dewletê dê karekî din bida Tesîreyê.

# -49-

Êdî şerê ji bona tunekirina kurdan bi heman awayî destpêkiribû. Roj bi roj geş û berfireh dibû. Bi geşbûna vî şerî, kurdên bi salan di bin êşkencê, tahde û zordariya dewletê de bûn ku gelek ji wan dihatin kuştin û girtin, bû bû hêvî. Piraniya kurdan weha fêm kiribûn ku ji bona neyên kuştin û girtin êdî piraniya wan azadiya xwe di vî şerî de didîtin. Ji ber ku destpêka şer bi êrîşa li ser çend qerekolên leşkeran de destpêkiri bû. Vê destpêka li ser qerekolan tam bawerî dabû gelê kurd û bawer dikirin ku şerê azadiya wan destpê kirî ye. Lê ma rebenên gundiyên nexwenda nezan dê çawa fêm bikirana û têbihiştina ku ev şer dê dawiya wan bianiya. Ma wanê çawa fêm bikirana ku dewletê PTK damezrandiye û serokê wê jî yekî qaşo kurdek bû lê zilamê wan î bi wate bû. Ji ber plan û projeyên dewletê mezin bû. Wan bi xwe dizanîbûn ku çi dikin û wê bikin ku dawiya kurdan bi destê Sapociyan û serokê wê Sapo bîne. Ma kurdan wê çawa fêm bikirana ku di sala 2023an de peymana Lozanê ya sed salî diqede û li gor vî sed salî divê dagirkeran hemî kurdên li bakurê kurdistanê dijîn kiribana tirk. Lê bi serneketibûn. Loma hemî hazirî û tevgera ku wan avakiribûn û serokê wê kiribûn Sapo, dixwestin berî ku peymana Lozanê biqede kurdan tune bike û herkesên li tirkiyê dijîn bikin tirk. Ji ber ku wan jî baş dizanîbûn, heger ew di vê de bi sernekevin wê di peymana Lozana dudan de çi bihata serê wan, texmîn dikirin. Ji ber ku ew dewlet bûn û hemî îmkanên xwe yên dewletbûnê bi kar dianîn da ku dawî li kurdan bîne. Lê bi ser neketibûn û divê berî lozaneke din an peymaneke din ya navneteweyî pêk bê, dewlet li ser destê Sapo bi serbiketiba.

Ji bona vê serketinê jî li gor aqilmendên xwe, zana û rêvebirên xwe ku li hev dicivîyan ku wê çawa kurdan jî weke wan kêm neteweyên din, di nava xwe de bihelîne. Wan jî bike tirk. Hemî plana wan, damezrandina PTK û tevgerên wan î ji bona tunekirina kurdan, li ser vî asasî bû. Belê dagirkerann li gel rêxistina xwe hemî hazirî û amadekarî dikin da ku di vê sed salî de serbikevin kar û xebat dikir.

Tevgerên kurdan jî hay û bala wan jî vê yekê tunebûn. Bi saya fikrên çewt ku li bejna kurdan û kurdistanê ne dihatin, her roj bi hev diketin. Bi saya wan fikir û ramanên sosyalîzmê, kurdan xwe ji bîr kiribûn, xwe û mezinên xwe êdî nas nedikirin. Lê li cîhanê hemî mezin û rêvebirên kesên sosyalîst nas dikirin. Her roj ji dêlve zanyariyên xwe li ser asasê kurdbûna xwe bikin, wan ew ji bîr kiribûn û li ser fikir û ramanên sosyalîstiyê bi hev diketin, heta hevdu dikuştin jî.

Helbet ev fikir û ramanên ku li bejn û bala kurd û kurdistanê ne dihatin, ji teref Kemalîstên dewletê ku weke ew jî sosyalîst bin xwe didan nasîn û diketin nava ciwanên kurdan. Bi bandora vê hêdî hêdî ciwanên kurd bê ku bizanibin dibûn Kemalîst û bi fikir û ramanên Kemalîzmê dihatin kemilandin. Kemalîzm jî li ser asasê qirkirina kurdan û tunekirina kêm neteweyên din hatibû damezrandin ku herkesên di nav sînorên tirkiyê de dijiyan, divê bibana tirk. Loma hemî kar û xebatên desthilata tirkan ew bû ku tevgerên kurdan bi netewebûna xwe nehesin. Mezinên xwe nasnekin û bi hizr û ramanên îdelojiya sosyalîzmê bixemilên da ku li xwe û dîroka xwe hay nebin.

Ji ber vê bû ku dema dewletê PTK damezrandin û qaşo wê ev partî azadiya kurdan bianiya ku serokê wê kirin Sapo û di hemî medya xwe û ya kurdan de dixwestin bidin diyarkirin ku dîroka serîhildana kurdan ji Sapo de destpê kirî ye. Heger hin caran behsa hin serîhildan û berxwedanên kurdan bihatana kirin jî ew weke tevgerên paşverû rê didan. Ciwanên hay û baya wan ji dîroka wan tunebûn. Wan jî weha bawer dikirin ku bi rastî dîrok û hebûna kurdan ji Sapo de destpêkirî ye, dizanîbûn. Demekê ev propaganda bi saya çepên tirk ku hemî Kemalîst bûn, baş hate belavkirin ku dîroka kurdan ji Sapo de destpê kirî ye. Di gelek qonaxan de bi ser jî ketin.

PTK û Sapo bi saya şerê li gor belavoka ewil ku digot: ”Divê berê hemî kes û partiyên li dij şoreşê ne ji holê bêne rakirin”. Loma wî ji kuştina kurdan, ji tevger û kesayetiyên kurd yên zana, jêhatî û bîrewir destpê kir. Gelek kesayetiyên hêja şêx û axayên welatparêz kuştin. Tevgerên hebûn, piraniya wan bê deng kirin û tenê li hember wan û dewletê PGK li gel rêxistina wan ya bi navê RNK mabû. Lê çi kirin zora wan nebiribûn. Loma darbeya 12 îlona sala 1980 pêk anîn da ku di plana xwe ya dudan de him PGK û him jî çi kes û sexsiyetên welatparêz ku hê di nava gelê xwe de mabûn, tune bikin.

Loma Sapocî jî di nava şerê ku bi çek, zilam û qaweta dagirkeran hatibû destpê kirin, wan ji holê rake da ku tenê li bakurê kurdistanê Sapo û Sapocî bimînin. Sapo jî bi wê soza dagirkeran bawer bû ku ew ê li ser navê kurdan di Lozana dudan de weke serokê kurdan beşdarî Lozana dudan an civîneke weke wê haziriya xwe dikir.

Ji ber ku dewlet di plana xwe ya ewil de ku ji salên damezrandina komara xwe û heta 1980 ku dixwest tu tevgerên welatparêz yên kurdan nehêlin, bi serneketibûn. Ji ber vê bû ku wan Sapo li Sûrî bi cih kirin û hêdî hêdî xwestin şerekî nû bi serpereştiya wî bide destpê kirin.

Armanc û hedefa karbidestên dewletê ew bû, bi destê Sapo hemî hêjayî yên kurdan tune bikin, orf û adetên wan nehêlin, zana û bîrewirên wan pûç bikin. Partî û tevgerên heyî tune bikin. Armanc û hedefa şerê çekdarî ku bi serokatiya Sapo dane destpêkirinê ev bû. Di nav qadroyên çekdar de zilamên xwe yên herî zîrek û di nava rêvebiriya PTK da jî qadroyên xwe yên zana bi cih kiribûn. Bi gotineke din Sapo kiribûn weke M. Kemalê dudan û PTK jî kiribûn weke CHP. Daxwaza destpêka şerê wan jî bi Sloganên (sirûştên) mezin derxistin da ku xelk baweriyê bi wan bîne û weha jî bû.

Destpêka şer ji bona xelkê bû hêvî, bû azadî û bû bû serxwebûna kurdistanê. Yanî xelkê weha bawerî dikirin. Ji ber ku PTK dest bi şer kir û bi slogana em ê ”herçar perçên kurdistanê bi hevre xilas bikin”. Lê çi heyv û mixabinî bû ku tu kesan wê demê ”em ê her çar perçên Kurdistanê xilas bikin” fêm nekirbûn ku em ê ne ku azad bikin, Xilas bikin. Lê kurdan ew xilaskirin weke azadî dîtin û bê ku bifikirin hemî hêz û qawetên xwe bi alîkarî û piştgiriya Sapo û partiya wî kirin.

Kurdên bi salan di bin êşkence û lêdana leşkerên dewletê de dinaliyan, diketin zîndanan, dihatin kuştin hema bêjin tev bû bûn Sapocî. Her kesan li gor qawet û hêza xwe alîkariya Sapociyan çi di warî aborî û çi di ware bi xwe tevlêbûna partiya Sapo ew bi hêztir û xurt dikirin.

# -50-

Êdî her tiştek li gor dilê Sapo û dewletê pêk hatibû, şerê çekdarî ya ji bona tunekirina kurdan destpêkiribû. Dewletê û Sapo ev şer, kirin şerê azadiya kurdan(!). Sapo kirin mezinekî kurdan, serok û rêberê wan û li kurdan weha kirin û dane bawerîkirin ku bê Sapo dê tu caran Kurdistan xilas nebe. Piştî ku hemî hazirî û amadekarî li gor dilê wan pêk hatibû, kêf kêfa Sapo û dewetê bû. Ji xwe destpkirina şerê ji bona tunebûna kurdan, ji kurdan re bû bû hêvî û piraniya kurdan azadiya xwe di vî şerî de didîtin. Ji xwe dema şer destpê kir, dewletê jî di her warî de alîkariya Sapo û Sapociyan dikir da ku şer geştir bibe. Ji ber ku her şer geş dibû, di nava wê geşbûnê de wan jî li gor plan û projeyên xwe Sapo û Sapocî derdixistin firehiyê. Ji bona kurd baweriyê bi wan bîne û her weha jî bû.

Vî şerî kir ku her ciwanekî kurd ku nakokiyên wan bi malbata wan re hebûn. Yên feqîr bûn, bê kar û pere bûn. Yên ditirsiyan ku bêne girtin, yên di civatê de tu qedr û qîmeta wan tunebûn, berê xwe berbi şer vekirin û diketin nava Sapociyan. Kesên digihiştin Qandilê, Beka yê ji xwe êdî vegera wan tune bûn. Ya dihatin kuştin. Ya wan hinên li gor tevgera Sapo li gor emrê Buran didan kuştin. Ya jî divê herkesên din bi nameyekê ku xwe pîs û riswa dikirin û Sapo mezin dikirin didan wî. Kesên weha jî heta li jiyanê bana wê di bin emrê Sapo de karê kuştina kurdan bikirana. Kesên bixwestana ji partiyê veqetin. Buran ew dişandin şer di nava şer de ku kesên sedî sed zilamê dewletê bûn, lê weke şervanekî dihatin nasîn, bi destê wî wan didan kuştin û dikirin şehîd. Her ku şer geş dibû kuştina kurdan jî zêde dibû. Dewletê projeya xwe ya ku kurdan bi temamî tune bike hê ne biribû serî. Loma bi destpêkirina vî şerî wê biba egera kuştina kurdên berbi çav û dewlemendên kurd.

Ji xwe plan û projeya dewletê û Sapo ew bû ku bi geşbûna şer, çi kesên hene dê nikaribin zêde dengê xwe derxin. Heger derxistana jî dê çi bihata serê wan diyar bû. Ji ber ku Sapo bi saya vî şerî xwest ku armanc û hedefa ya ji bilî PTK tu teverek din ya kurdan bi hêz û

bi qawet nemîne. Heger hebin jî divê tim di bin kontrola dewletê û Sapo de bana ku kesên xeter ji holê rakin. Êdî dem dema şerê germ û dewletê li ser navê PTK û serokê wê Sapo dabû destpêkirinê, bû. Hingî ev şer bi saya dewleta ku çavên xwe ji bûyer û kiryarên dihatine kirin, digirtin da ku şer geş bibe. Geşbûna şerê ne di berjewendiya kurdan de bû, çavên xelkê jî girtibû, guhên wan xetimandibû, zimanê wan jê kiribûn, dîtin û ramanên wan jî guherandibû. Ji bona tenê PTK li holê bimaya, vana hemî kiribûn. Li xelkê weha kiribûn ku hemî rabûn û rûniştinên wan Sapo bû. Hemî pesn û qîmetdayîn tenê ji bona Sapo bû. Mezinbûna Sapo jî bi alîkariya medya Dogu û dewletê dihate kirin. Ev şer li gel propagandayên dewletê û medya Dogu yên ne rast û li ser asasê derewan mezinbûna Sapo dihate kirin ku ew ê hemî kurdan xilas bike. Hingî Sapo mezin dikirin ku kesekî weke wî li rûyê vê dinyê ji bona kurdan tune ye. Hingê ew mezin kiribû ku li ber çavên kurdan tenha ew û ew hebû. Ji ber vê jî hin kurdan azadî û serxwebûna xwe di hebûna wî de didît in. Loma digot in: ”Bê Sapo jiyan nabe”.

Êdî dewlet, Sapo û PTK bi serketibûn. Bi saya dewletê, Sapociyan serketineke weha bi destxistibûn ku ji wan pêve êdî tu deng û behsên din ji partî û kesan dernediket. Ev jî dihat wê watayê ku êdî Sapo bû bû mezinekî kurdan û partiya jê re damezrandinbûn jî bû bû partiya xelasiya kurdan. Kurdan jî di her hal û warî de alîkarî û piştgiriya wan dikirin. Qedera xwe didan destê Sapo û partiya wî ku ew jî wan tune bike. Ji bona tu partî û tevgerên kurdan nemîne çi lazim bû kirin. Lê ne dixwestin li vir jî bisekinin. Li gor wê dosya ku Kuçik ji Sapo re anî bû Şamê û wî dersa xwe baş jê girtibû. Dive êdî li gel vê hêzbûna xwe û bi saya dewletê û ji ber çavgirtin an çavgirêdana kurdan wî an wan çi bikirana deng ji kurdan dernediket. Dev ji deng berdin, li kurdan weha hatibû ku nema dizanîbûn, ev şer ji ber çi, çilo û çima destpêkiri ye.

Bi gotineke din êdî wî şerî li kurdan weha kiribû ku kesî nema dizanîbûn çi dibe. Bi kuştina leşkerekî kêfxweş dibûn û bi kuştina deh gerîlan xemgîn nedibûn. Her wan digot in: Şer e û di şer de her tişt dikare bibe. Ev jî bi zanetî xistibûn nava kurdan da ku kurd nikaribin rastiyê bibînin. Nedîtina rastiyê jî felek û afatên nedîti dianî û wê bianiya serê wan. Ji ber ku kurd nezan bûn û li gor vê nezaniya xwe jî wan texmîn dikir ku ev şerê hatiye destpêkirin dê ji wan re

azadiyê bîne û welatê wan ji bin nîrî dagirkeran azad bike. Lê ma wan ê ji ku bizanibana ev şer ji bona tunebûna wan hatiye destpêkirin.

Dewlet û PTK li gel kadroyên xwe di nava xelkê de bûn. Pirî caran vekirî û bi eşkereyî jî propaganda dikirin. Lê ne dihat girtin. Heger kesekî welatparêz rojekê gotineke ne li gor dilê Sapo û dewletê bigotina dihat girtin û êşkenciyên nedîtî li wan dikirin. Gelek kes bi saya wan êşkenceyan û bi tirsa zîndanê xwe teslîmê dewletê dikirin û li gor daxwaza dewletê divê karê xwe bikirana. Ji bona kesên din nizanibin ku ew bûye cahş ango sîxur û xwe firotiye. Dema ji zîndan derdiketin piştî demekê li gor daxwaza dewletê êdî wana direviyan Bekayê û diketin nava hêza gerîla. Berî ku dest bi karê xwe bike, li xwe rexnekirineke dirêj dinivîsandin û didan Sapo. Heger ew li xwe rexnekirin ne bi dilê Sapo ba, ji nûde bi wan didan nivîsandin. Çi tiştên xerab hebana dixistin hustiyên xwe. Hemî xerabî û nebasî wan û başî jî Sapo dikir. Yanî li xwe rexnekirineke weha dinivîsîn û didan Sapo da ku sibê ji wan biqetiyana jî bi eşkerekirina wan li xwerexneyan dê nikarîbûn di nava kurdan de bijiyana. Di rewşeke weha de wan dizanîbûn ku wê Sapo li xwe rexne girtina wan belav bike û ev jî dibû mirina wan…

Di nav gerîla û di perwerdeya ku li gor gotina Sapo dida kesan ku tam li gor xwe şikil jî dida wan. Heger hin ew yeka qebûlnekirina jî gelek tiştên xerab dianî serê wî/ê û ew tiştên ecib weke film digirtin û didan Sapo. Piştî bûyerên qirêj jî êdî wan kesana bi temamî xwe teslîmê Sapo dikirin û li gor daxwazên wî tevdigeriyan. Heger yekî xwe şaş bikira û tiştekî li gor Sapo ne li rê bikirana, ew dişandin şer û di şer de jî li gor destûra Buran û wan zilamên dewletê ku çekdarên zîrek bûn, dihatin kuştin û dûre jî dikirin şehîd. Lê hinên ku teslîm jî dibûn dişandin ewropa ku li wir jî bi saya wan karê PTK kurdên li ewropa bi rêk û pêk û li gor dilê Sapo bidin meşandin, ango hin kesên zîrek û jêhatî bikin zilamên wî. Ji kesên weha re dihat xwestin ku ew tim bêjin: Em ne endamên tu partiyan û PTK in jî. Lê di kar û xebatên xwe yên li ewropa de jî wan her weke Sapociyan kar dikin û li gor wê jî raporên xwe pêşkêş dikirin ku ew raporana digihiştin destê Sapo û dewletê. Heger ew kesên bû bûn zilamê dewletê û li gor dilê dewletê û Sapo kar û erkê xwe baş neanîna cih

ew mecbûr dikirin ku herin Beka yê li wir jî dişandin şer û li şer jî didan kuştin û dikirin şehîd.

Dewletê bi saya partiya ku wan damezrandibûn û zilamê xwe ango Sapo destûr û bernameyeke ku bikaribin bi rehetî û bê serêşî dawîya zana û mêrxasên kurdan bîne, çêkiribûn. Êdî çi bixwestana weha dikirin. Êdî dest bi kuştina mezin, zana û kesên kêrhatî ku welatparêz bûn kiribûn. Ji ber ku qaşo Sapociyan şerê xilasiya kurdan dikirin. Tu kesan nema dikarîbûn bifikiriyana û li ser van kuştinên têne kirin fikir û ramanên xwe diyar bikirana. Ji ber ku bi saya wî şerî êdî her tişt li gor dilê dewletê û Sapo dihate meşandin. Kuştina kesên welatparêz bi destê herduyan, ango dewlet û Sapo dihatin kirin, direvandin û didan kuştin. Yanî çawa dixwestin weha dikirin.

Sal êdî gihiştibû 1990î agirekî gûr û mezin li kurdistanê pê xistibûn ku di nava wî agirî de bi rehetî û bê asteng kurdan biqedînin. Ji doza wan dûr bixin, mêran bixesînin jinan bê dengê bikin. Tenê dengek û serokek êdî hebû ew jî dengê dewletê û ew kesê ku kiribû serokê kurdan Sapo bû. Êdî sekin li dewletê û li Sapo nemabû. Kuştin û wêranî. Revandin, wendakirina kesên welatparêz. Kurdên dewlemend û yên wê bikarîbana tevgereke damezrîna an tevgerên têde xurt bikin yek bi yek li ser navê qesas ne diyar dihatin kuştin. Di eslê xwe de qesas diyar bû. Dewletê li gel Sapo hemî kar organize kiribû ku ew tim bikaribe lîsta kesên xeter ku wê rojekê serêşê ji wan re derxe bidin kuştin. Ya jî bidin girtin û di girtîgehê de wan bikin zilamê dewletê ku di vir de jî bi serketibûn.

Kî çawa û ji ber çi sedemê dihatin kuştin kesan nema dizanîbûn. Tenê weha li wan hatibû kirinê ku bijî Sapo û bilindkirina du tilîkan dizan bûn. Ev jî dihate wê maneyê ku êdî xelk hatibûn teslîm girtin. Ji ber xelk nezan bûn. Di nava vê nezaniyê de wan ew şerê bi saya Sapo hatibû destpêkirin ji bona xwe azadî û serbestî didîtin. Lê nizanîbûn û nikarîbûn fêm bikin ku ew şer di asasê xwe de ji bona tunebûna wan bû.

# -51-

Şêro êdî doktorekî jîr û jêhatî bû, bi tevger û edeba xwe bala herkesan kişandibû ser xwe. Nav û dengê wî, kar û xizmetên ku ji bona xelkê dikir, li bakurê Kurdistan û bi taybetî li herêma Mêrdînê deng veda bû. Nav û dengê Şêro, başî û qenciyên ku wî bi xelkê dikir roj bi roj zêde dibû. Bi vê zêdebûnê jî hezkirina wî di nava gel de belav dibû. Êdî li bakurê Kurdistanê piraniya kesên ew nas nekiribana gelek kêm bûn. Loma ew bû bû kelemê ber çavên Sapo û dewletê

Ev belavkirin û behskirina navê Şero heta Şamê jî çû bû. Sapo ji ber vê yekî gelekî aciz bû bû. Loma difikirî ku wî ji hole rake, lê çawa? Her çiqasî bi rêya bêtêla ku ew bikaribe dewletê agahdar bike. Kê bigire an bikuje, kê bîşîna Qendîlê. Vê care jî bi bihîstina belavkirina navê Şêro û hezkirina xelkê ji wî, bi xweşa Sapo ve neçû bû. Ji ber vê bû ku wî dewlet agahdar kiribû ku hay û baya wan ji Şêro hebe.

Dema Sapo, dewlet agahdar kiribû ku divê haya wan ji Şêro hebe. Loma wan jî êdî hinekî zêdetir endam û berpirsên wê heremê dişandin mala wî. Ji bona balê bikşîne ser wî da ku bigirin ya jî jê re, rê ya çûna Qendilî bi saya hin berpirsin Sapocî ku bi eslê xwe zilamên dewletê bûn, veke. Her çiqasî Şêro ji çûyin û hatina hevalan û hin berpirsan aciz jî bû, lê dengê xwe dernedixist an nikarîbû derxista. Vê rewşa wî bala gelekan dikşand ku zêde û zêde heval diharin mala wî. Gelek caran bavê wî jê re digot:

-Kurê bavê xwe, heval zêde têne ba te. Ev yeka bala xelkê jî kişandiye. Heta çend dostan ji min re gotin ku heger bi vî awayî here dê Şêro bê girtin. Heger tu bikaribe hevalên xwe agahdar bike da ku ewqasî zêde neyên  ba te. Tu doktorekî baş e. Herêma Mêrdînê ji te hez dikin. Tu bi doktoriya xwe gelekî fêdê dide wan. Tu bi vî awayî xizmeteke baş jî partiya xwe re jî dike.

-Bavo xem nake, her kesekên tên weke nexweşê min bin. Ez dibêjim em vê zêde mezin nekin. Ji xwe li gor agahdariyên tên, di demeke nêzîk de wê bi saya partiyê û bi zanebûna serok Sapo em

ê bi tevayê ji bin nîrê dagirkeran azad bibin. Hindik maye bavo sebir bike.

-Kurê min ez sebir dikim û ez ê bikim. Lê bi qasî tecrubeyên xwe ez dibêjim xwe zû bi zû nexapîne û welatê bi sed salan hatiye dagirkirin weha bi rehetî azad nabe. Bi vê rêyê hûnê telef bibin. Wê welat ji binî de xerab bibe. Dewlet mezin e, çek û cebilxanên wan gelek e. Bi keleşînkofekê hûnê nikaribin zora dewletê bibin.Ya din gelek tevgerên hevalên te nakevin serê min. Tadê li xelkê dikin, peran bi zorê ji xelkê digirin, zarokan direvînin ev nabe, kurê bavê xwe.

-Bavo heyran niha em di şoreşekê de ne. Ev şoreş hêviya hemî gelê kurd e. Eva nêzîkî sed salan e ku kurd bindest in. Kolene û rêcber in. Niha şansek bi destê kurdan, bi saya serê serok Sapo ketiye divê em her yek ji aliyê xwe de ji vê şoreşê re bibin alîkar da ku em jî êdî li ser erda xwe azad bijîn.

-Baş e kurê min bila weke te be. Lê ev beşer, ev tevger ev dan û stendinên partiya we, wê taliya talî zerareke mezin bide kurdan ku heta niha wê zerareke weha ne hatibe serê wan. Divê hûn berî her tiştî dilê kurdan neêşînin, bila hezkirina we li hember wan zêde be. Hinekî rîhsipiyên xwe jî guhdarî bikin. Ji şoreşên xwe yên berê dersan derxin. Çima ew bi serneketine? fêr bibin. Ez bi qasî te nizanim lê li gor tecrubeyên xwe van dibêjim.

Di munaqeşeya Şêro û bavê wî de, her çiqasî bavê wî hin agahdarî û balkêşî dabûn kurê xwe jî fêde nekiribû. Ji ber ku ciwanên wê demê hemî bi ava Kemalîzma ku Sapo ew hêdî hêdî bi kurdan şêrîn dikir û kiribû, hatibû û dihate şuştinê. Ji xwe di felsefeya Sapo de guhdarîkirina mezinan û fêrbûna şoreşên berê hatibûn qedexe kirin. Li gor Sapo, ew hemî serîhildan û şoreşên berê paşverû bûn. Loma dîrok ji wî de destpêkiriye. Weha dabû zanîn ku ji bona xilaskirina kurdan dîrok û tekoşîneke nû lazim e ku ew jî ji wî de destpê kirî ye. Di hemî perwerdeyên Gerîla de tim ev yeka weke derseke girîng ji wan re dihate gotin.

Ji ber vê bû ku ne tenê munaqeşeya nava Şêro û bavê wî, bê fedebû. Li gor plana dewletê û perwerdekirina Sapo divê ciwanan weha kiribana ku ew êdî guh nedin sal mezinên xwe, bav û apên xwe. Ji ber ku tevde weke nezan û paşverû bûn, li qelemê hatibû xistin. Bi gotineke din dewletê û Sapo li ciwanên kurd weha kiribûn

ku ew dîroka xwe, mezin û berxwedanên wan nasnekin. Heger nas jî bikin divê weke tevgerên dînî(olî) û paşverî binasin da ku tenê xwe li ser zanîn û şoreşa Sapo daye destpêkirinê, amade bikin.

Lê çi fêde ciwanên wê demê ji ber agirê bi wan û welatê wan ketibû nikarîbûn li ser tiştên rast û nerast. Çep û xwar, qencî û xerabiyan rawestiyana. Ji xwe biryara Sapo û partiya wî ew bû ku divê vana tunebana. Ji ber ku dewletê baş dizanîbûn ku ciwanên li ser koka xwe mezin nebin wê nikaribin ji bona wê kokê kar û fêdê jî bike an bîne. Tiştên ku li ser gotinên Sapo dihatin gotin hemî ji bona vê yekê bûn.

# -52-

Her ku şer geş dibû li gor wê jî kuştin û revandina zarokên kurdan. Aqilmend û siyasetmedarên ku heta niha xwe parastibûn û li welat mabûn jî zêdetir dibû. Êdî dor hatibû kuştina mezênin kurdan û dewlemendên wan. Êdî dor hatibû xerabkirina gundan û xelkê wan bi zorê ji wir derxistinê. Ji ber ku plana dewletê ew bû ku gundan xerab bike û gundiyan jî mecbûrî koçberî nava bajarên dewletê bikin.

Wê di nava şerde yek bi yek mezinên kurdan, axa û begên welatparêz bihata kuştin ku li ser navê, bi dewletê re kar dikin (!). Wê gelek ciwan jî bihatina girtin û kuştin, li ser navê ku Sapocîne an bi wan re kar dikin.(!) Plan mezin bû lê kurdan û partiyên wan, fêm nedikirin.

Wê gund bihatana valakirin da ku cihê hatibûn valakirin tirkan an koçberên ji Balkanê li wir bi cih bikin. Daxwaza wan ya mezin ew bû ku divê gundên li ser sînor hemî bihatana rûxandin û xelkê wir bihatana koçberkirin, Ew gundên li ser sînor ji bona dewletê girîng bûn. Ji ber ku wan jî dizanîbûn ku ew gundiyên wan gundan tim bi alîkariya şoreşa Barzanî ve rabû bûn û radibûn. Wan bi hemî hêz û qawetên xwe piştiriya wê şoreşê kiribûn û dikirin. Ev jî ne li gor dilê karbidestên dewletê bû. Ji ber wan jî baş dizanîbûn ku azadiya perçeyekî dê biba sedema azadiya hersê perçên din jî. Ji ber vê yekê bû ku dewletê bi destê Sapo û partiya wî dixwestin hemî gundên li ser sînor vala bikin da ku tevgera azadî û serxwebûnxwazên Barzaniyan nikaribin piştgirî û alîkariyê ji wan bigirin.

Dewletê biryara xwe da bû û divê ew gundana bihatana valakirin. Loma jî ev bi destê Sapo pêk anîn an dixwestin pêk bînin. Dema wan bi rêya Kûcik dosyeke mezin ku her tiştên divê Sapo bikira têde nivîsî bû xwend, wî jî fêm kir ku erkê wî ya mezin ew e ku destbi xerabkirina gundan bike. Loma wî li gel Buran bi rêya bêtêlên xwe

têkilî danî da ku mifrezeyên gerîlayên xwe ji bona kuştina gundiyan û xerabkirina gundên wan çalak bike. Dor hatibû gundan û gundiyên kurd.

Ji ber ku li bakurê kurdistanê û li bajaran çi kesên zana û jêhatî hebûn bi destê Sapociyan hatibûn kuştin. Yên dikarîbûn xwe xelas bikin, berbi dewletên ewropa reviyan ku ev jî li gor dilê karbidestên dewletê û Sapo bû. Yên mecala revê nedidîtin an nedixwestin welatê xwe biterkînin jî gelek ji wan dabûn girtin da ku di girtîgehê de dewlet wan perwerde bike. Dema ji girtîgehê derkevin li gor rê û rêbaza Sapo ya ku dewletê jê re amade kiribû, tevbigerin. Hin kadroyên girtî ku ji girtîgehê derdiketin êdî doza kurdistanê ne dikirin. Hinan êdî fikra Kurdistanê avêtibûn tenekê zibil. Hin berbi Bekayê ve çûn û ketin nava gerîla û hin ji wan bûne berpirs jî. Hin jî berbi dewletên ewropa de çûn da ku bikaribin rewşa tevgerên kurdan li ewropa baş fêr bibin û li gor wê jî raporên xwe bidin dewletê. Ji bona dewlet jî ji hemî kiryar û bûyerên kesên ku di zîndanê de kiribûn zilamên xwe û berdabûn. Bi alîkariya dewletê xwe gihiştibûn ewropa da ku rewşa tevgerên kurd yên welatparêz weke rapor bighêjîne wan.

Bi vê yekê Dewletê û Sapociyan tu rêvebir û kadroyên zîrek li bakurê kurdistanê nehiştibûn. Yên mabûn jî nema dikarîbûn dengê xwe derxin ango yek bi yek hatibûn xesandin. Ji ber ku li ser serê wan şûrê dewletê û çekên Sapoyiyan hebûn. Piştî vî karî jî êdî dor dora xerabkirina gundan û valakirina wan bû. Ji bona wê jî wan serokên mifrezeyên gerîla ku ji civatê dûr, ne xwenda û nezan, bi berpirsiyariyên weha bi erk kiribûn ku ew jî li gor dilê Sapo û dewletê, tade û zilmê li gundiyan bikin. Gundê wan bi ser serê wan de hilweşîne. Li ser navê şoreşê(!) peran ji gundiyan bistîne. Tadê û zilmê li wan bike. Rewş zelal bû û dewlet bê deng bû. Loma kes nedigirtin. Ji ber ku ev jî plana wan bû ku bi navê Sapociyan û li gor gotinên Sapo pêk bînin. bû.

Serokên mifrezeyên cahîl, êdî kêf bû bû kêfa wan. Ji bona li gor dilê xwe çi bixwazin wê bikin û dikirin. Diketin kîjan gundan hemî gundî li gel jin û mêran top dikirin. Tade li wan dikrin û bi darê zorê pere ji wan distendin. Ji xwe berê ev kar leşkerên dewletê dikirin. Gundî li meydana gund top dikirin. Ew şût î tazî dikirin mêraniya wan bi destê jinên wan didan girêdanê û bi wan didan kişandinê. Bi salan

leşkerên dewletê zilmên weha dianîn serê gundiyên kurd. Lê êdî leşkerên dewletê nema bûn. Ji dêlva wan, kar û erkên wan êdî Sapociyên ku qaşo wê kurdistan azad bikirana dikirin. Leşkeran pir zor û zehmetî didan gundiyan lê ne dikuştin. Hezar mixabin Sapociyan gelek caran li gor kêfa xwe hin gundiyên ew ji wan nerazî bûn, li gel jin û zarokan didan ber guleyên keleşkofên xwe.

Dewletê li ser navê Sapo, gerîla azadkiribû da ku gundan xerab bikin, bi zorê peran ji wan bistîne. Her weha ji gerîla re hatibû gotin ku ew di heman bûyer û kiryarên xwe de azad in. Ev şer şerê Sapociyan ya li hember dewletê ye û kesên li dij vê bin, wê bêne cezakirinê (!). Ceza wan jî  kuştin bû. Hemî bûyer li ber çavên dewletê pêk dihat, Lê wan bi zanetî destê xwe dirêjî gerîla nedikirin. Gerîla çi bikirana jî dewletê çavên xwe ji wan re digirt. Sedema vê jî ew bû ku tiştên wan nikarîbûn bianiyana serê kurdan, dê bi destê gerîlayên kurd bikirina û dikirin. Ji ber dewletê jî zanîbûn û xwedî tecrube bûn ku heger ”kurmê darê ne ji darê be dê dar nerize. ” Ji xwe gelek çekdarên dewletê bi navê gerîla jî, di nava Sapociyan de cihê xwe girtibûn. Da ku hin bûyerên dibe ku gerîla nekin an nikaribin bike, wan çekdarên dewletê ew jî pêk dianîn.

Demeke weha hatibû ku êdî kesan nema dizanîbûn çi dibe û diqewime. Lê hin ji berpirsê dewletê dizanîbûn çi dikin. Hin ji kurdan hê fêrnebû bûn ku ev şer wê dawî li wan bîne. Hinan bi zanetî tola xwe ji gundiyan, axa û began digirtin. Ew firseta ketibû destên wan, pêk dianîn. Ji ber ku gelek serok an berpirsên mifrezeyên gerîla an berpirsên herêman piraniya wan ji nezanan pêk anîbûn ku ew li gor dilê xwe gundên kurdistanê xerab bikin. Axa û began û kesên zana bikujin. Ji ber vê bû her roj mifrezeyên gerîla êrîşî gundekî dikirin, tade û êşkence li gundiyan dikirin. Hin kesan ji tirsa û hinan jî ji ber berjewendiyên xwe yên şexsî newîrîbûn deng bikin û van kiryarên Sapociyan yên ne di berjewendiya Kurdan de bûn, rexne bikin. Her kes li cihê xwe sar mabûn. Tiştekî ne diyar, tofan û afateke bi serê kurdan de hatibû an anî bûn ku dê zarokên xwe avêtibûn. Tenê dewletê û Sapo dizanîbûn çi dikin û wê çi biqewîme.

Dîsa li gor wê dosya sor ku Kûçik ji Sapo re anî bû, tê de hatibû nivîsandin ku divê aqilmend û zaneyekî kurd nemîne. Divê Sapocî zarokên kurdan ya bi kêfxweşî ya jî bi darê zora bixin nava gerîla da ku li wir bêne kuştin. Ji ber ku dewletê ji Sapo re gotibû ku zarok

hebûna gelekî ne. Dema zarok nemîne hebûna wî gelî jî namîne. Loma Sapo jî ev xistibû nava çalakiyên gerîla ji bona zarokan birevînin û wan bibin Beka yê. Ji xwe zarokên çûn wir jî êdî vegera wan û kurdbûna wan nedima.

Kurdistan êdî bû bû meydana Sapociyan da ku çi bixwestana weha dikirin. Divê wan ji dewletê bêtir êşence, tade û zilm li kurdan bikirana da ku Sapo jî ewqasî biketa çavên dagirkerên dewletê. Êdî Sapocî rojê li gundekî, di nava bajarekî de tade û zilm li ser navê şoreşê(!) li kurdan dikirin û bi zorê pere ji wan digirtin. Kurdistan kiribûn meydana hespên dagirkeran da ku çawa bixwestana weha dikirin. Lê hemî kirin jî li ser navê Gerîla bû. Gerîla jî endamên PTK bûn. PTK jî ya dewleta kûr bû.

# -53-

Gelek ji van kiryar û bûyerên gerîlayên Sapoyî dikirin êdî bi xweşa Şêro jî nediçûn. Êdî Şêro li gotinên bavê xwe yên ku berê jê re gotibû vegeriya û anî bîra xwe. Wî dixwest vê rewşê ser rast bike. Wî dizanîbû ku dema tekoşîna miletekî tê kirin, divê çekdar û gerîlayên wî miletî berî her tiştî qedr û qimeta însanên xwe bizanibin. Divê tadê û êşkencê li wan neke. Divê li gor daxwaza wan tevbigere. Lê tiştên gerîlayên Sapoyî dikirin hemî berovacî vê pîvanê bûn.

Şêro difikirî ku ev kiryarên qirêj ku bi destê gerîla têne kirin, bi serê xwe dikin û haya Sapo jê tune ye. Loma çend caran bi rêya hin gerîla Şêro, Sapo agahdar kiribû ku ev tiştên gerîla dike weke zilmeke li gundiyan e. Wî ji Sapo daxaz kiri bû ku ew li ser vê rewşa gerîla raweste û serrast bike. Şêro texmin dikir ku vana hemî bê agahdariya wî têne kirin. Ma rebeno dê ji ku bizanibaya ku ev hemî jî li ser daxwaza Sapo pêk tên. Ji ber vê bû wan agahdarî an raporên Şêro ji Sapo re şandibû bi zora Sapo çû bû. Êdî wî fêm kiribû ku Şêro hêdî hêdî rastiya miletê xwe û ya gerîla dibîne. Loma fikirî bû ku heger rewş weha here wê roj bê Şêroyê vê rastiyê ji xelkê re jî bêje û ev ê bibe bela serê wî. Li gor vê rewşê jî Sapo bi rêya bêtêla xwe, dewleta xwe agahdar kiribû ku hay û bala wan jî Şêro hebe.

Şêroyê dilsozê gelê xwe, dê ji ku bizanîba ev kiryarana hemî bi biryara Sapo pêk tên. Ma wî yê ji ku bizanîba her agahdariyeke wî û raporeke ku dişand ji Sapo re kuştina xwe nêzîk dikir. Ma wî yê ji ku bizanîba ku Sapo zilamê dewleta kûr e û ew li gor berjewendiya wan tevdigere. Loma ew dilsozê gelê xwe û li benda azadkirina wî li ser destê PTK û serokê wê Sapo dê pêk bihata, bû. Wî li gor xwe hesab dikir ku wê Sapo li ser kuştina gundiyan û wêrankirina gundan raweste da ku bûyerên weha careke din pêk neyê.

***

Gerila roj bi roj zilm, zordarî û tade li ser serê gundiyên kurd zêdetir dikir. Li wan weha hatibû ku divê êdî hemî gundî bacê bidin gerîla. Yên ne dixwestin bidin an perê wan tuneba ew û malbata wan dihatin gulebarankirin. Te digot belkî ew ne kurd in û dixwazin tola xwe ji kurdan bigirin. Loma jî êdî tenê bi kuştina wan ne dihatin ser, daxwaza peran jî li wan dikir û qet nedifikirîn ku perê wan heye an tune ye. Gerîla gundî dixistin rêzê û her yek ji wan dê çiqas pere bidin, fermana wan dixwend.

Gerîla gelek caran çûbûn gundê mala bavê Şêro jî. Li wan dibû mêvan û tim pere ji gundiyan digirtin. Ji bona herkes peran bide wan, gelek tade û êşkence li gundiyan dikarin. Her cara ku zêde zor li wan bikirana wan jî haya bavê Şêro jê çê dikirin ku ew bi alîkariya gundiyan ve rabe. Ji ber ku hemî gerîlayên wê navçê bavê Şêro nasdikirin û dizanîbûn ku kurê wî weke berpirsekî wan ê mezin e. Ji ber vê bû ku wan newêrîbûn bê rêziya bavê Şêro jî bikirana.

Rojekê dîsa gerîlayên Sapo ketibûn gundê mala bavê Şêro. Hemî zilam, jin û zarok li meydanê topî ser hev kiribûn û doza divê herkes baca xwe bide, li wan dikir. Ji gundiyan kesekî herî feqîr û hema bêjin nan jî bi dest ne diket ku ew û zarokên xwe bixwin. Lê berpirsê gerîla yê ser û çavên wî bi paçekî ve hatibû girêdan ango veşartin, doza gelek peran li feqîrê gundî dikir. Gundî bi tirs û xof bi dengekî nizm ji berpirs re dibêje:

-Bawer bike tu perên ku ez ê bikaribin bidim we tune ye. Ê li vî gundi herî feqîr ez bi xwe me. Nan tuneye ku zarokên min bixwin. Ma ez ê ji we re peran ji ku bînîm!!!

Ev gotina rebenê gundî bi zora wî berpirsê Gerîlayê Sapocî dihare. Loma ew, ê gundî ji nava koma zilaman derdixe, keleşînkofa xwe dixe noqa wî û dibêje?

-Ji niha û heta sê saetan tu 30 hezar lîra tîne bîne, ya na ez ê vê keleşînkofê di te de vala bikim.

Rebenê gundî her çiqasî berxwe dide, lê fêde nake. Berpirsê ser û çavên wî girtî serê keleşînkofê xisteye noqa wî û dibêje:

-De zû lez bike karê me heye.

Kurê gundiyê yê çarde salî dinere ku wê bavê wî bikujin, ji nav komê derdikev û ji yê berpirs re dibêje:

-Ez heyrana we me, bavê min nekujin ez ê herim peran bînim.

Ê berpirs bawer dike û dibêje:

-De zû here û were.

Lawik bi bazdan dihare mala bavê Şêro yanî xalê Ehmo, dema dikeve hundir gazî xalê Ehmo dike û dibêje:

-Xalo zû derkeve û were dîsa ew hatine û vê care dixwazin bavê min bikujin. Xalê Ehmo lê vedigerîne:

-Kî hatine kurê min?

-Ew hatine ew, dîsa peran ji gundiya dixwazin û keleşînkofa xwe xistiye noqa bavê min û dibê: Ecele divê tu 30 hezar lîre bîne.

Xalê Ehmo rewşê fêm dike. Bi halê xwe yê nexweş radibe û sola xwe dike pê. Ew û lawik derdikefin berbi meydana gund diharin ku xalê Ehmo çi bibîne. Dinere ku Sapociyên serçavên wan girtî, çend kesan berê keloşînkofên xwe dane gundiyên li wê meydanê komkirine û yekî ji wan serê keleşînkofa xwe xistiye noqa rebenê gundî û peran jê dixwazî. Loma xalê Ehmo hêrs dibe û dibêje,

-Çi ye dîsa we xêr e? berpirsê ser çavê wî girtî dibêje:

-Em doza baca partiyê dikin. Lê ev necamêr dibêje tune û ez nadim. Heger nede wê li vir bê kuştin. Xalê Ehmo dibêje:

-Kurê min ew feqîrê herî feqîr e, ne sî hezar ew nikare sê lîran jî bide û bi hers dibêje: Zû keleşînkofa xwe dîne û biteqizin herin. Ê berpirs dibêje:

-Xalo weha çênabe. Divê herkes baca xwe bide partiyê. Ji ber ku partî jî ji bona wan kar dike. Heger nede wê bê kuştin.

Li ser vê gotina wî, xalê Ehmedê bavê Şêro gelekî hêrs dibe, xwe nêzîkê wî berpirsê ku devê keleşînkofa xwe xistiye noqa wî kesê fekîr û dibêje:

-Zû ecele ser çavê xwe veke, ez binerim bê tu kîye? Ê berpirs berxwe dide ku veneke. Lê çi dike nabe. Ji ber ku xalê Ehmo bavê berpirsê wan bû. Heger Ehmo vê rewşê ji kurê xwe re bêje, ew berpirs dikare bihata kuştin ku bê rêziya bavê wî kirî ye. Loma mecbûr dimîne ku ser çavê xwe vedike û bi serçavdîtina wî xalê Ehmo dibîne ku ew kurê gavanê wan e. Di berxwe de axînekê dikşîne û xwe bi xwe dibêje: Aha dema berpirsê gerîla kurê şîvan û gavanan be, wê tucarî kurdistan azad nebe.

Mesele li vir diqede. Xalê Ehmo dixwazî gerîla bi yek carê gund biterkînin. Dûre kurê gavanê gund û berpirsê mifrezeya gerîla, bi birûskekê Sapo ji ber vê rewşê agahdar dike ku bavê Şêro nahêle ew baca partiyê ji gundiyan bigirin. Xalê Ehmo jî roja din dihare ba kurê xwe û vê meselê jê re dibêje. Kurê wî yê dilozê gelê xwe ê dilpaqij ku hê jî fêr nebû ye ku Sapo zilamê dewletê ye, ew jî bi birûskekê Sapo agahdar dike û dibêje ku tiştên gerîla dikin şaş e. Ma gelo te hay ji wan heye an na? Bi girtina wê birûska Şêro, Sapo, yek ser emrê kuştina wî dide û dewletê agahdar dike ku êdî ew xeter e loma divê bigirin û cezayê wî lê bibirin. Ceza birîn jî berê êşkence û dûre jî kuştin e.

# -54-

Êdî welat ango bakurê kurdistanê ketiye bin desthilatiya Sapociyan. Gerîlayên Sapo hingî zor û zehmetî li gundiyan dikirin bê hey hawar. Gundiyan dixwestin ku bila bi lêdana leşkerên romê û ne bi kuştina destê gerîlayên zarokên wan, ba. Êdî rewş bû bû rewşeke din. Sapo bi alîkariya dewleta xwe bû bû desthilat. Bi wêrankirina gundan û kuştina gundiyên kurd, Dewlet û Sapo bi serketibûn. Hemî tişt li gor daxwaza dewletê bi rêve diçû. Lê karekî din jî ma bû divê ew jî bi destê Sapo bihata kirinê bê ku kes rewşê fêm bike. Ew jî ew bû ku divê siyasetmedar, dewlemend û kesên ku bêhna welatparêziyê ji wan dihat, bihatana kuştin. Ji bona vê jî Kûçik weke berê dîsa bi dosyake qalind dihare Şamê li gel Sapo yê serok. li wî û li gerîla bû mêvan.

Kûcik Dosyê bi ken dirêjî Sapo dike û dibêje:

-Serokê min! dewlet gelekî ji te razî ye. Tu bawer bike em ne li bendê bûn ku tê ewqasî zû kurdan û tevgerên ciwanên wan têk bibe. Ji bona vî kar û berpirsiyariya te dewlet gelekî ji te razî ye. Lê hê kar neqediya ye.

-Tu û dewlet her sax bin. Ji bona vê dewleta şêrîn û delal çi ji destê min bê ez ê bikim. Çi kar û pêdivî hebe bêjin da ku ez jî pêk bînim. Ez di xizmeta dewleta xwe de me.

-Spas serokê min. Karê li pêş te di vê dosyê de heye ku divê tu wan jî pêk bîne. Ev jî wê bibe karê te ê talî ku êdî tê li kurdisanê vegere û li Amedê di avahiyeke herî xweş ku wê dewlet ji bona te amade bike rûnê. Êdî bi şiklekî din ango di warê demokratîk de kurdên ku mane jî tê biqedîne. Ez êdî li virim û ev jî wê dosya talî be ku dê ji te re were.

-Spas lê ez ê çawa li welêt vegerim ma ne qaşo ez terorîst im (di berxwe de mizmî).

-Ma tu vê difikire? Ev rehetirîn karê me ye. Piştî ku hemî kar bi destê te biqede em ê bixwazin weke dewlet û tu weke serokê kurdan peymanekê çi bikin. Efûyekê derxin ku tu vegere. Vê care jî tê di warê demokratîk de bibe serokê kurdan û partiyekê veke. Di bin sîwana wê partiyê de tê û em ê bi hevre kurdan li wir top bikin. Em ê jî hewl bidin ku partiya te bi serkeve ango em ê bi hev re hewl bidin ku di hilbijatinên li pêş me, partiya em bi hevre ya legal damezrînin bendê derbas bike. Aha wê gave êdî dê karê te û me rehet be.

-Bi rastî jî ev karekî xweş û hêsan e ku dewlet fikirî ye. Min di ware şerê çekdarî de çawa kurd û tevgerên wan têk birin, di ware eşkere de û bi alîkariya dewletê em ê pir bi rehetî bi serkevin. Berî peymana Lozana dudan ez ê hemî karî biqedînim ku dê kurd êdî qet nikaribin serê xwe rakin û doza welatê xwe an zimanê xwe bikin. Bila qet şika te û dewletê tune be.

-De baş e! Êdî ez jî li virim. Weke mamosteyekî ez ê gerîla perwerde bikim da ku hêdî hêdî Kemalîzmê û tirkbûnê bi wan şêrîn bikim. Helbet ev kar bê alîkariya te na be ha. Niha wê karê te bibe ku tu heta çend rojan vê dosya nû bixwîne û navaroka wê baş fêr bibe da ku em vî karê li pêşiya me maye biqedînin. Ji te re serketinê dixwazim serokê min.

Sapo dosya xwe ya nû girt. Derbasî oda xwe bû da ku zû wê bixwîne. Ferman û biryarê ji wî re hatiye zû bi cih bike. Ji ber ku wî jî êdî dixwest here wê avahiya ku wê dewletê jê re li Amade ava bike û êdî kurdan di bin sîwana partiyeke legal ango eşkere de bike Kemalîst. Tirkobûnê bi kurdan şêrîn bike da ku êdî mesele kurdan bi temamî ji holê rabe. Dema Sapo derbasî oda xwe ya ku ji wî pêve kes nikarîbûn derbasî wir bibana, bû. Gazî berpirsiyarekî kir û got?

-Brêz Kûcik bigire ba xwe wî bigerîne dûre jî wî bibe Beka yê bila here nava gerîla û ew çend dersan jî bide wan. Divê hûn hemî qîmeta profesorê me baş bizanibin. Ew li vir e da ku em di şerê xwe ê li hember dewletê bi ser bikevin. Cenabê profesor çi got û çi xwest divê hûn bê kêmanî bikin. De qawet be ji were. Ez ê jî van çend rojan bixwînim û divê ez rêyeke nû ji bona serketina me peyde bikin.

Sapo derbasî oda xwe bû, bi lez û bez dosya jê re hatibû şandinê vekir û dest bi xwendina wê kir.

”Serok.

Em weke komîteya dewletê, ji karê te yî ku heta niha te kirine kêfxweşin û gelekî ji te razî ne. Êdî tê li gel Kûçik karê xwe li wir bimeşîne. Ew ê êdî li wir bimîne lê divê tu û em mayîna wî ya li ba te jî bi awayekî nîşanî raya giştî bikin ku kes vê meselê fêm neke. Bila bê zanîn ku êdî Kûçik jî bûye dijiminê dewletê û bi alîkariya gerîla ve radibe da ku tu di şoreşa xwe de bi ser bikeve. Ew ê weke profesorekî dersa gerîla bide. Herkes bila weha zanibin. Lê di eslê xwe de karê wî dê ew be ku gerîlan bike hezkirê Kemalîzmê. Dema pêdivî çê bû tê bi alîkariya wî ve rabe.

Karê herî girîng ku li pêşberî me maye ew e ku divê êdî li ser navê partiyê tu li tirkiyê û li başûrê rojhilatê tirkiyê jî dest bi çalakiyan bike. Xwepêşandan û mitîngan li dar bixe. Sedema li darxistina mitingan jî dê ew be ku ew mirovên hê jî di dilê wan de Kurdistanek azad hebe. Em ê êdî li gel te û bi alîkariya te wana yek bi yek di nava xwepêşandan û mitîngande bi saya çekdarên xwe ê zîrik bikujin. Kî hatin kuştin tê xwedî li wan derkev e û ji bona wan xwe pêşandanan li dij dewletê li dar bixe. Di wan xwe pêşandanan de jî çend kesên ku em ê bi rêya te tespît bikin û li ser destê çekdarên xwe wan jî ya bikujin ya jî bigirin, bavêjin zîndanê û di wirde wan perwerde bikin da ku ew jî ji bona dewletê kar bikin.

Çima xwe pêşandin û mitîng?

Kurd êdî ji helwestên dewletê gelekî aciz bûne. Divê tu di wan xwepêşand û mitîngan weha organîze bike ku bila bi sloganên herî tûj û li dij dewletê bêne destnîşankirin û ew siloganana wê berê ji alîyê zilamên me û te de bine avêtin. Di destêpêkê de wê hindik bin. Dûre wê geş û fireh bibe. Bi vê rêyê em ê bi rehetî wan kesên bi rastî hê jî ji dil li dij dewletêne destnîşan bikin. Em ê hinan li wir bikujin û hinan jî bigirin. Ev kar wê heta ku me got bese, dê berdewam bike. Armanca dewletê ji vê, wê ew be ku di vî warî de em hin kesên ji dil kurd û têgihiştîne jî bikujin an bikin zilamên xwe.

Êdî li ser vê projeya nû tu û profesor hûn bi hevre kar bikin. Plan û projeyên nû amade bikin û wan pêk bînin. Êdî we çi biryar da em ê li gor we tevbigerin. Lê di warekî din de jî karê xerabkirina gundan û kuştina hin axa û serokêşîrên wan jî bila beredewam be. Êrîşên xwe yên li ser Qeraqolên leşkeran hê zêdetir bikin da ku bawerî bi

temamî bi we bê. Berî ku hûn êrîşî qereqolekê bikin divê hûn me agahdar bikin da ku em li gor wê hazirî bikin. Ji bona leşkerên me zêde zerarê nebînin. Em ê jî leşkerên xwe derxin û hin leşkerên ku bi eslê xwe kurd in an hin kesên ku tirk in lê ew jî berê li dij dewletê bûn ango sosyalîstbûn, têde bihêlin. Yanî di gelek alî û rêyan de ev karê te û me yê nû divê berdewam be.

Ji bona em hemî astengên li pêşiya te rakin, divê tu ji bîr neke ku ev bû deh sal di ser darbê ango hukmê leşkerî de derbas bû ye. Piştî ewqas sal û li Iraqê kurd bûne xwedê maf, Ev dikare bêtir zerar bide me, Ev dikare pêşî li tevgerên nû yên başûrê rojhilata welatê me veke. Ji başûrê rojhilatê welêt (bakurê Kurdistanê) xelk dikarin herin başûr li wir bîryara xwe nû kirin an hin partiyên din vekirinê bidin. Aha ev ê ji nû de bibe bela serê me û te. Ji bona wê jî em ê dest bi pêvajoyeke nû bikin û navê wê bikin Qesas ne diyar. Yanî em ê li gel agahdariyên te ku kesên dixwazin ji nû de xwe bi rêxistinê bikin, tevgerên xwe çalak û yên nû damezrînin. Divê berî ku ew vê pêk bînin, em wan bi navê qesas ne diyar ji holê rakin. Me wan çekdarên xwe yên ku ew jî endamên partiya te ne, perwerde kirine ku bi vî karî ve rabin. Heger di kuştin an xerabkirina hin gundan de astengî derket, ji xwe tê wê bûyerê bide ser xwe û bêje PTK ev kirî ye. Êdî dem dema kuştina kurdên çalak bi navê Qesas ne diyar e. Bila guhên te li ser başûr, çûyên û hatinên ku wê ji başûrê rojhilatê herin wir, be. Kî ji bona çi çûne wir, kî li wir dê çi bike divê tu me agahdar bike. Ya din tu û em divê li ser hin kesên li başûrê rojhilat ku dixwazin xwe bi tevger bikin, divê ew jî li ser navê Qesas ne diyar bêne kuştin. Êdî dem dema bi navê qesas ne diyar û kuştina zana û yên dixwazin ji nû de ji bona kurdistana xwe kar bikin e.

Ev karê nû, ev hemla nû ji bona bi temamî bêdengkirina kurdan û hin tirkên me jî ne. Ev ê bibe şer û pevçûna dawî. Loma divê tu şika me nemîne ku wê kurd êdî serê xwe rakin. Yên nikaribin serî rakin jî divê hemî di bin sîwana partiya eşkere ku em ê ji te re wê jî vekin, bibin yek. Ji xwe êdî karê profesor wê ew be ku ew ê bi perwerdekirina gerîlan mijjûl bibe ku wan bike Kemalîst û ew gerîlayên ji bona doza gelê xwe reviyan çiyan û çek girtine destê xwe, wê êdî ji bona komara me canê xwe bidin. Ji bîr neke!!! Lozana dudan nêzîk dibe. Divê hemî kar berî wê pêk bê ku tu weke serokê kurdan beşdarî wê bibe.

Êdî kar dimîne li ser pişta te û Kûçik. Lez biki, destê xwe sivêk bigire. Bê qeyde û şert dewlet bi te re ye. Em ji vî karê nû re ji te re serketinê dixwazin û bi hêviya ku tê di vî karê xwe de jî bi serbikeve. Hewl bidin bila êdî gerîla bê ku ew bizanibin, ew ên di ber parastina komara me de canê xwe bidin.

Her serketî be û ji dil em te silav dikin û ji karê te re serketinê dixwazin.

Li ser navê komîta parastina dewletê”

# -55-

Wan herdu brûskên ku yek ji berpirsê wê mifrezeya gerîla ku serokê wê kurê gavanê gundê mala bavê Şêro û ya din jî ku Şêro ji ber wê bûyera kurê gavên, gihiştibûn ber destê Sapo.

Sapo ji brûska Şêro gelekî aciz dibe û li ser vê, yek ser dewletê agahdar dike ku divê êdî ew Şêro bigirin, berê têra wî êşkencê lê bike û bikujin. Dema Sapo vê bûyerê bi bêtêla xwe dighêjîne dewletê. Dewlet jî êdî karê xwe dizane ku wê çi bike ji Şêro. Lê li aliyê din jî qet hay û baya Şêro ji wan tiştan tune ye. Ew êdî ketiye haziriya xwe û zewacê. Wî dixwest ku êdî mala wî, jina wî û zarokên wî jî çi bibe. Wî dixwest êdî dawî li wê evîna ji hev dûr ya xwe û Xezalê bîne. Loma rojên betlanê, wî Xezala xwe û herdu dayikên xwe ango dayikê Xezala û ya xwe digirt û diçûn bajêr ku ji bona mala xwe ya ku wê bi hevre jiyaneke xweş lê derbas bikirana, bikiriyana. Piştî ku hemî pêdiviyên xwe pêk anîn êdî dor hatibû roja dawetê û belavkirina qerta vexwandina mêvanan. Ji xwe gundiyan biryar dabûn ku daweta wan li gundê ku Şêro lê doktorî dikir, li dar bixin. Lê hazirkirina qertan jî ji bona mêvanên li bajêr û ji cihê dûr dê bihatana, bû.

Roja dawata Şêro û Xezalê li hemî an li piraniya gundên herêma Mêrdînê hatibû bihîstin. Herkesên ku ev mizginî dibîhîstin xwe ji bona wê rojê amade dikirin. Kesên qertên xwe jî bi rêya postê girtibûn, pir kêfxweş bû bûn û wan jî haziriyê xwe dikirin ku wê weke diyarî çi bibin. Ji xwe mala bavê Şêro hemî jî hatibûn gundê ew lê bû. Bav, dayik û xuşkên wî jî ketibûn nava haziriya roja daweta Şêro û Xezalê. Gundî şerpeze bû bûn ku wê roja dawetê çawa pêşîwaziya mêvanan bikin û xwarina wan li gor adetên kurdewarî amade bikin.

Gundî, dê û bavê Şêro û xuşkên wî. Dê û bavê Xezalê, xuşk û brayên wê jî bi haziriya dawetê ve mijûl dibûn. Biryar hatibû dayin da ku sê rojan dawet li dar keve. Dawetên qedirbilindan û

dewlemendan ji sê rojan heta hefteyekê dihate kirin. Lê biryara sê rojan ku daweta Şêro, ji aliyê gundiyan hatibû destnîşankirin. Ji bona Şêro û Xezala wî rojek bes bû, lê gundiyên, gundê wî lê doktorî dikir, biryara sê rojan dabûn. Şêro li gel malbat, nas û dostên xwe tenê ji bona daweteke serketî di nava kar de bûn.

***

Şêro li gel hevalbend, malbat û gundiyên xwe ketibûn nava haziriya daweteke xweş. Lê dewleta ku qet xweşî û aramî nedabû kurdan jî li ser daxwaza Sapo ketibûn haziriya girtina Şêro û kuştina wî. Hezar mixabin hay û baya Şêro ji vê tune bû. Di nava vê kelecanê de ji bîr kiribû ku ji bona rastkirina şaşî û tevgerên gerîla ji Sapo re brûskek şandibû. Wî yî çawa bizaniba ku Sapo jî êdî dewlet e û heta ji dewletê jî xetertir e. Ma wî yê ji ku bizanîba ew brûska wî şandibû wê biba dawî anîna wî. Tew qet li ser vê nedifirî bû. Loma wî çend heval û berpirsên hevalan jî vexwandibûn daweta xwe. Heta ew li bendê bû ku Sapo jî ji wî re pîroznameya dawetê bişîne. Rast e, Sapo ji dêlva pîroznameyê, fermana girtin û kuştina wî ji dewletê re şandibû.

Êdî bi kêfxweşî û serbilindî hemî karê dawetê qediya bû. Gundiyan û hemî kesên ji bona dawetê hatibûn vexwandin. Bi kelecan li benda wê rojê bûn. Herkesan texmîn dikirin ku wê daweteke weha bibe ku hê kesan tiştekî weha ango daweteke weha nedîtibûn. Ji xwe pêkanîna daweteke weha wê biba cara yekê ku dê li gundê wan bihata li darxistin.

Ji daweta wan re du roj mabî ku êvarekî çend kesên ser çavên wan girêdayî ango rûyên xwe yên reş veşartibûn. Li deriyê Şêro dixin. Şêro derî vedike, wan vedixwîne  hundir û dema berpirs, wê çefîya gemarî li ser rûyê xwe dida alî Şêro lê dinere ku heval in. Nas dike û dibêje:

-Fermo kerem bike werin hundir heval.

-Na karê me bi lez e heval. Berpirsê eyaleta Botan hatiye û dixwaze te bibîne û ji bona roja dawetê te pîroz bike. Loma hema kincên xwe li xwe bike em herin heval.

Çûyin hebû lê veger tune bû. Şêro birin lê kê bir diyar bû. Hinan di şevreşê de dîtin ku siyarek li ber deriyê mala Şêro sekinî ye. Wan digotin dibe ku hinan nexweşên xwe anîbin ba wî. Vê zêde bala kesan nekişandibû. Şêro çû lê vegera wî nebû. Bû sibe Şêro tune ye, bû roja din Şêro tune ye. Êdî ketibû nava devê gundiyan ku Şêro hatiye revandin.

Bû bû roja sisiyan jî Şêro nehat, bê huzûriyeke mezin ketibû nava malê. Bavê Şêre nerî ku nabe. Çû qerekola gund û pirsa kurê xwe kir, lê wan gotin: "Haya me jê tune ye". Li ser vê bersîvê, bavê şêro çû qezê, bajêr û hemî qerekol û navçeyên polîsan pirsa kurê xwe dikir. Tu bersîveke erênî ji wan nedigirt.

Êdî sekin li bavê Şêro nema bû. Karê wî bû bû gera ku lawê xwe bibîne. Ew çû ba berpirsê gerîlayên herêma Mêrdînê û pirsa kurê xwe kir, wan jî got ku haya me jê tune ye. Te digot belkî Şêro bûye xwelî û li ber bayê kurr bi ezmanan ketiye çû û çû. Piştî ku bavê Şêro ji hevalan jî fêr dibe ku haya wan jê tune ye. Seredana qerekol û navçên polîsan bêtir dikir. Ha li wir û ha li vir li kurê xwe digere. Tu qerekol û navçên polîsan namabûn ku wî serdana wan nekir û li kurê xwe dipirsî. Lê tunebû. Firya bû, bi ezmanan ketibû. Şînekê bê emsal girtibû ser herdu malan. Herkesan li xwe didan û gazî Şêro dikirin. Lê Şêro tune bû. Ji xwe bavê wî êdî li mala xwe jî venegeriya ha li wê qerekolê ha li cih û warê polîsan li kurê xwe digeriya.

# -56-

Êdî li bakurê kurdistanê demeke nû, destpêkek xerab ji teref dewletê û PTK hatibû destpêkirin. Dewletê rûpelekî nû vekiribû ku piştî donzdeh salan êdî li bakurê kurdistanê bi saya azadiya başûrê kurdistanê kurd xwe amade dikin ku dest bi tevgerên nû bikin. Ji bona wê jî gelekan berê xwe didan başûrê kurdistanê ku li wir kongre û civînên xwe li welatê xwe ê azad pêk bînin. Azadiya başûrê kurdistanê bû bû roniyeke nû. Bû bû qezencek ku êdî kurd weke çawa di destpêka şoreşa îlonê bi teqandina guleya ewil hemî kurdên cihanê ji nû de li xwe hay bûn ku hê bi temamî neqediyane û hene. Çawa dengê şoreşa ji bona azadiya kurdistanê li başûr olan dide, dibihîstin. Çawa ku wê şoreşê kurd ji xewa mirinê şiyar kir. Raperîn û serhildana başûrê kurdistan ya di sala 1991an jî bû destpêka xwe ji nû de bi rêxistinkirina tevgerên bakurê kurdistanê. Ji ber vê bû ku dîsa weke her car dagirkerên me ketin tirsa mirinê. Tevger li ser tevgeran pêk dianîn. Plan û projeyên nû bi hevre amade dikirin. Lê ê herî zêde ji vê rewşê aciz jî rêveberên komara dewleta tirk bûn. Ji ber ku dema wan ji Sapo re PTK vekirin. Xwestin ku li ser destê wî kurdên hê dixwestin doza gelê xwe bidomîne, ji holê rake da ku bi temamî êdî kurd bê deng bibin. Heta demekê kirin jî. Lê bi azadiya başûrê kurdistanê ew tirs û bê dengî li bakurê kurdistanê rabû bû. Êdî dagirkerên me ketibûn nava tirsek nû. Li ser vî asasê êdî biryara destpêka pêvajoyeke nû dan ku di vê pêvajoyê de jî ew li bakur û Sapo jî li başûr kurdên dixwest tevgerên xwe çalak bikin, ji holê rakirina wan bû.

Başûrê kurdistanê êdî bû bû weke zîyareta kurdan. Roj tune bû ku ji bakur kesên siyasî serdana wir nekiribana. Tevger û partiyan êdî kongre û civînên xwe li wir di bin ala kurdistanê de çê dikirin. Lê ev yeka ji bona dagirkeran tirsek nû û xofeke mezin bû. Ji ber vê bû ku dagirkerên dewletê jî bi vekirina pêvajoyeke nû xwestin pêşî li vê pêşveçûnê bigire. Ev pêvajojî bi navê Qesas ne diyar dest bi kuştina kesên welatparêz, zîrek ku dixwestin xwe li bakurê kurdistanê çalak bikin, bû.

Vê rewşê tirseke dijwar xistibû nava Sapo jî. Wî jî êdî bi hemî hêz, qawet û bi saya çekdarên dewletê, kesên di nava xwe de dest bi kuştina wanên ku çenek xwîna kurdewariyê bi wan re mabûn, kir. Sapo û Buran ji kê çenek şik bikirana dişandin çalakiyekê û li wir bi destê zilamên xwe didan kuştin. Dûre jî dikirin şehîd û xwedî li wan derdiketin. Ji bona protestokirina wan jî li bakur çalakî li dar dixistin ku dewlet jî kesên ji welatê xwe hez dikirin û dixwestin ji bona azadiya wî kar bikin, dikuştin. Yanî êdî kuştina kurdan bi du aliyan ve pêk dihat.

Lê hê jî kîna dewletê û Sapo li hember endam û rêvebirên PGK û tevgera ciwanên wan RNK dom dikir. Tim çavderiya wan dikirin ku bê ewên çi demê xwe ji nûde bi tanzîn ango bi rêxistinî bikin û dest bi karê siyasî bikin. Li bendê bûn ku dema RNK jî herin başûr ku haziriyên xwe bikin an tevgera xwe ya bi salan bê deng mabû, bi deng bikin, bûn. Ew roj hatibû û RNKê biryara kongreya xwe li başûrê kurdistanê li dar bixin dabûn. Vê kêfa Sapo anî bû ku tiştê li bendê bû wê pêk bê. Li gor vê biryarê jî di sala 1992an RNK bi nûnerên xwe yên çi li welêt û çi jî li derveyî welat kongreya xwe pêk anîn. Her weha di vê kongrê de jî berpirsê partiyê kesekî ji welêt ku bi navê Xetîp hilbijartin. Lê mixabin hê jî kurdên bakurê kurdistanê dersa xwe negirtinbûn. Ji ber vê jî RNK li darxistina kongreya xwe û hilbijartina komîta navendî û berpirsê xwe zêde veneşartin. Li başûrê kurdistanê di nava xwe û dostên xwe de munaqeşeyên xwe de tim behsa nûjenkirna karê xwe dikirin. Hin caran didan zanîn ku wan ji bona nûjenkirina karê tevgera xwe kongreyeke baş kirine û komîteyeke nû ku piraniya wan ji kesên ji welêt başdarî kiribûn, hatine hilbijartin. Gelek caran jî didan zanîn ku wan Xetîp weke berpirsê bakurê kurdisatanê destnîşan kirine. Lê piştî qedandina karê xwe û hilbijartina komîteyeke nû ku herkes li cihê xwe vegeriyan. Piştî vegerê jî berpirsê tevgera RNK Xatîp bi navê qesas ne diyar hate kuştin. Ev jî dide zanîn ku çi tevgerên bakuriyan li başûr civîn an kongreyên xwe pêk dianîn, ji bê tedbîra wan, Sapocî haydar dibûn û wan jî dewleta xwe agahdar dikirin ku dewletê jî li ser navê qesas ne diyar ew dikuştin. Kuştina Xetîp jî yek ji wan bû.

Piştî pêvajoya destpêkirina qesas ne diyar, li kurdên bakurê kurdistanê wer hatibû ku êdî herkes bi tirs ji malên xwe derdiketin. Dema derdiketin jî gelo wê êvarî li mal vegere an venegere, ne diyar

bû. Bi salan milet bi vê tirsê jiyan. Lê dewletê û Sapo jî karê xwe yên kuştina welatparêzên kurd her berdewam dikir. Bi salan ev rewş berdewam kir û dûre jî li ser pêşniyara dewletê ji Sapo re partiyeke legal vekir û di vekirina vê de jî xwestibûn, li gel hemî kurdan ev bibe da ku dewlet bikaribe wan kesên hê dilsoz û xebatkarê gelê xwe ne, bi saya vekirina partiyeke weha nas bike. Helbet ev jî kirin.

Partî ewil li gel hemî tevger û kurdên din vekirin. Piştî naskirina gelekan û emrê kuştin an girtina wan. Dewletê û Sapo biryar dan da ku partî êdî tenê weke ya wan bimîne. Şerê çekdarî kêm bikin û êdî li ser navê vê partiyê kurdan bi  temamî ji doza wan dûr bixin û Kemalîzmê bi wan bide şêrînkirin û qebûlkirin.

# -57-

Karê bavê Şêro bû bû ger û serîlêdana qerekolên leşkeran, cih û avahiyên polîsan. Tu der nema bû ku wî serîlêdana wan nekiri bû. Ha li wir û ha li vir li kurê xwe digeriya lê te digot erd qelişiye û Şêro tê de wande bû ye.

Ji xwe Sapo jî tiştekî weha dixwest ku bavê Şêro bi serîlêdana qerekol û warê polîsan bike da ku bikaribe wî bi ajantî ango mixburiyê tawanbar bike. Piştî demekê ew merama Sapo tê cih û bi rêya bê têlê serokê mifrezeya xwe ya gerîlayên herêma Mêrdînê agahdar dike ku bavê Şêro her roj li Qerekolên leşkeran û avahiyên polîsan e. Yanî ew êdî bûye zilamê dewletê û karê wî bûye muxbirî. Ji ber vê ew her roj çend endamên gerîla dide dest. Loma Sapo ji berpirsê gerîla xwest ku cezayekê bidin bavê Şêro. Ji xwe ceza birîn an cezakirin jî dihate maneye ku divê êdî ew bê kuştin.

Li ser vê agahiya Sapo, êdî berpirsê gerîla dikeve hereketê. Rojekê derengî şevê çend gerîla diharin mala bavê Şêro û ji re dibêjin:

-Xalê Ehmo, Şêro dixwaze te bibîne. Em hatine ku te bibin ba wî.

Bi vê gotinê, xalê Ehmo ji nû de tê jiyanê. Bi bihîstina ”Şêro dixwazî te bibîne ”. Tu nema bû ku bifiriya. Hema bi lez û bez cilên xwe li xwe dike. Bangî zarokên xwe dike û dibêje:

-Zarokên min, hay ji xwe û malê hebin, waye Şêro şandiye pê min. Heval hatine wê min bibin ba wî. Heta ez vegeriyam hay ji xwe hebin û ji tu kesan re tiştekî nebêjîn ha.

Bê ku li benda bersîvekê bisekine ew li gel wan herdu gerîlayên ku hatibûn pê wî, derketin derve. Li siyara li ber derî siwar bûn û çûn. Çûn lê xuya bû dê vegera wî jî weka ya kurê wî ba.

Piştî wî dibin li cihekî dûrî gund ku çend kesên din jî li wir in, li benda wan bûn. Wek diyarbû ku kesê pêşewaziya xalê Ehmo kir kurê

gavanê wan yê dema ku Xalê Ehmo tinazê xwe pê kiri bû. Xwe nêzîkî xalê Ehmo kir û bi zirt got:

-Ev demeke ji zû de ye em te dişopînin. Tu her roj li ba leşker û polîsan e. Em dibihîsîn ku tu her roj muxbirîtiya gerîla dike. Tu gerîlayên zarokên kurdan gilî dike û polîs wan digire. Ma qet tu nefikirî ku tê rojekê cezayê xwe bibîne.

Êdî mesela zelal bû û xalê Ehmo dizanî bû dê çi bê serê wî. Fêm kir ku yên kurê wî jî kuştina an veşartine heman kes in ango Sapocî ne. Lê dîsa jî got:

-Na! we şaş fêm kirî ye. Ez ji wan re behsa kurê xwe û wendabûna wî dikim. Ez texmîn dikim ku wan kurê min. hevalê we Şêro girtine. Ez jî her roj li wî digerim û heta bibînim jî ez ê gera xwe berdewam bikim.

Bi xelasbûna gotina wî, berpirsê Sapociyê kurê gavanê gund, hêdî paçê ser rûyê xwe vekir û bi şîdet çend boks li dev û rûyê wî dixwe. Xalê Ehmdo dike hawar û gazî, lê fêda wê jê re çênabe. Dema ew dikeve erdê, kurê gavanê berpirsê Sapocî dibêje:

-Ma tê bîra te ku dema te ser çavê min da vekirin û di nava mifrezeya min de te ez rezîl kirim. Divê tu wê rojê ji bona rojekê weha jî fikirî ba.

Jê re weha dibêje û çend pêhînan jî li ser û çavên wî dixe. Lêdaneke li gor xwe li xalê Ehmo, bavê Şêro dike. Xuya ye dilê wî bi vê rehet nabe. Dûre tabançeya xwe derdixe û carcûrekê tê de vala dike. Serê xwe berbi hevalên dizivîrîne û dibêje:

-Me îro jî sixurekî kurd ku di xezmeta dewletê de bû kuşt û me bi vê yekê jî xwest ku em parastina gerîlayên xwe bikin.

Xalê Ehmo li erdê bû bû term. Ne deng û ne jî hilma û êdî derdiket. Di wê şevreşê de û dirêjkirî de ruh mabû. Piştî Gerîla diharin vê care Şêroyê di destê çend zilamên îstîxbaratê de tînin ba bavê wî. Dema ew bavê xwe dibîne ku xwîn ji devê wî diherike baz dide da ku xwe bighêjîne ser. Lê bi gava dudan ku Şêro nêzîkî bavê xwe dibe. Zilamê îstîxbaratê bi debançeya xwe, carcorekê di Şêro de vala dike. Ew jî li ber bavê xwe li erdê dikeve û êdî rabûna wî jî namîne. Her du term li ber hev dirêj kirî di tariya şevê de hay û baya wan ji

hev çênabe. Ehmoyê bi dû dîtina kurê xwe ketibû, bi navê sîxurtiyê ji teref gerîla û Şêroyê gerîla ew ji mal biribûn jî bi navê li dij dewletê kar dike, têne kuştin.

Bi derketandina rojê, dema gundî dewarên xwe ji axuran derdixin. Ji bona teva naxirê bikin da ku gavan jî wan bibe çê rê. Gava ku hemî heywan tevlê naxirê dibe û gavan jî amadekariyê dike da ku wan bibe rojhilatê gund. Piştî qederekê ew û naxir berbi cihê çêrê ve diharin. Êdî ronkayî ketiye erdê, roj hêdî hêdî serê xwe bilind dike. Di wê ronkayî yê de gavan dibîne ku weke du term an însanên raketî bin, ber çavên wî dikeve. Hêdî hêdî gavên xwe berbi wir de diavije. Her ku nêzîk wan herduyan dibe û bi derketandina rojê ew wan nas dike ku Şêro û bavê xwe di nava xwînê de bê deng, bê ruh dirêjkirî ne. Dilezîne tê ser wan û dema wan di wî halî de dibîne dike gazî û hawar. Ew gazî û hawara wî di nava gund de olan dide, yên dibihîzên berbi wî dengê gaziyê de direvin ku bizanibin çi qewimiye, çi bûye. Di destpê de Gundî tê gihiştin dibe ku dîsa dewletê li ser navê qesas ne diyar hin gerîla kuştibin û avîtine ber gundê wan.

Her kesên ku ew deng, gazî û hawarê dibihîstin berbi wirde de direviyan ku fêr bibin bê îcar çi bûye û çi qewimî ye. Lê dema gundiyan xwe gihiştin ser wan herdu terman, dîtin ku yek Şêro û ê din Bavê wî ye. Hawar û gazî bêtir dibe. Bi wê hawar û gaziyê Xezalê, dayik û bavê xwe, jin û keçên Ehmo hemî bi hevre berbi termên li erdê, direviyan. Xwe digihêjin wir lê dîtina wan dît agir bi nava wan dikeve. Çavên wan kor, guhê wan kerr û lal bû bûn. Ne dizanîbûn û dikarî bûn dê çi bêjin. Yek doktorê berzewac û din jî bavê wî bû. Xezalê ji heşê xwe diçe û li ser termê Şêro dikeve. Her ku diçû roj bilndtir û xelk qelebalixtir dibin. Her diçû dengê gazî û hawara wan berbi gundên din jî diherikî…

Hemî gundên nêzîk ku dengê hawar û gaziyê çûbû wan, ew jî berbi wir de beziyan. Ji derketandina rojê heta berbi êvarî, gundî li wir, li ber serê doktorê xwe û bavê wî rawestiyan. Hin digiriyan, hinan li xwe didan. Hinan kincên xwe ji ber vê zilmê diçirandin. Heta ku Xezalê bi ser heşê xwe de hat. Rabû ser xwe, herdu destên xwe berbi ezman de bilind kir û bi dengekî bilind ku hemî kesên li wir bikaribin bibihîzin, got:

-Hey hawar!!! ev çi felek, afat û bobelate tê serê me kurdan. Ev çi hal e kurd tê de dijîn. Kurdek ji ber li hember dewletê kar dike tê kuştin, bav ji bi navê sîxurtiyê ji teref Sapociyan tê kuştin. Lê kurd vê fêm nakin ku kuştina herduyan ji bona yek rêziya parastina komara tirk e. Hawer hawere kurdno, gerîla hatine amadekirin da ku gelê xwe, xelkê xwe, xuşk û brayên xwe bikujin. Gerîla çêkirine ji bona kurdan û zaneyên wan nehêlin. Gerîla çêkirine ji bona tevgerên kurdan nehêlin û gerîla çêkirine ji bona ciwan û xortên kurdan negihêjin miradê xwe. Gerîla çêkirine ji bona ciwanên siberoja miletê xwe ne, nehêlin da ku miletê kurd bê siberoja xwe bimîne.

Gundîno!!!

Vê baş bizanibin û fêr bibin ku PTK û gerîlayên wan ne ji bona mafê kurdan, lê ji bona parastina komara tirk e, da ku hemî tevger û hêjayiyê gelê xwe bi destê wan têk bibin. Dijmin jî baş dizanin ku dema kurmê darê ne ji darê be, wê ew dar nerize. Armanç û hedefa damezrandina PTK ya bi destê dewletê jî ev e. Bi destên ciwanên kurd, kurdan didin kuştin. Bi destê gerîlayên kurd ku ji bona azadiya gelê xwe reviyane serê çiyan û ketine nava vê partiya ji bona tunebûna kurdan û parastina komarê, kar dikin. Ew partî bûye aş û kurdan di nava xwe de dihêre. Ew partî bûye derya û gelê kurd di nava xwe de difetisîne. Ew partî bûye agir û gelê Kurd dişewitîne. Bes e, bes e haho bes e. Êdî zarokên xwe navêjin nava vî agirê ku me û we dişewitîne… Got û serê wê ket ser termê Şêro û ew jî bê ruh, bê deng û bê tevger ma…

# 58

Dem û zeman diherikî. Şer û pevçûn her berdewam bû. Şerê azadiya Kurdan ya bi serpereştiya Barzaniyan destpêkiribû li başûrê Kurdistanê gihiştibû azadiyê. Bi azadiya başûrê Kurdistanê jî tola Seyi Riza, Sêx Seîdê Pîran, Qazî Mihemed, Barzaniyê nemir, bi hezaran canfede û rêberên Kurdan ya pêşmêrgeyên bi salan di nava şerê azadiya welatê xwe de, bû bûn cangorî hate hilanîn. Tola Enfalkirina 182000 kurdan û tola Helebçeya bi bombên jahrê ku bi hezaran kurd bûne cangorî û seqet mabûn, bi ser ketibû.

Êdî li ser çiya û zinarên Kurdistanê wê alaya Qazî Muhammed diyarî serokê neteweyî Barzaniyê nemir kiri bû û ji xwestibû ku dema wan Kurdistan azad kir. Bila hemî çiyayên Kurdistanê bi vê alê bêne xemilandin. Bila ev ala ku bû ye remza berxwedan û serîhildana kurdan ku weke ala neteweyî, bila bikeve hemî malan, hatibû cih.

Belê Barzaniyan êdî ew nesîheta Qazî pêk anîbûn, welatê xwe azad û însanên xwe ji bindestiyê xelas kiri bûn. Vê azadiyê li başûrê Kurdistanê, berê otonomî bi dest xistibû. Bi destxistina vê azadiyê êdî Barzanî li wir nesekinîn, gav bi gav ji bona Kurdistaneke serbixwe karê xwe didomandin.

Parlemana xwe damezrandin, care ewil bi dengên xelkê xwe, parlementoya xwe çalak kirin. Di bin sîwana parlemena xwe de hemî kurd li gel hev ji bona azadî û serxwebûnê, karê xwe domandin. Li gel hemî zor û zehmetiyan, bi xebatên pir alî û bi biryara perlementoya Kurdistanê kurdan xwe weke dewletek Federe ragihandin û ev biryara wan ji teref parlemana Iraqê jî ve hate pesinandin. Agirê azadiyê ku li başûrê Kurdistanê pê ketibû, tîna xwe, germahiya xwe dida perçên din jî. Wî agirî kurd ji şer û ji şevreşê parast. Germahiya wî agirê dabû perçên din jî. Bi saya wê germê qeşaya nava însanên kurd yên bindest diheliya. Wî agirî kir

ku Kurd ji nûde li xwe, li welatê vegerin. Loma tevger û berxwedanên perçên din bi saya wî agirê azadiya ku li başûrê kurdistanê hatibû pêxistin, ketin nava xebatên ji bona azadiya gelê xwe.

Kurd bi saya şerê Barzaniyan ya sed salan li başûrê Kurdistanê bûne dewleteke Federe li Iraqê. Hemî kurdan li gel hev ji bona avahî û pêşvebirina wir kar kirin. Li seran serê cîhanê û li hemî perçên Kurdistanê Kurdan bi alaya rengîn, bi sirûda ey Reqîb kuçe û kolanên welatan xemilandin û hejandin.

Piştî Komara Kurdistanê li Mehabadê, li başûrê Kurdistanê kurd bûne xwediyê parlemana xwe. Di vê perlemana nû ya başûrê Kurdistanê de kurdan, kurê serokê neteweyî Barzaniyê nemir Mesud Barzanî kirin serokkomarê xwe û serokwezîrekî herî ciwan, kurê qehremanê nemir Îdarîs Barzanî kirin serokwezîr. Serokwezîrê nû Nêçîrvan Barzanî bi wê zîrekbûna xwe bi çalakbûna xwe û bi wê zanîn û kanîna xwe ji bona parastina mafê kurdan dest bi dîplomasiya navneteweyî kir.

Aha vê hebûnê, dagirkerên kurdan ji nû de har kir ku divê wan ew hebûna têk biribana. Kûçikê li Şamê li gel telebê xwe Sapo plan li ser planan çê dikirin da ku wê çawa vê hebûnê têk bibin. Sapo dîn û har bû bû ku divê wî ev hebûn bi hemî hêz û qaweta xwe û bi alîkariya dagirkran têk bibira da ku ew li ser navê Kurdan û weke mezinekî wan beşdarî civîna Lozana dudan biba. Lê Barzaniyan hemî planên dagirkeran ya li ser destê Sapo, bi azadiya Kurdistanê têk biribûn. Loma ev nedihat hesabê Sapo û dagirkeran. Kûçik û Sapo bi alîkariya dewleta xwe ji nû de ketin nava plan û projeyan. Taliya talî gihiştin wê encamê ku divê gerîla şerê Barzaniyan li hember pêşmêrgeyan bikirana da ku ew hebûn têk biçûya. Kurd ji nûde bi qirkirin û wêraniyê rû bû rû bibana.

Ji ber vê bû Sapo biryara li hember pêşmêrgeyên Kurdistana azad û tunebûna wan dabû. Şerê mezin di nava pêşmêrgeyên qehreman û gerîla de derket. Di vî şerî de pêşmêrgeyên qehreman li gor rêbaza Barzaniyê mezin, xwedî li erda azad derketin û li hember gerîlayên ku her çar dagirkeran piştgiriya wan dikirin, bi serketin.

Vê serketinê ji nû de morala dagirkeran xerab kir. Êdî tê gihiştin ku çi jî bikin wê nikaribin zora Barzaniyên ji bona Kurdistaneke azad û serbixwe, ev serê sed salane şer dikin, bibin. Piştî têkçûna gerîlayên ku bi piştgiriga dagirkeran têk dihare. Rewşa Kurdistanê jî dikeve qonaxa dewletbûnê. Loma desthilata başûrê Kurdistanê bi serpereştiya serok wezîrê ciwan û jêhatî, dest bi xebatên navdewletî kir.

Lê Sapoyê weke li ser êgir be, bi heqaret bi gef û bi tehdîdan xwest ku gerîla tevgera Barzaniyan têk bibin. Lê nebû û bi vê yekê ne Sapociyan, her weha her çar dagirkrên bi alîkariy Sapo û partiya wî ve rabûbûn, wenda kirin. Piştî azadiya Kurdistanê êdî rewş bi temamî hat guherandin. Êdî mayîna Kûcik û Sapo li Şamê rîsk bû. Loma dewletê xwest bi rêya hin qomployên nû Kûçik û Sapo bibin welatê wan. Her çiqasî ew bi ser jî neketibûn, lê wan karên baş ji bona dewleta xwe kiribûn.

Berê Kûçik li Enqereyê vegeriya ji bona ew neyê fêm kirin an zanîn ku ew zilamê dewleta kûr e. Ew girtin û derxistin dadgehê. Di parastina xwe de Kûçik weha ji dadgêr re got: ”Binere her çiqasî paşnavê min Kûcik e jî lê min weke şêrekî ji bona dewleta xwe kar û xebat kirî ye û dikim. Ma ne xeyala me tevan bû ku zarokên kurdan xwe di ber parastina komarê de bidin kuştin, Ma ne daxwaza me tevan bû ku em tevgerên başûrê rojhilata welêt biqedînin û bê deng bikin. Gelo we qet pirsiye ku vana hemî bi aqilê kê û li ser destê kê hatin kirin”.

Piştî Kûcik li welatê xwe vegeriya. Hat fêm kirinê nebiserketina Sapo û ya hemî dagirkeran bi destê Barzaniyan têk çû. Loma dewletê xwest ku zilamê xwe, pêgirtê xwe li welatê wî vegerîne. Lê ji bona xelkê xwe û cîhanê bixapîne, di warê komplowarî de Sapo ji şamê derxistin. Li welatê wî vegerandin û li gravekê cihekî xweş ji bona wî amade kirin. Kirin û bêtêl û telefonek ji bona wî amade kirin ku êdî ew li wir bi rehetî bikaribe partiya xwe bi rêve bibe…

Barzaniyan weke gelek caran vê carê jî hemî plan û projeyên dagirkerên ku dixwestin Kurdistanê wêran û xelkê wê talan bikin, têk birin. Barzaniyan bi saya rêbaza pîroz û bi tekoşîneke dûr û dirêj Kurd ji mirinê azad kirin û ji bona wan dewleteke Federa

danîn. Lê xebat û lebatên wan ji bona Kurdistaneke serbixwe her berdewam e…

Sapoyê bi hewesa, wê weke serokekî kurdan li ser navê wan beşdarî Lozana dudan biba jî têk çû bû. Loma wî xwest heta ku PTK hebe divê li başûrê kurdistanê tevliheviyan derxin, şer û pevçûnên nû bikin. Divê Gerîla xwe amade bikin da ku pêşmêrgeyan bikujin û ne aramî li wir hebe da ku wir ji bona nebe dewleteke serbixwe. Ji xwe Sapo tim gotibû û digot: ”Heta ku ez û PTK hebin dê Barzanî nikaribe dewleta kurdî ava bike” jî têk çûbû. Loma êdî ew ma li wê grava dewletê weke diyarî dabû wî. Êdî ew ma li wir... Û Barzanî jî bûne dewlet federe heta ku serxwebûnê jî ragihînin….

Xwendevan jî divê vê rewşê ji nû de binirxînin û bibinîn ku bê çi plan û proje ji bona têkbirina kurdan hatibûn amade kirin. Divê vê yekê jî bizanibin ku plan û projeyên dagirkeran ya ji bona tunekirina kurdan bi destên Barzaniyan têk çû. Têk çû êdî ew bûne xwediyê gelê  xwe. rêber û xizmetkarên welatê xwe. Bi saya wê tekoşîna wan ya sed salan kurd bûne xwedî dewleta xwe…

Fikrek bi çûk, dikare bi destxistineke mezin pêk bîne. Berî niha bi sed salan, Barzaniyan gotibûn: ”Em biyaniyan li erda xwe, ji bona xwe weke desthilat qepûl nakin”. Loma îro ew li welatê xwe bûne desthilat…

DAWÎ

Berhemên Bûbê Eser yên hatine weşandin;

1) Gardiyan,1994, Stockhom, Weşanên Roja Nû (Roman)

2) Gardiyan ( Bi Yunanî) 2001 Yunanistan

3) Gardiyan (Bi kurdî) 2006 Stenbol, Weşanên Doz

4) Gardiyan (Bi Tirkî) 2007, Stenbol Weşanên Doz

5) Gardiyan (Bi zarawayê Soranî) Başûrê Kurdistanê, 2010

6) Gardiyan (Bi kurdî kurdî Elmana weşanxana Ser Sera 2019

7) Gardiyan (Bi zimanê Swêdî) Weşanxna Apec 2021

8) Gardiyan (Bi zimanê Erebî) 2023

9) Jiyanek, 2005, Stenbol, Weşanên Bajar (Roman)

10) Jiyanek 2006 Weşanxana Doz (Roman)

11) Enfal û Jenosîda Bi Kurdî, 2007, Başûrê Kurdistanê, (Lê- kolîn)

12) Sîno bû Efendî, 2007, Stenbol, Weşanên Doz, (Novel)

13) Zewaca Şaş, 2008 Stenbol, Weşanên Doz (Şano)

14) Rastiya Me, 2008, Stenbol, Weşanên Doz (Nivîs)

15) Dîroka Rureş, 2009 Stockholm, Weşanên Sara (Şano)

16) Barzan Digiri (2017) Weşanan Sîtav (Roman)

17) Qêrîna Barzan (2020) Weşanxana Doz (Hevpeyvîn

Li gel malbatên kesên wan hatibûn enfalkirinê.

18) Qêrîna Barzan bi zimanê tirkî Barzanin Haykirişi.

2022 Weşanxana Doz li tirkiyê çap bûye